HAFIZA MERKEZİ
HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

# LI TIRKIYEYÊ LÊGERÎNEKE HEQÎQETÊ YA AŞTIYANE Û RARÛBÛNA BI NIJADPERESTIYÊ RE

NESRÎN UÇARLAR

# LI TIRKIYEYÊ LÊGERÎNEKE HEQÎQETÊ YA AŞTIYANE Û RARÛBÛNA BI NIJADPERESTIYÊ RE

NESRÎN UÇARLAR

WERGERA JI TIRKÎ: ZANA FARQÎNÎ

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

HAFIZA MERKEZİ

**TRUTH JUSTICE MEMORY CENTER**
Ömer Avni Mahallesi
İnönü Caddesi Akar Palas No:14 Kat:1
Beyoğlu, 34427, İstanbul
T: +90 212 243 32 27
info@hafiza-merkezi.org
www.hakikatadalethafiza.org

**NİVÎSKAR**
Nesrîn Uçarlar

**WERGÊR**
Zana Farqînî

**DÎZAYN**
Ekîn Sanaç

© Hakikat Adalet Hafıza Çalışmaları Derneği Yayınları (Truth Justice and Memory Studies Association Publications) 2022

OLOF PALME INTERNATIONAL CENTER

Hafıza Merkezi spasiyê li Olof Palme International Centerê dike ji bo alikariya wan a bo çapkirina vê reportê.

OAK FOUNDATION

SIGRID RAUSING TRUST

Em spasiyê li Weqfa Oakê û li Weqfa the Sigrid Rausing Trustê dikin bo alikariya wan a ku li saziyê kirine.

**DESTPÊK** 5

**I. Di Dewra Piştî Heqîqetê de Lêgerîna Heqîqetê ya Aştiyane** 10

**1. Kiryara Siyasî ya Heqîqetê** 11
*Dewra Piştî Heqîqetê* 15
*Li Tirkiyeyê Dewra Neheqîqetiyê* 20
**2. Rejîma Heqîqetê ya Tirkiyeyê** 23
*Salên 1990'î: Dîmenên ji "Anadoliyê"* 26
*Şopên Hafizeyan û Heqîqetê* 31
*Salên 2010'an: "Bibin Şahid"* 35
**3. Rejîma Heqîqetê ya Mixalif** 41
*Lêgerîna Heqîqetê ya Aştiyane* 48
*Pevçûna Heqîqetê* 50

**II. Îtiraza li Rejîma Heqîqetê: Rarûbûna bi Nijadperestiyê re** 54

**1. Rewşa Sade ya Neteweperweriyê: Nijadperestî** 55
*Nijadperestiya bi Usûla Tirkî* 60
**2. Xeyalên Nijadperest û Îmtiyaz** 66
*Zindîtiya li Dijî Nijadperestiyê* 72
**3. Bermayiya Nijadperest: Li Afrîkaya Başûr Rarûbûna bi Raboriyê re** 77
*Tewqên Nijadperestiyê* 83
*Sînorên Edaletê yên Dewra Derbasîbûnê: Nijadperestî* 88
**4. Li Dijî Teşebusên Çareseriyê yên li Tirkiyeyê Berhilistiya Nijadperest** 94
*Rarûbûna bi Raboriya li Dijî Nijadperestiyê û Bilîbûna bi Aştiyê* 100

**GOTINA DAWÎ** 104

# Destpêk

Lêgerîna li heqîqetê û têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re, xwedî wê mebestê ye ku hewl dide li ser heqîqetên eleqedarî zilm û şideta dewletê bê axaftin û hesab bê pirsîn ku çendî beşeke giring a civakê bi wan dizane jî lê ne xwedî raye û îradeya axaftina li ser wan û ne jî xwedî niyeta girtina ser xwe ya berpirsiyên mihtemel e. Divê ew heq bê teslîmkirin ku li dinyayê û Tirkiyeyê, vê têkoşîna hanê rêyeke giring kudandiye ku êdî bi qasî berê ne gengaz e ew bêedaletiyên raboriyê bên înkarkirin an jî meşrûkirin. Li aliyê din, ew tebeqeyên bêeleqetiyê ku vê têkoşînê nekariye bi temamî ew berteref bikin, dibin asteng ku bi awayê heqkirî li ser bêedaletiyê bê axaftin û ya hîn giring jî hesabê wê yêkê bê pirsîn.

Ew tebeqeyên bêeleqetiyê yên mindemîcî avabûna dewletan in û wan sîrayetî kûrahiya jiyana rojane kiriye û ji wan bêedaletiyên ku wesfê binyatî û sîstematîk bi dest xistiye xwe xwedî dikin, tevî em dizanin bi lêgerîna heqîqetê ya ku ji aliyê mixalifan ve tê meşandin û bi têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re hel nabe jî, em dikarin bibêjin ku tewereya sereke ya vê têkoşînê jî zordayîna li vê asteng û nebihurînîtiyê ye. Bi gotineke din, lêgerîna heqîqetê û têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re, beşên serwer ên ku aştiyê bi raboriyê re eleqedar dikin û bi berdewamiya îmtiyazên xwe ve girê didin û beşên mexdûr ên ku aştiyê aîdî dahatûyê dibînin û bi şertê bidawîhatina îmtiyazan ve dibestînin, tîne pêşberî hev û din. Di vê rewşê de, mexdûr û mixalifên ku bi daxwaza dayîna deynên siyasî, aborî û civakî lêgerîna li heqîqetê û têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re dimeşînin û bi israr dixwazin sifetê “biheysiyet” bi aştiya temendirêj a ku hewl didin wê pêk bînin ve deynin, fikirîna li ser vê yekê da ku ji aliyê qisimê kirde (fail) û kesên xwedî îmtiyaz ve ew bê îdrakkirin, dîsan dikeve ser milê wan kesên hanê ku ew li dû aştiyeke temendirêj û biheysiyet in.

Lêgerîneke li heqîqetê û têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re ya ku daxwaza dayîna deynên siyasî, aborî û civakî dike, çendî xwedî armanca aştiyeke temendirêj û biheysiyet e jî, lê ji ber em pê dizanin dibe ku ev rasterast an jî ji ber xwe ve yan jî di maweyeke kurt de encamên aştiyane nede. Ji lew re ji ber nedana deyn a ji aliyê deyndaran ve ku ew deyndar xwedî niyet in di îmtiyazên xwe nebihurin, loma hewce bi fikirîna li ser îmkanên din heye ku ev têkoşîn divê bi tenê ne mexdûr û mixalifan, lê belê beşên din ên civakê jî li xwe bigire û bi awayekî pir tebeqeyî bê meşandin û pêdivî pê çêdibe ku lêgerîna li heqîqetê û têkoşîna bi raboriyê re li bernameyeke siyasî bê dagerandin. Jê bêhtir, di bingeha vî îhtiyacî de, xuyabarkirin û hesabdayînbariya heqîqeteke hîmî ya din jî heye ku ji bilî mexdûr û mixalifan, beşên din jî eleqedar dike: Têkiliyên desthilatê yên mindemîcî feraseta îdareya siyasî ya modern ku hemû

tebeqeyên civakê radipêçe û ji ber wê hêza wê ya ku heqîqetê tayîn dike, hildiberîne, dide hilberandin, dibêje, dide gotin, qeyd dike, dide qeydkirin, bi derfetên sîstematîk û binyatî û bi navbeynkariya şidetê tê bikaranîn.

Ji bo îtirazkirina li têkiliya di navbera desthilat û heqîqetê de, ku Foucault wê bi tabîra “rejîma heqîqetê” îzah dike, divê bi heqîqetên fermî yên ku ji vê têkiliyê çêdibin û bi rejîma heqîqetê mirov bide nîşandan ku ji ber stînkar ne tenê mexdûr û mixalif in, loma jî hewce bi vekirina rêyên tebeqeyên bêeleqetiyê yên di civakê de heye. Bi xulase, têkoşîna bi bêedaletiyên raboriyê re û bi bêeleqetiya têkildarî lêgerîna heqîqetê û têkoşîna rarûbûna bi raboriyê ya îroj re, ku hewla çêkirina aştiyeke temendirêj û biheysiyet dide, tê mehneya bilîbûna bi xuyabarkirina awayê xebitîna rejîmên heqîqetê, çavkaniyên vê heqîqetê, îstismarkirin û texsîrkirina wan tiştan.

Bilîbûna ji bo xuyabarkirina xebitîna rejîmeke heqîqetê ya diyar û ew heqîqetên resmî yên ew wan hildiberîne, ku teqabûlî lêgerîna li heqîqeteke eleqedarî heqîqetên mixalif dike, dibe ku li parçeyekî pêvajoya avabûn û xebitîna rejîma heqîqetê ya mixalif jî dagere. Bi gotineke din, divê bi bîr bê xistin ku dibe her rejîmeke heqîqetê ji çêkirina rejîmeke heqîqetê ya dijber re, rê veke û lêgerîna li heqîqetê ya ku îtiraz li rejîma heqîqetê ya fermî dike û xwe dispêre heqîqetên mixalif, di avakirina vê rejîma heqîqetê ya mixalif de roleke giring dileyîze. Ji lew re em dikarin bibêjin ku çêkirina aştiyeke temendirêj, bi îtirazkirina li “rejîmeke şer” mimkin e ku ew ji wê lihevxistina di navbera rejîmên heqîqetê de, xwe xwedî dike. Li ser navê daxistina li zemîneke teswîrker û siyasî ya vê qeziyeya normatîf û exlaqî, rarûbûna bi raboriya heyî re û rexneyên têkildarî lêgerînên li heqîqetê, divê bi sedema ku alîkarî li aştiyê bike li dest bê hildan û li ser “lêgerîna li heqîqeta aştiyane” yanî ji zexmkirina cure rejîmeke heqîqetê bêhtir şehitandina rejîma şer û ji bo belavekirina daxwaza aştiyê, hewce ye mirov li ser rêbaza lêgerîneke li heqîqetê bifikire da ku ew rêbaz pirhêl û pirtebeqeyî be, mexdûriyetên cuda li xwe bigire û bikare zorê li wê bêeleqetiya beşên xwedan îmtiyaz bike.

Gava ez li ser metoda lêgerîneke li heqîqetê difikirim, ez du nuqteyên hêjayî nîqaşkirinê dibînim. A pêşî, danîna holê ya bergindiyên siyasî û aborî yên heqîqetên diyardeyî ye ku rejîma heqîqetên resmî wan xuyabar dike û rejîma heqîqetên mixalif jî lê dixebite wan xuyabar bike, her wiha li gel bi peyketina li heqîqetên diyardeyî yên ku rejîma heqîqetên fermî wan vedişêre jî, di konteksta aştiyeke temendirêj û biheysiyet de îcar fikirîna li ser mehne û derfetên hildana dest a heqîqetên diyardeyî ye ku rejîma heqîqetên mixalif guncayî dibîne ku wan veşêre. Gava em vê bibêjin, eger em bal nekişînin ser çavkanî û hêzên wan, şidet û zilmên van her du rejîmên heqîqetan û her wiha ji ber ku mexdûriyet û texrîbatên wan jî ne xwedî heman îtibar û derfeta

tamîrê ye, dê ev yek bê mehneya berdewamkirina bêedaletiya heyî. Jê zêdetir, lêgerîna li heqîqetê ya aştiyane bi xwe jî, divê em wî heqî teslîm bikin ku ev bilîbûn jî li rejîma heqîqetê ya mixalif bi xwe dimîne ku ew ji derfetên tora destilatê ya rejîma heqîqetê ya fermî mehrûm e. Ji vî aliyî ve, ez hewl didim ku ji fikirekê behs bikim ku ne nirxandineke rexneyîtiyê ya bêteref li xwe digire, lê fikira ku îtiraz li serweriya heqîqetê ya rejîma heqîqeta fermî, li zilma wê ya raboriyê û li tehekûma wê ya dahatûyê dike û rejîma heqîqetê jî dawetî wê yekê dike ku bi daxwaza xwe ya edaletê û çêkirina aştiyê re, ya ku dike ew bi lêgerîna li heqîqetê mimkin bibe, divê lihevkirî be.

Gava ez li ser rêbazeke lêgerîna li ser heqîqeteke aştiyane difikirim, nuqteya duyem a ku dixwazim jê behs bikim jî, derxistina rastê ya têkiliya nijadperestiyê ya bi avabûna rejîmên heqîqetê û bi awayê xebitîna wê ye. Dîsan ev têkiliya ku em dikarin bi Foucault re şopa wê taqîb bikin, îdîaya herî sereke ya pêkhatina hebûna heqîqetê bi xwe derdixe holê ku ew jî li ser hebûna nijadan, raseriya wan a li hev û din û ya wî mafî ye ku yek dikare yên din îstismar bike. Nijadperestî, ku bi navgînên biyolojîk û fîzyolojîk ên di bin hakîmiyeta desthilatan de tên hilberandin, îlham dide neteweperweriyan û mêtingehkariyê meşrû dike, derfet dide tenzîmkirina maf û heqîqetan da ku netewe-dewleta modern nijadeke diyar şad û yên din jî tune bike. Piştî têkoşîna li dijî mêtingehkarî û nijadperestiyê, ku wê kir behskirina ji mêtingehkarî û nijadperestiyê negengaz bibe, îcar ew nijadperestiya ku sifetên nû û yên çandî wergirtine, ya rast ji bo desthilat hemû civakê îdare bikin û heta ji bo civak di çarçoveya wan qaydeyên hanê de yên ku desthilatê ew diyar kirine, xwe bi xwe îdare bike, bi zilma normalîtiyeke ku wê bi pêş xistiye dixebite. Her tezahura ku rîayetî norman nake, duçarî cihêtîkerî, bêedaletî û şidetê dibe.

Eger diyardeya di çavkaniya cihêtîkeriyê de, ya li dijî kesên derî-normê wek “nijadperestiyê” bê wesifkirin jî, ez wisan difikirim ku li gorî pêwistiya xeta me li jorê dişopand, çendî teqabulî gotina heqîqetê bike jî, bêedaletiyê, zilmê û texrîbatê li zimanê civakî tercime dike. Bi navê wê dengkirina li cihêtîkeriya li dijî cinsiyetên cuda yên ji cinsiyeta serwer cihê ne, yanî lêdanîna navê zayendperestiyê, ez wisan difikirim ku têkoşîna ji bo pêdana wesifê cezayî ya vê cihêtîkeriyê xurt dike; her wiha li cihêtîkeriya li dijî dîn û zimanên cuda jî, ji ber ku em nikarin bi navê dîndarîtî yan jî zimankariyê deng li wan bikin, rewşeke tersî vê diafirîne. Bi vê yekê, ez difikirim ku denglêkirina bi navê cihêtîkeriyan ên ji bilî zayendperestiyê, ku nemaze bi navê neteweperweriyê tên meşrûkirin, yanî lêkirina navê nijadperestiyê jî hewla pêdana wesifê cezayî ya nijadperestiyê ye ku têkoşîna li dijî nijadperestiyê xurt dike. Divê mijar wek binavkirina meseleyek besîd neyê dîtin, ji lew re binavkirin bi xwe jî têkoşîneke siyasî ye û em dikarin bibêjin berginda hewla wan mexdûr û mixalifan heye ku îtiraz lê dikin ew bêedaletiya duçarî wê bûne bi termên rejîma heqîqetê bên

îfadekirin û ew îşaretî wê cihêtîkeriya binyatgerî ya sîstematîk û şidetê dikin.

Ez dixwazim behsa naveroka vê xebatê bikim, ku li jorê min ceriband nîqaşê di konteksta rarûbûna bi raboriyê re û lêgerîna heqîqetê ya li Tirkiyeyê de bi cih bikim û wisan vê gîrizgehê biqedînim. Di beşa pêşî ya xebatê de, min hewl da ku ez ji analîza “rejîma heqîqetê” ya Foucault û ji nirxandinên Arendt ên eleqedarî têkiliya di navbera heqîqet û siyasetê de hereket bikim û li ser nîqaşa dewra piştî heqîqetê (*post-truth era*) ya roja me rawestim. Ji seyra dewra piştî heqîqetê ya li Tirkiyeyê, ku ez difikirim mirov dikare wek serdema neheqîqetiyê jî wê biwesfîne, bi rê ketim da ku ez çêbûna rejîma heqîqetê ya li Tirkiyeyê, awayê xebitîna wê, miqaweta wê û krîza wê vekolim û hewl bidim li bernameyên televîzyonan ên salên 1990’î û yên 2010’an, nemaze li tezahurên “têkoşîna li dijî terorê” yên ku vebeyîne kanalên dewletê û li şopên hafiza û heqîqetê yên cuda yên ji van tezahuran qewimîne binêrim. Min xwast ez têkiliya di navbera rejîma heqîqetê ya resmî ya Tirkiyeyê û rejîma heqîqetê ya mixalf de, ku ev li dijî ya resmî hatiye avakirin, wek rejîmeke şer nîqaş bikim, ku nemaze ew di wexta “operasyonên xendeqan” de berbiçav bû. Ez lê xebitîm ku ramanên xwe yên eleqedarî têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re û nemaze ya têkildarî metoda lêgerîna li heqîqetê ya aştiyane, ku ji îtiraza rejîmên heqîqetê çêbûne, di çarçoveyeke qirêna/pevçûna heqîqetê de hildim dest û binirxînim.

Di beşa duyem a xebata xwe de min xwast ez şopa têkiliya di navbera rejîma heqîqetê û nijadperestiyê de bişopînim. Gava min dest pê kir da ku ez şekilê vê şopê ya li Tirkiyeyê vekolim, min ji bernameyên nîqaşê yên ku di televîzyonan de dihatin weşandin îstifade kir û bi taybetî têkiliya di navbera neteweperwerî û nijadperestiyê de û eleqedarî fikira berbelav a ku dibêje li Tirkiyeyê nijadperestî tune ye, min xwast ku ez wê ji nirxandina rexneyî re vekim. Ji bo ez vê nirxandinê bingehî bikim, min ji lîteratura nijadperestî û têkoşîna dijberî nijadperestiyê sûd wergirt. Bi mebesta ez nijadperestî û têkoşîna dijberî nijadperestiyê di konteksta rarûbûna bi raboriyê re bi cih bikim, her çendî min behs ji rexneyên li ser Komîsyona Heqîqet û Lihevkirinê ya Afrîkaya Başûr kir jî, lê min hewl da ku giraniyê bidim ser tesbîtên kêşeya nijadperestiyê ku di pêvajoya rarabûna bi raboriya Afrîkaya Başûr re têra xwe li serê nehatiye sekinandin û îroj hîn jî ev yek dibe sedema xwedîkirina şidet û cihêtîkeriya li ser mirovên reşik û afrîkayiyên din. Min ev tesbît, bi mebesta ku dê rojekê li Tirkiyeyê di çarçoveya pêvajoya rarûbûna bi raboriyê re li pêş çav bên girtin kirin, ku loma min pêşî xwast reaksiyonên nijadperest ên li ser teşebusên çareseriyê yên borî yên li Tirkiyeyê û seyra giştî ya van teşebusan bi bîr bixim. Bi meqseda ku dê ew ferqên mezin ên di navbera Tirkiye û Afrîkaya Başûr de, ji hînbûna wan ji hev û ji fikirîna bi hev re nebe asteng, min bi tecrubeya Afrîkaya Başûr dest pê kir û lê xebitîm ku ez li ser rarûbûneke bi raboriyê re ya li dijî nijadperestiyê ya li Tirkiyeyê û li ser nuqteyên

krîtîk ên mihtemel ên pêvajoya aştiyê bifikirim.

Gava min ev xebat didomand, tim ev fikir dihat hişê min: Têkoşîna lêgerîna li heqîqetê û hewla rarûbûna bi raboriyê re ya ku mexdûr û mixalifan dida û di heman demê de dîtina îmkana îtiraza li rejîmên heqîqetê û meşandina têkoşîna dijberî nijadperestiyê, ji nû ve derdixe holê ku ev cehd îlhambexş û xwedî hêzeke siyasî ya giştgir e. Hêvîdar im min kariye bikim ku ev fikir fesîh be û qîmet pê bê dayîn ku ew hêjayî têfikirînê ye.

BEŞA YEKEM

# DI DEWRA PIŞTÎ HEQÎQETÊ DE LÊGERÎNA HEQÎQETÊ YA AŞTIYANE

# Di Dewra Piştî Heqîqetê de Lêgerîna Heqîqetê ya Aştiyane

Ev qisimê ku di dewra piştî heqîqetê de, li Tirkiyeyê lêgerîna heqîqeteke aştiyane û derfetên rarûbûna bi heqîqetê re nîqaş dike, ji sê beşên sereke pêk tê. Beşa pêşî ya ku ez li ser têgiha "rejîma heqîqetê", têkiliya heqîqet û siyasetê û nîqaşên li ser dewra piştî heqîqetê disekinim, bi nirxandineke têkildarî dewra heqîqetê ya Tirkiyeyê bi dawî dibe. Di beşa duyem de ku ez rejîma heqîqetê ya li Tirkiyeyê, nîqaşên siyasî yên li salên 90'î yên ku vebeyiyane bernameyên televîzyonan, dîmen û şopên ku van dîmenan di hafizeyan de hiştine vedikolim, bi wesîteya bernameyeke televîzyonê ya aîdî 2010'an e, tezahurên rejîma heqîqetê ku vebeyiyane roja me ya îroj, her wisan nîqaşa ku cext li berhingariya wê û lê belê li krîza wê jî dike, li xwe digire. Ev qisim jî bi beşa sêyem a rejîma heqîqetê ya mixalif, ku ew li dijî rejîma heqîqetê ya fermî hatiye avakirin, bi dawî dibe û min ev beş ji nîqaşê re vekir da ku ew bikare di çarçoveya pevçûneke/qirêneke heqîqetê de xizmetê li lêgerîneke heqîqetê bike.

## 1. Kiryara Siyasî ya Heqîqetê

Li gorî Foucault, ku îdia dike desthilata modern bi awayê çêkirina serweriya li ser heqîqetê dixebite, divê heqîqet wekî "tevahiyek proseduran a ku ji bo hilberîna îfadeyan, verastkirin, belavkirin, geran û fonksiyan wan hatiye sererastkirin" bê fehmkirin, "bi sîstemên îqtidarê re, ku wan ew bi xwe hilberandiye û wê destek dike û bi tesîrên desthilatê re, ku wan ew aniye holê û ew belave kiriye, di nav têkiliyeke çerxî de ye."[1] Ev têkiliya çerxî ya ku Foucault ew wek "rejîma heqîqetê" bi nav dike, dibêje ku ew tim di handana siyasî û aborî de dijî, di bin kontrola domînant a dameziraweyên wekî zanîngeh, artêş û medyayê de tê hilberandin û wek objeya lêbelavkirin û serfkirinê ya xwedî çapaneke berfireh hemû nîqaşên siyasî û lihevxistina civakî li xwe digire.[2] Ji vî aliyî ve, rejîma heqîqetê da ku siyasetê hilde bin wesayetê û zor bide qada siyasî, em dikarin bibêjin ku ew bi awayê xwe bispêre çêkirina serweriya li ser heqîqetê, bi şekilê "rejîmeke şer" a timî dixebite. Jixwe Foucault ku şopa rabêjiya dîrokî-siyasî ya têkildarî gotina ku siyaset dewama şer e dişopîne, analîzeke eleqedarî vê fonksiyonê pêşkêş dike: Şer ku çêbûna hiqûq û dewletê amade dike, bi bêdengbûna çekan naqede; bingeha hemû têkiliyên desthilatê çêdike û dike ku em tim li dijî hev di rewşa şer de bin; di nav

[1] Michel Foucault. 2011. *Entelektüelin Siyasi İşlevi*. Wer. Işık Ergüden, Osman Akınhay, Ferda Keskin. Ayrıntı: 52. Gava min ji vê pirtûkê jêgiran dikirin, min ji îngilîziya pirtûkê îstifade kir û ji bo hin bêjeyan jî min bergindên cuda yên tirkî bi kar anîn. Ji bo îngilîziya pirtûkê binêrin Michel Foucault. 1980. *Power/Knowledge. Selected Interviews and Other Writings 1972- 1977*. Ed. Colin Gordon. Pantheon Books: 133.

[2] Michel Foucault. 2011: 51

vê rewşa şer a giştî de "kesê ku dipeyive, rastiyê dibêje, dîrokê vedibêje, xatirayan ji nû ve keşf dike û lê dixebite ku tu tiştî ji bîr neke [...] bivê nevê bi awayekî girêdayî vî alî yan jî yê din e: di nav şer de ye, dijminên wî/wê hene, ji bo zafereke taybetî dixebite.[3] Kirdeya vê rabêjiyê, pozîsyona kirdeya xwe ya gerdûnî yan jî notr winda kiriye; gava dibêje 'ev mafê me ye', qesta "mafê malbat an jî nijada xwe, mafê xwe yê raserî yan jî berîtiyê, mafê îstilayên mizafer an jî mafê îşxalên nû yan jî yên dêrin" dike.[4] Bi awayê mîna têgiha maf, têgiha heqîqetê jî pozîsyona xwe ya notr an jî gerdûnî û ya nêzî aştiyê winda dike û li çekekê dadigere ku ji bo destkeftiyeke diyar tê bikaranîn; dibe sedema çêbûna têkiliyên heqîqetê yên mindemîcî têkiliyên hêzan û xizmeta çêkirina rejîmên heqîqetê dike; a rast heqîqet êdî bûye parçeyekî têkiliyên hêzan, asîmetrî û şer.[5] Ji vî aliyî ve, li dijî heqîqetên fermî ku tim pêgirî hilberîna zanyariyê ya desthilatê û gerana wê ye, em dikarin bibêjin ku em ji wê heqîqetên mixalif behs dikin ku ew wan red dike, dipestîne û diheşêve û em di nav rejîma şer de ref digirin ku rejîma heqîqetê ew dadimezirîne.

Eger em qebûl bikin ku heqîqetên diyardeyî rasterast nikarin bipeyivîn, mixatabên xwe ji ber xwe ve peyda nakin; kîjan heqîqetên diyardeyî dê li kê, bi çi awayê bên veguhastin û bi van heqîqetên diyardeyî tê xwastin dê çi bê kirin, tim meseleya şiroveyeke siyasî û tercîhê ye, nexwe em dikarin bibêjin ku bi mebesta çêkirina qenaet û nêrînê bi şekilekî diyar tên bikaranîn, di nav kontekstên siyasî yên diyar de tên şirovekirin û loma li heqîqetên siyasî tên dagerandin. Jixwe gava Arendt dest pê dike têkiliya di navbera heqîqet û siyasetê de nîqaş dike, îşaretî ferqa di navbera heqîqeta rasyonel (heqîqetên têkildarî matematîk, zanist, felsefe û dîn) û heqîqetên diyardeyî de dike, dibêje heqîqetên diyardeyî ku parçeyekî qada siyasî ne "di warê karên mirov de derdikevin holê ku bêyî rawestan diguherin", li dijî êrîşên desthilatê nikarin li ber xwe bidin û ji bilî zêhna mirov stareyeke din nikarin peyda bikin.[6] Li hêla din, em dikarin bibêjin ku ev stare ew cih e ku heqîqet lê tê xebitandin, çarçovedarkirin û ji bo ku derkeve qada gelemperî jî tê amadekirin. Nemaze li gel bipêşketina demokrasiyê ku nêrîn, gotin

---

[3] Michel Foucault. 2002. *Toplumu Savunmak Gerekir*. Wer. Şehsuvar Aktaş. YKY: 62-63. Gava min ji vê pirtûkê jêgiran dikirin, min ji îngilîziya pirtûkê îstifade kir û ji bo hin bêjeyan jî min bergindên cuda yên tirkî bi kar anîn. Ji bo îngilîziya pirtûkê binêrin Michel Foucault. 2003. *"Society Must Be Defended" Lectures at the Collège de France. 1975-76*. Picador: 51- 52.

[4] Michel Foucault. 2002: 64; 2003: 52.

[5] Michel Foucault. 2002: 69; 2003: 57.

[6] Hannah Arendt. 2012. *Geçmişle Gelecek Arasında*. Wer. Bahadır Sina Şener. İletişim: 276.
Meqaleya ku sala 1967'an di kovara *The New Yorker* de hatiye weşandin û sernavê wê yê bi îngilîzî "Truth and Politics" e, li tirkî bi sernavê "Doğruluk/Hakikat ve Siyaset" (Rastî/Heqîqet û Siyaset) hatiye wergerandin û di nav pirtûka navborî de derbas dibe. Gava min ji vê pirtûkê jêgiran dikirin, min sûd ji orîjînala gotarê jî wergirt û ji bo hin peyvan jî min bergindên cuda yên tirkiya wan bi kar anîn. Ji bo metna orîjînal binêrin: https://idanlandau.files.wordpress.com/2014/12/arendt-truth-and-politics.pdf [01.12.2020].

û raya her ferdî dibe xwedî giringiyê, desthilatên modern dadikevin stareyên heqîqetên diyardeyî da ku nêrînan bişêwînin/şekildar bikin, ev jî rewşeke mindemîcî siyaseta modern e. Arendt dibêje ku ev rewş bi siyaseta post-modern re diguhere; êdî nêrîn ji heqîqetên diyardeyî bi awayekî serbixwe dikarin bên çêkirin û di navbera nêrîn û diyardeyan de antagonîzmeke (dijminiyeke) siyasî heye.[7]

Arendt, dibêje heqîqetên diyardeyî yên di encama meyla "dagerîna diyardeyê ya li nêrînê" ku em îroj têra xwe lê dibin şahid, "di dilqê 'ji min re wisan tê'" de derdikeve holê û lê zêde dike ku heqîqetên diyardeyî yên di karakterê "ne îqnaker lê xwedî wesifekî zorlêker e", "hikumlêker û serhişkî" de ne jî, xwedî lidijnederketinekê ye ku nîqaşa bingeha siyasetê jî nikare wê ragire. Ev lidijnederketin li hemberî heqîqetên diyardeyî bi zafera nêrînan/dîtinan bi ser dikeve û heqîqetên diyardeyî bi lezgînî dikarin derkevin derveyî qada siyasî. Ev rewşa ku mimkin dike heqîqetên diyardeyî bi nêrînan dikarin bên têkbirin, li gorî nêrînên ku gihîştina heqîqetên diyardeyî û berbelavekirina wan zor e, yanî li gorî nêrînan bi hêsanî hezmnekirina heqîqetên diyardeyî, negerîna li ser zar û zimanan, ji zêhnan derbasnekirina li zêhnan e.

Bi ser de, Arendt dibêje ku ne bi tenê reqîbê heqîqetên diyardeyî, her wiha dijminê wê jî heye; eger nêrîn reqîbê wê be, derew jî dijminê wê ye. Ji bilî vê, "ji ber ku derew bi piranî bi mebesta îkamekirina li şûna amrazên şidetê tê bikaranîn, wisan tê dîtin ku ew li gorî yên di mihîmata kiryara siyasî de cih digirin hîn bêzerar e"[8] Li aliyê din, em dikarin bibêjin ku derew ne tenê bi mebesta îkamekirina şidetê lê ji ber ku bi mebesta meşrûkirinê jî tê bikaranîn, loma teqabûlî zêdetirî amrazeke bêzerar dike. Jixwe tesbîtên Arendt ên eleqedarî têkiliya di navbera "derewa siyasî ya birêxistî/modern" û desthilatê de, roniyê dixe ser pêwendiya li navbera derew û şidetê jî:

> Derewa siyasî ya nerîtî ku quncê giring ê dîroka hunera dîplomasî û dewletê îşxal kiriye yan wekî razên bera - bi daneyên ku ji gel re tu car nehatine aşkerakirin- an jî [...] weki tiştê eleqedarî niyetan hatine gotin. [...] Lê hal we ye, eleqeya derewa siyasî ya modern bi razan re tune ye, di heqê wan tiştan de ye ku di pratîkê de her kes bi wan dizane. [...] Ji aliyê kiroxên wan ve bê zanîn an jî neyê zanîn, ev hemû derew di nava wan de hêmaneke şidetê vedihewîne; çendî bi awayekî zanebûn, bi tenê tevgerên totalîter di rêya qîtalê de wek gavê pêşîn pijirandibe jî, derewa birêxistî xwedî wê meylê ye ku her tiştê der barê wî de biryara tunekirinê daye, wî ji holê rake. [...] ferqa di navbera derewa kevneşopî û modern de, gelek caran dikare li ferqa bincilkirin û tunekirinê werqile.[9]

---

[7] Hannah Arendt. 2012: 286-288.

[8] Hannah Arendt. 2012: 273-274.

[9] H.b.: 304-305.

Em dikarin bibêjin ku rejîmên heqîqetê derewa kevneşopî û ya modern bi hev re bi kar tîne; raz, niyet û heqîqetên diyardeyî vedişêrin an bi nêrînan îqame dikin an jî bi nêrînan êrîşî heqîqetên diyardeyî dikin û bi awayê dereweke birêxistî/rejîma şer dixebite ku yên ji bo xwe tune hesab kirine bi biryardarî wan tune dike. Bi ser de, bi bawerkirina van derewên birêxistî yên ku hemû konteksta siyasî diguhêrin û heqîqetên diyardeyî çarçove dikin, a ji aliyê wan kiroxên (failên) ku derewan dikin û tune dikin, heqîqet jî ku wextekê "stareya xwe ya dawî di derewker de didît", "li derveyî dinyayê ketiye".[10] Arendt cext lê dike ku dê parêzkariya heqîqetê jî tenê di rewşeke wiha de, yanî di rewşeke wisan de ku derewa birêxistî bûye serdestê qada siyasî, teqabulî kiryariyeke siyasî bike û ew dibêje ku di halekî wiha de vebêjerê heqîqetê jî xwe "bi dest karên siyasî re berdaye" û "bi ûcba guhartina dinyayê dest bi destpêkekê kiriye." [11] Bi vê nirxandinê em dikarin dubare bikin û bibêjin ku têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re, ya ku li dij rejîma heqîqeta fermî derdikeve û lêgerîna heqîqetê ya mixalif, teqabulî kiryariyeke siyasî dike.

Divê em lê zêde bikin ku rejîma heqîqetê tim bi awayê ku vê kiryara siyasî bêbandor bike dixebite, yanî êrîşî melekeya mihakemekirinê jî dike ku ew meleke dike em ferqa di navbera heqîqet û derewê de fehm bikin. Arendt bi bîr dixe ku "di maweya dirêj de encama şûştina mêjî, cureyek sînîzmê ye ku çendî zexm hatibe îsnadkirin jî, bi temamî redkirina bawerkirina bi tiştekî wekî heqîqetê ye" û vedibêje ku "wekî heqîqet qebûlkirina derewê û heqîqet jî ne reşkirina wekî derewê, texrîbbûna [...] seheka me ye ku ew dabîn dike em di dinyaya berayîn de îstiqameta xwe diyar bikin", tam jî rewşeke wisan e ku ew ji rejîmên totalîter re tebayan berhev dike.[12] Di rewşeke wiha de îdraka heqîqetê wisan texrîb dibe, heqîqet wisan bi dûr dikeve ku êdî dîtina wê, eger em bibînin jî gazîkirina li wê, eger em pê bigirin bînin jî hewldana ji bo bawerîkirina bi wê û daxilkirina wê ya li qada siyasî ya heyî û guhartina dinyayê, pir dijwar dibe.

Têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re û lêgerîna heqîqetê jî, melekeya mihakemeyê ya mirov û îdraka heqîqetê çi qas texrîb bûbe jî, nîşan dide ku qadeke siyasî tune ye ku mefhûma heqîqetê ew ziyaret nekirbe, zor lê nekiribe û sînordar nekiribe. Jixwe wekî ku Arendt dibêje, heqîqeta ku "derew û şidetê ew tune kiriye lê cihê wê negirtiye", qudreteke wê ya ku hêza xwe ji raboriyê digire heye. Raboriya ku dest û kiryara mirov nagihîjê û êdî nikare bê guhartin û li paş bê vegerandin, bi wesîteya vebêjerê heqîqetê ku biryar daye bikeve qada siyasî, qada siyasî sînordar dike û her wiha heyî dike. Di demeke wisan de ku îroj heqîqet bêhikum maye û cih ji vebêjerê heqîqetê re tune ye,

---

[10] H.b.: 307.

[11] H.b.: 303.

[12] H.b.: 310.

divê em tesbîtên wê yên ku em pê re dijîn di vê çarçoveyê de hildin dest û nîqaş bikin dê ka bikare bi çi awayî tesîr li têkoşîna lêgerîna heqîqetê û rarûbûna bi heqîqetê re bike, dibe ku ev yek ji me re bibe xala destpêkê.

### ***Dewra Piştî Heqîqetê***

Bêjeya di têgiha "dewra piştî heqîqetê" de, ku bi giştî "*post-truth era*" li tirkî wekî "hakikat-sonrası çağ" (dewra piştî heqîqetê) tê wergerandin, ew wek sifetê ku carinan raweyên (sîxeyên) têkiliyê yan jî rewşan pênase dike û bi berdewamî tevî ku çendî rasterast hewce bi wergerê dike ew tê bikaranîn jî, ez wisan difikirim ku têgiha "neheqîqetî"yê vê dewra em tê de ne terîf dike.[13] Difikirim ku bêjeya neheqîqetiyê di eynî demê de îşaret bi rewşa hem erozyona heqîqetê yan jî bêqîmetbûna wê û windabûna îdraka heqîqetê dike hem jî amaje bi halê biqîmetbûna heqîqetê û zêdebûna berbelavbûna îhtiyac û lêgerîna heqîqetê dike. Bi nihartina li derketina holê ya çemka dewra piştî heqîqetê, peydakirina wê ya bergindeke civakî û ew rewşa wê ya ku bûye sedem bi awayekî belave bê bikaranîn, bê ka çi ye, em dikarin nîqaşa vê têgihê kûrtir bikin.

Derewên fermî yên têkildarî Şerê Vîetnamê ku bi Skandala Watergateyê di salên 1970'yî de derketibûn holê û beşeke civakê ya diyar aciz nekiribû, ji hemleyên polîtîka derve re bûbûn bingeha siran ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ew dimeşandin û vê yekê kir ku ew di qada gelemper de bên ragirtin û bi salên 2010'an re jî ji çêbûna tebîra "siyaseta piştî heqîqetê" re zemîn amade kir.[14] Rewşa siyaseta piştî heqîqetê ya hatî tescîlkirin, ku nemaze Donald Trump bi meşandina kampanyaya hilbijartinên 2016'an û bi şekilê siyaseta ku di dewra serokatiya xwe de serî lê dabû, ji bo wesifandina dewra ku em tê de dijîn tê bikaranîn. Trump di sala 2018'an de, ku ji raporeke vebîniyên aîdî krîza îqlimê li xwe digirtin, gotibû "ez bi vê bawer nakim" û ew bêîtibar kiribû, ji bo şekilê nû yê ku siyasetê bi heqîqetê re danîbû wek nimûne hatibû nîşandan: " '*Ez bi vê*

[13] Jixwe peyva "post-truth"ê ku di Ferhenga Oxfordê de wek rengdêrekê hatiye diyarkirin, gava li tirkî hatiye wergerandin wesifê wê yê rengdêrî jê hatiye xistin: "Di wexta diyarkirina/çêkirina raya giştî/nêrîna gel de rewşa/halê bitesîrbûna hîn kêmtir a hestan û qenaetên/baweriyên şexsî yên li gorî heqîqetên/rasteqîneyên/diyardeyên objektîfî yên li ser mijareke diyar." Di gel vê cudahiya hanê, Âdem Terzi lê zêde dike ku ji bilî avaniya vê bêjeya orîjînal, wergerandina wê ya li tirkî ku pêşgir tê de nîn e, zehmet dike û dibêje ji bo têgiha "post-truth"ê berginda herî guncayî jî "bêehemiyetbûna heqîqetê" ye; lê diyar dike ku ew bergindên "piştî heqîqetê" û "wêdetirî heqîqetê" hîn guncayîtir dibîne. Wekî di îzahê de jî dixuye, ji bo têgihê berginda herî guncayî ew e ku divê em li ser heqîqetê israr bikin; ez wisan difikirim ku ew ên di qada rarûbûna bi raboriyê re dixebitin jî dê berdewamî bidin cudahiya peyva rasteqîn/rastî ya ji bo daneyên tekane û diyardeyî û ya bêjeya heqîqetê jî, ji bo rehendên ku aliyên siyasî, aborî û civakî li xwe digirin û rewşeke hîn giştgir terîf dike.

Âdem Terzi. 2020. "Post-Truth" Kavramı ve Türkçe Karşılıkları Üzerine. *Türk Dili*. Nîsan, 69: 82; 80-86. Ji bo pênaseya bêjeyê ya îngilîzî binêrin: https://languages.oup.com/word-of-the-year/2016/ [29.11.2020].

[14] Ran Halévi. 2017. The new truth regime. *Le Débat*. 197(5): 28-41. https://www.cairn-int.info/article-E_DEBA_197_0028--the-new-truth-regime.htm# [07.03.2021].

*bawer nakim*', di gerewa heqîqeta diyardeyê de, wek tezahureke heqîqetê ya ku hest pê tê kirin, dikare bê şirovekirin."[15]

Rewşa piştî heqîqetê, îşaret bi awayekî besîd kirina derewan, şapînoz, vegerîna li gotina xwe yan jî reşa sextebûnê nake ku em Arendt jî bi bîr bînin em dikarin bibêjin ku ev rewş ne nû ye. Tiştê nû, bi şekilê ku "berêtiyê lerizîna hisî ya li ser diyarde û delîlan a ku her diçe pirtir dibe, cihê rastdêrana algorîtmayên medyaya civakî ya ku tiştê em dixwazin bibihîzin ji me re vedibêje, digire" tê terîfkirin.[16] Em dikarin bibêjin ku ev algorîtma wek stratejiyeke jiyanê neheqîqetiyê difermînin; repertuwareke înkarê pêşkêşî civakê dikin. Siyasetmedarê/a ku dibêje "bawer nakim" gel li hemberî zanyaran ji xwekêmdîtinê, ji endîşeyên têkildarî krîza îqlîmê û ji sûcdarbûna xwe ya bûna sedema krîza îqlîmê difilitîne.[17] Bal li wê yekê jî tê kişandin ku ji ber sedema zêdebûna cemserbendiya civakî ya ku her diçe pir dibe, ne mimkin e ku vebêjerên heqîqetê û zanyar xwe bigihînin vê "civata hestyar" a ku "naxwaze bawerî" bi heqîqetên diyardeyî bike û bi tirs û fikaran jî diqilqile.[18]

Ez difikirim eger mirov bîne bîra xwe dê li cih be ku berê jî nekarîne xwe bigihînin civata dabaş li ser e. Wek mînak, yek ji sawînên dewra piştî heqîqetê ew fereziye ye ku dibêje eger zanyariyên rast bi awayekî belave bikeve gerê dê gel biryarên rast bide, dikare rê li ber wê encamê veke ku li Amerîkayê, li ser nijadperestiyê têra xwe weşan an jî nîqaş nîn in. Lê hal we ye, nijadperestî ku nabe li dewra neheqîqetiyê bê îcrakirin ku ji demeke dirêj ve heye, heta tesîr li mûrehkên civakê kirine û bi gelek xebatan jî hatiye îfşakirin; mîna hestyarî yan jî cahiltiyê, ne materyalîst an jî zilmeke xwedî encamên sedemên madî û şênber (konkret) ku bi ranêzikiya derî siyasetê nikare bê aşkerakirin û xala destpêkê ya têkoşînekê ye ku di oxira wê de gelek qurbanî hatine dayîn û destkeftiyên giring hatine bidestxistin.[19] Ji vî aliyî ve, ku lîberal wek serok hilbijartina endamekî elît ê ekonomîk ê "nijadperest, zayendparêz û derewker" wekî encameke dewra piştî heqîqetê îzah dikin, xwe li nedîtina tunehesibandina sîstematîk a heqîqetên reşikan datînin û ranêzikiyên ku gazinkirina wan a li "piştî heqîqetê" mîna "semptomeke nijadperestiyê" dibînin, rehendeke rexneyî li nîqaşa piştî heqîqetê zêde

---

[15] Giovanni Gobber. 2019. The scarlet letter of 'post-truth': the sunset boulevard of communication. *Church, Communication and Culture.* 4:3, 287-304.

[16] H.b.; Matthew D'Ancona. 2017. Ten alternative facts for the post-truth world. The Guardian. https://www.theguardian.com/books/2017/may/12/post-truth-worst-of-best-donald-trump-sean-spicer-kellyanne-conway [25.06.2021].

[17] H.b.

[18] Anna Durnová. 2019. Unpacking emotional contexts of post-truth. *Critical Policy Studies.* 13(4): 447-450.

[19] Robert Mejia, Kay Beckermann û Curtis Sullivan. 2018. White lies: a racial history of the (post)truth. *Communication and Critical/Cultural Studies.* 15(2): 109-126.

dikin.[20]

Wek bersiva li ranêzikiyên ku dewra piştî heqîqetê bi esefeke nostaljîk pêşwazî lê dikin, em dikarin bi bîr bixin ku hest û bawerî tim ji amûrên siyasetê ne, heqîqetên diyardeyî hîn berê jî bi awayekî bêpirsgirêk neketine gerê, eger ketibin jî rexbetek li wan çênebûye; zanist û akademî berî dewra neheqîqetiyê jî ne miteber bûne; bi palpiştiya cemserbendiyê ku nemaze etfî dewra dîjîtal tê kirin, em aşinayî siyaseta nefret û hêrsê ne.[21] Bi kurtî, em dikarin bibêjin ku dewra heqîqetê qet nejiya. Dewra heqîqetê, bi taybetî ji bo karkeran, jinan, reşikan, xwecihiyan, her cure kêmaran, civatên LGBTI+'yî û gelên ku hatine kolonîzekirin, qet çênebû. Têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re, têkoşîneke siyasî ye ku tam jî ji îtiraza li neheqîqetiyê û heqîqeta resmî, ji daxwaza naskirina heqîqeta mixalif, ji lêgerîna heqîqetê û ji hewla tamîrkirina heysiyeta heqîqetê çêbûye.

Dîsan jî, divê berdewamiya rexneyên têkildarî pêwendiya heqîqet û siyasetê, bi awayekî besîd negihîje encama "tu tişt neguherî" ye. Ji bo dîtina derfetên ku di dewra piştî heqîqetê de xuya bûne û mirov bikare li ser lêgerînên heqîqetê bifikire, hewldana fehmkirina bê ka tiştê nû çi ye, giring e. Ji vî aliyî ve em dikarin bibêjin ku em di dewreke wisan de ne ku cemserbendbûna civakî ya heyî bi wesîteya medya û medyaya civakî dikare kûrtir bibe; ew yek dike ku bi lezgînî cemserbendiyên nû bên afirandin; mixatabên vê cemserbendiyê bi xwe jî dikarin her yek ji wan li aktorekî fanatîk bê dagerandin ku ew dikarin heqîqetên diyardeyî îcat bikin. Bi mebesta coşandina alîgirên lingekî vê cemserbendiyê, ku di dewreke wisan de afirandina heqîqetên diyardeyî yên alternatif û pêşkêşkirina van heqîqetan bi awayekî estetîk û berbelavkirina wan mimkin e, em dikarin lê zêde bikin ku îdraka heqîqetê li gorî berê hîn zêde hatiye hincirandin û ziyan gihîştiyê.[22] Têkiliya girseya bi heqîqetê re, ya ku bi tenê duçarî vê hincirandinê nebûye, bi xwe beşdarî pêvajoya hinciranê bûye, loma em dikarin bifikirin ku wekî ew bişibe têkiliya desthilatê ya bi heqîqetê re dageriyaye, yanî îhtirasa wê ya serwerbûna li heqîqetê belave bûye. Ji hêla din ve, em dikarin bibêjin ku ev dagerîn bi aweyekî besîd heqîqetê texrîb nake, bi kêrî mihekemekirina îdraka heqîqetê heta bi kêrî hejandina wan bismaran tê ku ew rejîmên heqîqetê sabit

---

20 H. b.

21 Binêrin Kathrin Braun. 2019. Unpacking post-truth. *Critical Policy Studies.* 13(4): 432-436.

22 Ji bo "Diyardeyên alternatîf" binêrin Colin Wright. 2018. Post-Truth, Postmodernism and Alternative Facts. *New Perspectives.* 26(3): 17-29.

dikin.[23] Di dewreke wisan de ku ji aliyê heqîqetên mixalif ve zor li sînorên fîzîkî û xeyalî yên qada gelemperî ya modern an jî rejîma heqîqetê tê kirin, medyaya civakî ya ku ew mecrayeke wisan e ev heqîqet dikarin tê de cih ji xwe re peyda bikin, dikare raya giştî zêde bike û karên kolana binê rewteka sereke bike. Hebûna torek civakî ya dîjîtal ku dewlet nikarin wê kontrol bikin, "ruhê web 2.0'yê" bi xwe jî, ji ber xwedî potansiyela çêkirina krîzeke rejîma heqîqetê ye, bi tena serê xwe jî watedar e.[24] Ji "otantîkiya derveyî" bêhtir ku bi heqîqetên diyardeyî mîzana wê tê kirin, ev nîvengên dîjîtal ên ku hevgirtîtiya şexsî û sedeqeta wicdanî ya bi heqîqetê re dide ber çav, xwe dispêre "otantîkiya hundirî" û ji ber ku gelek caran li ser hejmara şopîneran an jî "hevalan" hûr dibe, dikare temsîlên xwebûnî yên neewle li xwe bigire, loma li gorî rêjeya bertekiyên kolektîf ên fîzîkî, îmkan dide îtîrazên kolektîf jî, ku şêweyên îfadeyên şexsî hîn bêhtir di wan de tên parastin.[25]

Shifman ku kampanyayên wekî "Ji Buchris Zêdetir e", yên ku li ser Ofek Buchrisê mensûbê Artêşa Îsraîlê yê berê û sûcdarê tacîza cinsî dihat meşandin û bi qeydên dîtbarî û dengî yên aîdî van kampanyayan û bi nimayişên dîjîtal ên ku bi şahidiyan daxilî wan dibûn, vekolaye, balê dikişîne van kiryariyên siyasî yên ku bi teqlîdê zêde dibin lê afirîner û yekane dimînin, bi wesifê vebêjiya heqîqeta kolektîf û bi rêya îfşayê afirandina "ihqaqê heq", ango ji yê zalim standina mafê yê mezlûm û hêza bidestxistina encamên[26] hiqûqî. Şîmşek ku berhemên "piştî heqîqetê" yên di grûp û rûpelên facebookê de yên mîna "Sevdamız Mustafa Kemal Atatürk" (*Evîna Me Mustefa Kemal Ataturk*), "Türk Özel Kuvvetleri" (*Hêzên Taybetî yên Tirkî*) û "Fetva Kurulu" (*Heyeta Fetwayê*) hatine parevekirin û ji aliyê cemserbendiyê ve tesîrên wan ên neyînî vekolane, di heman demê de kanala youtubeyê ya bi navê "140 Journos" jî dinirxîne û balê dikişîne ser nimûneyên erênî û teşebusên dijraber jî ku li Tirkiyeyê di adresên

[23] Wekî jixwe em dê di beşa pey re hildin dest, ew nîqaşên di rûpelên malperan de cih digirin, ku di salên 1990'î de bernameyên televîzyonan di wan de dihatin weşandin û pêşbaziya serweriya li heqîqetê ku vebeyiyabûn bernameyên televîzyonan ên salên 2010'an, îşaret bi wê yekê dike ku îdraka heqîqetê di eleyhiya rejîma heqîqetê ya fermî de jî di ber çavan re hatiye derbaskirin.

[24] Paul Gready û Simon Robins. 2017. Rethinking civil society and transitional justice: lessons from social movements and 'new' civil society. *The International Journal of Human Rights*. 21(7): 956-975. "Web 2.0" an jî terma "tora civakî"; ragihana civakî, medya û parevekirina zanyariyê, hilberîna naverokan a bikarhêneran, hewldana hevkariyê ya di navbera ferd û dameziraweyan û tora dîjîtal a nifşê duyem de ku ev ji sepanên webê yên navend-bikarhêner, ên ku dikarin bi hev re di nav ahengê de bixebitin û ji xizmetên wan pêk tê ku hîn bêhtir şexsî û xwedî wesifê ragihanî ye, terîf dike. Binêrin David W. Wilson, Xiaolin Lin, Phil Longstreet û Saonee Sarker. 2011. Web 2.0: A Definition, Literature Review, and Directions for Future Research. *AMCIS 2011 Proceedings* Paper 368: http://aisel.aisnet.org/amcis2011_submissions/368 [01.12.2020].

[25] Limor Shifman. 2018. Testimonial rallies and the construction of memetic authenticity. *European Journal of Communication*. 33:2, 172-184. Ji bo mînakên van cure îtîrazên kolektîf ên li Tirkiyeyê binêrin İnan Özdemir Taştan. 2018. Ayrımcılıkla Mücadele için Radikal Medya. Ülkü Doğanay (Berhevkar.) Ji nav *Ayrımcılığın Yüzleri*. Kapasite Geliştirme Derneği: 217-232.

[26] Limor Shifman. 2018.

“teyit.org”, “doğrulukpayi.com” û “oyveotesi.com”ê de mînakên wan hene.[27] Li ser van mînakan wek veser, em dikarin behs ji xebatên afirîner ên di warê rarûbûna bi raboriyê re û lêgerîna heqîqetê bikin ku di adresên “karakutu.org.tr” û “hafızakaydı.org”ê de cih digirin. Ev mecrayên ku em dikarin wan wek “tevgerên heqîqetê” bi nav bikin, nîşan didin ku hîn jî qîmeteke civakî ya heqîqetê heye.

Siddiquee ku di jenosîda Rohingyayê ya sala 2017’an pêkhatî de bikaranîna medyayê ya dewleta Myanmarê û nemaze rola serincrakêş a parevekirinên xwedî naveroka nefretê ya grûpên facebookê yên dijberên Rohingyayê vekolaye jî, diparêze ku dewra piştî heqîqetê ji demokratîkbûyînê bêhtir rêya otorîterbûyînê vekiriye.[28] Li hêla din, çendî medyaya civakî amûreke lezandin û hêsankirina belavebûna heqîqetên fermî yên nijadperest û xistina tevgerê yên revdeyên nijadperest/lînçker be jî, em dizanin ku berê jî metodên îdare û sewqkirinên nijadperest/lînçker ên wekî wê, bi amûrên cuda hatine bikaranîn. Ji xwe piştî qetliamên Yavî û Çîçekliyê ku PKK’yê di sala 1993’yan de kiribûn, koma ku MHP’yiyan serî dikişand û “raweşiyabûn” kuçeyên Erziromê, pêşî bi ser baregeha bajêr a Partiya Demokrasiyê (DEP) ve girtibû û piştre berê xwe dabû taxa kurdan, di bernameya 32. Gunê de wiha dihat vegotin: “Dewletê li tiştên ku diqewimî, hema bibêje bi awayekî bêçare temaşe dikir. Bi hezaran kes hêrsa xwe ya ji PKK’yê, dikir ku di serê hemşehriyên xwe de bişikînin. Standina heyfê dixwastin.”[29] Walî Oguz Berberoglu ku di bernameyê de diaxivî jî, dîsan daxwaza wan a xwastina hildana heyfê ya girseya ku bi wesîteya MHP’yiyan hatibû “aramkirin”, bi van gotinan berginê dida wan: “Bi deh hezaran mirov, bi nefret slogana “ciwanên Erziromê çek dixwazin’ diqîriyan. Min got ‘Belê’, ‘Em ê çekên ciwanên Erziromê bidine wan.’” Dotira rojê, ji girseya ku li ber avahiya hikûmetê civiyabû, ev daxuyanî dikir: “Ji erkana giştî duh hezar çekên kalaşnîkof hatin. [...] Ez wisan bawer dikim ku erziromiyên min ên egîd eger çeka wî hebe, perwerdehiya wî hebe, riayet li nobeta xwe bike, ne PKK em dikarin bi artêşa ermenan re jî serî bikin der.”

---

27 Volkan Şimşek. 2018. Post-Truth ve Yeni Medya: Sosyal Medya Grupları Üzerinden Bir İnceleme. *Global Media Journal TR Edition*. Bahar/Spring. 8(16).

28 Md. Ali Siddiquee. 2020. The portrayal of the Rohingya genocide and refugee crisis in the age of post-truth politics. *Asian Journal of Comparative Politics*. 5(2): 89-103.

29 Di heman bernameyê de, em hîn dibin di nav hefteyekê de 750 erziromî, ku piranî jê MHP’yî ne, ji bo bibin polîs an jî çawîşê pispor serlêdan kirine û ji bo ku DEP’yî ji meclisê bên avêtin jî kampanyaya berhevkirina îmzayan li dar xistine. Bernameyê, bi hevokên Mehmet Alî Bîrand ên wekî “Di meseleya Başûrê Rojhilat de partiya ku xebatên herî çalak dike Partiya Tevgera Neteweperwer (MHP) e. Metodên xweserî MHP’yê hene. [...] Me ev çalaktî di bûyerên Erziromê de dît.” dest pê dikir û mêvanên bernameyê jî Serokê Giştî yê MHP’yê Alpaslan Turkeş û Parlamenterê Şirnexê yê DEP’yê Orhan Dogan bû, ku ew bi sedema li mala xwe PKK’iyek veşartiye dihat darizandin. Di bernameyê de li ser DEP’ê, ku wê PKK şermezar nedikir, “Kêşeya Başûrê Rojhilat” tê minaqeşekirin. https://www.youtube.com/watch?v=wN5ljsCwRnI [21.11.2020].

Em dikarin gelek nimûneyên wiha peyda bikin ku nîşan didin otorîterbûyîn ji demokratîkbûyînê hîn kêmtir hewce bi medyaya civakî dibîne. Ji vî aliyî ve em dikarin bifikirin ku kêşeya esil rejîmên heqîqetê ne û bikaranîna medyaya civakî ye ku dê bikare ji bo hejandina rejîmên heqîqetê bibe wesîle û lêgerîna heqîqetê jî yek ji wechên eksantrîk û erênî yên dewra piştî heqîqetê ne.[30] Bi xulase, diyardeya herî giring a ku dewra neheqîqetiyê ji dewrên din cihê dike, ku berê jî heqîqet pir zêde ne miteber bû yan jî îdraka heqîqetê têra xwe hatibû hincirandin, wisan dixuye ku tu car bi qasî niha der barê têkiliya ku bi heqîqetê re hatiye danîn, xem nehatiye xwarin û ew qas ji aliyê girseyeke berfireh ve jî şayîşa wê nehatiye kişandin.[31] d'Agostini, ku rewşa pirsgirêka heqîqetê di jiyana me de cihekî giring dibîne wek dewra piştî paş-heqîqetê terîf dike, dibêje ku tiştê îroj nû ye ne gera berbelav a derewan an jî îtibarkirina mirovan a ne bi derewan e, ji bo "nexweşînên me yên aletîk" pêşniyazkirina gelek teşxîs û terapiyan e.[32] Hewlên îzahkirina nexweşînên kognîtîf ên ku bi raweyên heqîqetê yên mîna divêtî, gengazî yan jî bêîmkaniyê re têkildar in, yanî "nexweşînên aletîk ê mirov" ku îroj tenê em bi bipêşketina teknolojîk, bi niyeta xerab a siyasetkaran an jî bi cahiltiya xelkê girê bidin û gava em çareseriyên adî yên ku van hewlan dişopînin problematîk dikin, em dikarin bifikirin ku em di dewra neheqîqetê de dijîn ku heqîqet tê de biqîmet dibe, loma ya rast hewce bi şîfayên acîl nake û heta dibe ku ew wek dewra nekahetê jî bê fehmkirin.

***Li Tirkiyeyê Dewra Neheqîqetiyê***

Bi awayekî giştî dewrên berî desthilata AKP'yê, nemaza salên 90'î, bi taybetî çendî ku ji bo kurdan dewra piştî heqîqetê ye jî, lê bi awayekî giştî em dikarin bibêjin ku tê fikarandin li Tirkiyeyê "dewra piştî heqîqetê" bi desthilata AKP'yê dest pê kiriye. Ew fikira ku desthilata AKP'yê bi xwe neheqîqetiyek afirandiye, di îthama "teqiyekirin"ê de dihat ser zimên ku ew jî tê mehneya "veşartina nêrîn û baweriya kesê ku xwedî heqîqetê" ye.[33] Hal we ye, ev neheqîqetî ya ku li gorî Arendt dikare li nav kategoriya derewa siyasî ya kevneşopî bê hildan, ji neheqîqeteke din pêk tê ku di pratîkê de ew her tiştê her kes pê dizane dikare bê înkarkirin an jî kes li dîtina wê xwe danaîne ku li

[30] Ji bo nîşandana ku desthilata siyasî ya li Tirkiyeyê, nemaze ji bikaranîna medyaya civakî ya di bûyerên civakî yên krîtîk de bê çi qas ne razî ye û ji bo îtirazên li ser nûçeyên ku di wan de dîtbarî û zanyariyên sexte hatine bikaranîn, binêrin vê navnîşanê: https://www.yenisafak.com/teknoloji/ozgurluge-evet-sosyal-terore-hayir-dunyada-sahte-haberlere- en-cok-maruz-kalan-ulke-turkiye-3547711 [02.11.2020]

[31] Franca d'Agostini. 2019. Misunderstandings about truth. *Church, Communication and Culture*, 4(3): 266-286.

[32] H.b.

[33] https://www.luggat.com/index.php#ceviri [03.12.2020]. Ji bo hin nûçeyên eleqedarî îthamên li ser taqiyeyê binêrin: https://www.sozcu.com.tr/2016/gundem/son-dakika-haberi/chpli-arslan-iktidar-14-yildir-takiye-yapiyor-1362589/ [03.12.2020]; https://odatv4.com/nuray-mertten-yine-kandirildik-aciklamasi-0805171200.html [03.12.2020].

derewa siyasî ya modern tê zêdekirin. Kirdeyên rejîma heqîqetê ya heyî, bi endîşeya ku dê dijminî li terzê jiyana wan a ku wek modern û sekuler dihesibînin bê kirin û dê îmtiyazên wan destedewir bibin, desthilateke îslamî bi kirina teqiyeyê sûcdar dikir. Mexdûrên ku wesifê nijadperest-mêtingehkar ê rejîma heqîqetê, aliyên otorîter û mihafezekar ên terzê jiyana modern û sekuler pir baş dizanin, nemaze beşeke giring a kurdan bi xwe jî, ji ber sedema hikûmeta AKP'yê ya mixalifa rejîma heqîqetê ya heyî, îmtiyazên ku ji windakirina wan bitirsiyana, tune bûn.

Rejîma heqîqetê ya ku AKP'yê ew înşa kiriye tevî hin îhtirasên nijadperest û mêtingehkar ên ku di bin hesreta Tirkiyeya kevn de hene hejandine yan jî dagerandine û qisimekî giring jê jî ber bi pêş de birine, em dikarin bibêjin ku bi taybetî ji bo kurdan ji berê hîn bêhtir neheqîqet e. Çendî teşebusên siyasî û civakî ku di Pêvajoya Çareseriyê de gihîştibûn lûtkeyê û ji ber ku ew wek îhanet an jî taqiye nedihatin dîtin jî, lê qet bêyî rezerv nedihatin destekkirin, loma divê em bi bîr bixin ku ew xwedî wesfekî wisan bûn ku wan rêya ji rejîma şer derbasîbûna li rejîma aştiyê vedikir. Lê ji ber encama miqaweta rejîma şer ku Tirkiyeya nû li Tirkiyeya kevn vegeriya, nemaze Bûyerên Xendeqan ku tê îdîakirin wan rê ji vegerîna li salên 90'î vekiriye û êrîşên li îradeya siyasî ya cihkî û neteweyî ya gelê kurd, encamên erênî yên van teşebusan û xatireya li ser wan têra xwe bi paş de wergirt. Yek ji meseleyên ku îşaret bi îdîayên vegerîna li salên 90'î dike, careke din ew texrîbkirina bi şidetê ya îdraka heqîqetê ya jixwe derbexarî bû ku desthilata AKP'yê bi şekilekî minasibî dewra piştî heqîqetê, bi awayê ku girseya lê xîtab dikir biheyirîne, heqîqetên diyardeyî red kirin û heqîqetên diyardeyî yên ku dê bicoşîne afirandin.

Texrîbata îdraka heqîqetê ya minasibî dewra piştî heqîqetê, wekî din di gelek bûyerên siyasî de jî çêbû. Medyaya civakî, ku AKP'yê bi temamî ew wek qadeke têkoşînê didît, nemaze di dema Berxwedana Geziyê de ku li mehên Gulan û Hezîrana sala 2013'an pêk hat; di skandala nelirêtî û bertîlê de ku di dema 17-25 Kanûna Pêşîn de çêbû û gihîşt heta bi malbata Erdogan; di protestoyên Kobaniyê yên Çiriya Pêşîn a 2014'an de; di Qetliama Gara Enqereyê ya 10 Çiriya Pêşîn 2015'an de; di bûyerên xenqedan ên salên 2015 û 2016'an de û di teşebusa derbeyê ya 15 Tîrmeh 2016'an de gihîşt astên herî bilind ku îrojî didome û ew bû yek ji mecrayên krîtîk ên şerê heqîqetan.[34] Lê belê em dikarin bibêjin ku ji aliyî meseleya kurdî ve, nemaze bi bûyerên xenqeqan re, rewş li dewra neheqetiyê vegeriya. Li aliyê din, bi mebesta ku dê di dawiya vê beşê de bi awayekî hîn bikitekit rewş bê nîqaşkirin, em dikarin lê zêde bikin ku di wexta van hemû bûyeran

[34] https://www.yenisafak.com/teknoloji/ozgurluge-evet-sosyal-terore-hayir-dunyada-sahte-haberlere-en-cok-maruz- kalan-ulke-turkiye-3547711; https://www.gazeteduvar.com.tr/gundem/2020/06/12/ak-parti-lehine-calisan-sahte-hesaplar- kapatildi [04.12.2020].

de ziyan jî gihîşt rejîmên fermî û mixalif. Bersiva desthilata AKP'yê ya ji vê hejikînê re kûrkirina cemserbendiya heyî, bi amrazên îdeolojîk û madî çêkirina hegemonyayê ya li ser aligirên xwe û li ser dijberên xwe jî bikaranîna pêkutî û şidetê bû.[35] Bi vê bersiva hanê ku ji rejîma şer derbasîbûna li rejîma aştiyê ji nû ve taloq dikir, ez wisan difikirim ku bersiv ji bo rarûbûna bi raboriyê re û bi rejîma heqîqetê re, bi taybetî jî hewlên hesabpirsîna ji salên 90'î re, ku demeke dirêj bê bergind man, hatibe dayîn.

Reaksiyonên li dijî çeteyên dewleta kûr a ku piştî çêbûna Qezaya Susurlukê ya di 3 Çiriya Paşîn 1996'an de qewimî, di raya giştî de xuyabariya wê zêde bû û gumana li ser rejîma heqîqetê ku vê çeteyê kir ew xuyabartir bibe, bi daxuyaniyên Midurê Emniyetê Hanîfî Avcî re ku di 1997 û 1998'an de hem li Meclisê hem jî di çapemeniyê de kiribûn, di encamê de wek hesabpirsîna di nav dewletê de hat fehmkirin û guh pê nehat kirin. Bernameya televîzyonê, ku endamê operasyonên taybetî Ayhan Çarkin di Çiriya Pêşîn a 2008'an de li ser qetliamên salên 90'î û têkiliyên di navbera grûpên dewletê yên ku di doza Ergenokê ya nû vekirî de navên wan derbas dibin û PKK'yê de daxuyanî didan, bi meraqa fokûsbûna li ser psîkolojiya Çarkin û ya magazînî hat temaşekirin.[36] Di Çiriya Pêşîna 2010'an de daxuyaniyên endamê PKK'yê yê berê û îtirafkarê JÎTEM'ê Abdulkadir Aygan û di Kanûna Paşîn 2011'an de jî daxuyaniyên mîralayê teqawid Arîf Dogan ku tê gotin avakarê JÎTEM'ê ye, ku daxuyaniyên wan di televîzyonan de hatin weşandin, wek vegotinên serkî man ku îroj di bîranînên şexsî de mîna yadkirinê dikare ji wan bê behskirin.

Ez wisan difikirim ku heqîqetên mixalif ên êdî xuyabar bûne, ne ku heqîqeta fermî ya ku ev e nêzî sed salî ye hikum dike bi awayekî cidî ji kokê ve nehejandiye, lê divê bal lê bê kişandin ku ew bêbergind jî nemaye. Çendî darizandina wan a ji ber kirina sûcên li dijî mirovahiyên yên li dijî kurdan mimkin nebûbe jî, Dozên Ergenekonê (2008-2019), ku ji ber têkiliya bersûcan ên bi rejîmên heqîqetê re xwedî giringiyê ye û Dozên JÎTEM'ê (2009-2016), çendî temamî bersûcan beraet kiribe û leşkerekî astbilind ê wekî Cemal

[35] Katharina Bodirsky. 2016. From the 'state-idea' to 'politically organized subjection.' Revisiting Abrams in times of crisis in Turkey and EU-Europe. *Journal of Global and Historical Anthropology*. 75: 121-129.

[36] Dokumantera bi navê *"Regresso a Wiriyamu"* (Vegera li Wiriyamuyê) ku di sala 1998'an de bi îmzayên Felícia Cabrita û Paulo Camacho ye, yek ji nimûneyên miezam in ku li şûna sûc û qurbanî, li ser fail fokûs dibe. Di dokumanterê de, yek ji berpirsên astbilind û failên qetliama li gundê Wiriyamuya Mozambîkê ya 16 Kanûna Pêşîn 1972'yan, ku ji aliyê yekîneyên leşkerî yên Portekîzê ve hatiye kirin, Antonino Melo bi xwe jî yek ji kameremanan e ku li gund vedigere, sûcê kiriye îtiraf dike û ji kesên ku li heyatê mane jî efûkirina xwe dixwaze. Gava kesê herî extiyar ê gund Baera bersiv dide uzra Melo, kamera Melo ji nêz ve dikêşe û em êdî dengê hundirî yê Melo seh dikin. https://www.youtube.com/watch?v=MBLqftwIN7c [03.12.2020]. Ji bo lêkolîneke li ser dokumanterê binêrin Robert Stock. 2012. Apologising for Colonial Violence: The Documentary Film Regresso a Wiriyamu, Transitional Justice, and Portuguese-Mozambican Decolonisation. Birgit Schwelling (ber.). Ji nav *Reconciliation, Civil Society, and the Politics of Memory. Transnational Initiatives in the 20th and 21st Century*. Transcript Verlag: 239-276.

Temîzoz derketibe pêşberî darazê jî, wan ji van îfşaetên xwedî xuyanga îtrafan hêz stand. Lê belê li encamê, ez tesbîtên mikemel ên Yildiz û Baert ên têkildarî "îtirafên" Avci, Çarkin û Aygan giring dibînim, ji ber îşaret bi çarçoveya ku heqîqetên diyardeyî yên mixalif pêwîstî pê heye dike û dîqetê dikişîne ser bergingariya rejîma heqîqetê ya Tirkiyeyê: Ev îtirafên hanê ku sûcê hatî kirin û berpirsiya kirox bêqîmet dike; bi etifên wekî sîstem, dewlet, emir, wezîfe, welat, milet, hewcedarî, sûc û berpirsiyê ji aliyê siyasî û encama cezayî ve paqij dike; failan mexdûr an jî qehreman, qurbaniyan nexuyane, şideta dewletê elelade dike; wek îfşaetên sansasyonel ên ku îtirafê li înkarê dadigerîne man.[37] Tevî negiringkirina heqîqeta salên 90'î, ku qurbanî ji bo xuyabûn û naskirina wan tê koşiyabûn, lê ximamiya îfşaetan û şemitokiya wan û ji aliyê çêkirina encamên siyasî û cezayî ve jî zehmetiya wê, kir ku çanda bêcezatiyê û rejîma heqîqetê bê xurtkirin.[38]

## 2. Rejîma Heqîqetê ya Tirkiyeyê

Em dikarin bibêjin ku rejîma heqîqetê ya Tirkiyeyê, heta roja îroj ji hemû îdeolojiyên ku serweriya siyasî û civakî bi dest xistiye, xwedî bûye. Ji vî aliyî ve, em dikarin çavkaniyên rejîma heqîqeta fermî di neteweperweriya tirkî de ku bi awayê nijadperestiya mihefezekar-dîndar/modern-sekuler xuya dibe; di îslamîtiya mitedil an jî modern de; di mexseda laîktî û modernbûyînê de bibînin ku ew armanc dike îsyana etnopolîtîk a li Kurdistanê, "paşverûtî" û paşmayîna aborî biqedîne û herî hindik bi qasî neteweperwerî û îslamîtiyê, wê îlham daye birêvebirina mêtingehkarî û şidetê. Her wiha em dikarin kemalîzmê/ataturkîtiyê wekî "îdeolojiyeke matrîs"ê ya ku van hemû îdeolojiyan li hev tîne; "pratîkên ku şideta birêxistî ya hiqûqî û civakî li xwe digirin" ên wekî Jenosîda Ermeniyan a 19915'an ku ew li habîtusa înkarê hatiye hildan û Şewata Mezin a Îzmîrê ya 1922'yan û bi awayekî giştî mîtên "Dewleta Tirkî" jî, mîna çavkaniyên rejîma heqîqetê bibînin.[39]

Paşxaneya dîrokî û teorîk a rejîma heqîqetê ya li Tirkiyeyê û wesifê wê yê nijadperest, ez dê di beşeke piştre, di beşa "Nijadperestiya bi Usûla Tirkî" de, hewl bidim ku bi awayekî bikitekit nîqaş bikim. Di vê beşê de jî ku xwedî wesifê destpêka nîqaşê ye,

---

[37] Yeşim Yaprak Yıldız û Patrick Baert. 2020. Confessions without guilt: public confessions ofstate violence in Turkey. *Theory and Society*. https://doi.org/10.1007/s11186-020-09398-x [03.12.2020].

[38] Ji bo xulaseyeke kurt a van dozan, binêrin https://www.failibelli.org/jitem-davalari-aklanma-yargilamasina-donusuyor/ [04.12.2020].

[39] Ahmet İnsel. 2001. Ber. *Modern Türkiye'de Siyasi Düşünce Cilt 2 / Kemalizm*. İletişim; Tanıl Bora. 2017. *Cereyanlar: Türkiye'de Siyasi İdeolojiler*. İletişim: 119-194; Tanıl Bora. 1998. Millî Tarih ve Devlet Mitosu. *Birikim*. 105-106: 83- 93; Talin Suciyan. 2015. Dört nesil: Kurtarılamayan son. *Toplum ve Bilim*. 132: 132-149; Biray Kolluoğlu Kırlı. 2005. Forgetting the Smyrna Fire. *History Workshop Journal*. 60: 25-44.

ez dixwazim rejîma heqîqetê ya Tirkiyeyê, bi taybetî di konteksta meseleya kurdî de bê çawan qada nîqaşên siyasî û ya lihevxistina civakî li xwe girtiye, vekolim. Bi vê mebestê, pêşî ez dixwazim minazereyên "têkoşîna bi terorê re" ku di weşanên televîzyonan ên salên 90'î de cih digirtin û bernameyên TRT'yê, piştre jî şopên heqîqetê yên ku van bernameyan di hafizeyan de hiştine nîqaş bikim, di pey re jî ez dixwazim li ser xuyangên/tezahurên "têkoşîna bi terorê re" bê çawan vebehiyane ekranên televizyonên roja me ya îroj û krîza rejîma heqîqetê ya roja me, binirxînim.

Bernameyeke "Siyaset Meydanı" (*Meydana Siyasetê*) ya aîdî sala 1993'yan ku li yek ji minazereyên televîzyonan dageriyabû û tê de zor li parlamenterên kurdan dihat kirin da bibêjin "PKK rêxistina terorê ye" û wexta Rewşa Neasayî (OHAL) bê hildan û demokratîkbûyîn pêk were jî divê garantiya ku PKK dev ji çekan berde, nîqaşeke retorîk a ku rejîma heqîqetê destûr dida, li xwe vedihewîne.[40] Parlamenterê Partîya Çep a Demokratîk (DSP) Uluç Gurkan, îdîa dikir ku valakirina gundan ji bo "şerê bereyi/cepheyî" pêwîst e, lê divê ev yek ji aliyê otorîteya sivîl ve bê kirin û digot ew zilma dewletê qebûl dikin, her wisan ji mêvanên kurd dipirsî: "Hûn çima zilma PKK'yê qebûl dikin?" Waliyê Hêrêma Rewşa Neasayî Unal Erkan jî ku bi telefonê beşdarî bernameyê dibe, serkeftina di vî şerê bereyî de tesdîq dike û bi awayê mealî gotinên wekî "Meseleya nasnameyê ya welatiyên tirkî tune ye; di warê têkoşîna bi terorê re em di nuqteyeke pir baş de ne" dibêje.

Parlamenterê serbixwe Mahmut Alinak tîne ser zimên ku li Herêma Rewşa Neasayî ya ku ew bi ambargoyên xwerek, windahiyên li binçaviyan û kuştinên kiryar nediyar tê birêvebirin, "komara kontrgerîla" hatiye avakirin. Her wiha ji bo ku vebêje hikûmet bi mehneya xwe ya rasteqîn ne desthilateke siyasî ye, Serokwezîr Demîrel wek nimûne nîşan dide ku nekariye gotina Erkan a "eger sloganek tek jî bê qîrîn em dê teqe lê bikin" pê bi paş de bide wergirtin û nekariye rê li ber Qetliama Newroza 92'yan bigire.[41] Parlamenterê Partiya Refahê Îbrahîm Halîl Çelîk ku gotibû "Ji malzaroka nijadperestiyekê em nijadperestiyeke duyem newelidînin" û rexne li polîtîkayên asîmîlasyonê girtibû û daxuyandibû ku gelê herêmê di navbera du agiran de maye, pêşniyazên wekî hildana Rewşa Neasayî, ronîkirina kuştinên kiryar nediyar, hildana nivîsên li ser çiyayan ên "Ne Mutlu Türk'üm Diyene" (*Xwezî Bi yê Dibêje Ez Tirk im*), kirina perwerdehiya bi kurdî û avakirina birêvebirinên cihkî kiribûn, wiha fikira xwe derpêş dikir: "Divê em jê re çareseriya îslamî bînin." Ji birêveberên Partiya Tevgera

---

40 https://www.youtube.com/watch?v=IcMa3Y3zyeY [05.01.2021]. Di rûpelê de ku video tê de heye, dema weşanê ya bernameyê nayê nîşandan. Eger em bûyerên ku di bernameyê de ji wan tên behskirin û hebûna Alinak li ber çav bigirin, em dikarin texmîn bikin ku sala weşanê 1993 ye.

41 Ji bo mehneya pîrozbahiyên Newrozê û qetliama Newroza 1992'yan binêrin: http://yeniyasamgazetesi2.com/serhildanlar-doneminin-newrozu/ [05.01.2021].

Neteweperest (MHP) Yaşar Erbaz jî vedibêje ku li rastê “meseleyeke axê” heye; ji aliyê aborî ve dewlet zêdetirî tiştê ku ji herêmê distîne dide herêmê; eger Kurdistan bê avakirin dê di demeke kurt de cihê xwe ji Ermenistanê re bihêle û bi vê yekê jî dê tirk bikevin rewşeke “miletekî mirî”; li paş gotina “nasnameya tirkî” nijadperestî tune ye, lê ya esil gava mirov bibêje “meseleya kurdî heye” ew bi xwe nijadperestî ye.[42]

Ev cure nîqaşên ku ji berberiya di navbera rewtekên neteweperwer û îslamî re dibin sehne, ku ew bi salên 90’î re ew xurt bûne û nijadperestiya li dijî kurdan teşhîr dikin, bi kêrî fonksiyona çêkirineke raya giştî tên ku ji şideta dewletê ya derasayî ya li Kurdistanê haydar in, lê vê şidetê dadixin radeya “heqîqeta têkoşîna bi terorê re.”[43] Bi ser de, ji ber tirsa ku rejîma heqîqetê ew belav kiriye û raya giştî ya ku dixwaze xwe ji “panîka moralê” bi dûr bide, îmkan dide da ku ew berê xwe bidin aliyekî din û ji repertuwara înkarê jî hilbijartinekê bikin. Rewşa “panîka moralê” ku Stanley Cohen ew bi şekilê “ji aliyê siyasetkar û medyayê ve bi awayekî diyar şêwandin an jî klîşekirina rewşekê, hedîsyekê, kes an jî grûpekê wek terîfa tehdîteke li dijî nirx û berjewendiyên civakî” pênase dike, li gorî wesif û pîvaneya “tehdîtê”, mezalîma ku tê sepandin jê re vebijêrkên bi awayekî aşkera yan bi şiroveyê yan jî bi awayê înkarkirina ji esas ve pêşkêş dike.[44]

Rêyên înkarê yên wekî bi awayekî korkorane û bi aşkerahî redkirina îdîayên ku hatine derpêşkirin (mesela, mîna nebûna kêşeya nasnameyî ya welatiyên “tirkî” yan jî eger di vê bernameyê de neyê ser zimên jî, wekî ku li Kurdistanê bi şekilekî berbelav e, gotina wekî tê zanîn ew kesên hatine binçavkirin û hatine kuştin, hatine berdan) an jî şirovekirina bi gotinên xweş û wesîteya qanûnan (mesela, jicihkirina bi darê zorê wek pênasekirina bi valakirina gundan û zeliqandina bi şerê cebheyî ve) yan jî tevî qebûlkirina îdîayan lê redkirina ji esasî ve ya encamên psîkolojîk, siyasî û exlaqî ya îdîayan an jî kêmdîtina wan (wekî gotina sivîlên ku dewletê ew kuştine terorîst in an jî ew terorîst nemisliman in), repertuwara înkarê pêk tînin, ku ew dirêjeyeke rewşa panîka moralê ne. Ev rewşa panîka moralê ya ku di çarçoveya meseleya kurdî de tim serî lê tê xistin û repertuwara înkarê ku nijadperestiyê xwedî dike, di bernameyên

[42] Di beşeke din a bernameya “Siyaset Meydanı”yê de, ya bi mêjûya 15 Çiriya Pêşîn 1994’an û bi navê “Yükselen Milliyetçilik ve Kürt sorunu” (*Neteweperweriya ku Zêde Dibe û Meseleya Kurdî*), nîqaşeke wekî wê çêdibe: https://www.youtube.com/watch?v=zDFkUM00nH8 [07.01.2021]. Ez dê li qisimê II. a beşa bi navê “Rewşa Sade ya Neteweperweriyê: Nijadperestî” yê de, behs ji vê bernameyê bikim.

[43] Ji bo wê nivîsê ya îtîraz li wê têgihîştinê dike ku sedema bilindbûna MHP’yê ya di salên 90’î de ji ber hebûna PKK’yê ye û ranêzikiya MHP’yê ya li meseleya kurdî bi dorfirehî hildide dest, binêrin Kemal Can û Tanıl Bora. 2000. MHP’nin Güç Kaynağı Olarak Kürt Meselesi. *Birikim*. 134-135: 56-72.

[44] Michael Welch. 2003. Trampling Human Rights in the War on Terror: Implications to the Sociology of Denial. *Critical Criminology*. 12: 1-20; Stanley Cohen. 1972. *Folk Devils and Moral Panics*. Macgibbon and Kee; Stanley Cohen. 2001. *States of Denial: Knowing about Atrocities and Suffering*. Polity.

TRT'yê de yên ku bi talîmata dewletê hatine amadekirin, di gel heqîqetên fermî yên ku tînin ser zimên û bi dîmên hêwilnak ên ku tên weşandin, berfireh dibin.

***Salên 1990'î: Dîmenên ji "Anadoliyê"***

> Bûyeran, di 15 Tebax 1984'an de bi êrîşên li Erûh-Şemzînanê dest pê kirin. Wezîfe dan min. Ez çûm aliyê Erûhê. Wekî tê bîra min, Erturk Yondem jî çûbû aliyê Şemzînanê. [...] Li Erûhê min ev bername amade kir. Navê wê jî bû "Huzur Operasyonu" (*Operasyona Hizûrê*). [...] Piştê sepana Rewşa Neasayî dest pê kir bi şûn de, ji qedemeyên jorê yên dewletê ji TRT'yê çêkirina bernameyekê, erka çêkirina bernameyeke der heqê têkoşîna bi terorê re hatibû xwastin, ku jixwe wê çaxê tenê TRT hebû. Birêveberên wê demê yên TRT'yê jî talîmat da min ku ez vê bernameyê çêkim û min jî dest pê kir ew bername çêkir. [...] Di 5 Çiriya Pêşîn 1987'an de me dest bi bernameya "Anadolu'dan Görünüm"ê (*Dîmena ji Anadoliyê*) kir û jê bi şûn de hata sala 200'î'ê dewam kir. (Güntaç Aktan)[45]

> Min rewşa welêt da ber çavê xwe û biryara çêkirina bernameyeke wisan da. [...] Gotin "ev dengê dewletê ye", "dewlet vî berhêl dike." Komara Tirkiyeyê ji rojnamegerekî re, ji weşangerekî re nabêje "vê wiha bike, wiha neke." [...] Min çi be ew got. Lê hin tişt hene ku qet nayên vegotin. Ji lew re têkoşîna bi terorê re metodeke pir cuda ye. Di nav vê metodê de tiştên ku divê raya giştî bi wan nehise jî hebûn. Ev dê bi min re herin gorê. [...] Bernameya min [*Perde Arkası (*Pişt Perdeyê*)*] [ji sala *1987'an*] heta 2002'yan domiya. [...] Hevalên min ji min ra dibêjin "Paşayê min", ji lew re ez bi salan bi hêzên çekdar re, di nav wan de jiyam. (Ertürk Yöndem)[46]

Dema weşanê ya van her du bernameyên ku mebesta wan "têkoşîna bi terorê re" veguhêzin raya giştî, tam rastî dewra wezîfeya Walîtiya Herêma Rewşa Neasayî ya Kurdistanê tên.[47] Ev dewra hanê ya ku wekî salên 90'î tê zanîn, dikare mîna "rejîmeke şer" bê wesifandin ku desthilata siyasî û leşkerî ya ku di sepanên bêyom ên Rewşa Neasayî de berceste bûye û li ser "heqîqeta têkoşîna bi terorê re" hatiye avakirin, bi xwe ew xistine dewrê. Jixwe beşa Bernameya "Perde Arkası"yê (*Pişt Perdeyê*) ya ku ji bo danasîna tabûra Seslîceyê ya li Çiyayê Gebarê hatiye veqetandin, "şerê ku Tirkiye tê

---

[45] Hevpeyvîna ku bi Guntaç Aktan re hatiye kirin: https://www.youtube.com/watch?v=9z8fv8gXIgg [21.11.2020].

[46] https://www.haberturk.com/medya/haber/1378-perde-arkasi-neden-yayindan-kaldirildi [26.11.2020].

[47] Îdareya urfî ya leşkerî ku nêzî derbeya leşkerî ya sala 1980'yî li tevahiya welêt hat îlankirin û tevî ku bi awayekî qedemeyî hat hildan jî, heta sala 1984'an hat domandin, ku li Kurdistanê jî veguherî Rewşa Neasayî û heta 2002'yan jî domiya.

de ye" dirsimîne.[48] Em bi strana Yemenê, bi dorê termên milîtanan, fotografê Ataturk, alaya Tirkiyeyê û leşkerên ku Sonda Mehmetcîk (*Mihemedok)* dixwînin dibînin. Erturk Yondem, di beşên cuda yên tabûrê de, bi leşkerên ku jê re dibêjin "komutanê min" sihbet dike. "Mihemedok" hema bibêje tev bi heman gotinan, deng li malbatên şehîdan dikin: "Em ê heta dilopa xwîna xwe ya dawî, têkoşîna ku wan hiştiye, bidomînin."

Dîsan di bernameya "Gezelim Görelim"ê (*Em Bigerin û Bibînin*) de, ya bi mêjûya 1994'an, ku ev beş ji mijara "têkoşîna bi terorê re" hatiye veqetandin û di TRT'yê de hatiye weşandin, çendî bi awayekî tam li bernameyên "Perde Arkası" (*Pişt Perdeyê*) û "Anadolu'dan Görünüm" (*Dîmena ji Anadoliyê*) neyê jî, bi temamî bi eynî tercîhên estetîkî, danasîna Lîwaya Komando û Çiya Hekariyê ya di bin îdareya Osman Pamukoglu de, hatiye kirin.[49]

Di binçavdêriya Pamukoglu de, li "salona şerefê û muzeya lîwayê" digere; em tê de tiştên ku bi dest hatine xistin "xwedêgiravî Xerîteya Sevrê", di gel çekên "eşqiyayan" û pakêtên esrarê, wêneyên operasyonan û wêneyên şehîdan ên bi dîwaran ve daleqandî dibînin. Leşker dîsan hema bibêje bi heman îfadeyan "xweşiya" komandobûnê tînin ser zimên û dibêjin "em ê vî îşî biqedînin" û sozê hildana heyfê didin. Di weşaneke din a "Gezelim Görelim" *(Em Bigerin û Bibînin)*ê de jî ya bi mêjûya 1994'an, tevî hevpeyvînên ku bi endamên Herekata Taybetî ya Diyarbekirê re hatiye kirin, danasîna şikeftên ku milîtan xwe di wan de vedişêrin û çekên ku leşker ew bi kar tînin, tê kirin.[50] Yek ji danasînên çekan jî, rewşa mêraniyê ya ku ji hîmê esasî yê rejîma şer e, li xwe digire: "Ev çeka ku ez li ser xwe digerînim, bi tebîra me 'keçika dîn" e, [...] bi şertê ku qet bêdeng nebe, ji bo koma terorê yek ji çekên herî tirsnak e [...] gava wiha pêlî tetikê tê kirin, ew mîna hespekî radibe pêdarê." Têkiliya di navbera neteweperwerî, mîlîtarîzm û zayendparêziyê de, ne tiştekî şaşwazker e ku gava leşkerekî tirk çekekê teswîr dike ew derdikeve holê; lê belê ev rewş îşaret bi wê yekê dike ku divê bi awayê îtiraza li rejîma şer û têkoşîna dijberî nijadperestiyê û ranêzikiya li dijî zayendparêziyê jî bigire nav

---

48 https://www.youtube.com/watch?v=P7ty8sl2jJE; https://www.youtube.com/watch?v=2pYdQ-Bbtgc [23.11.2020]. Min xwe negihand mêjûya weşana vê beşê. Di arşîvên TRT'yê de, yên ku ji bo raya giştî hatine vekirin, ev bername cih nagire. Çendî vîdeoyên ku min ew di hin kanalên youtubeyê de peyda kirine, hejmareke kêm û xwedî wesifekî vesînorkirî be jî, ez wisan difikirim ku ev vîdeo der barê xebitîna rejîma heqîqetê ya Tirkiyeyê de, nîşaneyên giring in.

49 Ev vîdeo di rûpela youtubeyê ya Pamukoglu de cih digire ku wî "Hak ve Eşitlik Partisi- HEPAR" (*Partiya Maf û Wekheviyê*) damezirandibû û di navbera salên 2008 û 2019'an de fealiyet kiribû, lê paşê ji aliyê wî ve hatibû girtin: https://www.youtube.com/watch?v=R2Z42EY5_EU [23.11.2020]. Ji bo agahiyên giştî yên têkildarî bernameya "Gezelim Görelim" û çêkerê wê de, binêrin: https://www.yenisafak.com/yenisafakpazar/emeklilik-hayalinde-gezmek-yok-2032176 [23.11.2020].

50 https://www.youtube.com/watch?v=DLkGCCV_FnA [23.11.2020].

xwe, bê meşandin.[51]

Di bernameya “Anadolu’dan Görünüm”ê (*Dîmena ji Anadoliyê*) de, ya beşa bi mêjûya 18 Hezîran 1990’î, nûçeya qetliama li gundê Gerê ya Basana Şirnexê, ya ku ji aliyê PKK’yê ve hatiye kirin tê dayîn.[52] Termên kurdên sivîl ên ku di qetliamê de hatine kuştin an jî di şewata xaniyan de hatine şewitandin û mirovên ku li ber serê van terman zêmaran dibêjin, bi dîmengiriya ji nêz û dûr ve, li ser hev tên nîşandan. “Murat Aydin ê bi navê kod Ezîz ku wek lîderê koma parêzkar” tevî qetliamê bûye, ku tê de 12 jê zarok, 7 jê jin û 3 jî extiyar tevî hev 27 kes hatibûn kuştin, bersiva pirsên Guntaç Aktan ê ku pê re hevpeyvînê dike, wiha dide:

> Belê belê, gund tev. Heta em dikarin bibêjin ku kuştina 100 kesî wek hedef e. [...] Heta di nav vê de ji zar û zêçan wêdetir tişt hene, yanî em bibêjin ku şewitandina zeviyan, kuştina heywanan, şewitandina xaniyan, bexçeyan, eger firsend hebe heta birîna daran jî. [...] Nirxandina ku hatiye kirin: tê gotin ku ‘Me heyfa xwe stand [...] me 100 kesî ne kuştibe jî qet nebe me nêzî 60 mirovî kuşt. [...] Niha gava em tê difikirin [...] kiryareke sernekeftî ye. Yanî hemû gund ji xwe re kirine hedef, lê ji ber berxwedana parêzvanan nikarin ev hedefa xwe pêk bînin. *Eger li cihên din jî, yanî wekî parêzvanên ku li ber xwe didin berxwedan hebe, ev tiştên ku tên kirin jî wê nikaribin bikin.*[53]

Gava dewlet bi navbeynkariya milîtanên kurd hişyarî li parêzvanên kurd dikirin, mimkin xuya dike ku mirov wisan bikare bifikire ji bo şideta resmî ya di meseleya kurdî de sîber bike, hewl dide lihevxistinan di navbera milîtan û parêzvanan de derxe pêş.

Di bernameyeke din a “Anadolu’dan Görünüm”ê (*Dîmena ji Anadoliyê*) de jî, ku tê de behsa êrîşên PKK’yê yên di meha Çiriya Pêşîn a sala 1993’yan ên li ser gundên Hertawîs û Matelêta Şêrwanê ya Sêrtê dike û jin û zarok jî tê de tevî hev 33 kes hatine kuştin, agahiyên wisan tên dayîn ku mirov dike bifikirin lihevxistin ne di navbera kurdan de

---

51 Ez dê di qisimê duyem ê beşa “Xeyalên Nijadperest û Îmtiyaz”an de behsa têkiliya di navbera zayendparêzî û nijadperestiyê de bikim. Ji bo têkiliya zayendparêziyê ya bi neteweperwerî û milîtarîzmê re, binêrin Çiğdem Akgül. 2011. *Militarizmin Cinsiyetçi Suretleri: Devlet, Ordu ve Toplumsal Cinsiyet*. Dipnot; Serpil Sancar. 2017. *Türk Modernleşmesinin Cinsiyeti. Erkekler Devlet, Kadınlar Aile Kurar*. İletişim.

52 https://www.youtube.com/watch?v=NgG7Y3FE8C8 [21.11.2020].

53 Li dawiya vê vîdeoyê, hevoka Aktan a ku awayê bê “Murat Aydin ê bi navê kod Azîz çawan teslîm bûye …” dest pê dike jî cih digire. Piştre ez dê di şiroveyên beşên paşê de cih bidimê, wekî ku hatiye diyarkirin, bi awayekî mihtemel îtirafên Aydin ên eleqedarî rêxistinê û poşmaniyên wî tên nîşandan. Di nûçeya bi sernavê “PKK Itirafçısını öldüren PKK›lılar hakkında iddianame” (Îdianameya der barê PKK›yiyên ku îtirafkarê PKK›yê kuştine de) ya bi mêjûya 15.02.2017’an de jî, ku di rojnameya Hurriyetê de hatiye weşandin, em hîn dibin ku Aydin hatiye kuştin: https://www.hurriyet.com.tr/pkk-itirafcisini-olduren-pkklilar-hakkinda-idd-40367043 [27.11.2020].

lê di navbera misliman û nemislimanan bi xwe de qewimiye.[54] Di vê bernameyê de em pêşî termên ku li nav lihêf û betaniyan hatine pêçan; piştre lêzimên wan ên ku li ber serê wan şînê dikin û zêmaran dibêjin, termên ku tên kişandin û xaniyên ku dişewitin dibînin. Ew nûçeya ku pitika yek sal û nîvî ji hembêza dê hildane û avêtine nav agir, ji aliyê dêya ku bi tirkî nizane, bi navbeynkariya gundiyekî ku bi tirkî dizane tê veguhastin. Parêzvanekî ku tê gotin "Rûyê esehî yê rêxistina terorê û jêderka wê ronî kiriye", bi awayê ku pişta wî li kamerayê û rûyê wî jî li Waliyê Herêma Rewşa Neasayî Unal Erkan be, bûyerê vedibêje:

> "[...] min bi bêtêlê *bi terorê re xeber da.* Bersiva ku da min wiha bû: *We gava sala 1919'an anî bîra xwe, em niha mecbûr in ku heyfa xwe bistînin.* Em niha heyfa xwe hiltînin. Kesê ku eşhed ber bi navê dînê îslamê, bi dînê Hz. Mihemed bîne, tu car vê nake. [...] *Ew gawir êdî kîjan dînî dihebînin nizanim.* [...] Dibêjin we di filan tarîxê de wiha kiriye. Em ê jî wisan bikin. [...] Çi dikeve ber wan didin ber guleyan. Hema bila gundê parêzvanan be, bes e ji wan re."

Piştre Erkan vê daxuyaniyê dide:

> "Qaseke berê çawan ku welatiyekî me jî got, car caran terorîst [...] deng li welatiyên me dikin û bi awayê '*em ê ji we heyfa 1915'an bistînin*' [...] anonsan li wan dikin, jixwe gava bûyerên mîna vê li pêş çavan bên hildan, ji ber xwe ve xuya dibe [...] ku di bin van yekan de çi heye. [...] *Ev heqîqetek e ku di nav rêxistina terorê de mîqdarek biyanî û di nav van biyaniyan de jî kesên esilermen hene.* [...] Belê li vir bala welatiyên me jî dikişîne, [...] *mixabin kesên ku di pozîsyona sempatîzanê rêxistinê de [...]parêzkariya mafên mirovan dikin [...] li ser navê mirovahiyê bi van mewzûyan eleqedar nabin.*"

Gazinên Erkan ên têkildarî parêzkarên mafên mirovan, mimkin e ku mirov bikare wekî şopên pêkutiyên dewletê yên li ser Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a ku îtirazê li heqîqeta fermî dike, bixwîne.[55] Jixwe Serokê Giştî yê ÎHD'yê Nevzat Helvaci, di axaftina xwe ya 24 Çiriya Pêşîn 1992'yan de, van dibêje:[56]

---

54 Min mêjûya tam a weşanê peyda nekir; kamera 3'yê Çiriya Pêşîn nîşan dide. https://www.youtube.com/watch?v=8evc4OtyDiM [23.11.2020]. Şiroveyên li binê vîdeoyê ji aliyê xebitîna rejîma heqîqetê ve, bi tena serê xwe mijara lêgerîn û lêkolînê ye. Bi puxteyî, em dikarin bibêjin ku nîqaşek di navbera kesên ku bi awayekî gur qehra xwe li PKK'yê, hîn hindik be jî li kurd û ermenan tînin û yên li dewletê tînin ku îdîa dikin JÎTEM'ê ev qetliam kirine - car carinan bi delîlên ku ji vîdeoyan pêk tên- didome. Di beşa "Dewra Piştî Heqîqetê" de ez dê behsa vê û van cure nîqaşan bikim ku di qada girîmanekî ya gelemperî de cih digirin.

55 Ji bo çend nimûneyên daxuyaniyên ÎHD'yê, ku bale dikişîne ser pest û pêkutiyên li ser komeleyê, binêrin: https://www.ihd.org.tr/ihdden-cumhurbaskani-tugut-ozala-tepki/; https://www.ihd.org.tr/basbakan-suleyman-demirele- acik-mektup/ [01.01.2021].

56 https://www.ihd.org.tr/ihd-genel-baskani-nevzat-helvacinin-4-olagan-genel-kurulu-acilis-konusmasi/ [01.01.2021].

> Di çapemeniyê de hin nivîskarên quncikan çendî navê komeleyê nedin jî, lê bi terîfa "parêzkarên mafên mirovan" nivîsên ku komele ji xwe re dikirin hedef weşandin. [...] Herî dawî televîzyona TRT'yê jî tevî van weşanan bû. Di vê navê de, ji aliyê hin rayedarên fermî ve jî em wek hedef hatin nîşandan. [...] Neheqî ji kê tê bila bê, helbet em dê li dij bin. Lê divê erka Dozgeriya Dadgeha Ewlehiya Dewletê jî li me neyê barkirin.

Di daxuyaniya çapemeniyê de, ku li mêjûya 29 Tebax 1992'yan hatî kirin, em dixwînin ku "hewlên parastina mafê jiyanê yê gelê kurd ê ku tê xwastin ji heft saliyan heta heftê saliyan bê tunekirin" îroj wek "sedema hebûna" komeleyê tê dîtin û helwesta hilbijêr a li dijî îhlalên mafên mirovan jî, hatiye sedemîkirin.[57] Li hêla din, ev sedemîkirin xwedî wî wesifî ye ku lihevxistineke mindemîcî rejîma şer a Tirkiyeyê, lihevxistina di navbera "têkoşîna bi terorê re" ya dewletê û ya "têkoşîna azadiyê" ya PKK'yê û gelê kurd de, vedibeyîne. Ji bo ku ez dê nîqaşeke hîn bikitekit a eleqedarî vê lihevxistinê di beşa dawî de bidomînim, niha dixwazim li daxuyaniya Erkan vegerim.

Ji "dîroka tolhildanê" ya ku parêzvan ew wek 1919, lê Erkan bi awayê 1915 sererast kiribû û bi hereketkirina cexta li ser "ji heqîqetên ku tên zanîn", ku bi vê dîrokê re têkilî danîbû, em fehm dikin bê dewlet dixwaze meseleya kurdî wek meseleya terorê bide tescîlkirin loma hewl dide bi wesîteya "têkoşîna bi terorê re" heqîqeteke din a fermî jî di çarçoveya rejîma şer de bihêle. Em dikarin bibêjin ev metoda ku xwedî wê mebestê ye hem stratejiya înkarkirina ajenosîda ermeniyan bidomîne hem jî meseleya kurdî di nav rabêjiya îslamî de bihêle, tune bihesibîne û dadixe meseleya terorê, loma têkiliya di navbera PKK û ASALA'yê de bi agahiya ku di nav milîtanên gawir de ermenî jî hene dixe dewrê, îroj jî di rewacê de ye.[58] Li hêla din, em dikarin wisan biramin ku ew "terorê" bi parêzvan re peyiviye, bi îhtimala ku dixwaze dîroka sala 1919'an a destpêka Şerê Xelasiyê bi bîr bixe û bi sererastkirina 1915'an jî ew hatiye berterafkirin. Di her du

57 https://www.ihd.org.tr/insan-haklari-derneginin-49-sube-baskaninin-ankarada-ortaklasa-duzenledikleri-basin- aciklamasi/ [01.01.2021]. Ew helwesta hilbijêr a ku tê behskirin, di terzên îfadeyên daxuyaniyên ÎHD'yê de jî, yên li dijî kiryarên PKK'yê ku şermezarnekirina wan ne mimkin xuya dike, tê dîtin. Wek mînak, gava bang tê kirin da ku leşkerên ji aliyê PKK'yê ve hatine dîlgirtin, serbest bên berdan, sedemeke pêwîst jî li bangê tê zêdekirin: "Rehenda mirovî ya kêşeyê û peymanên navneteweyî, me mecbûrî vê teşebusê dike." https://www.ihd.org.tr/pkknin-esir-aldigi-turk-askerler/ [01.01.2021]. Ji bo metnên wekî vê binêrin: https://www.ihd.org.tr/kamu-gorevlilerine-yonelik-silahli-saldirilar/; https://www.ihd.org.tr/pkknin-elinde-bulunan-insanlarin-guvenlik-icinde-ailelerine-kavusmalarini-istiyoruz/; https://www.ihd.org.tr/hicbir-ideolojik-siyasi-mucadele- ve-hicbir-yuksek-amac-otobus-bombalama-eyleminin-gerekcesi-olamaz/ https://www.ihd.org.tr/tgrt-muhabirleri-pkk- gerillalarinca-kacirildi/ [01.01.2021].

58 Binêrin nivîsa Vartan Estukyan a bi mêjûya 10.09.2015'an a bi sernavê "Devletin 'sünnet' imtihanı Kuzu'yla yeniden gündemde": http://www.agos.com.tr/tr/yazi/12718/devletin-sunnet-imtihani-kuzuyla-yeniden-gundemde [01.01.2021]; Daxuyaniya Serokê ASİMED'ê (Asılsız Soykırım İddialarıyla Mücadele Derneği) Savaş Eğilmez a bi mêjûya 16.05.2020"î: https://www.haberturk.com/erzurum-haberleri/77973703-asimed-baskani-egilmez-asala-pkk-ittifaki-halen-devam- ediyorsozde-ermeni-meselesi-icin [01.01.2021].

rewşan de jî, cexta li ser dîroka fermî ya Komara Tirkiyeyê, ji bo hin kesan wek dîroka heyfhildanê, mebesta hildana bin çarçoveya fermî ya hafize û heqîqetan li xwe digire.

***Şopên Hafizeyan û Heqîqetê***

Em vekolîna vê rejîma şer a ku eksî bernameyên TRT'yê yên salên 90'î bûne û bi taybetî tezahurên "têkoşîna bi terorê re" yên aîdî rejîma heqîqetê ya Tirkiyeyê, bi feydedîtina ji hin şiroveyên temaşekaran ên eleqedarî van bernameyan û ji şopên vê tezahura ku dirêjî heta roja me ya îroj dibin, bidomînin. Em dikarin bibêjin ku hafize û heqîqeta bernameyên"Anadolu'dan Görünüm" (*Dîmena Ji Anadoliyê*) û "Perde Arkası"yê (*Pişt Perdeyê*) yên ku dewrî roja me bûne, bi manendi ku tên terîfkirin, cihdana dîmenên terman, daxuyaniyên waliyên Herêma Neasayî, îtirafên PKK'yiyan û îfadeyên wan ên poşmanbûnê û fikirên Ocalan ên der barê eşqê de, biparçe ne.[59] Şiroveyên ku li ser bernameyan hatine kirin, herî hindik sê şopên cuda yên hafıza û heqîqetê li xwe digirin ku bernameyan ew hilberandine.[60] Ji van a pêşî, "hafizeya rexneyî" ya wan kesên xwedî nêrîna gumandar e ku gava li bernameyan temaşe dikin an jî tînin bîra xwe û "şopeke heqîqeta mixalif" e ku îtiraz li rejîma heqîqetê dike. Ya duyem, "hafizeya nostaljîk" û "şopa heqîqeta fermî" ya wan kesan e ku gava li bernameyan temaşe dikin tesdîq dikin û tînin bîra xwe. Ya din, çendî nêzî ya duyem be jî "hafizeyeke apolîtîk" û "şopa heqîqeta nîvfermî" ya bi ser hafizeya şexsî ve bûyî ye ku ew li dijî rejîma heqîqetê bêleqe xuya dikin.

Şopa heqîqeta mixalif, a ku di hafizeya rexneyî de cih girtiye, bernameya "Anadolu'dan Görünüm"ê (*Dîmena ji Anadoliyê*) ye ku ew wexta hatina malê ya saeta zarokên dibistana seretayî û berî "[xêzefîlmê] *He-Man*" tê weşandin, wekî "yek ji hêmanên temamker ên propagandaya li dibistanê kêm maye" dibîne. Li gorî vê nêrînê, bi wesîteya bernameyê "kabûsa ku dewleta me ew dîtiye dikirin nav mala me." Wek nimûne, gava "termên terorîstan ên ku li ser hev hatine nijinandin" di bernameyê de dihatin nîşandan, rê li ber pirsên "ew termên bixwîn ên ku mêş li ser wan diçin û tên kî ne? çima hatine firandin? televîzyon çima nîşan dide? vedikir, "rewşa fehmnekirina hemû tiştên ku

[59] Ew vîdeoyên min li wan temaşe kir, ez rastî wan dîmenan ne hatim ku fikirên Ocalan ên der barê eşqê de di wan de cih digirin, lê ez difikirim ku ev îfade xwedî wesifên şahidiyê ne. Min vekîta/îmlaya şaş a di şiroveyan de rast kirin. Ji bo şiroveyên eleqedarî bernameya "Anadolu'dan Görünüm"ê binêrin: https://eksisozluk.com/anadoludan-gorunum--1626365; https://forum.donanimhaber.com/anadoludan-gorunum--6312498; https://dunyasozluk.com/baslik/anadolu+dan+g%C3%B6r%C3%BCn%C3%BCm [21.11.2020]. Wekî ku di hin şiroveyan de jî cih digire, divê em not hildin ku hemû beşên bernameya "Anadolu'dan Görünüm"ê ji mijara "têkoşîna bi terorê re" nehatine veqetandin û hin bernameyên wê jî Projeya Başûrê Rojavayê Anadoliyê (GAP) ya geşepêdanê li xwe vedihemînin. Ji bo GAP'ê binêrin: http://www.gap.gov.tr/gap-nedir-sayfa-1.html [10.12.2020].

[60] Kesên ku şiroveyên wan îqtibas kirine, bi giştî li salên 1970'yî hatine dinyayê, ez wisan texmîn dikim ku li salên 1990'î li rojavayê Tirkiyeyê û li malen bitelevîzyon mezin bûne. Di gel ku bi wan kesan re hema hema di eynî temenî û di eynî pozîsyonê de me, dibe ji ber ku wan gavan min li televîzyonê temaşe nekiribe, her du bername jî nayên bîra min. Divê mirov not hilde ku dibe nifşeke berê ya li bernameyan temaşe kiribe, xwedî şopên cuda yên hafize û heqîqetê bin.

bûne û qewimîne bi awayekî esehî" tam jî "rewşeke wisan bû ku her tiştî mikemel dikir." Tê bîra me ku yek ji beşên herî giring ê weşanan ew hevpeyvîn bûn ku bi "îtrafkarên têra xwe hatibûn bizdandin û hincirandin" re hatibûn kirin û îtirafkaran jî axaftina xwe "bi awayê bêyî xwe şaş bikin bi gotina 'Ne Mutlu Türk'üm Diyene'(Xwezî Bi yê Dibêje Ez Tirk im)" ve girê didan. Ez dixwazim temamî şiroveya têkildarî bernameyê, ku şopa heqîqeta mixalif a ku di hafizeya rexneyî de bi cih bûye û xwedî wesifê xulasekirinê ye, veguhêzim vir:

> Mora herî giran a hesta dorpêçkirîbûnê. Mîmarê texrîbatên ku jêbirina wan a ji hafizeyê zor e. Nifşa hingura TRT'yê ya ku bêteşetiya terzê îdareya serwer a bêyî paxav vedibeyîne. Yek ji nimûneyên şideta sembolîk a li welêt a herî mezin. Gramera hakim, rewşa xemnak û tengav a dewletê. Der barê meseleya kurdî de bernameya herî hîmdar a ku hîn jî mîtên di tedawilê de hene, hildiberîne. Ji du tiştên sabit ên ku ji zarokatiya min yadîgar mane, yek jê ev bername, ya din jî nefreta di awirên tîmên taybetî de ye.[61]

Kana şideta sembolîk a fîzîkî ya ku bi wesîteya cesetan, îtirafkarên hincirandî û awirên tîmên taybetî tê sepandin, yanî pîvana şideta ku li Kurdistanê tê pêkanîn wisan mezin, repertuwara şidetê wisan fireh e ku yek ji birîndarbûnan jî îdraka heqîqetê bi xwe ye ku bi dirêjahiya salên 90'î "derxistina bilançoya wê ne mimkin" e.[62] Em ji şiroveyên têkildarî bernameya "Perde Arkası"yê (*Pişt Perdeyê*) jî dikarin taqîb bikin şideta ku xwedî wê pîvanê dikare îdraka heqîqetê texrîb bike, bi kêrî înkarkirina vê şidetê û her wisan bi kêrî zeximkirina rejîma heqîqetê tê.[63] Gava navê PKK'yê tê bihîstin, hemen "dîmenê bebekê gulekirî yê di vê bernameyê de hatiye nîşandan" tê hişê mirov; bi wesîteya dîmenên cesetan, "ciwanên neteweperest ê mirîhez" mezin dibin; di bernameyê de "tim zenofobiyek, paranoya [tê afirandin] û bangêriya şer" tê kirin û "piraniya malbatên li welêt bi awayê bi çi şertî dibe bila bibe dihatin hestyarkirin ku divê li dijî kutabûna vî şerê ku niha didome derkevin." Tevî veşartina şideta dewletê û heqîqetên mixalif, bi daxuyaniyên rayedarên siyasî û leşkerî û şedet û heqîqetên fermî, rabêjiyên nijadperest û îmajên ku bi navbeynkariya van cure bernameyan dikevin geriyanê, tam jî wekî ku Arendt dibêje, îdraka heqîqetê texrîb dike û ji bo rejîma heqîqetê jî berhevkirina tebayan ji xwe re dike armanc.

---

[61] https://eksisozluk.com/anadoludan-gorunum--1626365?p=4 [21.11.2020].

[62] Ji bo pîvaneya şidetê û repertuwarê wê ya ku li salên 90'î li Kurdistanê hatiye sepandin binêrin Bahar Şahin Fırat. 2014. Türkiye'de 'Doksanlar': Devlet Şiddetinin Özgünlüğü ve Sürekliliği Üzerine Bir Deneme. *Türkiye'de Siyasal Şiddetin Boyutları*. Ber. Güney Çeğin û İbrahim Şirin. İletişim: 382-389; Özgür Sevgi Göral, Ayhan Işık û Özlem Kaya. 2013. *Konuşulmayan Gerçek: Zorla Kaybetmeler*. Hakikat, Adalet ve Hafıza Çalışmaları Derneği Yayınları: 14-20.

[63] Ji bo şiroveyên têkildarî bernameya "Perde Arkası"yê binêrin: https://eksisozluk.com/perde-arkasi--76161?p [21.11.2020].

Şopên ku bernameyan di heqîqetên fermî û nîvfermî de hiştine, mimkin e ku mirov di hafizeyên nostaljîk an jî apolîtîk de rastî wan were ku vê texrîbatê ew şêwandine. Li bîranînên aîdî bernameya “Anadolu’dan Görünüm”ê (*Dîmena ji Anadoliyê*), “bêhna galetaya bianason a ku bi çaya pêncan re tê xwarin” û fikira ku van saetên rojê dê tu car “wekî wan rojan bikêf” neyê jiyandin, dikare hevaltî bike. Di bernameyê de, “ku wextekê ew bernameya televîzyonê ya tek bû, dîmenên Abdullah Ocalan lê dihat weşandin”, tê gotin ku di wan dîmenan de “Apo, ji gerîlayên jin re yên ku li pêşberî wî quncifokî û melisankî bûbûn, digot ‘a ku bi min re be wê qazanc bike’”. Bi nîşandana “termên terorîstan ku vê gavê di leyîstikên vîdeoyê de dikare bê dîtin” heyecan tê çêkirin, carinan jî “bebekên mirî yên di pêçekê de” tê nîşandan û temaşekar pê tên xemgînkirin, niha jî xatirayeke bernameyê heye ku “heta di mêjiyan de fikira ka binêrin teror çi dike, çêneke nasekine.” Çendî tu tiştekî din ê aîdî wan salan nayê bîra kesî jî, lê li van cure dîmenên hanê “ku hîn jî bi awayekî zelal tê pêşberî çavan”, îcar dîmenên ku “dramên malbatên şehîdan li xwe vedihewînin” bi wan re hevaltî dikin.

Ji bilî mebesta bernameyê, di hin şiroveyên agresîf-nostaljîk de, ku rexneyên li dijî tesîra wan a xemnak li xwe digirin û van cure şiroveyên romantîk-nostaljîk naîf dike, şopên heqîqeta fermî hîn xuyatir in: Temaşekarekî ku bernameya “Anadolu’dan Görünüm”ê “wek bernameyeke ne diyar bê ka çi ye” tê bîra wî, jê re tê gotin ku divê ew der barê bernameyeke wiha de ku “leşkerên me yên li Rojhilat, li Başûrê Rojhilat bi qehremanî welatê me diparêzin [...] erdên vî welatê ji xwe re dike mijar” bi awayekî “rast bipeyive” û tiştek bi bîra wî tê xistin: Li wan salên ku kanalên taybetî û înternet tune bûn, ji bo wan malbatên ku îmkana wan a kirîna rojnameyê nebû û zarokên wan li Rojhilat leşkerî dikir “bernameyeke wisan bû ku ji bo lê temaşe bikin, bi kerb û bêsebir li bendê bûn [...] Îroj ciwanên tirk ên ku bi gotinên [...] nizanim demokratîkbûyîn e, nizanim mafên mirovan e tên xapandin, eger lê temaşe bikira û her kesî fehm bikira bê ka a rast çi bûye.”[64]

Eger bê bawerkirina ku bi wesîteya van bernameyan dikare bê fehmkirin “ka esehî çi ye”, nîşan dide ku ev bernameyên “bi terorê re tê dikoşin” bi awayekî qismî karîne bi ser bikevin da ku heqîqetên diyardeyî di çarçoveya heqîqeta fermî ya rejîma şer de heps bike. Çendî fotografên aîdî qetliamê ya ku artêşa Holandayê li Endonezyayê kiribû di geriyanê de bûn jî, Paul Bijl bê çima ev fotograf nebûbûn sedema destpêkirina pirsyarîkirina siyasî û civakî nîqaş dike, karê “çarçovekirinê” ya ku ew temîn dike fotograf metneke dîtbarî ye vedikole û diangêje ku ji ber civak dîroka mêtingehkar û şidetê bi berdewamî di nav çarçoveyeye siyasî ya serwer û mizafer de dihêvişîne

64 https://forum.donanimhaber.com/anadoludan-gorunum--6312498 [21.11.2020].

nahêle ku pirsyarîkirin bigihîje mehneyekê.[65] Ev çarçoveya siyasî ya ku îzah dike bê tiştê tê bîra me çawan tê bîra me, dikare wek rejîmeke heqîqetê yan jî çarçoveya heqîqeta fermî bê fehmkirin. Televîzyoneke ku dewletê ew bi çarçove kiriye, ji bo çêkirina cihana têgihîştinê ya ku rejîma şer hewce pê dibîne û xwe dispêre heqîqeta têkoşîna bi terorê re, divê ev yek ji wan amûrên herî guncayî be.

Wan kesên ku tercîh kiriye ew li dû li şopa heqîqeta fermî ya ku xwe dispêre heqîqetên diyardeyî herin ku ku televîzyona dewletê ew çarçove kirine, çendî gelek pêwîstekên wan ên mîna aborî, civakî û psîkolojîk hebin jî, di encamê de wan tercîheke siyasî kiriye û bi gotina ku dibêjin wan berê xwe daye bi aliyê partiyên eleqedar, em dikarin cextê li ser wesifê siyasî ya têgiha heqîqetê jî bikin, ku jixwe me ev wesif di beşa pêşî de nîqaş kiribû; pirsyarînekirina heqîqeta fermî tercîheke siyasî ye ku tê xwastin ew mîna raser-siyasetê bê pejirandin, ku dixuye nezaniyê û bêleqetiyê çêtir dibîne lê ji şideta dewletê agahdar e, aşinayê vê tundiyê ye, ji vê xwedî bûye û bi vê şidetê seqet bûye. Ew termên "terorîstan" ên di bernameyan de tên nîşandan, bi bîra mirov dixe ku terza îdareya serwer bi sepandina şideta fîzîkî û sembolîk a li ser kesên li dijî heqîqeta fermî radibin şekil girtiye, bi gramera nijadperest û ciwanan ewle dibe ku ji bo bêyî paxav heqîqeta fermî bide jiyandina, hingî çors e îcar qet fikareyan nake da vê terzê vebeyîne.

Nîşandana merasîmên cenazeyan a fermî ya tirkan û leşkeran, a termên kurdan û mîlîtanan jî bi awayekî bêyî paxav û li ser hev, li îmajeke têkildarî xebitîna nijadperestiyê, li daneyeke şênber/berbiçav dadigere; li ser cesedên ku dikare bên nîşandan, îşaret bi bedenên candar ên ku dikare bên kuştin, tê kirin. Ji ber em dê di beşa qisimê duyem ê "Xeyalên Nijadperest û Îmtiyaz"an de bi awayekî bikitekit nîqaş bikin, li vir em dikarin Foucault zikir bikin ku ew dibêje rejîmên heqîqetê, rayeya mehkûmkirina bi mirinê ya beşeke diyar a nifûsê, bi nijadperestiyê qazanc dike. Eger em lê zêde bikin û bibêjin, wekî ku Evren Balta di nivîsa xwe de bi etifa Katherine Verdery diyar dike, teserûfa zilmê ya li ser termên mixalifan a desthilata siyasî û hemleyên wê ku dixwaze van terman bêgor û bêabîde bihêle û ji hafizeyan bimalêşe nîqaş dike, bedenen mirî tevî "biyografi"yekê tên ber me: "Tiştên ku bi bedena wan hatine kirin, nîşaneyeke wê yekê ye ku tê xwastin dê bi wan kesan jî bê kirin ku gava ew li jiyanê bûn ew dê bi wan re xwedî eynî qederê bûn. Bedenên wan hem mirî hem jî zindî ne. Çendî bi awayekî fîzîkî mirî bin jî, lê bi awayê siyasî ew zindî ne. Bedena mirî

---

65 Paul Bijl. 2015. *Emerging Memory: Photographs of Colonial Atrocity in Dutch Cultural Remembrance.* Amsterdam University Press: 29-37.

û tiştên ku bi bedena mirî hatine kirin, rewşa herî tazî ya siyasetê ye."[66]

Dîmenên ku rejîma heqîqetê bi televîzyonên dewletê dixe geriyanê, ne bi tenê "terorê", şideta dewletê jî di hafizeyan de neqş dike bê dikare çi bike. Terazandina xemgîniya mirinên ku sivîlên kurd heq nekirine bi kêfxweşiya mirinên ku "terorîstan heq kirine", tam jî bi wesîteya hafize û şopên heqîqetê ku dewletê ew çêkirine, yanî bi saya wateya siyasî û çarçoveya nijadperest ên ku dewletê li cesedan bar kirine, mimkin dibe. Di bernameyên TRT'yê de, ku heta seriyekî nedin Waliyê Herêma Neasayî bi dawî nabin, gava dîmenên aîdî kurdên sivîl ên ku PKK'yê ew kuştine û yên aîdî cendekên milîtanên PKK'yê ku dewletê ew kuştine dikin geriyanê, heqîqetên diyardeyî yên eleqedarî wan kiryarên ku dewletê di navê têkoşîna bi terorê re, bi darê zorê kurdên sivîl ji cihên wan kirine, bi zorê ew winda kirine, bi cinayetên ku wek failên wan mechûl dixuyin û bi şewitandina gundan ew qetil kirine, tên veşartin. Hewla serwerbûna li heqîqetê ya bi feraseteke manend a weşanê ku awayê xebitîna rejîma şer û miqaweta wê ya îroj derdixe rastê, hejekên serweriyê jî ku hevaltiyê bi krîza heqîqetê ya îroj re dike, aşkeratir dike.

***Salên 2010'an: "Bibin Şahid"***

Di heyna "operasyonên xendeqan" de yên bi mêjûya 2015-2016'an, dîsan di dewra Rewşa Neasayî (OHAL) de û dîsan bi bernameya bi navê "Şahit Olun" (*Bibin Şahid*) ku di TRT'yê de hatibû weşandin, wekî salên 90'î, bernameyên "têkoşîna bi terorê re" û weşangeriya nijadperest a di kanalên taybetî de, ku desthilatê dest daniye ser wan, xwedî wê xulasekirina wesifê hewla çêkirina rejîma şer in. Li aliyê din, rastiya ku îroj ew hewl bêkîfayet mane, di van hevokan de dikare bê dîtin ku ew di her beşa bernameyê de tên ser zimên.[67]

> Hûn dixwazin bigihîjin rastiyê, hûn dixwazin rastiyê bibînin? Nexwe serê pêşî herin jêderka bûyerê. Û mirovê li wir bibînin, destê xwe pê bikin, li çîroka wî guhdarî bikin, bi çavên wî bibînin û bibin şahidê tiştên qewimîne. Bibin şahid ku hem bi exlaqî hem jî bi wicdanî hest bi berpirsiyê bikin. Tune nehesibînin û pişta xwe nedinê neçin. Bibin şahid ku bi saya we rastî biqîmet bibe.

"Rêzebelgewariya ku sergurdê teqawid, pisporê ewlehiyê û nivîskar Mete Yarar amade

---

[66] Evren Balta. 2015. Ölü Bedenlerin Siyasal Yaşamları. *Birikim*: https://birikimdergisi.com/haftalik/7240/olu-bedenlerin-siyasal-yasamlari [05.03.2021]. Her wiha binêrin Katherine Verdery. 1999. *The Political Lives of Dead Bodies: Reburial and Postsocialist Change*. Columbia University Press: 27-55.

[67] Ji bo hemû beşên bernameyê: https://www.youtube.com/c/trtbelgesel/search?query=%C5%9Fahit%20ol [24.11.2020]. Sê beşên din ên bernameyê jî penaberên ku li Tirkiyeyê ne, ji xwe re kirine mijar.

kiriye, li dema têkoşîna bi terorê re, tiştên ku li leşkerên tirk û polîstên tirk qewimîne [...] bi pêş çavan dixe." Berî ku em hin beşên bernameyê yên ku ji bo Farqîn, Amed, Sûr (Sûrîçî), Şirnex, Nisêbîn û Dêrikê hatine veqetandin veguhêzin, dê li cih be ku em bi kurtasî behsa "operasyonên xenqeqan" û şerê ku di navbera Tîrmeh 2015 û Adar 2016'an de qewimîne bikin, ku bûne mijara bernameyê.

"Çareseriya Îslamî" ya desthilata AKP'yê, ya ku ji hemleya hembêzkirina kurdên di nav dewlet û PKK'yê de mane û ji bingeh ve kurdîtiyê li hemberî mislimantiyê li "rengekî folklorîk" dadixe pêk tê, îmkan dida pêşwazîkirina daxwazên çandî ya kurdan lê destûr dida wê yekê jî ku dawazên wan ên siyasî bi şidetê bên tepeserkirin.[68] Bi berdewamiya Pêvajoya Çareseriyê re bibîrxistina vê îcazetê, kir ku pêşî pêvajo neçe serî, di pey re jî rewşeke libar a meşrûkirina şideta dewletê ya ku bi navê "operasyonên xendeqan" tê zanîn, çêkir. Ev şerê ku pêşewayê PKK'yê Murat Karayilan li hemberî "jenosîda siyasî" ew wek "metodeke parastinê" bi nav kir û bi xendeq û barîkatan dest pê kir, ku "bi pêvajoyê re ji ber xwe ve ber bi çekdarbûnekê ve çû" û dewletê bi qasî 15 hezar leşker, polîs û tîmên taybetî beşdarî lê kir, bû sedema mirina bi sedan kesên sivîl, a bi sed hezaran kesan ku terka malên xwe bidin, a wêrankirina qada jiyanê û eserên dîrokî.[69] Heqîqeta ku vî şerî afirandiye û texrîbata aştiyê ez dê di beşa piştre, Pêvajoya Çareseriyê jî, ku hemen berî şer xelas bûbû di qisimê pey re, di beşa "Li Dijî Teşebusên Çareseriyê yên li Tirkiyeyê Berhilistiya Nijadperest" de nîqaş bikim.

Di beşa pêşî ya bernameya "Şahit Olun"ê (*Bibin Şahid*) de ku li ser Farqînê bû, wekî di tevahiya beşan de, em hîn dibin ku bê polîsan çi cure çek û amûr bi kar anîne û li hemberî teknîkên "rêxistin"ê çawan tê koşiyane.[70] Bi wesiteya dengekî derve em pê dihesin ku sivîl ji aliyê rêxistinê ve " wek rehîn" hatine girtin, lê gelê ku "lê werqiliye bê dewlet çi qas giringiyeke zêde nîşanî Pêvajoya Çareseriyê dide" loma ji herêmê

---

68 Ji bo pêvebûna AKP'yê ya bi rejîma şer ve û siyaseta kurdî binêrin Cenk Saraçoğlu. 2012. Türkiye Sağı, AKP ve Kürt Meselesi. *Türk Sağı:* ji nav *Mitler, Fetişler, Düşman İmgeleri*. Ber. İnci Özkan Kerestecioğlu û Güven Gürkan Öztan. İletişim: 243-279.

69 http://www.insanhaber.com/guncel/karayilan-hpg-sehre-inmedi-ama-dahil-olabilir-h53718.html [26.11.2020]. Ez dê di beşa pey re bi awayekî bikitekit behsa vê daxuyaniya Karayilan bikim. Li ser mijara eleqedarî reqemên şer, daneyên cuda hene: http://www.radikal.com.tr/turkiye/cizre-ve-silopide-10-bin-askerle-operasyon-tanklar-ilce- merkezinde-1494018/; https://www.dw.com/tr/aihmde-hendek-operasyonlar%C4%B1-duru%C5%9Fmas%C4%B1/a- 46281770; https://www.bbc.com/turkce/haberler-turkiye-39230287; http://www.aljazeera.com.tr/al-jazeera- ozel/hendegin-bilancosu-nufusun-22si-goc-etti [26.11.2020]. Endamekî berê yê Herekata Taybetî ya polîsan vê yekeyê wekî "Ocaxa Pêxember" terîf dike û dibêje ku "di operasyonên xendeqan de Çeneqeleyek çêbû" û îşaret bi çapa şer û mehneya wê ya di raya giştî ya Tirkiyeyê de dike û van lê zêde dike: "Ev doz ne doza birayên me yên kurd e. Ne doza gerîna ji bo mafên wan e. Navên wan ê kod Çekdar, Hogir […] tev navên ermeniyan in […] Lê doza me doza îslamê ye, doza namûsê ye […] Em ê ji aliyê madî ve cihada xwe bikin, hûn ê jî ji aliyê manewî ve cihada xwe bikin [ji lawê xwe re dibêje]": https://www.youtube.com/watch?v=ggxAoxgoR2o [25.11.2020].

70 https://www.youtube.com/c/trtbelgesel/search?query=%C5%9Fahit%20ol [24.11.2020].

direve; PKK di çarçoveya “taktîka şerê psîkolojîk” de hêzên ewlehiyê “dîmendar dike” û dixwaze van dîmenan jî servîsî dinyayê bike. Ku em fehm dikin Yarar dixwaze vî şerê psîkolojîk berevajî bike, di hemû beşan de balê dikêşe ser vê Meseleyê:

> Endîşeya hevalan [*polîsên herekata taybetî*]: [...] *‘Em bi lêpirsîn û dozên ku yan li ser medyaya civakî yan jî li ser tiştekî din li me hatine vekirin, mijûl dibin.* Loma ji we ricaya min, tek ricaya min, li ser navê me hûn bibêjin. *Bila li pişt me bisekinin.’*

Beşa Farqînê wekî hemû beşan, bi vê pirsa Yarar tê girtin: “Gelo hûn karîn ku li cudahiya di navbera pêzanînên xwe û tiştên qewimî de, bibin şahid?

Ew tiştê ku tê xwastin em lê bibin şahid ferqbûn be, jixwe mebesta psîkolojîk a bernameyê xulase dike. Li hêla din, cudabûna ji bernameyên ku di salên 90’î de dihatin weşandin, şideta sembolîk a di van weşanan de, ne bi dîmenên cesedan, lê bi dîmenên kavilbûnê dertê pêşberî me. Bi hesabên medyaya civakî yên hem aîdî endamên hêzên ewlehiyê hem jî yên aîdî welatiyên mixalif, ew dîmenên cesedan ku em li wan temaşe dikin jî, berdewamî bi îşaretkirina wê yekê dide ku bê dewlet dikare kîjan welatiyan bi çi şekilî bikuje.[71] Tevî vê, ew dîmenên ku bi wesîteya kanalên nûçeyan ên nefermî yan jî yên şexsî dikevin geriyanê, çêkirina ji nû ve ya rejîma heqîqetê ya fermî jî zor dike. Amirekî buroya Têkoşîna bi Terorê re (TEM) ku di beşa bernameyê ya Şirnexê de dipeyive, van dibêje: “Ji vî aliyî ve em desteka gelê xwe [...] dixwazin. Yanî em dixwazin ku teraza menfi û misbetê di medyaya civakî de li leha me biguhêrin.” Di weşana li ser Amedê de jî heman gazin heye. Li ser pirsa Yarar ku dibêje “Ma hûn difikirin ku we xwe nedaye zanîn û fehmkirin”, tîmekî herekata taybetî wiha bersiv dide:

> Divê ez li wir wezîfeya xwe bikim an jî [...] *bi awayekî wek dijminiya medyaya civakî, divê ez ji xwe behs bikim*? [...] A li vir îslamiyet mesela li ser xelkê me tesîra wê gelek zêde ye. [...] Di camiyeke tarîxî de ev sê meh e ku azan lê nayê dayîn, nimêj lê nayê kirin [...] Eger Ajansa Anadoliyê nehata ev nekişandina, neweşandina, ma wê kî ev bizanîbûna?

Tîmê taybetî ku hewce pê nabîne medyaya civakî bi kar bîne xwe bide zanîn û fehmkirin, tercîh dike ku êrîşa li îslamiyetê hatiye kirin, bê zanîn. Jixwe Erdogan got ku “Ew ên ku Mizgefta Fatih Paşa xera kiriye, ew ên ku birayên min ên kurd ên bawermend û îmandar îstismar kirine va ye bedêla vê didin û wê bidin jî” û em dibînin ku tevî nîşandana berteka ji ber şewata Camiya Qurşûnî meseleya kurdî ya dewletê

[71] Mesela ji bo zanyariyên li ser mirina Taybet Înanê, ku di lihevxistinên li Silopyayê de bi çek hatibû hingaftin, li kuçeyê bi rojan mayîna termê wê û der barê lêpirsîna vê yekê de binêrin: https://www.evrensel.net/haber/393399/taybet-inanin-olumuyle-ilgili- sorusturmada-4-yilda-ilerleme-yok [03.01.2021]

li meseleya terorê dadixist û careke din xwe li îslamiyetê dipenihand.[72] Îslamiyet bi berdewamî bûye yek ji çavkaniyên serlêdanê ku dewletê ji bo meşrûkirina îdareya mêtingehkariyê û polîtîkayên şidetê yên li Kurdistanê, serî lê daye; lê belê em dikarin bibêjin ku AKP'yê, nemaze bi torên saziyên civaka sivîl, bi xizmetên binesaziyê û bi rêya kadrobûyînê umeta îslamê berfireh kiriye û tevî teşebusên xebatên ku bi wan nasnameya kurdî bimelisîne, amûrên şidetê bi rabêjiya cîhadê "xweş kirine" û nijadperestiya dîndar a Tirkiyeyê û mêtingehkariya wê bi pêş ve birine.[73]

Gava em li kuçeyên Sûrê bi zanyariya ku dibe her kêlî lihevxistinek biqewime tên gerandin, bê ka "xwişk û birayên me yên kurd" der barê vê û yên mîna vê de çi difikirin, ku em dizanin em ê di vê bernameyê de hîn nebin, lê bi daxuyaniya Yarar em digihîjin heqîqeteke din: "Liv ir hûn mîkrofonê [...] dirêjî kê bikin, du roj bi şûn de yan hildana ber îfadeyan an jî talûkeya jiyanê çêdibe." Li gorî tê xwastin ku em bifikirin ew ê ji aliyê PKK'yê ve îfadeyên wan bê girtin, îcar "em lê dibin şahid" ku dewlet li Kurdistanê krîzeke serweriyê dijî.[74] Endamekî TEM'ê (Têkoşîna bi Terorê re) li Şirnexê dertê pêşberî me ku vê krîza serweriyê rast didêrîne:

> [...] Sê hêmanên dewleta modern hene. Serwerî, mirov û ax. [...] Bi çêkirina barîkat, xendeq û mewziyan hêmana me ya axê, xwedîgiravî bi kirina kontrola nasnameyê hêmana me ya serweriyê û bi zora çekan şandina ser sindoqê ya îradeya siyasî ya gelê me jî, hêmana me ya mirov tesîrdar dibe. [...] *Beşek ji gel ji vê aciz e,* lê çêkirina kantonan, qaşo taktîkeke çêkirina kantonan jî ev e.

Bi qasî ku em ji van gotinan fehm dikin, qisimek ji gel ji "tesîrdarbûna" hêmanên dewletê ne aciz in ku em loma dikarin bifikirin tam jî şer ji bo meseleyeke serwerî, mirov û axê ye, yanî ne teror lê meseleya kurdî ye. Lê belê endamê Têkoşîna bi Terorê re dibêje "li ser her kesê ku bi dewletê re ye pêkutiyeke ecêb heye" û hewl dide vê îhtimalê berteref bike, îdîa dike ku bi wesîteya îdarekirina îdrakê ev pest û pêkutî tê nexuyanekirin:

---

72 https://www.bbc.com/turkce/haberler/2015/12/151217_erdogan_cizre_silopi [01.12.2020]. Ji bo îdîayên li ser şewatê ku di navbera wan de nakokî hene, binêrin: https://bianet.org/bianet/kent/169945-diyarbakir-kursunlu-cami-nde-yangin [01.12.2020].

73 Binêrin Mehmet Kurt. 2019. 'My Muslim Kurdish brother': Colonial rule and Islamist governmentality in the Kurdish region of Turkey. *Journal of Balkan And Near Eastern Studies*. 21(3): 350–365.

74 Ew vîdeoya ku bi sernavê "Dîmenên ji xala pişkinanê ya polîsên herekata taybetî ya li bajaroka Sûra Diyarbekirê hatiye weşandin û tê de heqaret û çêrên leşkeran ên li jinan hene – ku tu îşaret nîn e ew ne sivîl in- îcar em dibînin ku dewlet bi xwe sivîlan dikişîne ber îfadeyan: https://www.youtube.com/watch?v=Fjs5eq1kesE [24.11.2020].

> [...] Gotina ku kuştina kesên sivîl heye, nan tune ye, îdîakirina ku xwedêgiravî di sarincê de hin zarok tên hiştin[75] [...] *Ev gişt, di çarçoveya taktîkeke diyar de, bi bikaranîna medyaya civakî, bi kirina birêvebirina îdrakê, sepandina wan taktîkan e.* [...] Rêxistin bi taybetî dixwaze ku em zerar bigihînin mirovên sivîl û loma em ji ber vê pir bi baldarî tev digerin. [...] Em ji bo kesên ku di destê wan de çek heye jî bi baldarî hereket dikin, ji lew re ew zarok hîn ne fehmber in [...] Gava tiştek bê serê yekî ji wan zarokan, em dizanin ku em ê taxê gişt ji dest bidin.

Diyardeyên ku tê xwastin bi rengdêra xwedêgiravî/qaşo heqîeta wan bê pirsyarîkirin û ev hewla ku mirina sivîlan yek ji ber wan amûrên birêvebirina îdrakê ye tê kirin, wisan dixuye ku li cem raya giştî ya hin kesan xwedî bergindekê ye; eynî mîna şopa heqîqeta fermî û nîvfermî ya ku xwe bi hafizeyên nostaljîk û apolîtîk digirtin ku bernameyên televîzyonê yên salên 90'î ew çêkiribûn. Jixwe, ev gotinên aîdî mensûbê Têkoşîna bi Terorê re jî, hewlên dewletê yên birêvebirina îdrakê yên dijber nîşan dide:

> Ez gelê deverê pir baş nas dikim. Hesasiyetên wan ên pir giring hene. [...] Yek jê dîn e, ya din jî hêmana namûsê ye. Rêxistin niha êrîşî her du hêmanan jî dike. We jî dît, camiyên me vala ne. [...] Û di van barîkatan de, di van xendeqan de, li vir, li wir, di wan deman de ku em kontrol nakin [...] mirovên ku kontrola nasnameyan dikin bêyî tu hesasiyetê nîşanî keçên me yên ciwan, pîrekên me bidin, bi helwestên ku wan tehl bikin tev digerin, em van ji keçên me guhdarî dikin û ji wan dibihîzin.

Di dewreke wisan de ku hemû medya kana/çavkaniya xwe neqilî "operasyonên xendeqan kiribû , çendî bawerkirina ku dewlet li hemberî birêvebirina îdrakê ya PKK'yê neçar maye ne mimkin be jî, di televîzyona dewletê de ji aliyê tîmên taybetî ve anîna ser ziman a vê neçareriyê, îşaret bi hebûna rayeke giştî dike ku ew ji rejîma heqîqetê re serşor nabin. Çendî heqîqetên diyardeyî bi rêya medya û medyaya civakî servîs dike bila bike jî, ji ber ku dewlet difikire nekariye îdrakê îdare bike, bi qasî hewla înkarkirina sûcên ku dewletê ew kirine ev rewşeke welê ye ku krîza serweriyê û qulçikên di rejîma heqîqetê de aşkera dike.

Jixwe di beşa vekirinê ya heman bernameyê de ku li ser Cizîrê ye, em dibînin hemen li cem alayeke din a ku li serê dîreka girekî dihejike lê belê hatiye flûkirin, dîrekeke din a dirêj hatiye çikilandin û alaya tirk lê dimilmile. Ev nîşandera ku dike "zafera" dewletê ya ku axa xwe ji nû ve bi dest xistiye bê mihakemekirin, bi dayîna referansa hilbijartinên giştî yên 2015'an ku bi serkeftina HDP'yê û têkçûna AKP'yê bi encam

[75] Cesedê Cemîle Çağırga ya 10 salî ku di lihevxistinan de hatibû kuştin, ji ber qedexeya derketina derve nehatibû definkirin, loma di sarincê de hatibû veşartin, ji bo nûçeyên li ser vê yekê binêrin: https://www.bbc.com/turkce/haberler/2015/09/150913_cizre_cemileninolumu_hatice_kamer [03.01.2021].

bûbû, li çarçoveya heqîqetê ya xêzkirî tê hildan. Yarar ku dibêje "Li Cizîrê ji 7'ê Hezîranê ve tiştên pir giring çêdibin, a rast berê jî dibûn", diyar dike ku cîrana Cizîrê ya li Sûriyeyê PYD ye û bi çekên ku "hinan bi navê alîkariya mirovî" ji PYD'yê re şandine, li Cizîrê mirov bi wan tên kuştin.

Di beşa Nisêbînê ya bernameyê de jî tê diyarkirin ku mîqdarê bombayên li navçeyê hatine çandin "hindiktirîn 7 ton" e û dîsan li nav lihevxistinê hişyarî dike: "Heta ev civak, li dijî wan kêsên ku dixwazin vî welatî bikin mîna Sûriyeyê bi tevahî dengê xwe bilind neke, bawer bikin wê ji me re hizûr û şadî tune be." Gava li şiroveyên li binê vê vîdeoyê tê nihartin, tê dîtin ku dengekî ev civak bi tevahî wî bide nîn e.[76] Ji nîqaşên di navbera wan kesan de, yên ku dibêjin ev heft ton bomba gava li Nisêbînê dihat çandin "gele herêmê li ku dere bû" û yên dibêjin "dewlet li ku dere bû", em hîn dibin ku îxbarkirina wan kesên "gava bombayan diçînin di destê wan de çek hene" ne tiştekî hêsan e û gava ew tên îxbarkirin jî dewlet "ji ber zerar negihîje Pêvajoya Çareseriyê tu gavekê jî naavêje" û pirskirina "eger xebera dewletê tune be çivîk nikare bi cihekî de biçe, lê çawan dibe ku bi tonan bomba di erdê de hatine bicihkirin" tiştekî eletewş e; jixwe em dizanin eger hewce bike dewlet eskerê xwe jî dikuje birakê min ê delal, em cem erseveran dizanin."

Ew terefên rejîma heqîqetê ya Tirkiyeyê çêdikin, "zehmetiya" ku di warê qebûlkirina heqîqeta din a ku îroj derdikeve pêşiya wan û bawerkirina ji heqîqetên diyardeyî de bi wan re çêdibe, wekî me berê jî got, em dikarin wek texrîbata heqîqetê ya ku şidetê ew çêkiriye bibînin. Li hêla din, ew gumanên eleqedarî heqîqetên fermî û mixalif ên ku di mecrayên gelemperî yên girîmanekî de tên bilêvkirin, wekî ku me di beşa ewil de nîqaş kir, dibe ku mîna biqîmetbûna heqîqetê û lêgerîna heqîqetê jî bê xwendin. Xebitîna li ser hevparkirina lêgerîna heqîqetê, ji bo ku mirov bikare heqîqetên fermî û mixalif ên rejîma şer di çarçoveya rejîma aştiyê de bide bicihkirin, dibe ku ew wek xaleke jêderketinê bê dîtin. Loma lêgerîneke heqîqetê ya aştiyane, ku ne bi tenê ji îtiraza li rejîma heqîqetê lê ji rexneya rejîma heqîqetê ya mixalif jî çêdibe, li hewla tamîrkirina texrîbata heqîqetê jî rast tê.

---

76 https://www.youtube.com/watch?v=bC2kpMkNBXs [24.11.2020].

## 3. Rejîma Heqîqetê ya Mixalif

Me gotibû ku rejîma heqîqetê ya Tirkiyeyê ji "heqîqeta têkoşîna bi terorê re" serşor bûye ku dameziraweyên mîna arteş û medyayê ew hilberandine û bi desteka raya giştî ya tirkî bûye xwedî fonksiyon û tirûşê. Li aliyê din, em dikarin bibêjin ku rejîmeke mixalif a xurt heye ku dewlet israr dike ji bereka civakî û siyasî ya "terorê" pê re tê dikoşe fehm neke yan jî têra xwe jê serwext dibe û lê dixebite ya jê serwext dibe tune bike, yanî meseleya kurdî tenzîlî meseleya terorê dike û hewl dide ku bi şideta Hêrêma Rewşa Neasayî (OHAL) li Kurdistanê li ser lingan bisekine. PKK ku mixetabê têkoşîna bi terorê re ye, em dikarin bibêjin di çarçoveya têkoşîna azadiyê de ku gelê kurd jî beşdarî lê dike, rejîmeke din a heqîqetê çêkiriye. Em bi bîra xwe bînin ku salên 90'î ku "ji bo kurdan împaratoriya tirsê hatibû afirandin", lê ew dewreke wisan e ku dest pê kir bi wesîteya "zimanên siyasî dikare rejîma heqîqetê îfşa û "şideta dewletê îfade bike" û bike ku heqîqeta mixalif jî xuyabartir bibe.[77]

Li hemberî "heqîqeta têkoşîna bi terorê re" ya ku dewlet hewl dide bi amrazên Rewşa Neasayî wê qewî bike û rejîma heqîqetê, îcar "heqîqeta têkoşîna azadiyê" ya ku bi kiryara çekdar, partiya siyasî, civaka sivîl û *serhildanê* tê jiyandin û rejîma heqêqetê ya mixalif cih digirtin. Helbet rejîma heqîqetê ya mixalif ji têkiliyên desthilatê ku rejîma heqîqetê ya fermî xwedî wan e, ji binyada sîstematîk û sazûmanî, ji perwerdehiyeke serwer û berbelav, ji tora hiqûq, tib, medya, akademî, kar û hunerê, ji hêza aborî û fînansî mehrûm e û divê mirov teslîm bike ku newekheviya heyî ya vê mehrûmiyetê jî şideta nijadperest û mêtingehkar a dewletê zêde kiriye. Li hêla din, ez xwedî wê qeneetê me ku ev newekheviya hanê, meşru nake ku cext li lêgerîna rabêjî û kiryarên ku şer didomînin, aştî, heqîqet û edaletê bê kirin. Bi ser de, ez difikirim heqdariya ku newekheviyê ew afirandiye têr nake hêzê bide amûrên ji bo lêgerîna maf.

Ocalan ku wisan tê fehmkirin ji analîza Foucault a eleqedarî têkiliya desthilat û heqîqetê agahdar e, di nivîsa xwe ya bi mêjûya 2013'an de têgiha rejîma heqîqetê ku wekî "şiroveya xwe" pêşkêş kiriye û mîna "mitefîka herî saxlem a rejîma istismara siyasî" terîf kiriye, dibêje ku "karê herî cidî yê wek metod divê em bikin, terkandina vê rejîma heqîqetê ye" û diyar dike ku hewce ye "ji her cebheyî ve li hemberî rejîma heqîqetê ya sîstemê reftariya neyînî bê kirin."[78] Ramanên ku wî di slogana "Hakikat Aşktır, Aşk Özgür Yaşamdır!" (*Heqîqet Eşq e, Eşq Jiyana Azad e*!) guncandiye, bi wesîteya notên dersê ku tê de beşeke bi sernavê "Rejîma Heqîqetê" û li ser berga

---

[77] Toplum ve Kuram. 2014. "Geçmişin İşlenmesi Ne Demektir?" *Toplum ve Kuram*. 9: 19.

[78] Abdullah Öcalan. 2013. *Demokratik Uygarlık Manifestosu. I. Kitap. Uygarlık. Maskeli Tanrılar ve Örtük Krallar Çağı*. Abdullah Öcalan Sosyal Bilimler Akademisi Yayınları: 29-31.

wê slogana dabaşa mijarê û wêneyê bi îbareya “Şehîd Malda Kosa Anısına” (*Ji bo Bibîranîna Şehîd Malda Kosa*) hene, li Rojava hildane mifredata perwerdehiyê.[79] Çendî xebitîna ji bo rizgarkirina heqîqetê ya ji bin nîrê serweriya fermî hewce û têkoşîneke giring be jî, lê ji bo bipêşxistina siyaseta heqîqetê ya nû û aştiyane em dikarin bibêjin ku ev têkoşîn, wekî ez dê di beşa dawî de li ser bisekinim, divê li “pevçûneke heqîqetê” bê dagerandin.

Di sala 2016’an de, meha Sibatê ez çend caran çûbûm Sûrê; wekî hemû gelê Sûrê, ez duçarî çûnûhatina wesayîtên zirxdar, merasîma bihurînê ya leşker û polîsan bûbûm. “Modela xwebirêvebirin-xweseriyê” ya ku Ocalan “di pêvajoya çareseriyê de anîbû rojevê” [...] li gel îdîayên” stratejiya ku di bin wesayet û welayeta çekdar de bi gelê kurd didin qebûlkirin”, dihat nîqaşkirin ku destanên qehremanî û berxwedanê yên li pey kesên mirî hatine nivîsandin têrî zindîkirina ruhê serhildanê yên li salên 90’î nake.[80] Jixwe di wê heynê de, ku min li MedNûçe TV’yê temaşe dikir, ku bi awayekî birêkûpêk hişyarî dihat kirin ku “berteka li dijî midaxeleya dewletê tê dayîn, ne li gorî wê pêwîstiyê ye ku tê xwastin” û di pey re banga ku divê her roj beşdarî li karbedanê ya di navbera 13.50-14.00’yan de, saet li 18.00’an jî beşdarî li derxistina deng û kiryara vemirandin û pêxistina roniyê were kirin. Li semta Ofîsê ya bajêr, ku ew ji ber guhnedana bangewaziyê dihatin tawandarkirin, pankarta ku li serê “Sur halkının yanındayız” (*Em li cem gelê Sûrê ne*) daleqandî bû.

Dîsan di heman rojan de, ez beşdarî merheleya dawî ya civana (jivana) Amedê ya kampanyaya îmzayan bûbûm ku Teşebusa Jinan a Ji bo Aştiyê, bi slogana “Em ne ji aliyê mirinê em ji aliyê jiyanê ne” li dar xistibû. Dayikên ku ji bo cesedên zarokên xwe yên di lihevxistinên Sûrê de miribûn wergirin, li Sumerparkê nobet digirtin û jinên ku ji Stenbol û Enqereyê dihatin da “nobeta aştiyê” destek bikin, jinên Amedê ew pêşwazî dikirin. Yek ji sloganên ku jinan ew diqiriya, bi awayê “hezar silav li gerîlayan/li jinan ku li Sûrê li ber xwe didin”, bû. Teşebuseke ku ne ji aliyê mirinê lê ji aliyê jiyanê bû, silavkirina li gerîla çendî di şertê şer de dibe were îzahkirin jî, lê ev silav dikare wek yek ji rabêjiyên ku ji aştiyê re xizmet nake bihata dîtin jî. Jin heman roj vegeriyan; çendî fotograf û nivîsên ku di medyaya civakî de hatin parevekirin berevajiyê vê yekê nîşan bidin jî, tesîra kiryarê sînordar ma. Ez wisan fikirîbûm sedema tekane ne ew bû ku wê rojê jin tirsîbûn bi hejmareke zêde nehatibûn Sumerparkê û tacîzkirina dewletê ya vê teşebusê û yên mîna wê bû, lê ew bû ku rejîmên heqîqetê yên dewletê li ser lingan

[79] Devrimci Eğitim-Broşür. 2020. Rojava Jineoloji Andrea Wolf Enstitüsü İlk Eğitim Devresinden Notlar: https://jineoloji.org/tr/wp-content/uploads/2020/09/Revolutionary-education-turkish-1.pdf [12.03.2021].

[80] Binêrin Barış Özkul. 2015. Kürt Meselesinde Yeni Durum. *Birikim*. https://birikimdergisi.com/haftalik/7384/kurt- meselesinde-yeni-durum [05.01.2021].

dihêle, ji îhtimala aştiyê xurtir bûn.
Pirsên ku sivîlên hatine kuştin çawan û kengê, bi zorê yan jî bi dilê xwe tevî vî şerî bûne, rewşa wan a dilxwazî û mecbûriyê û tevî nîqaşkirineke eleqedarî desthilata PKK'yê û ya heqîqeta mixalif, têra xwe xwedî giringiyê ne; hem heqîqetên têkildarî sedemên binyadî yên şer hem jî yên Pêvajoya Çareseriyê li xwe digirtin. Jixwe yek ji daxuyaniyên ku dibe ji van pirsan re bibe bersiv, di mêjûya 21 Kanûna Pêşîn 2015'an de ji Murat Karayilan hatibû ku wî beyanat dabû rojnameya Yeni Özgür Politikayê:[81]

> Xendeq û barîkat li dijî jenosîda siyasî bi pêş ketibûn. Ji vî aliyî ve, bi awayekî esasî xendeq wek rêbazeke parastinê ketine rojevê. Helbet di destpêkê de pêvajoya lihevxistinê ya li vir bi kevir, dar, molotof û tifingên nêçîrê dihat kirin, *lê bi pêvajorê re, ji ber xwe ve ber bi çekdariyê ve çûye.* Di tu demê de, ji aliyê me ve ji bo berxwedaneke wiha çek li bajaran nehatiye şandin. Lê belê *van mirovên ku di destpêkê de bi awayekî bêçek li ber xwe daye, bi awayekî her çûye bi derfetên xwe mecbûr mane ku xwe çekdar bikin.* Tabî mahiyeta van çekan û xwebirêxistinkirinê, yek bi yek girêdayî mahiyeta van êrîşan bû. [*cextkirin aîdî min in*]

Di îfşaeta Karayilan de, pirsên ku înkarê li îtirafê dadigerîne derdiketin: Gelê Sûrê çawan ji ber xwe ve ber bi xweçekdarkirinê ve çûye, bi derfetên xwe çawan mimkin bûye ku xwe çekdar bikin? Mahiyeta van çekan, yanî esil û wesifên wan, çawan bûye ku girêdayî mahiyeta êrîşan maye? Di rapora HDP'yê ya Sûrê de, ku ew yek ji wan metnan e da bikare bi awayekî ne rasterê be jî bersiv bide pirsan, ev hatine nivîsandin:

> Sepanên dewletê yên mîna girtina bi ser malan de, binçavî, îşkence, miemeleya xerab û wekî din, ku ji berê ve mirov aşinayên wan pêkhatinên nehiqûqî û neexlaqî yên dewletê ne, piştî Hilbijartinên Giştî yên 7'ê Hezîrana 2015'an bi awayekî leztir domiyane, di pey re jî li gelek cihan ji bo ku rê li ber girtina bi ser malan de, îşkence û miemeleya xerab bê girtin, ji aliyê ciwanên deverê ve xendeq hatine kolan û barîkat hatine çêkirin.

Di raporê de ne çekên ku Karayilan hebûna wan qebûl dike ne jî sûcên ku bi van çekan hatine kirin, derbas dibin. Tenê di rûpela 29'an de bi etifa "Sur Olayları İnceleme Raporu" (*Rapora Lêkolîna Bûyerên Sûrê*) ku ji aliyê Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TİHV), Odeya Tabîban a Amedê û Komeleya Mafên Mirovan (İHD) ve hatiye weşandin, tê veguhastin ku "[...] li derdora Camiya Qurşûnî, di mêjûya 6 Îlon 2015'an de ji aliyê mensûbên Tevgera Ciwanên Welatparêz û Şoreşger (YDGH) ve li dijî ekîba polîsan

[81] http://www.insanhaber.com/guncel/karayilan-hpg-sehre-inmedi-ama-dahil-olabilir-h53718.html[03.12.2020].

êrîşa biroket hatiye kirin."[82] Wekî di beşa dawî ya raporê de ku bi awayekî rast hatiye îfadekirin, hewlên di serî de ji bo mafê jiyanê yê sivîlên ku li Sûrê dijîn, her cure binpêkirina giran a mafên mirovan û hewlên ji bo sekinandina van îhlalan hatine kirin li xwe digire, rapor "îfadeya wan rastiyan e ku divê ebed neyên jibîrkirin." Lê divê em bi bîr bixin ku ev heqîqet jî di çarçoveya heqîqeta siyasî ya diyar de hatiye veguhastin. Îfadeyên Serokê Şaxa Komeleya Mafên Mirovan a Amedê Racî Bîlîcî ku di raporê de cih digirin, xwedî wî wesifî ye ku vê çarçoveyê derdibe.

> Di vê bûyera xendeqan de, tu medodeke şer ne minasib e. *Tu rêbazeke lihevxistinê ne rast e.* Tu kes jî napejirîne. Eger em bi encamên wê ve nîqaşê bikin, em ê xeletiyê bikin. *Hewce ye em dakevin kan û jêderkên şer. Encam çi ye?Va vî kesî ev kuşt, encam e ev. Çima kuşt? Hewce ye em vê nîqaş bikin.* Çima ev ciwan xendeqan dikolin, divê em vê nîqaş bikin. [...] mesele çareserî ye, rê û rêbazên demokratîk e, bipêşxistina têkiliyan e, diyalog e, mizakere ye. Eger ev nebe *wê yek rabe xendeqan bikole, wê yek derkeve şer bike, wê yek biçe çalakiya rûniştinê bike, yanî metod dikarin bên nîqaşkirin, ew tiştekî din e.* Lê eger hûn li ser encamê nîqaşê bikin, hûn ê xeta bikin. [*cextkirin aîdî min in*]

Bîlîcî gava lê zêde dike dibe ku metod bên nîqaşkirin, lê bi bîr dixe ku ew lihevxistina dibêje tu metodeke wê rast nabîne, dibe ku îcar ew bê mafdarkirin. Dibêje "Va vî kesî ev kuşt" ne encam lê ji pirsa "çima kuşt" re sedemên ku wek bersiv dikare bên dayîn, divê bên nîqaşkirin. Li vir "kesê" ku behs jê tê kirin ji ber ne leşker an jî polîs e, em fehm dikin ku dixwaze sedemên kê kî kuştiye bên nîqaşkirin. Li hêla din, wekî em di îtirafên failên sûcên dewletê kirî de dibînin, em dikarin bibêjin ku eger sedem bên nîqaşkirin, sûc û sûcdar dê bên nexuyanekirin.

Em dizanin ne mimkin e ku dewlet îdareya xwe ya derî hiqûqê ya li Kurdistanê û şideta xwe ya li dijî sivîlan a derasayî mafdar bike; ev îdare û şidet, rewşeke wisan e ku meşrûbûna siyasî ya dewletê ya li Kurdistanê ji holê radike. Li hêla din, ev rewşa ku dibe bi kêrî mafdarkirina lihevxistinê were, wek amûr xizmetê ji mafdarkirina şidetê re jî dike. Wekî Arendt jî derdibe, ji ber ku divê ne armanc lê amûr be û qada siyasî tune dike, şideta ku nabe "were meşrûkirin" - lê û helbet- em tim dikarin wê mafdar bikin.[83] Eger em bi awayekî din bibêjin, çendî şidet wek amûr bê mafdarkirin bila bê kirin, meşrûbûnê bi dest naxe û loma wesifê xwe yê cezayî winda nake ku têkoşîna bi bêcezatiyê re, parçeyekî neveqetînbar ê îtirazkirina li "meşrûbûna" şideta dewletê ye. Ji

82 https://www.hdp.org.tr/Images/UserFiles/Documents/Editor/Surraporu.pdf [04.12.2020]. Di raporê de jî ku etif lê hatiye kirin, îbareya PKK nîn e: https://www.ihddiyarbakir.org/Content/uploads/8778d5e1-126a-4312-b59b-edea254893e6.pdf [04.12.2020].

83 Hannah Arendt. 1972. *Crises of the Republic*. A Harvest Book: 161.

ber ew bi xwe amûr e, îşaret bi nebivênevêtiya şidetê dike, berevajî îşaret pê dike ku ew tim mijara tercîhê ye; wekî ku Bîlîcî jî îfade dike ew tiştegî nîqaşbar e; nemaze gava sivîl dabaşa mijarê bin û di konteksta mebesta aştiya mayînde de, îşaret pê dike ku dê ebed meşrûbûnê jî bi dest nexe.

Çendî şideta bêsînor a rejîma *apartheid* a li Afrîkaya Başûr û cemserbendiya reş-spî ya li civakê her cure tercîha kiryara terorîst wekî ku mafdar bike bixuye jî, pêşewayên Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê (ANC) ji bo ku bikin îdareya mêtingehkar bêfonksiyon bimîne, di kiryarên sabotajê de jî -li ser navê da bi îdeolojiya li dijî nijadperestiyê ve girêdayî bimînin ku wan ew diparast- xwe ji mirina sivîlan dûr girtibin, li gel hemû kêmasiyan îdîayên ku aştiya pêk hatiye bûye sedem da ku zêde bi derengî nekeve, jixwe ji îdîayên ku şidet bivênevêtiyê li xwe digire hîn kêmtir derbasdar xuya nake.[84]

Di daxuyaniya Bîlicî de ya li jorê, îşaret bi meseleyê dike ku difikire ew bûye sedema xendeq û mirinan, yanî bi awayekî heqdar, aşkera ye ku dixwaze îşaret bi neçûna serî ya Pêvajoya Çareseriyê û berpirsiya dewletê ya pêkhatina serkeftînebûna vê yekê, bike. Jixwe di dema Bûyerên Xendeqan de, ji bo lêkolînekê ku ew bûbû sedem ez li Amedê bim, min gava pê re hevdîtinek dikir gotibû ku di bin ranêzikiya pêvajoyê ya dewletê de "fikira aştiyê" nîn e, rêxistinên civaka sivîl ên ku dê pêvajoyê hêsan bikin ji xwe re nake mixatab, wek nimûne rola navbeynkariyê ku wan bi xwe daxwaz kiribû jî, dewlet nêzikî nirxandina vê yekê nebûbû.[85] Vegotibû ku gava di raporên xwe de cih didan rexneyên xwe yên li dijî PKK'yê yan jî ya mirina sivîlan a ku ji PKK'yê diqewimî, ne "di organên weşanê yên nêzî PKK'yê de" ne jî di medyaya dewletê de xuyabar dibûn; li hêla din, dema bal dikişandin ser mirina sivîlan ku ji ber bi giranî ji dewletê diqewimî, îcar ew wek teref dihatin dîtin û dewlet bi pêşhikumî nêzikahî di wan dida.

Serokê Şaxa "İnsan Hakları ve Mazlumlar İçin Dayanışma Derneği- MAZLUMDER" (*Komeleya Mafên Mirovan û Piştgiriya Ji bo Mezlûman*) a Amedê Abdurrahîm Ay, ku gotibû di dema Bûyerên Xendeqan de li gorî xwastina xwe nikaribûne biraporkirinekê çêkin jî, diyar dikir ku li cihên qedexeya derketina kuçeyan li wan dihat sepandin, "ji ber ku ji aliyê hêzên ewlehiyê ve bêyî hedef bê girtin an jî bi mebesta qutifandin û serkutkirinê, rewşa lihevxistinê bi awayekî bêyî paxav dihat bikaranîn" mirina gelek

---

[84] Jeff Goodwin. 2007. "The Struggle Made Me A Nonracialist": Why There Was So Little Terrorism in the Anti*apartheid* Struggle. *Mobilization*. 12(2): 193-203; Mac Maharaj. 2008. *The ANC and South Africa's Negotiated Transition to Democracy and Peace*. Berghof Transitions Series No. 2. Berghof Foundation; Ji bo teşebusên sivîl ku ETA îqna kirine dev ji çekan berde binêrin Basque Permanent Social Forum. 2017. *ETA's disarmament in light of international DDR guidelines: Lessons learnt from an innovative Basque scenario*. Berghof Transitions Series No. 12. Berghof Foundation.

[85] Hevpeyvîna bi Raci Bilici re. 12.02.2016. Diyarbakır.

kesên sivîl çêdibûn û rapora wan xwedî wesifekî wisan bû ku dikarî “hikûmetê bike rewşeke zor” jî, ev li axaftina xwe zêde kiribûn:[86]

> Rapora me ya Farqînê pir baştir çêbû. Em wisan difikirin. Heta ji Karayilan tehdîteke sergirtî jî li me hatibû kirin. Me ewk gotibû: [...] Divê PKK lihevxistinê ji qada sivîl bide alî. Bi awayê ku feraseta ev terz xendeq, barîkat, ev terz xwebirêvebirin ne rast e. Ji lew re me digot di encamê de jiyana rojane ya mirovan a sivîl hecir dike, sînordar dike û taybetiyeke cezbkirinê ya midaxeleya dewletê li xwe vedihewîne [...] ji bo ku otorîteya xwe çêke dê bibe wesîleya ku dewlet şidetê bi kar bîne û [...] ya rast ji vê rêxistin bi xwe jî berpirs e. [...] Karayilan bi awayê “Heyeteke Mazlum-Derê hatiye Farqînê, ji me re wiha gotiye, em vê qebûl nakin, ev kiryara gel bi xwe ye. Rabêjiyên wiha ne rast in” daxuyaniyek da.

Ne mimkin bû ku mirov nizanîbe Pêvajoya Çareseriyê ji aliyê dewletê ve bê çi qas zor dihat meşandin û bi hikumranî û fermankeriyê kar dikir ku navê aştiyê jî li pêvajoyê neyê kirin -ku dewlet bi xwe jî dixwast bide nîşandan bêyî ji vê helwesta xwe ya mizafer tawiz bide- pêvajo dimeşand. Li aliyê din, çawan ku tu aliyek nîn bû bêyî îhtirazê/rezervê vê pêvajoyê destek bike, grûpên xwedî rezerv û ferasetek aştiyê ya ku teref lê bibin hevpar û îradeyeke sivîl ya ku vê ferasetê biparêze jî nebûn. Helbet tek misebîbê kêmasiya vê îradeyê, ne rêxistinên mafan û saziyên civaka sivîl bûn ku nêzî terefan disekinîn; lê belê bi awayekî giştî ez difikirim ku li gorî aktorên mihafezekar ên binyad-xizmetî û xwedî wesifê sivîliya dewletparêz, potansiyala çêkirina îradeyeke aştiyane û sivîl a aktorên mixalif ên ku xwedî îdîaya pêşverûtiya çandî û entelektuelî ne, hîn bêhtir e.[87]

Em dikarin bibêjin ku bi awayekî giştî aktorên sivîl ên mixalif, meyleke wan a wisan heye ku şideta PKK’yê ya ku xwedî îdîa ye îradeya gelê kurd temsîl dike, hîn kêmtir problematîk bikin û ev meyl, wekî me di beşa berê de jî nîqaş kiribû, dirêjî heta salên 90’î dibe. Gotinên ku Abdullah Ocalan di sala 1992’yan, di bernameya “32. Gün”ê de kiribûn, der heqê diyardeyên siyasî û civakî de emare dida ku dikir şideta PKK’yê bibe tiştekî bivênevê û nenîqaşbar.[88]

> AO: *Têkoşîna çekdarî* bi tenê ne teqîna çekan e, *konsantrebûna îdeolojîk a herî zêde ye*. [...] *Têgihîştina herî realîst a polîtîkayê ye* [...] ev hinekî ji bo kurdan wisan e.

---

[86] Hevpeyvîna bi Abdürrahim Ay re. 11.02.2015. Diyarbekir.

[87] Ji bo ceribandina rexnekirina bi awayekî giştî ya qelsiya entelektuelî ya rastê tirk û feraseta wan a civaka sivîl binêrin A. Tarık Çelenk. 2017. *Türk Sağının Düşünce Atlası: “İnsanı Yaşat ki Devlet Yaşasın”*. Mahfil.

[88] “Abdullah Öcalan Röportajı” https://www.youtube.com/watch?v=iJ91JxQJt44 [23.11.2020]. Di bernameyê de, ku Mehmet Alî Bîrand amade û pêşkêş dikir, dîmenên ji kampa PKK’yê ya li Geliyê Bekayê û yên ji mala Ocalan a li Şamê jî hene.

*Ya ku tenê wan bike mirov, hinek, ji ber ku ji vê amûrê pê ve rêyeke bipêşketinê ji wan re nehatiye hiştin diqewime, ma çima hûn fehm nakin?*

[...]

MB: [...] Di nav kiryarên we yên kirî de yên wisan jî hene ku... ...

AO: Ez difikirim, encamên wan kiryaran ez çawan radigirim, hûn pê dizanin?

MB: Yanî, gel, ew gelê ku hûn lê dixebitin biparêzin, ji aliyekî ve hûn gel ji xw re nakin reqîb?

AO: Hûn dizanin, wezîfeyên ji bo gel çawan tên bicihanîn? *Ew kiryarek e, wek sedemeke lêhûrbûnê li ser tê sekinandin* [...] û *bi vî awayî da ku ji bin barê giran ê wicdanî xwe xelas bikin hewl tê dayîn.* [...] Bê bîra te min gotibû kêşeyeke we ya pêşewatiyê heye û ev krîz hîn jî çareser nebûye [...] Ez dikarim hemû PKK'yê girê bidim. *Gelê kurd bi mirina xwe ve li gotina min guhdarî dike.*

MB: Yanî hûn hemû gelê kurd...

AO: Piraniya zêde. [...] Me ev yekîtî pêk aniye. Li gotina min guhdarî dike. Binêre, bêşert û sînor dipeyivim, *wisan erzan qethî kes nikare li dij ranabe.*

Rêxistinên mafan ku têkoşîna çekdarî wek konsantrebûna îdolojîk a herî bilind û bi awayê herî realîst a têgihîştina ji polîtîkayê, kuştina sivîlan jî wek kiryara lêhûrbûnê nabînin, tercîhkirina wan a ku têra xwe qetliaman nayînin rojevê, dikare wek helwestgirtina wan a li aliyê îradeya gelê kurd û têkoşîna azadiyê bê dîtin ku di PKK'yê de berceste dibe. Li hêla din, bi navê gihandina ziyanê ya li heqîqeta fermî û xuyabarkirina heqîqeta mixalif, xwe danîna li nedîtana hin heqîqetên diyardeyî, wisan dixuye ku nebûye sedema derbexwarina îdraka heqîqetê, cemserbendiya ku rejîma şer ew afirandiye û nexuanebûna rabêjiya aştiyê. Cuma Çîçek dibêje ku di salên 90'î de saziyên civaka sivîl hewl dida ku ji aliyekî ve li hemberî êrîşên dewletê li ser lingan bimînin li aliyê din jî bi taybetî lê dixebitîn ku qeyda îhlalên mafan ên dewletê bigirin, bi awayekî giştî ew di pozîsyoneke welê de bûn ku ne "rol distandin" lê ji aliyê îradeyên ku wek siyaset angajeyî wan bûn "rol li wan dihat dayîn" û li hemberî raya giştî ya ku destek dida şer jî bêkifayet mane ku rizayeke civakî ya xwe dispêre daxwaza aştî û adalete çêkin.[89] Derketina derveyî tercîhên ku rejîma şer ew li mirov ferz dikin; tesewirkirina metoda lêgerîneke heqîqetê ya aştiyane da ku heqîqetên fermî û mixalif nêzî rejîma aştiyê bikin, îroj jî wek tercîheke siyasî ya ku bedêla wê giran e, li rastê heye.

[89] Binêrin Cuma Çiçek. 2017. *2013-2015 Çözüm Süreci'nde Sivil Toplum Kuruluşları*. Barış Vakfı Yayınları: 27-29, 35-37.

***Lêgerîna Heqîqetê ya Aştiyane***

Rejîma şer a Tirkiyeyê ku bi lihevxistina her rejîmên heqîqetê tê perçinandin, eger mirov lê zêde bike bibêje tim lêgerîneke çareseriyê û aştiyê ya terefan li xwe digire, dê li cih be. Her çendî ji ber sedema texeyûlên çareserî û aştiyê yên ji hev cuda yên aliyan, fonksiyonîtî û tirûşiya rejîma şer a ku digihîjin roja me neketibe kemala xwe jî, hinekî jî ji elastîkiya ku îmkan dide lêgerîna çareserî û aştiyê, diqewime. Hem PKK, ku bi berdewamiya salên 90'î di encama mizakerayên bi dewletê re agirbest îlan kirin, hem jî dewlet, ku bi bi berdewamiya salên 2000'î da ku bi Ocalan re mizakereyan bike mase ava kirin, rejîma şer bi lêgerîna çareserî û aştiyê re dimeşîne.[90] Bi puxteyî, em dikarin bibêjin ku rejîmên heqîqetê yên em lê dixebitin wan hildin dest, li gel ku xwe dispêrin feraseteke siyasetê ya ku di lewleba lihevxistin û çareseriyê yan jî di ya şer û aştiyê de daleqandî ye, li dawiyê bi şekilê rejîmeke şer dixebite û texeyûla lêgerîna heqîqetê ya aştiyane ku berek dide vê xebatê jî, xwedî wê mebestê ye da siyasetê ji lewlebê bifilitîne û rejîma şer nêzî rejîma aştiyê bike.

Gava min di çarçoveya lêkolînê de "kronolojiyeke aştiyê" amade dikir ku min di beşa berê de jê behs kiribû, hemen piştî serdana duyem a heyeta Îmraliyê ya bi Ocalan re, yanî di mêjûya 23 Sibat 2013'an de ez rastî nüce û dîmenê ragihandina avakirina Tevgera Ciwanên Welatparêz û Şoreşger (YDGH) hatibûm û nemaze li wexta pêvajoya vekişîna PKK'yê ya ji nav Tirkiyeyê, min li merasîmên sondxwarinê yên YDGH-Asayişê li bajarokên cuda û bi taybetî li Cizîrê temaşe kiribû. Berevajî daxuyaniya Karayilan a ku min li jorê jê behs kiribû ku tê de gotibû "Xendeq nebûna jî dê ev êrîş bihatina destpêkirin. Jixwe gava agirbest xera kirin û dest bi êrîşan kirin xendeq tune bûn", min bal kişandibû serê ku di Çiriya Pêşîn a 2014'an de xendeq hatibûn kolan û di Kanûna Pêşîn de jî hatibûn girtin, lê di pey midaxeleyên şedît ên dewletê re cardin hatibûn vekirin.[91] Ez wisan fikirîbûm, gava mirov ev cure teşebusên ku di wexta berdewamiya Pêvajoya Çareseriyê de derketibûn holê, protestoyên Kobaniyê, înşaeta qalekolan, texrîbkirina gorên HPG'yiyan û gulereşandina li ser kesên ku ev rewş protesto dikir, pirsgirêkên têkildarî vekişîna PKK'yê û meseleyên mîna van jî li pêş çav bigire, ev nîşandereke mafdar a pênebawerbûnê ye.

Li encamê, dixwazim sûcên li dijî mirovahiyê yên ku dewletê kirine bibînim, nîşan

---

[90] Ji bo dîrokçeya "Lêgerînên ji bo lihevkirina li ser lihevxistina kurdî" binêrin Cuma Çiçek. 2018. "*Süreç" Kürt Çatışması ve Çözüm Arayışları*. İletişim: 143-209.

[91] "Xendeqên pêşî yên li Cizîrê di heyna protestoyên Kobaniyê yên 6-7'ê Çiriya Pêşîn de hatin kolan. […] di destpêka Kanûna Paşîn de ji xendeqan şeşên wan ji aliyê Şaredara Cizîrê Leyla Îmret ve hatibûn girtin. Îmret ku bi Al Jazeerayê re peyivîbû, gotibû ku ew difikire tenê bi rizaya wan kesên xenqeq kolane hemû xendeq dikarin bên girtin." http://www.aljazeera.com.tr/haber/cizrede-hendekler- kapatildi [04.12.2020].

bidim û bikim ku bêceza nemîne, ku di şertên aştiyê yên temendirêj û biheysiyet de, ez wan ji hêmanên esilî yên lêgerîna heqîqetê û têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re dibînim. Lê dîtina wek tercîheke siyasî ya rast a îtirazkirina li heqîqeta resmî û rejîma heqîqetê, dikare bike ku avakirina heqîqeta fermî ya mixalif û rejîma heqîqetê wek meseleyeke talî bê dîtin û ya giring dikare xizmetê ji talîkirina aştiyê bi xwe re bike. Gava em lêgerîneke heqîqetê tesewir dikin ku bike rejîma şer li rejîma aştiyê dagerîne, gelo di nav çarçoveyekê de taqîbkirina heqîqetên diyardeyî yên ku ne pêgirtiyê rejîmên heqîqetê ne mimkin e yan na û ji bo bipêşxistina lêgerîneke heqîqetê ya aştiyane da ku îdraka heqîqetê tamîr bikin jî em dikarin bergindên wan ên siyasî û civakî lêkolîn bikin.

Bi awayekî giştî li şûna lêkolînên biteferûat û zanyariyên eleqedarî sedemên şer û encamên şer li xwe vehewînin, lêgerîneke heqîqetê ya ku ji klîşe û qaliban pêk tê û xîtabî hisiyatê dikin da ku vegotinên mezin ên zidî hev zexm bikin û bi şiroveyên xwedî binyata nêrîn û qenaetan hatine şêwandin, ji bo şiroveya mijara dabaşê destek bikin serî li rêya hilbijartin û veguhastina heqîqetên diyardeyî tê xistin; bi gotineke din bi qasî heqîqetên ku tên gotin heqîqetên ku nayên gotin jî, ez wisan difikirim ku divê ji aliyê lêgerîneke heqîqetê ya aştiyane ve di ber çavan re bê derbaskirin. Divê mirov bi bîr bixe ku kronolojiyên hilbijêr ên li ser mafdariyê hatine avakirin û heqîqetên kêm, di warê rejîmên heqîqetê di şekilê rejîmên şer ên nijadperest de dişixulin, yanî di honandina vegêranên neteweperest de jî tên bikaranîn. Jixwe wekî ku em dê di qisimê bê de nîqaş bikin, îtirazên klîşebûyî û qalibbûyî jî dikin ku nijadperestî dest biavêje husnûtebîran ku zêde xuya nebe û wisan didin nîşandan ku tenê ew “heqîqetên raserî siyasetê” tîne zimên; a rast, bi ya min para van cure îtirazên prensîpkirî di vê yekê de heye ku ew dibin sedem mesele li derveyî siyasetê bên hiştin.

Pêşniyaza lêgerîna heqîqetê ya aştiyane, hebûna “heqîqeteke aştiyane” an jî payîna li peydakirinê wê texeyûl nake, nexwe ev dê berî her tiştî bibûya çewtiyeke siyasî; fikira lêgerîna heqîqetê ya “aştiyane”, fikirîna li ser metoda lêgerîneke heqîqetê ya ku dê ji aştiyê re xizmet bike, li xwe vedihewîne. Ji rexneyeke ku xizmetê li çêkirina rejîmên heqîqetê yên fermî û mixalif dike, ji awayê şixulîn û miqaweta wan a eleqedarî têkiliya heqîqet û desthilatê, nemaze jî, ji rexneyeke eleqedarî metodên lêgerîna “heqîqeta mixalif” a li dijî “heqîqeta fermî” ya ku parçeyekî edaleta dewra derbasîbûnê û pêvajoyên rarûbûna bi raboriyê ye, ji rexneyeke tehekûmê ya di rewşa teyaqûzê de, xwedî dibe. Ew ne xwedî nîşandana rêyeke normatîf û exlaqî, lê xwedî mebesteke wisan e ku dixwaze rê ji nîqaşeke teswîrker û siyasî re veke. Bi gotineke din, heqîqetên diyardeyî ne bi çarçoveya heqîqetê ya ku rejîmên şer ferz dike, lê xwedî wesifekî bangkirina fikirîna li ser metodan e ku ew bikin da amûrên qirêneke hiqûqî û civakî ji bo bilindkirina daxwaza aştiyê û lêgerîna heqîqetê veguhêzîne û xuyabartir bike.

Helbet mimkin e ku mirov bibêje lêgerîna heqîqetê ya aştiyane, di serî de îradeya terefan, wekî têkiliyên desthilata heyî û terazên îdeolojîk, ne yek ji faktorên sereke ye ku rewşa teşebusên çareserî û aştiyê diyar dike. Lê belê aktorên sivîl ên ku aştiyê diparêzin û ne mimkin e li ser guherîna van faktoran rasterast fokûs bibin, bi boneya lêgerîna heqîqetê ya aştiyane, mexdûrên cuda yên terefên cuda û meseleyên wekî nijadperestiya sîstematîk û şideta nijadperest ên ku gelek beşên civakê duçarî wan bûne, di nav derfet û berpirsiya wan de ye ku ji aliyê ranêziya xwe ve wan ji xwe re bikin derd û bikin mijara pêvajoyê, da hem van cure meseleyên ku di bingeha şer de hene çareser bikin hem jî ji pêvajoya aştiyê re bibin destek. Li şûna bikaranîna van derfetên hanê û girtina ser xwe ya van berpirsiyan, rexnekirina li aktorên sivîl ên ku berê xwe dane zêdekirina gazinên eleqedarî pêvajoyê, ya rast li nik van cure aktoran, ji bibîrxistina rola potansiyel a civakê ya di pêvajoya aştiyê de pêk tê.

Bi awayê mîna uslûba aştiyê ya ku neasayî ye û ne fehmbar e, gotina ku dê lêgerîna heqîqetê ya aştiyane jî çawan bê bipêşxistin û berbelavkirin, wek nimûne ji tesbîta uslûba şer û tercîhkirina wê hîn zortir e. Li hêla din, ew gotina "xwişk û biratiya tirk û kurdan", ne ku tenê klîşeyî bûye, ji ber ku heqîqetê teslîm nake, yanî ji ber ev xwişk û biratiya hanê ya ku di eleyhiya kurdan de ye jî teqabilî nixamtina ser wê rastiya hiyerarşiya nijadperest û mêtingehkariyê dike, jixwe ne hewce ye mirov bibêje ew sloganên ku ji aliyê aştiyê ve ne xwedî wate û giringiyê ne, li uslûba aştiyê nayên.

Bi lêgerîna heqîqetê ya aştiyane, qesta me ew e ku heqîqetên diyardeyî yên ku rejîma şer a ji rejîmên heqîqetê xwe xwedî dike bihejikîne, di konteksta aştiyê de bi cih bibe û bigihîje çarçoveyeke hiqûqî, siyasî û civakî ya ku xizmetî aştiyê dike. Konteksta aştiyê ku heqîqetên diyardeyî hewcehî pê dibînin, dibe ku çarçoveyeke welê be aliyên cuda yên van heqîqetan li xwe bigire û wisan bike ku ev heqîqet li wan kêşe û pêwîstiyên sereke were ku qisimên civakê yên din jî eleqedar dike. Lêgerîna heqîqetê ya aştiyane, dikare mîna qirên û pevçûneke heqîqetê jî bê fikirandin ku têkoşîna ji bo berbelavkirina îtiraza li rejîmên heqîqetê û meseleya rarûbûna bi raboriyê re, mundemîçî hewla têkildarkirina bi têkoşîna dijberî nijadperestiyê be.

***Pevçûna Heqîqetê***

Foucault, dibêje erka entelektuel ew e ku ji bo pozîsyonên desthilatê, aliyên wê yên xurt, nuqteyên wê yên qels tesbît bike ku îroj wê çiqil û gulî daye, bi awayekî tesîrdar dişixule, bi cih bûye û xwe hildaye bin temînatê, divê amûrên analîzê temîn bike, vê erkê jî eleqedarî qada şer a ku ji bo heqîqetê lê tê meşandin wek "lêkolîneke jeolojîk

û topolojîk" terîf dike.[92] Ji bo ku vî entelektuelî namzetî vê lêkolînê biresimîne jî serî li qiyaseyekê dide: Dibêje ku ji aliyê gerdûnî, klasîk û siyasî ve fîgura entelektuel, yanî entelektuelê "ku zanyariya xwe, pisporiya xwe û têkiliya xwe ya bi heqîqetê re di qada têkoşîna siyasî de bi kar tîne", ji kesê ku "gerdûnîtiya qanûneke adil datîne rastê, heta piştre vê li hemberî kesên ku hiqûq ji xwe re kirine meslek, dike", bi taybetî jî ji hiqûqnas-nivîskar çêdibe; fîgura spesîfîk û entelektuelê nû jî giringî û otorîteya xwe ji biyolojî û fîzîkê, ji belavebûna qada aborî û stratejîk a binyatên teknîk û zanistî werdigire, loma "te divê di xizmeta dewletê de be te divê li dijî dewletê be, li wî kesî dadigere ku ew wan hêzan di destê xwe digire ku dikare bi wan jiyanê xweş bike yan jî bi awayê ku vegerîna jê ne mimkin be wê tune bike."[93] Li aliyê din, dibêje rola vî entelektuelê nû, ji ber sedema ku "bivê nevê neçar maye berpirsiyên siyasî bigire ser xwe" her ku diçe dê hîn bêhtir giring bibe û lê zêde dike ku divê mirov dev ne ji vî entelektuelê spesîfîk lê divê dev ji nostaljiya hewcehiya entelektuelê gerdûnî berde.[94]

Foucault ku bi bîr dixe hêmana herî giring a entelektuelê nû dike spesîfik ew "siyaseta heqîqetê ya di civaka me de ye" û bi balê dikişîne serê ku bi vî awayî entelektuelê nû ne bi tenê di asta meslekî yan jî sektorî de, dikare bibe parçeyê têkoşîneke wisan ku dikare di asta rejîma heqîqetê de jî encamên tesîrdar derxe holê.[95] Ew ji têkoşîneke welê behs dike ku ji bo bikare di asta rejîma heqîqetê de encamên tesîrdar bide, ne ku wan heqîqetên li benda kifşkirinê û qebûlkirinê ne derxe rastê, divê xwedî tesbîta têkilî û qaydeyên desthilatê be ku ew rast û şaşiyê diyar dike, loma "divê ne pevçûnek be ku bi sedema parastina heqîqetê ya li dijî derewan an jî ya bi 'navê' heqîqetê tê meşandin; pevçûneke eleqedarî statuya heqîqetê û ya rola siyasî û aborî ye ku pê radibe."[96] Pirsgirêka siyasî ya ku Foucault di xusûseta entelektuel de terîf dike û pevçûna ku dibêje "li dora heqîqetê" tê kirin, ez difikirim ji bo lêgerîna heqîqetê ya di bingeha rarûbûna bi raboriyê re bi temamî derbasdar e û ji bo her kesê ku îtiraz li rejîmên heqîqetê dike jî watedar e:

> Ji bo entelektuel kêşeya sereke ya siyasî [...] ew pêzanîn ê bê ka pêkanîna *siyaseteke heqîqetê ya nû* mimkin e an na. Mesele ne guhartina ya di hişmendî û serê mirovan de ye; guhartina rejîma siyasî, aborî û sazûmanî ye ku heqîqetê hildiberîne. Tiştê dabaşa mijarê ye, ji her cure sîstema desthilatê ne rizgarkirina heqîqetê ye [...] ji teşeyên hegemonyayê yên civakî, aborî û çandî rizgarkirina hêza heqîqetê ye ku ew niha di wan de tesîrdar e. [...] Kêşeya siyasî ne xafilî, sawîr, hişmendiya havîbûyî yan

[92] Michel Foucault. 1980: 62.

[93] Michel Foucault. 2011: 79-81.

[94] H.b.: 82.

[95] H.b..: 83.

[96] H.b.: 83-84.

jî îdeolojî ye; heqîqet bi xwe ye.” [*cextlêkirin aîdî min in*][97]

Xebatkirina ji bo ku mirov heqîqetê ji sîstemên desthilatê bifilitîne, helbet tesewireke romantîk û apolîtîk e; lê belê mirov hewl bide da lêgerîna heqîqetê bêyî pêgirîbûna bi rejîmên heqîqetê bidomîne, tê bikoşe ji bo ku hêza heqîqetê ji serweriya van sîsteman bifilitîne, heqîqetê bi xwe bike rewşa meseleyeke siyasî, yanî ji bo ku mirov derxe holê bê ka kîjan heqîqet ji çi cure têkiliyên desthilatê re xizmetê dike, dikare wekî pevçûna ji bo heqîqetê bê dîtin. Di vê rewşê de, pevçûna ji bo heqîqetê ku mindemîcî têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re ye, wê tenê nebe pevçûneke sînordar a derxistina holê ya diyardeyên rejîma heqîqeta mixalif ku lê dixebite wan li dijî diyardeyên ku rejîma heqîqeta heyî ew kirine heqîqet, bike heqîqet.

Eger em bi tebîra Foucault bibêjin, xetên jeolojîk û topolojîk ên ku di têkoşîna serweriya li ser heqîqetê de tên taqîbkirin, yanî ev pevçûna ku dê bi şopandina hem rûbarên cuda û têkiliyên desthilatê yên heqîqetê hem jî tebeqeyên bêeleqemayîna li heqîqet û perîferiyên wê bê meşandin, dikare li rêyên îşaretkirina ji nû ve ya têkoşîna serweriya li ser heqîqetê bigere ku ew parçeyekî şerê fîzîkî ya di navbera rejîmên heqîqetê de ye û lêgerîna heqîqetê jî divê ku ne li yek ji wan terefên heqîqetê lê ji xizmeta aştiyê re bê pêşkêşkirin. Bi awayê ku bal lê bê kişandina bê heqîqet ji aliyê komên alîgirên têkoşîna heyî ve çawan tê nirxandin û ji nû ve tê hilberandin, mirov dikare li şertên daxilkirina wan koman bigere da ku ew tevî pevçûna ji bo heqîqetê û lêgerîna heqîqetê ya aştiyane bibin.

Em dizanin ku ji aliyê kesên di warê rarûbûna bi raboriyê re û lêgerîna heqîqetê de dixebitin, meseleya bingehîn bi tenê ne derxistina holê ya diyardeyên heqîqetan e. Em pê dizanin ku heqîqet ne tek e û ya rast hin heqîqet jî jixwe li rastê ne. Nexwe dibe ku mesele fikirîna li ser berxwedana li dijî cemserbendiya heyî, populîzm û tezahura nenazik û besîdkirî ya ku bi kêrî temeluka hestyarî û şexsî tê û şikandina konteksta kolektîf û siyasî ya heqîqetan be, li ser parkirina wan rêyan be ku heqîqet ne tenê ji bo lêgerîna li mafan, lê bi awayê ku xizmetê ji aştiyê re jî bikin. Meşandina pevçûneke heqîqetê ya ku lêgerîna li heqîqetê nirxdar bike, îdraka heqîqetê tamîr bike û rejîmên heqîqetê yên heyî bihejikîne, dibe ku mirov ji bo vê li ser eleqedariya alîkarîkirina wê ya mihtemel a berginda siyasî, mimkinî û herî giring avakirina aştiyê tesewir bike.

Foucault ku wexta desthilat ji bo hilberandina rabêjiyên heqîqetê serî li qaydeyên hiqûqê dixe û awayê tenzîmkirina mafan nîqaş dike, vedibêje ku teşeyên desthilatên dîsîplîner awayê şixulîna artêşan li civakê diguncînîn û ji xwe re dikin mexsed ku

[97] H.b.: 84-85.

civakê “normalîze” bikin.[98] Ev rejîma şer a ku bi şekilê mindemîcî siyasetê dişixule, bi rêya hiqûqê dijminên wekî anormal û nijadên cuda diafirîne û ji bo ku van dijminan bike heqîqî jî daneyan diafirîne. Desthilata ku heqîqetê hildiberîne, di heman demê de têkiliyên desthilatê yên ku nijad û nijadperestiyê hildiberîne jî dihone. Ji vî aliyî ve, em dikarin bibêjin ku ji bo xuyabarkirina sûcên li dijî mirovahiyê yên ku rejîma heqîqetê kirine û ew dane meşrûkirin, parçeyekî siruştî yê têkoşîna dijberî nijadperestiyê ye. Têkiliya di navbera rejîma heqîqetê û nijadperestiyê de, her wisan têkiliya di navbera têkoşîna dijberî nijadperestiyê û têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re, mijara qisimê duyem pêk tîne.

[98] Michel Foucault. 2002; Ferhat Taylan. 2013. Strateji, Norm, Yönetim: Foucault’nun 1978 Collège de France Dersleri. *e-skop*: https://www.e-skop.com/skopbulten/strateji-norm-yonetim-foucaultnun-1978-coll%C3%A8ge-de-france- dersleri/1701 [01.12.2020].

BEŞA DUYEM

# ÎTÎRAZA LÎ REJÎMA HEQÎQETÊ: RARÛBÛNA BÎ NÎJADPERESTÎYÊ RE

# Îtiraza li Rejîma Heqîqetê: Rarûbûna bi Nijadperestiyê re

Vê qisima ku ez dixwazim meseleya nijadperestiyê ya ku di bingeha rejîma heqîqetê de heye di konteksta têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re hildim dest, ji çar beşan pêk tê. Di beşa pêşî de min hewl da ku ez têkiliya nijadperestiyê ya bi neteweperweriyê re, tezahurên vê têkiliyê yên li Tirkiyeyê û seyra wê ya dîrokî nîqaş bikim. Beşa duyem ku teoriyên eleqedarî nijadperestî û têkoşîna dijberî nijadperestiyê û nirxandina wan li xwe digire, armanc dike hem nîqaşa eleqedarî Tirkiyeyê ya ku di beşa berê de cih digire temam bike hem jî roniyê bide ser nîqaşa der barê rarûbûna bi raboriyê re ku di beşa pey re cih digire. Di beşa sêyem de rexneyên li ser Komîsyona Heqîqet û Lihevkirinê ya Afrîkaya Başûr, lêkolîneke eleqedarî meseleya nijadperestiyê ya ku li Afrîkaya Başûr didome û ya ji aliyê rarûbûna bi nijadperestiyê ve sînorên qada edaletê ya dewra derbasîbûnê, cih digirin. Di beşa çarem de reaksiyonên nijadperest ên li dijî teşebusên çareseriyê yên li Tirkiyeyê tên nirxandin û rarûbûna bi raboriyeke li dijî nijadperestiyê, ku pêvajoyeke çareseriyê ya mihtemel wê pêwîst dike û têkoşîna aştiyê cih digirin; bi vî awayî ev qisim bi dawî dibe.

## 1. Rewşa Sade ya Neteweperweriyê: Nijadperestî

Nijadperestiya ku mindemîcî rejîma heqîqetê ya Dewleta Komara Tirkiyeyê ye, mîna her raman û kiryara ku bûye xwedî tiştekî asayî, nemaze di demên fewquladet de geşe bi xwe dide û xwe nîşan dide. Di bernameya “Siyaset Meydanı” (*Meydana Siyasetê*) ya bi mêjûya 15 Çiriya Pêşîn 2015’an de, ew mijara “Neteweperweriya ku Bilind dibe” bi berdewamiya şeş saetî ve ku ji hêla siyasetmedar û nivîskarên du jê jin û sî û du mêrî ve dihat nîqaşkirin, ev cure geşebûneke wiha ye ku me dît, mirovan heşmetkar dihêle.[99] Di bernameyê de tê îdîakirin ku neteweperweriya tirkî ji ber reaksiyona neteweperweriya kurdî zêde dibe, hema wekî terzê “hezkirina ji miletê tirkî” ya mêrên tirk tê resimandin. Nîqaşa “divê miletê tirkî çawan bê hezkirin” jî ku di bernameyê de serwer e, dibe wesîleya anîna ser zimên û heta cismanîkirina şidet, zayendperestî û nemaze ya nijadperestiyê.

Îdeolojiya dewra tek partiyê ku neteweperwer (temsîlkarên CHP û DSP’yê) lê dibûn xwedî û miliyetperestan (temsîlkarên MHP û BBP’yê) jî di xwe de dibihart, ji aliyê îslamiyan (temsîlkarên RP’yê) û kurdan (temsîlkarên DEP’ê) ve jî wek

[99] https://www.youtube.com/watch?v=zDFkUM00nH8 [04.02.2021]. Gava min nîqaşa di bernameyê de xulase kir, min îfadeyên aidî mêvanan di nav neynikê de dan ku min hewce pê nedît navê wan bidim.

“neteweperweriya ku bi şekilê nijadperestiyê tê sepandin”, tê pênasekirin. Li hemberî vê yekê, derdora CHP’yê pesinê siyaseta “vederkirinê” ya ku li ser bingeha “wekheviya etnîk a asîmîlasyonîst” tê meşandin dida, digot ku nijadperestî “tehdekirina li neteweyên din e” û ji derdora MHP’yê destek dibîne ku ew bi xwe dipesinîn neteweperweriya tirkî ne nijadperest e. Lê belê bi awayekî sergitî jî miliyetperestan kesên îslamî sûcdar dikirin ku ew têra xwe ne miliyetperest in; îcar îslamiyan jî diparast ku yên Tirkiye ava kiriye bi qasî tirkperwer bûne ew qas jî îslamî, bi qasî ku miliyetperwer bûne ew qas jî umetparêz bûne û ew sûcdar dikirin ku têra xwe ne dîndar in. Fîgurên neteweperwerên çewisîner, miliyetperest û îslamî “kurdên tirk” û xwişk û birayên kurd ên misliman didan ber dilê xwe û wan dixwast dilê miletê tirkî bi xwe xweş bikin, lê kurd li mixetabekî siyasî digerin da ku ew meseleya kurdî çareser bike.

Em dikarin bibêjin ew nîqaşa ku naveroka wê li berberiyek desthilatê û çalakiyên propagandayê dageriya, miliyetperestan awarte û nuasên wê midetek îhmal kirin û hemû miliyetperest di pênaseya neteweya tirkî de, ku bi awayekî hevparî wan diparast ew ne xwedî wesifekî nijadperest e, tewifîn: “Her kesê ku zimanî wî tirkî, dînê wî îslam, terbiyeya tirkî û çanda tirkî wergirtiye û yê ji xwe re dibêje tirk, ji miletê tirkî ye.” Eger îfadeya “nijada tirkî” di metnên avaker û daxuyaniyan de qet cih negirtibûya, pratîkên nijadperest di damezirandina Dewleta Tirkî de qet rol neleyîstibûya -wekî ku em dê di beşa pişt re de bibînin, rewş berevajiyê vê ye- mimkin bû mirov bi îdîaya ku peyva tirk a di vê terîfê de cih digire îqna bibûya ku ew ne navê nijadekê ye. Li aliyê din, wekî texeyulên nijadperest jî nîşan didin ku em dê di beşên paşê de wan nîqaş bikin, mehereta nijadperestiyê ew e ku tevî li holê tiştekî bi navê nijadê tune ye jî, lê dikare her cure nasnameyê li madeya xam a nijadî dagerîne. Ji vî aliyî ve, çendî bê gotin ku di terîfa neteweya tirkî de referansên nijadî tune ne jî, dîsan îdîaya ku tirkîtî wek nasnameyeke nijadî û ji bo ku li ser “nijadên” din tehekumê bike hatiye avakirinin, pûç nake.

Her cure pênase û wecîzên ku ji bo em neteweperweriya tirkî wekî meseleyeke temamîtiya dînî û edeb û adabê ya ku ji têgiha nijadê re biyan e, yan jî ji bo ku em wê wekî rewşa niştimanperweriyeke sade texeyul bikin hatine bipêşxistin, ji dîtina me ya “nijadperestiya bênijad” an jî “nijadperestiya bênijadperest” re nabin asteng ku wan tesîra xwe li qanûnan, damezirameyan û sepanan/tetbîqan kiriye. A rast ez difikirim ev têgihên ji bo terîfkirina cudahîkeriyeke nijadî ya ku serî li referansên nijadî nade tên bikaranîn, têgihên wisan in ku dikare ji bo nijadperestiya neteweperwer û miliyetperestên ku heta ji wan tê hewl didin xwe ji behsa nijadê bi dûr bidin û fikare dikin wekî nijadperest bên tawandarkirin an jî ya ji bo neteweperwerên îslamiyên ku

dixwazin xwe ji gunehê nijadperestiyê dûr bidin, bên wesifandin.[100] Her du têgih jî, li welatên ku tê fikirandin nijadperestî li wan bi dawî bûye, ji bo lêkolîna stratejiyên nijadperest ên nû yên ku hatine bipêşxistin da bêyî duçarî sûcdarbûna "nijadperest" bên û bikarin rabêjî û kiryara nijadperest pêk bînin, tê bikaranîn. Ev stratejiyên nijadperestiyê ku ji bo Tirkiyeyê ne nû ne, ez dê di beşa duyem de bi awayekî bikitekit hildim dest.

Nijadperestiya tirkî a ku em dewam dikin şopa wê digerînin, ji "Nutuk"ê heta bi peykerên li rûbarê Tirkiyeyê, ji bulvaran heta bi navendên "çand û hunerê", ji daxuyaniyên rojane heta bi misabeqeyên sporê ku îşaretkirina wê mimkin e, bi rewşa herî aşkera em dikarin di xala 66. a Makeqanûnê de peyda bikin. "Her kesê ku bi bendê welatîbûnê bi Dewleta Tirkî ve girêdayî ye tirk e. Zarokê ji bav an jî ji dêya tirk, tirk e."[101] Aîdkirina kesan a bi nijadekê ya ji ber welatîbûna wan a bi dewletekê yanî wek îlaweya ramana ku dixwaze bi rêya asîmîlasyona çandî û "erka welatîbûnê" nijadekê biafirîne, xistina dewrê ya fikira neteweyê ya li ser bingeha nijadê, yanî serîlêdana li pêwendiya xwînê û neteweperweriya etnîk, dikare wek awayê israra "Dewleta tirkî" a li ser nijadperestiyê bê xwendin.

Teza ku feraseta "neteweya tirkî" ya ku ne tenê kesên ji aliyê nijadî/etnîk ve tirk in, lê yên ji aliyê çandî ve û wek erkeke welatîbûnê tirkbûnê qebûl dikin jî dikarin bibin endamê wê, xwe naspêre bingeha neteweperweriya nijadekê/etnîsîteyê, lê bi zanyarî û tecrubeyan re ne giring dibin ku ew dikin em îdrak bikin bê yên ne tirk in û yên tirkbûnê napejirînin duçarî çi dibin û dê bibin. Wekî Billig nîşan dide, neteweperweriya etnîkî/nîjadî û neteweperweriya li ser binyada çandî/welatîbûnê ((*civic*), li dawiya dawî bi awayekî manend, nemaze di demên şer an jî qeyranan de bi heman rabêjî (diskurs), pratîk û amrazên şidetê dişixule.[102] Lê wek nimûne, neteweperweriya fransiz a li ser bingeha çandî/welatîbûnê, ku ji çavkaniyên îlhamê yên neteweperweriya tirkî ye, ferden aîdî çandên "prîmîtîf" û "xwecihî" asîmîleyî çanda fransiz a "gerdûnî" dikir û ew vedixwendin bipêşketinê, azadbûyînê û bûna xwedî maf û bi behaneya ku di vê vexwendinê de cih nedida referansên biyolojîk, bi taybetî ji ber sedema fransiziya ku xwe ji zirxê raboriya mêtingehkariyê pak kiriye, heta van demên nêzik mimkin

100 Ji bo têgiha "Nijadperestiya bênijad" binêrin Etienne Balibar. 1991a. Is There a 'Neo-Racism'? Etienne Balibar û Immanuel Wallerstein. Ji nav *Race, Nation, Class. Ambiguous Identities*. Verso: 21; Albert Memmi. 2000. *Racism*. University of Minnesota Press; David Theo Goldberg. 2008. Racisms without Racism. PMLA. 123(5): 1712-1716. Ji bo têgiha "Nijadperestiya bênijadperest" binêrin Eduardo Bonilla-Silva. 2013. *Racism without Racist: Color-Blind Racism and the Persistence of Racial Inequality in the United States*. Rowman & Littlefield Publishers: 29.

101 https://www.icisleri.gov.tr/kurumlar/icisleri.gov.tr/IcSite/illeridaresi/Mevzuat/Kanunlar/Anayasa.pdf [09.02.2021].

102 Binêrin Michael Billig. 1995. *Banal Nationalism*. Sage: 83.

nebûye ku ew wek nijadperestiyê bê wesifandin.[103] Bi awayê ku em dê di beşa duyem de bi kitekit behsa wesfê nijadperest ê neteweperweriya franszi bikin û li vir em dê vegerin salên 90'î yên Tirkiyeyê, em bibêjin ku kesên di 1998'an de Bereya Neteweyî (*Front National*) bi nijadperestiyê sûcdar dikir, ji aliyê nijadperestan ve îcar ew bikirina nijadperestiya li dijî fransiz dihatin sûcdarkirin.[104] Wekî vê, di bernameyê de ya ez jê behs dikim, ew îdîa ji aliyê neteweperwerên ku tirsa vegerîna li rojên berê ya wexta ku ji hêla osmaniyên dewşirme ve tirk wek "etraqê bêîdrak" dihatin hesibandin, tim tê ser zimên ku li Tirkiyeyê jî nijadperestiya li dijî tirkan tê kirin û "ji ber ku tirk tirk in, kêm tên dîtin û loma jî ew ketine rewşeke wisan ku şerm dikin ji xwe re bibêjin em tirk in."

Wekî ku Balibar dibêje, "rêxistinên nijadperest red dikin ew [*mîna nijadperest*] bên binavkirin û [...] derpêş dikin ku têgihên nijadperest û neteweperwer ne yeksanî hev û din in"; lê hal we ye hemû mînak rast didêrînin ku "nijadperestî bi awayekî timî ji neteweperweriyê dizê. [...] Û neteweperwerî ji nijadperestiyê çêdibe."[105] Ji vî aliyî ve gava em serî li balkişandina sawîra ku tebîra "neteweperweriya nijadperest" afirandiye bidin, ango nemimkiniya rasthatina li nimûneya neteweperweriya ku ne nijadperest e û - eynî mîna tebîra "sosyalîzma neteweyî"- di heman demê de wekî balkêşana li nijadperestiya xweserî her neteweperweriyê jî îcar gava em serî li wesifê ecêb/xerîb ê tebîra "nijadperestiya neteweyî" bidin dê mimkin be ku em îşaretî bêfeydetiya hewla cudakirina neteweperweriyê ji nijadperestiyê û nijadperestiya wekî halê sade ya neteweperweriyê, bikin. Bi gotineke din, neteweperwerî û nijadperestî bi qasî ku hev û din newesifînin, nêzî hev û tayên hev in.

Kurdên ku beşdarî vê bernameya ez jê behs dikim bûne, tam jî wan ji vê hevkêşeya neteweperwerî-nijadperestiyê hereket dikir û îdîa dikir ku neteweperweriya tirkî ne tevgereke sivîl e. "Lêşkerên ku li Başûrê Rojhilatê Anadoliyê hatine şandin û bi awayê ku di berîka wan de guh hebin vegerin" dianîn rojevê û bal li tezahurên civakî yên ku li nijadperestiyê dibûn xwedî, yanî li "nijadperestiyên bênijadperest" dikişandin ku neteweperweriya tirkî ya fermî ew nedigirtin ser xwe. Ev têgiha ku Goldberg daniye rastê û diangêje dibêje nijadperestî bi neolîberalîzmê re ji hîmayeya dewletê filitiye û wekî cureyekî nijadperestiya piyaseya serbest dişixule, dadixuyîne ku bê çawan dewlet bi globalîzmê re ji gelek qadên hilberîn û xizmetê vekişiyaye, wê çawan nijadperestî jî hewaleyî sektora taybetî kiriye û heta ji bo ku qadê ji sepan û

---

[103] Binêrin Etienne Balibar. 1991a: 25.
[104] Binêrin Ann Laura Stoler. 2016. *Duress. Imperial Durabilities in Our Times*. Duke University Press: 282.
[105] Etienne Balibar. 1991b. Racism and Nationalism. Etienne Balibar ve Immanuel Wallerstein. *Race, Nation, Class. Ambiguous Identities* içinde. Verso: 37, 53.

xizmetên nijadperest re veke çawan xwe dûr vedaye.[106] Em dikarin bibêjin ku bi salên 90'î re, nijadperestiya li Tirkiyeyê di hîmayeya dewletê de dest pê kiriye ku bi şekilekî nijadperestiya bênijadperest a taybetîkirî şixuliye; lê vê rewşê nijadperestiya bênijad û bênijadperest a neteweperweran û miliyetperestên mihafezekar/dindar îbtal nekiriye, vê repertuwara nijadperest a berfirehbûyî rabêjî û çeşîdiya pratîka nijadperest a li tebeqeyên dewlet û civakî firehtir kiriye.

Nîqaşa sereke ya li Tirkiyeya salên 90'î vebeyiya ekranan, ji bo tunekirina PKK'yê û siyaseta kurdî, li ser wê yekê ye ku divê kîjan neteweperwerî bê desthilatê û ka kurd jî divê li neteweya tirkî yan jî li umeta îslamê bên asîmîlekirin. Di bernameya televîzyonê de, ya ku ez jê behs dikim, ji birêveberên MHP'yê Yaşar Erbaz ku dibêje di berîkên xwe de şiringa û cetwel hilnagirin û ne xwedî wan saîqên "nijadperest" in ku kiloxan bipîvin an jî xwînê wergirin û lê zêde dike ku di malbata wî de bûkên bi esilê xwe kurd jî hene û reaksiyon nîşan dida ku neteweperweriya wan a diparêzin wek nijadperestî tê fehmkirin. Ev nêrîna hanê ya ku gava şikayet dikir çima bipêşketina Tirkiyeyê ya li dijî nijadperestiyê nayê teqdîrkirin û dîsan diket rewşa nijadperestiyê, hesteke şermîbûnê û ya hêrsê/xezebê li xwe digire, ku ji sala 2015'an pê ve bi îtifaqa AKP û MHP'yê bûye desthilat û li îdeolojiya tek partiyê jî dibe xwedî, mimkin e mirov bibêje sîrayetî "milet" jî kiriye.

Kentel, Ahiska û Genç vedikolin bê neteweperweriyên ku beşeke mezin a qada siyasî rapêçaye, bi îdeolojiyên ku bi hev re pev diçin û bi berjewendiyan îtifaqan çêdikin û ji bo domandina îmtiyazan serî li şideta organize didin û "şirîkatiya sûc" dikin çawan sîrayetî milet kiriye, dibêjin ku "ev têgiha stratejîk a ku navê aşopiyeke du sed salên dawî ye û têkiliyên desthilatê ya îroj nexuyane dike, divê mirov bipejirîne ku bin û nava wê vala ye û tiştekî bi navê 'neteweperweriyê' êdî tune ye [*cextlêkirin aîdî min e*].[107] Min hay jê heye gava bê gotin ku a rast tu car neteweperwerî tune bûye, bi îfadeyeke hîn rast û wekî ez di vê lihevxistinê de derdibim, ruhiya neteweperweriyê nijadperestî ye, heta neteweperwerî tayê nijadperestiyê ye, ne li gorî wê armancê ye ku ji pêşniyaza nivîskaran re bûye çavkanî; yanî vekolîna taktîkên neteweperweriyê ku daxwaza "teqdîrbûn", "mayîna wekî xwe" û "xwerêzdarî"yê ya ku temamî nasnameyên cuda yên zimanî, dînî, nijadî, zayendî û çînî yên Tirkiyeyê li xwe bigire û ji bo "derxistina pêş a rewşên hestê yên ku di çapana welêt, bajêr an jî di pîvaneyên din de tên parevekirin", ez dizanim ku li şûna neteweperweriyê bikaranîna têgiha nijadperestiyê dê nikarîbe lêkolîneke sofîstîke pêşkêş bike.

106 Binêrin David Theo Goldberg. 2008.

107 Ferhat Kentel, Meltem Ahıska û Fırat Genç. 2009. *"Milletin Bölünmez Bütünlüğü" Demokratikleşme Sürecinde Parçalayan Milliyetçilik(ler)*. TESEV Yayınları: 294.

Ez dibînim ku di her rewş û her firsendê de li şûna neteweperweriyê bikaranîna têgiha nijadperestiyê, nijadperestî jî wekî neteweperweriyê talûkeya dagerîna li têgiheke nava wê vala li xwe digire, zehmetiyên analîtîk û pirsgirêkên metodolojîk jî li xwe vedihewîne. Li hêla din, çendî dixwazim bi bîr bixim ku têgiha nijadê ji têgiha neteweyê hîn bêhtir ne xwedî wesifekî aşopî ye jî, lê ez difikirim ev têgiha nijadperestiyê ya ku halê herî sade yê neteweperweriyê û awayê berbelav ê şixulîna wê teswîr dike, dikare bi mebesta ku balê bikişîne ser cureyên cudahîkeriyê bê bikaranîn ya ku bi navê neteweperweriyê tê meşrûkirin û îşaret bi çavkaniyan van cudahîkeriyan û wesifê wê yê cezayî bike. Her wiha ji bo ku mirov têgiha nijadperestiyê tevî xebatên rarûbûna bi raboriyê bike, zehf giring e jî ku mirov dêhna xwe bide ser nijadperestiyê, nemaze divê di çarçoveya şidet û sûc de wê derxe pêş û amaje pê bike ku ew rewşeke welê ye ku divê hesab pê re bê dîtin. Bi kurtasî, mefhûma nijadperestiyê ku em dê di beşa duyem de hîn bikitekit wê nîqaş bikin, em dikarin wê wek têgiheke wisan bibînin ku dikare qadên xebatê yên nû ji têkoşîna aştî û edaletê re veke û derfetên nû yên îtirazê jî ji rejîmên heqîqetê re biafirîne. Loma ez dixwazim em şopên wan xuyabûnên/tezahurên nijadperest ên ku ji neteweperweriya tirkî heta bi miliyetperestiya tirk-îslamê, ji dewletê heta civakê diçin bigerînin û di wan deriyan re derbas bibin ku ew li îtirazkirina rejîma heqîqetê vedibin.

***Nijadperestiya bi Usûla Tirkî***

Naveroka neteweperweriya tirkî ya nijadperest, ku di dewrên dawî yên osmanî de dest pê kiriye zelal bûye, gava Cemiyeta Îtîhad û Teraqiyê li navbera salên 1913-1918'an bûye desthilat, dikare were gotin ev yek di siyaseta wê ya nifûsê de ya ku bi mebesta tirkkirin û mislimankirina Anadoliyê meşandiye, aşkeratir bûye.[108] Li gorî vê siyasetê, ku Fuat Dundar navê "mihendisiya etnîsîteyê" lê daniye, ji bo tirkkirin û mislimankirina Anadoliya ku ew bi lêkolînên etnografîk, statîstîkên etnîk û xebatên xerîteyan hatiye keşfkirin, bulxar ji Trakyayê, rûm ji Egeyê hatine qewirandin, ermenî bi tehcir û jenosîdan hatine tunekirin, nastûrî û suryanî hatine mişextkirin, cihû hatine qutifandin, kurd li îskana mecbûrî duçar hatine hiştin; tirk û mislimanên ku li gorî esilên xwe yên etnîkî hatine senifandin jî, li herêmên minasib hatine bicihkirin.

Turk Ocakları (*Ocaxên Tirkan*) ku tevî xebata mihendisiya mijara dabaşê bûye û di sala 1912'an de ji bo "kemilîna nijad û zimanê tirkî, ku ew yek ji stûnên giring ên qewmê îslamê ye" dest bi xebatên xwe kirine, bi qasî ku ÎTC'yê (Cemiyeta Îtihad û Teraqiyê) destûr û mawe daye, çalakiyên "neteweperweriya çandî" li dar xistine;

108 Fuat Dündar. 2019. *Modern Türkiye'nin Şifresi. İttihat ve Terakki'nin Etnisite Mühendisliği (1913-1918).* İletişim.

refaqetî avakirina komarê kiriye; piştî ku ji CHF'yê (*Cumhuriyet Halk Fırkası, Firqeya Gel a Cumhûriyetê*) bûye asteng, di sala 1931'ê de ne hewce û xeternak hatiye dîtin û hatiye girtin.[109] Mustefa Kemal gava ku dibêje "Ez dixwazim bi firqaya min re, ku eynî esasên Ocaxên Tirkan di sehaya siyasî û tetbîqî de dide teheqûqkirin [...] bi awayekî pêkveyî bixebitin minasib dibînim",[110] di esasê xwe de neteweperweriya mixalif a ku sîrayetî "Turk Ocakları" bûye ji xwe re dike hedef, dibe sedema dayîna îmkana ku em bifikirin nijadperestî ji aliyê partiya wî bi xwe û dewletê ve tê kirin. Di vê nuqteyê de, ew zanyariya ku ji ber Mustefa Kemal û hevalên wî bi xwe ne tirkên saf in, wan tirkîtî li gorî ku hewce pê heye bilind nekiriye û yên ku ne tirk in jî veder nekirine loma bûne hedefa nijadperestan, ji bo qeydkirina çeşîdî û berberiyên meqamên nijadperest ên li Tirkiyeyê, giring e.[111]

Di Kongreya Dîroka Tirkî ya yekem a sala 1932'yan de, "Pêşewatiya siyasî" ku bi awayê "nasnameya neteweyî bi nijad û diyardeyên zimanî yên girêdayî nijadê rave bike" tev digeriya, lê belê çendî ku kongreya duyem a sala 1937'an bi "zanistparêziya" otorîter meşand jî îdîaya hemcuretiya nijadî bi ser nexistiye; îcar neçar maye ku ji bo neteweya tirkî qîma xwe bi çêkirina dîrokeke fermî ya "arkeolojîk" bîne.[112] Lê dîsan jî nehatiye îhmalkirin ku navên akademîk ên kartêker û sîmayên siyasî yên ku di nav kadroya nivîskar û heyeta îdareyê ya "*Türk Antropoloji Mecmuası*"yê (Kovara Antropolojiya Tirkî) de cih digirt, hildin bin hîmayeya dewletê ji bo ku raseriya nijada tirkî bi welêt û dinyayê bidin îsbatkirin weşanên aşopiya zanistiyî bikin û gavên nijadperest ên projeya modernbûnê ya dewletê ya xwedî bingeha navendiya Ewrûpayê jî meşrû bikin.[113]

Piştî dewra nazîzm û holokostê, ku hewce pê dîtin nijadperestiya etnîkî ya xwedî bingeha biyolojîk-fîzyolojîk û ya xwedî îlhama Almanyayê li şûna nijadperestiya çandî bi cih bikin, îcar di çarçoveya neteweperweriya fransiz de giranî dan ser şirovekirina neteweperweriya tirkî. Min bi ramana ku "nijadperestiya etnîkî" , wekî di tebîra "ava şil" de bê çawan rê li ber bêserûberiya wateyê vedike û bikaranîna bêjeya ne hewce aşkera dike, xwast serî lê bidim. Çavkaniyên etîmolojîk ên bêjeya etnîk a di zimanê

---

[109] Binêrin Füsun Üstel. 2004. İmparatorluktan Ulus-Devlete Türk Milliyetçiliği: Türk Ocakları 1912-1931. İletişim: 63.

[110] Binêrin H. b: 374.

[111] Binêrin Ilker Aytürk. 2011. The Racist Critics of Atatürk and Kemalism, from the 1930s to the 1960s. *Journal of Contemporary History*. 46(2): 308-335.

[112] Binêrin Büşra Ersanlı. 2006. İktidar ve Tarih. Türkiye'de "Resmî Tarih" Tezinin Oluşumu (1929-1937). İletişim: 187, 225, 234.

[113] Binêrin Nazan Maksudyan. 2016. *Türklüğü Ölçmek. Bilimkurgusal Antropoloji ve Türk Milliyetçiliğinin Irkçı Çehresi 1925-1939*. Metis. Her wiha binêrin Ilia Xypolia. 2016. Racist Aspects of Modern Turkish Nationalism. *Journal of Balkan and Near Eastern Studies*. 18(2): 111-124.

latînî de dirêjî heta peyvên mîna pagan, barbar, wehşî û kafir dibin; ji bo wesifandina civatên biçûk û ne serwer ên wekî qebîle, qewm, kast û heta ji bo col û keriyên heywanan jî serî li bêjeya etnîk hatiye xistin û divê em bi bîra xwe bînin ku yek ji wan bêjeyên bi peyva etnîk ve hemwate ye jî “nijadî” ye; loma ez difikirim ku mimkin e mirov îşaret bi kana xerabûna vê mehneya hanê bike.[114] Jixwe gava Ziya Gokalp neteweperweriya tirkî bi bingeh kiribû, lê hay bûbû ku ji ber referansên biyolojîk û zoolojîk têgiha nijadê ne minasib û bikêrhatî ye, tevî dev ji têgiha nijadê berdaye jî dîsan bi aşopiya hevpariya zimên, dîn, terbiye û heta ya çandê qîma xwe neaniye; ji bo ku vê aşopiyê teswîr bike jî serî li têgiha “éthnie”yê dabû.[115] Bi gotineke din, Tevî ku Gokalp dizanî ji bo miletê tirkî bispêrin nijada tirkî hêmanên zimên, dîn, terbiye û çandê têr nake, lê bikaranîna bêjeya nijadê jî bi kêr nayê, dîsan jî hevnegiriyeke xweserî “neteweperwerên çandî” nîşan dabû. CHP ku ev hevnegirî pejirandiye û neteweperweriya “bênijad” bi laîktiyê perçinandiye, di salên 1940’î de jî dîn dewrî “tirkîtiyê”, tirkîtî dewrî neteweperwerên mihafezekar kiriye; bi awayê ku tirkperestan bi nijadperest û paşverûtiyê bihesibîne jî hewl dabû ku rejîma tek-partîtiyê xurt û zexm bike.[116]

Di sala 1944’an de, tirkperestên ku ji ber raserî etifî tirkên xwînbijîn kirine û nijadperestî û tûranîtî kirine, hatibûn darizandin, lê dadgehê di sala 1947’an de ew bêsûc dîtibûn û li gorî madeya 88’an a Makeqanûnê ku tirkîtiyê ji aliyê welatîbûnê ve pênase dike, hikum dida ku ramana dibêje di nav neteweya tirkî de kesên ji esilên cuda yên nijadî hene ne li dijî Makeqanûnê ye û madeyeke qanûnê ya ku cudahîkeriya nijadî wek sûc dihesibîne, tune ye.[117] Jixwe Nîhat Atsiz ku ew jî di nav bersûcan de bû, derpêş dikir ku li gorî Madeya 142’yan a Qanûna Ceza ya ew pê tên darizandin, pêkanîna serweriya nijadekê ya li ser nijadên din na, lê ya çînekê li ser çînên din sûc e û ji bo ku divê çalakiyên wan ên neteweperwer ên li dijî tehdîda komunîzmê wek reaksiyoneke mecbûrî bê fehmkirin û ew ji ber vê yekê bên fihêlkirin/pakdêran jî, sedemeke hiqûqî pêşkêş kiribû.[118] Tirkîtiya di şexsê Alpaslan Turkeş de, ya ku dikare şopa wê heta roja me ya îroj jî bê gerandin, ku ew bi xwe jî di nav bersûcan de bû û ji ber binpêkirina qedexeya çalakiyên siyasî ya mensûbên artêşê dihat darizandin, di sala 1953’yan de dîsan bi sûcdarkirina nijadperestî û tûranîtiyê îcar ji ber Komeleya Neteweperwerên Tirk (*Turk Milliyetçiler Dernegi*) hatibû darizandin û piştre dadgeh gihîştibû wê

114 Binêrin https://www.etymonline.com/search?q=ethnic; https://www.merriam-webster.com/dictionary/ethnic [30.04.2021].

115 Binêrin Büşra Ersanlı. 2006: 86-87.

116 Binêrin Günay Göksu Özdoğan. 2002. *Turan’dan Bozkurt’a. Tek Parti Döneminde Türkçülük (1931-1946)*. İletişim: 13.

117 Binêrin h.b.: 113.

118 Binêrin h.b.: 114-115.

encamê ku gotinên neteweperwer ên komeleyê jixwe di “zanyariyên welêt” de hene ku li dibistanan ew tê xwendin, loma ew nayên mehneya nijadperestiyê û dîsan ji hêla dadgehê ve hatibû fihêlkirin.[119]

Tirkîtî hem ji aliyê desthilata CHP’yê ve û hem jî ya DP’yê ve, bi mebesta ku neteweperweriyên mixalif bên zebtkirin, duçarî teqîbatê bûbû û ji hêla dewletê ve ku hîn ew ne amadeyî taybetîkirina nijadperestiyê bû, hatibû kedîkirin. Ev çanda dewleta nijadperest û ya birêvebirinê ji Îtihad û Tereqiyê gihîştiye CHP’yê, ji wê întiqalî DP û desthilatên berdewamên wê bûye û li dawiyê veguhêziye AKP’yê jî,[120] pêşbînî dikir ku dest daîne ser daxwazên civakî yên mixalif an jî bike ku ew bibe xwedî wesifekî cezayî, yan jî gava hewce bike dezgîna hezeyanên civakî bikişîne ku dewletê bi xwe çêkirine yaxud wan rake pêdarê da ku otorîte û şidetê bi derece bike. Wek nimûne, destgilatên rastgir ku wan hewl daye bi berdewamiya salên 1960’î îcazeta burjuvaya neteweyî, şêniyên bajaran, artêş û kesên bijare bistîne, ji aliyekî ve bi rêxistinên neteweperwerên mihafezekar xwe dikişand qedemeyên dewletê, ji aliyekî ve jî îhmal nedikir ku van rêxistinan di têkoşîna bi komunîzmê re bi kar bîne û kontrol bike.

Neteweperwerên ku ji desthilatê hatibûn dûrxistin, hewlên xwe yên çêkirina hegemonyaya fikirî û çandî û ya gihandina kadroyan ku sibê rojê dewletê îdare bikin didomandin. Jixwe Yekîtiya Têkoşînê (*Mucadele Birligi*), ku bûbû cihê çûna gelek kesên wisan ên îroj di nav siyasetê de cih digirin, di navbera salên 1964 û1980’yî de neteweperwerên tirkparêz, anadolîparêz û îslamî bi hev gihandibûn, temîn kiribû ku neteweperwerên mihafezekar komarê hezm bikin û dewlet jî neteweperwerên mihafezekar qebûl bike û pêşengî li teşebusên ji bo germkirina aîdiyeta wan a welatîtiyê û ya cemaetê kiribû.[121] Rêxistinên tirkparêz ên ku di salên 1970’yî de li partî û tevgerên siyasî yên reqîbên hev û din dageriyabûn, îslamîtiya ku bi wesîteya MSP-nijdevan (*Akıncılaran*) berfireh kiribû û neteweperweriya ku bi wesîteya MHP-îdealîstan (*ulkucuyan*) bilind kiribû, bi derbeya leşkerî ya sala 1980’i re hatin tîmarkirin û sentezkirin, ew li hikûmetên navend rast hatine emanetkirin û bi xebatên neolîberal jî li piyaseyê hatibûn ajotin.[122]

Bi xulase, neteweperweriya tirkî ya ku ji pêkhateya xweserî nijadperestiya biyolojîk

119 Murat Kılıç. 2016. *“Allah, Vatan, Soy, Milli Mukaddesat” Türk Milliyetçiler Derneği (1951-1953)*. İletişim: 236. Komele ne ji ber kirina nijadperestî û olperestiyê, lê bi sedema ku çalakiyên siyasî kirine tê girtin.

120 Binêrin Mete Kaan Kaynar. 2020. Türkiye’nin Ellili Yılları Üzerine Bazı Notlar. Mete Kaan Kaynar (ber.) *Türkiye’nin 1950’li Yılları*. İletişim: 37-38.

121 Binêrin Ekin Kadir Selçuk. 2018. *“Mücadeleciler” Mücadele Birliği (1964-1980)*. İletişim: 13.

122 Binêrin Ertuğrul Zengin. 2021. *Akıncılar Hareketi. 1970’lerde İslâmcı Gençliğin Oluşumu ve Eylemi*. İletişim; Tanıl Bora. 2017: 298-337.

û çandî pêk hatiye, çendî li salên 1950'yî nêzikbûna di navbera şaxên wê yên neteweperweriya kemalîst a "îslamiya laîk" û miletperweriya mihafezekar a îslamiya radîkal de dest pê kiribe û car carinan bûbe sedema zivirbûna wan a li hev û din jî, bi derbeya leşkerî ya sala 1980'yî re, dewlet û artêş rojaneyî kirine; di serî de panîka ku îsyana kurdan di bin pêşewatiya PKK'yê de ew çêkiriye, tevî îşteha ku komarên tirkî yên li Asyaya Navîn û wehdên polîtîkayên neolîberal ew afirandiye, bi salên 90'î bi şûn de coşiyabû.[123] Li dawiyê ev nijadperestiyên bênijad û bênijadperest ku li hev kiribûn, ji aliyekî ve li yekîneyên herekata taybetî dihatin îstihdamkirin, li aliyekî jî ew dihat taybetîkirin û bi rewşa nijadperestiyên bênijadperest amade bûn ku li înîsiyatîfên civakî bên teslîmkirin. Li ser rola medyaya ku ji bo vê teslîmatê pêk bînin hêma û rabêjiyên nijadperest hildiberandin, min di qisimê ewil de, bi wesîteya hin weşanên televîzyonan behs ji vê yekê kiribû.[124]

Ev lihevkirina nijadperest a ku di dewra pêşî ya desthilata AKP'yê û Pêvajoya Çareseriyê de bi awayekî qisimî li aziyê û li bin kontrolê hatibû hiştin, AKP'ya ku mecbûr mabû cih ji pîroziya kemalîzmê re veke û ji bo ku alîgirên xwe yên mihafezekar û hiseyên dewletê berfireh bike bi desteka MHP'yê serî lê dabû, ji nû ve gihîşt fermîtiya xwe û di dema "operasyonên xendeqan" de jî bi şidetê hat perçinandin.[125] Ev lihevkirina ku bi taybetî li ser dijminiya bi kurdan re xuyabar bû, gumanên bêbinî yên têkildarî wesifê nijadperest ê neteweperweriya tirkî ji holê ranekiriye; rejîma heqîqetê ya dewleta tirkî ji nû ve qewîn kiriye.

Ew îdîayên ku dibêjin Tirkiye ji çavkaniyeke entelektuelî, ji hunerweriya rêxistinî yan jî ji hêza navneteweyî mehrûm bû loma nikaribû nijadperestiyê bi awayekî dameziraweyî û sîstematîk bixebitîne, hem ew nîqaşa ku li jorê nîşan dide hem jî nederbasdariya wê ya li cem gelê ku duçarî şideta nijadperest bûye li aliyekî, em dikarin bibêjin ku ev îdîa ne îsbata wê yekê ye ku nebûna nijadperestiya ya li Tirkiyeyê, lê daneyên wê yekê hene ku zemînê ji bo lêkolîna nijadperestiya dereng

123 Binêrin Tanıl Bora. 2017: 246-268. Wekî Bora jî jê behs dike, slogana "Şehitler ölmez vatan bölünmez" (Şehîd namirin, welat jî dabeş nabe) ku ji Tevgera Îdealîst/ mengîwer li neteweperweriya fermî hatiye wergerandin, bûbû sembola lihevkirina neteweperweriyên mihafezekar û sekuler. Hevoka pêşî ya heman sloganê, îcar di nav tevgera siyasî ya kurdî de jî berginda wê (wekî şehîd namirin") çêbûbû; em bi tenê bi bîr bixin û jê derbas bibin ku ev slogan ji bo her du rejîmên heqîqetê jî bûye wekî kevirekî wisan ku leqandina wî ya ji cih gelek zor e.

124 Ji bo xebateke li ser jêgiranên naveroka nijadperest a medyayê binêrin Hatice Çoban Keneş. 2014. *Yeni Irkçılığın "Kirli" Ötekileri. Kürtler, Aleviler, Ermeniler*. Dipnot: 59-60.

125 Binêrin Onur Atalay. 2018. *Türk'e Tapmak. Seküler Din ve İki Savaş Arası Kemalizm*. İletişim: 14-15. Hasan Aksay ku yek ji damezirînerê Milli Nizam Partisi (*Partiya Pergala Neteweyî*) ye û di salên 1960'î de parlamenteriya AP'yê (Partiya Edaletê) kiriye, di hevpeyîna xwe de, dibêje di çapa wê demê ya ferhenga Saziya Zimanê Tirkî de hatiye nivîsîn ku "Türkün dini Kemalizm" (dînê tirkan kemalîzm e); binêrin A. Tarık Çelenk. 2017: 235.

a li Tirkiyeyê yan jî ya nijadperestiya bi isûla tirkî amade dike.[12628] Li gel vî qasî, em dikarin bibêjin ku civariya entelektuelî ne ji bo kirina nijadperestiyê lê ji bo veşartina nijadperestiyê hewce pê heye û li Tirkiyeyê ev cure civariya entelektuelî têra xwe hem li cem beşên çepgir hem jî li cem ên rastigiran heye. Eger em bi nimûneya zayendparêziya ku bi nijadperestiyê xwe rapêçaye pê de herin, ew ên ku tûşî tacîza mêran, tecawiz û cinayetên wan bûne û hewce nake ku ferdên LGBTI+ îsbat bikin li Tirkiyeyê pirsgirêkan mêrîtiyê heye berevajiyê vê ji bo ku li Tirkiyeyê mêrîtî bi şêweyeke dameziraweyî û sîstematîk bê sepandin civariya entelektuelî û hunerweriya rêxistinî ya pêwîst mewcûd e. Çendî daxwazkirina analîzeke bi hûrgilî ya têkildarî nijadperestî û zayendparêziyê endîşeyeke mafdar a akademîk be jî, lê eger mirov bibêje endîşeya mexdûrên nijadperestî û zayendparêziyê ya li ser têkoşîna bi nijadperestî û zayendparêziyê re xwedî wesifekî rênîşander e, dê li cih be.

Tevahiya kurdên ku di sala 2014'an de min bi wan re hevdîtin pêk anî da ku ez fikira edaletê û lêgerînê ya mexdûrên terora dewletê ya salên 1990'î hîn bibim, tevî cudahiya wan a temen, zayend, çîn û mexdûriyetê, pirsa "çima"yê di navenda jiyana wan de radiwestiye û hem ji ber ku bersiva vê pirsê ya hevtayî heqîqeta diyardeyî jixwe dihat zanîn hem jî ji ber qet ne bersiveke maqûl û heqîqî bû, li gel ku wekî pirseke retorîk dima jî, ji binî ve daxwazekê vedibeyand: Ji aliyê dewlet û neteweya tirkî ve bi awayekî fermî naskirina wê bêedaletiyê bû ku li kurdan dibû.[12729] Bi gotineke din, bi awayekî fermî dihat xwastin ku bersiva pirsa "çima"yê ya ku "heqîqetek" e, bê ser zimên: Ji ber kurd kurd bûn; ji ber xwedî wî wesifê etifkirina wê kurdbûnê bûn, wekî tune dihatin hesibandin û dihat xwastin ew bên tunekirin û duçarî bêedaletiyê dibûn ku jixwe ev nijadperestî ye.

Serokê Şaxa Ocaxa Tirkan a Stenbolê Cezmî Bayram vedibêje ji rûyê nijadperestiyê, ku wê bi Şerê Cîhanê yê Duyem re "ji mirovahiyê re felaketa mezin anî", îroj bêjeya nijad bûye xwedî wateyeke neyînî, lê hal we ye di destpêka Komarê de bêjeya nijada tirkî bi mehneya miletê tirkî hatiye bikaranîn û ji bo îsbata vê jî diyar dike ku dewlelê li ber xwe dida tirkên gagavûz ê xirîstiyan wek "tirk qebûl nedikir" da ku hilde nav welêt, lê ji bo boşnaq, arnawid û erebên misliman berhilistî nedikir.[128] Ev îfade wekî ku Bariş Unlu jî dibêje, di bingeha "Peymana Tirkîtiyê" de "Peymana Mislimaniyê" heye û vê rewşê teyîd dike, lê wek nimûne gava dabaş were ser ereb, nemaze kurdan,

---

126 Binêrin Murat Ergin. 2008. 'Is the Turk a White Man?' Towards a Theoretical Framework for Race in the Making of Turkishness. *Middle Eastern Studies*. 44(6): 827–850.

127 Binêrin Nesrin Uçarlar. 2015. *Hiçbir Şey Yerinde Değil. Çatışma Sonrası Süreçte Adalet ve Geçmişle Yüzleşme Talepleri*. İletişim.

128 A. Tarık Çelenk. 2017: 286-287.

dê hewlên Bayram encam nede û tê xuyakirin di pênaseya neteweya tirkî de kakilekî nijadperest heye ku mislimanî jî nikare wî bi bin bixe. Jixwe Bariş Unlu jî dibêje ku di esilê xwe de ew “bi qaydeyên nenivîskî, bi veavabûna dameziraweyan, bi sepanên fiîlî, bi xûy û banekiyên rojane, bi stratejiyên agahdarnebûn û hestgermnebûnê” dixebite û “car caran hîç jî bi awayekî nazik naxebite”; balê dikişîne ser tezahurên nijadperest ên “Peymana Tirkîtiyê” ku ew wek “raserî îdeolojiyan” pênase dike.[129]

Tirkîtî û mislimaniya ku ji Împaratoriya Osmanî maye, li gorî ramana nijada raser a ku pê dixwaze biçûkbûna di Anadoliyê de asê bûye telafi bike, xwekêmdîtina siyasî û civakî ji holê rake û lez bide projeya geşepêdan û modernbûnê ya ku dereng maye û jê re kan û çavkaniyan dabîn bike, berdewamî pê dide ku di demên cuda û bi pîvaneyên cihê, têkel dike û bi kar tîne. Ji bo lêkolana vê ramana nijada raser û bipêşketina teorîk û dîrokî ya siyasetên nijadperest ku ne xweserî Tirkiyeyê ne û ji bo ku mirov bikare nijadperestiya li Tirkiyeyê nîqaş bike û rarûbûna bi raboriyê re li mihasebeya bi nijadperestiyê re dagerîne, amrazên giring pêşkêş dikin.

## 2. Xeyalên Nijadperest û Îmtiyaz

Foucault derpêş dike ku şerê di paşxaneya siyasetê de didome, civakan dişêwîne û dabeş dike, ya rast ew şerê nijadan e û dibêje rabêjiya ku vî şerî mimkin dike, berdewamî û bipêşketina wê temîn dike, xwedî wê armancê ye ku dixwaze cudahiyên çandî û zimanî li ferqîtiyên hêz û amrazên tehekumê dagerîne û wisan bike ku nijadek ji aliyê nijadekî din ve bê bidestxistin û rajêrîkirin.[130] Vedibêje ku ev rabêjiya di sedsala 17’an de ji aliyê nijadperestên biyolojîk û kesên ji bo îslahkirina nijadan dixebitîn dihat parastin, piştî ku li Ewrûpayê li tevgerên neteweperwer û mêtingehkariyê hat zêdekirin bi şûn de, li paş şerên çînî hatiye veşartin û li dawiyê ew ne şerê ku di navbera nijadên ji hev cuda de tê meşandin, lê aîdî şerekî wê beşê ye ku ew wek nijada tek a heqîqî tê resimandin, desthilatê di dest xwe de digire û xwedî terîfkirina normê ye, bi navê “parastina civakê” li dijî kesên ku ji vê normê averê dibin, dide meşandin.[131] Memmi jî dibêje ku têgiha irq/nijadê heta sedsala 17’an di warê xwedîkeriya heywanan de dihat bikaranîn, lê piştî ku Spanyayê li Parzemîna Amerîkayê û Ewrûpayê jî li Afrîkayê dest pê kiriye “mîsyonên xwe yên şaristanîkirinê” rewa bikin îcar di warê mêtingehkirina mirovan de jî hatiye bikaranîn û vedibêje ku nijadperestî xizmetî armancên veqetandina ji hev, nirxandin û hildana bin tehekumê û teqabilî rewşa

[129] Barış Ünlü. 2018. *Türklük Sözleşmesi: Oluşumu, İşleyişi ve Krizi*. Dipnot: 167.

[130] Michel Foucault. 2002: 71-72; 2003: 59-60.

[131] Michel Foucault. 2002: 72-74; 2003: 61-62.

şerekî berdewam dike.[132]

Foucault dibêje tevî teknîkên desthilatê yên ku beden û jiyana ferdan vedikole, wan ji hev vediqetîne, terbiye dike, wan hildide bin qeyd, raçavî û dîsîplînê û xwedî wê rayeyê ye ku ferdan dide jiyandin an jî bihêle ku bimirin, yanî wek îlaweyî anatomo-polîtîka bedena mirov, ew nijadperestiya ku xwe dispêre biyo-polîtîka nijada mirov, li gel feraseta birêvebirina xwe ya ku wê wek biyo-desthilat bi nav dike, dikeve mekanîzmayên dewletê û loma nabe ku xebitîna dewleta modern ji nijadperestiyê cuda bê fikirandin.[133] Pêbilîbûna biyo-polîtîkayê meseleyeke nifûsê ya biyolojîk, zanistî, siyasî û têkildarî desthilatê ye û dewleta ku xwedî hêza desthilata biyopolîtîk e, rayeya ku ferdan an jî qisimekî nifûsê mehkûmî mirinê bike, bi sayeya nijadperestiyê qebûlbar dike ku ev rewşa mehkûmkirina mirinê bi tenê rasterast ne kuştinê lê hiştina ji mirinê re, zêdekirina rîska mirinê, rakirina ji cih û waran an jî cureyên şidetê jî ku dibe wekî kuştina siyasî bê wesifandin, li xwe digire.[134]

Me behs kiribû ku di pêvajoya avabûna Komara Tirkiyeyê de meseleya nifûsê jî bi wesîteya biyopolîtîkayê, ango bi mihendisiya etnîsîteya ku pratîkên şideta nijadperest ên cur bi cur li xwe vedihewandin, hatibû "çareserkirin", îroj jî teknîkên çareseriyê yên wekî wê tên bikaranîn, heta tevî zilma li ser bedenên mirî, pratîkên şideta nijadperest li qadên bikaranînê yên nû jî belav bûne. Me jixwe bal lê kişandibû ku ev pratîk ne tenê bi destê dewletê, bi wesîteya civakê jî tên kirin. Ew ên aîdî wê "nijad"ê ya ku wek amraza serwerî û tehekumê hatiye aşopîkirin, ji ber ku ew ne aîdî vê nijadê ne yan jî naxwazin bibin aîdî wê, terkî mirinê hatine hiştin wek welatî heta wek mirov neyên qebûlkirin, loma jî kesên ku wek nijadperest tên gihandin van mirinan normal û pêwîst dibînin, heta zilma ku li cesedan tê kirin jî mafdar dibînin, ku jixwe di vekolîna li ser şopên heqîqeta fermî ya di qisimê ewil de em rastî van tezahurên welatîtiya nijadperest hatibûn.

Memmi, dibêje mirov bi nasnameya ku bi welidînê bi dest xistiye bixwaze bibe xwediyê maf, îmtiyaz û hêzê, yan jî fikirîna ku mafên mirov xwediyê wan e yan jî dikare bibe xwediyê wan di bin tehdîda îmtiyaz û hêzê de ne, tim kakilekî nijadperestiyê li xwe digire û çendî ev kakilê nijadperest ji tirsek û bertekiyeke navajoyî ya têkildarî yê cuda biqewime jî, tenê di konteksteke diyar a siyasî, aborî û civakî de, di bin xebitîneke diyar a îdeolojîk, sîstematîk û binyadî de dikare bikeve

---

[132] Albert Memmi. 2000: 35, 144, 184-186.

[133] Michel Foucault. 2002: 247-248, 260; 2003: 242-243, 254.

[134] Michel Foucault. 2002: 251, 262; 2003: 245, 256.

rewşeke nijadperest.[135] Nedana hesabê mafan, îmtiyazan û hêza ku mirov xwedî wan e; lixwenegirtina berpirsiya tehakuma ku bi saya van mafan, îmtiyazan û hêzê pêk hatiye; heta ji bo ku berpirsiya tehekumê li jêrdestan bar bike, berdewamîdana bi nijadperestbûna xwe, li wezîfeya welatîbûnê dadigere ku nijadperestî êdî dibe rewşeke sîstematîk.[136]

Unlu ku "tirkîtiyê ne wek etnîsîte, welatîbûn, nasnameya neteweyî yan jî aîdiyeta îdeolojîk" lê "wek hevpariyên raser-çînî û raser-îdeolojî ku dikare di nav piraniyan tirkan de bê çavdêrîkirin, rewş û teşeyên ku dişibin hev ên mîna dîtin, bihîstin, îdrakkirin, agahdarbûn, eleqedarbûn, dilzîzbûn û hildana helwestê" hildide dest, îşaret bi madeyên "Peymana Tirkîtiyê"dike ku bê çawan ji bo kesên bi vî awayî performansên tirkîtiyê nîşan didin, deriyê "cihana îmtiyazan"li wan vedike û balê dikişîne ser wê yekê tevî tirk û mislimanbûnê divê zilma ku li kesên ne tirk û misliman in tê kirin û dê bê kirin jî, ji aliyê wan ve were pesendkirin ku ev nijadperestî jî wek erkek welatîbûnê tê dîtin.[137]

Ji ber ku rabêjî û pratîkên nijadperest an jî îtiraznekirina li nijadperestiyê bûye wek erkeke welatîbûnê, îroj hîn zêde hewce bi fikirîna li ser aşkerakirina nijadperestiyê heye. A rast divê em bidin ber çav ku nedîtina nijadperestiyê bi awayekî giştî îmtiyazeke aîdî nijadperestan e û li nijadperestiyê nebûna xwedî jî, heta bi redkirina nijadperestiya biyolojîk îcar hewl tê dayîn ku ew nexuyane bibe, loma serê pêşî divê bibêje ku têgiha nijadê ne biyolojîk/şênber lê belê esasekî civakî/razber e û ji bo mirov bikare nijadperestiyê ji aliyê siyasî û aborî ve bikişîne bi hêla heqîqeta şênber ve, ev cewhera civakî/razber bes û qîmdar e.[138] Ji vî aliyî ve, hewce ye bê bibîrxistin ku nijadperestnebûn ne ew e ku mirov li dijî wê cudahîkeriyê be ku ew xwe dispêre têgiha nijada biyolojîk, lê belê gava mirov pratîkên berbiçav ên nijadperest tesbît bike, li dijî nijadperestiyê helwest bigire û encamên şênber ên vê helwestê, ango windakirina îmtiyazên xwe bide ber çavên xwe, ev yek dikare mimkin bibe.

Li Tirkiyeyê yek ji daxuyaniyên li rewacê ku nijadperestiya li dijî kesên ne tirk û misliman divê wek nijadperestî neyê binavkirin jî ew ku divê bi taybetî nijadperestî mîna ya li Amerîkayê ku ji aliyê spiyan ve li reşikan tê sepandin bê dîtin û jixwe li Tirkiyeyê nifûseke reşikan a balkêş jî nîn e. Divê mirov bibêje tu eleqeya nijadperestiyê

135 Albert Memmi. 2000: 21, 23, 32.

136 Binêre Albert Memmi. 2000: 139.

137 Barış Ünlü. 2018: 13-15.

138 Joshua Miller û Susan Donner. 2000. More Than Just Talk: The Use of Racial Dialogues to Combat Racism. *Social Work with Groups*. 23(1): 31-53.

bi rengê çerm re nîn e, lê têkilî bi daxwaza çêkirina tehekumê ya li ser ferqa biyolojîk û çandî ku etifî rengê çerm tê kirin heye, tevî mirov careke din bibêje ku taybetiyeke biyolojîk an jî çandî dikare bibe sedema nijadperestiyê jî, eger mirov li Tirkiyeyê behsa nijadperestiya li dijî reşikan bike jî dê tiştekî li cih be.

Reşikên ku di serdema Împaratoriya Osmanî de wek kole anîne Tirkiyeyê û ew bi awayê afro-tirk tên zanîn, eqrebeyên wan ên îroj bi giranî li Herêma Ege û Deryaya Spî rûdinin, bi tenê qîma xwe bi gotina li cihên ew dijîn leqayî nijadperestiyê nebûne, lê belê gava diçin cihên "dûr" ji duçarbûna "tacîza reng"aciz dibin.[139] Beravajî afro-tirkên ku bi temamî misliman in û bi qonaxa demê re hejmara wan kêm bûye yan jî "melez bûne" yaxud bi giştî li qesebe û gundan dijîn, lê reşikên xirîstiyan ên ku di demên nêz de ji welatên Afrîkayê hatine Stenbolê, vedibêjin ku bi wan "miemeleya eşyayên ji destê diduyan" tê kirin, bi navê "meymûn" deng li wan tê kirin, bi sedema ku "pîs" in xanî nadin wan û ji bo xizmetên tenduristiyê jî mizeya zêde ji wan tê standin, xwe ji tescîlkirina nijadperestiya li Tirkiyeyê bi dûr nadin.[140] Civateke din a ku îroj dikare nijadperestiya li Tirkiyeyê bêyî teredud tescîl bike, dibe ku penaberên sûriyeyî, nemaze endamên van civatan ên jin bin, ku nefreta li dijî ereban a dîrokî ya Tirkiyeyê, li wechekî siyasî û aborî tê dagerandin û ew bi şidetê tên birêvebirin.[141]

Em bibêjin ku kategoriyên nijad û etnîsîteyê ku ne siruştî yan jî rasteqîn in, çeşîddarkirinên heman fenomena modern û ne têgihên li dijî hev in, wekî di xebata Unlu de tê dîtin ku diangêje mimkin e mirov nijadperestiya spiyên li dijî reşikan a li Amerîkayê û nijadperestiya tirkan a li dijî kurdan berawirdî hev bike, ev cure berawirdî ne tenê mimkin e di heman demê de pêwîst e.[142] Em bi bîr bixin ku mirov dikare nimûneyên wekî wê yên ji bo Tirkiyeyê di neteweperweriyên li Amerîkaya Başûr bi xwe de "jî" peyda bike û em tezahurên nijad û nijadperestiyê û niqaşên wan li derveyî radara neteweyî bihêlin lê tenê em qîma xwe bi behskirina nijadperestiya Porto Rîkoyê ya ku serweriya spiyan li ser lingan dihêle bînin, ku ew xwe dispêre mîta "yekîtiya neteweyî" û ji bo ku spîtî wek nijadek neyê dîtin îmkan dide wê yekê da ku ew

---

139 https://www.youtube.com/watch?v=WqlDwM47Mj8 [10.02.2021]. Li ser nijadperestiya li dijî afro-tirkên ku di serdema osmaniyan de bi sepana koledariyê anîne Tirkiyeyê binêrin: Ayşegül Kayagil. 2021. Yok Ama Var: Türkiye'de Irk, Irkçılık, Köleciliğin Hayaletleri. *Cogito*. 101: 81-92.

140 https://www.youtube.com/watch?v=fy6YduQt1t0 [10.02.2021].

141 Ji bo berhevokeke hêja ya li ser cudahîkeriya ku elewî, kurd, ermenî, rûm, penaber, civatên LGBTI+ û astendarên li Tirkiyeyê tûşî wê bûne, binêrin Ülkü Doğanay. 2018. Her wiha binêrin Bülent Gökay û Darrell Whitman. 2017. No Racism Here: Modern Turkey and the question of race and national identity. *Links: International Journal of Socialist Renewal*: http://links.org.au/no-racism-here-modern-turkey-race-national-identity [06.04.2021]; Fatma Esra Öztürk. 2019. Göçmen Kadınlara Yönelik Üretilen "Yeni Irkçılık" Kavramının Medya Çerçevesinde İncelenmesi. *Global Media Journal TR Edition*. 9(18): 255-273.

142 Barış Ünlü. 2018: 23.

wek nijada veşarî bimîne.[143]

Green, vediguhêze ku neteweperweriya fransiz wekî neteweperweriya tirkî, nijadperestiyê wek modeleke siyasî ya xweserî DYA'yê, heta Fransaya ku "ne nijadperest e" vê yekê eleqedarî wê hişyariyê dibîne ku hewce ye der barê nijadperestiyê de baldar be, nemaze ew afro-amerîkanên ku ji DYA'yê hatine Parîsê û bi piranî reşikên entelektuel an jî hunermend in jî alîkarî li vê çîrokê kirine û di xebata xwe de polîtîkayên her du welatan ên li ser koçberan berawirdî hev dike û sawîr (îluzyon) û korîtiya fransiz a dabaşa mijarê datîne holê.[144] Ann Laura Stoler ku dibêje bi navên wan yadkirina wan tezahurên nijadperest û mêtingehkar ên ku venebehiyane berhemên wêjekaran, fîlmên derhêneran, analîzên têgihî yên felsefenasan û tehlîlên entelektuelan ên fransiz, yanî wek "nijadperest û mêtingehkar" wesifîna melekeyê, ji ber sedema bêserûberiyeke siyasî û civakî ya ku ew mîna "kolonyal/afaziya çandî" pênase dike tune ye û derpêş dike ku hewce bi vekolîna derdorên siyasî, akademîk, têgihî û hunerî heye ku ew nahêlin mirov bikare bigihîje zanyariya eleqedarî siyaseta nijadperest û mêtingehkar û pratîkên wan, ên ku zanebûnê seqet dikin û diyardeyan bi awayekî "guncayî" ji nû ve binavdikin.[145]

Goral Bîrîncî, bêeleqetiya ku bi bêhizûriya etnosiyasî û dijminahiyan re ketiye nava hev û li rojavayê Tirkiyeyê hikum diajo ku ev çil sal e li dora meseleya kurdî tê hilbirandin, bi têgiha "kolonyal/afaziya çandî" ya Stoler îzah dike, îdîa dike ku bêeleqetî ne ji ber kêmasiya zanyarî yan jî rasteqîniya diyardeyan, lê tiştên li Kurdistanê çêdibin, ji ber wê hilberandina hafizayekê diqewimin ku ew tişt bi awayekî nijdiyana tên berevajîkirin, berhêlîkirin û jê tên heşaftin.[146] Em dikarin bibêjin bêserûberiya afaziyeke manend, di wê rewşê de jî tê dîtin ku ji nijadperestiya li Tirkiyeyê re nijadperestî nikare bê gotin û li dawiyê rejîmên heqîqetê xwe dispêrin hêza diyarkirina bê ka wê ji kîjan zilmê re çi navî daînin.

Stoler vedibêje ku hîn jî bêjeya nijadê di ferhengên fransiz de tê menkirin, di sala 1981'ê de ji ber Etienne Balibar bal kişandibû ser "nijadperestiya endemîk" a di Partiya

143 Eduardo Bonilla-Silva. 2013: 182-184.

144 Nancy L. Green. 1999. Le Melting-Pot: Made in America, Produced in France. *The Journal of American History*. 86(3): 1188-1208.

145 Ann Laura Stoler. 2016: 128, 166-167. Li gorî Stoler, "di afaziyê de mesele hilmijîna zanyariyê ye. Kêşe ne xwe danîna li ne dîtinê ye yan jî tunebûn e. *Afazî […] zehmetiyeke axaftinê ye, zorbûna çêkirina ferhengoka têkildarî wan tiştan e ku nikare bêje û têgihên aîdî wan bi awayekî guncayî bi hev re eleqedar bike.* [*cextkirin aîdî nivîskar e*]."

146 Özgür Sevgi Göral Birinci (2017) *Enforced Disappearance and Forced Migration in the Context of Kurdish Conflict: Loss, Mourning and Politics at the Margin*. École des Hautes Études en Sciences Sociales Histoire et Civilizations [Teza doktorayê ya ku nehatiye weşandin], 302-303.

Komunîst de, ji partiya xwe hatibû avêtin, ev "endemîk"a ku em dikarin li tirkî wek "nexweşîneke cihkî yan jî florayê" wergerînin, dibêje ku Balibar bi serlêdana li tebîra nijadperestiya "endemîk" îşaretî sendroma nijadperest dike ku ev bi dîroka Fransayê ya kolonyal û nostaljiya "Faransaya aîdî fransizan" re, di têkiliyê de ye.[147] Balibar di gotara xwe ya bi navê "'Nijadperestiya Nû' heye?" de, ku fransiya wê di 1988'an de hatibû weşandin, sendroma nijadperest a li Fransayê di konteksta tevgerên nifûsê yên piştî bêmêtingehbûn û koçkirinan de hildide dest û rewşê di çarçoveya nijadperestiya bênijad de nîqaş dike, ku ev ji demeke dirêj ve li welatên anglo-sakson derbasdar e û lê belê ne li ser beşdariya biyolojîk li ser tênebihûrîna cudahiyên çandî avakirî ye.[148]

Balibar bi bîr dixe ku çand jî wekî wesifên siruştî yan jî nijadê, ferdan û grûpan bi ûcba hepsandina li şecereyekê, li kokeke sabit û razber tê bikaranîn û vedibêje ku ev nijadperestiya "nû" ya li şûna kodên nijadî li ser cudahiyên çandî hûr dibe, di bin navê hêvişandina cudahiyên çandî de helwestên nijadperest siruştî dike û heta li hemberî dijberên nijadperestiyê yên ku nijadperestiyê tesbît dikin, rê li ber sûcdarkirina wan vedikin.[149] Loma ji vî aliyî ve vediguhêze ku teknîsyenên psîkolojiya sosyal ên "rastîbîn" ji bo tezahurên "ji ber xwe ve" yên nijadperestiya nû ku şidetê li xwe vedihewînîn mafdar derînin ketine nav tevgerê, cihê wan îdeologan girtiye ku ew ideolog lê dixebitin nijadperestiya klasîk bi teoriyên şecereya mîstîk hîmdar bikin.[150] Em dikarin bibêjin nijadperestiya nû yan jî ya çandî ya li Fransayê, ku Taguieff jî balê dikişîne ser psîkolojiya sosyal a nijadperest a wekî wê ku îcar ew vê yekê wek "cudahîparêzî" yan jî "nijadperestiya cudahîparêz" terîf dike û dadixuyîne ku ev rewşa hanê ji wê tirsa ku dibe çanda serwer têkilî nav çandên din bibe û winda bibe, pêk tê.[151]

Miles û Brown dibêjin felaketên siyasî, ku fikira nijadperestî pirsgirêkeke exlaqî ye xurt û belave dike, xebitîna wê ya sîstematîk û sazûmanî derdixe holê, wek mînak bazirganiya koleyan, Holokosta Naziyan, cudahîkeriya li DYA û ya li Afrîkaya Başûr û wekî rejîma *apartheid*ê ku bi sûcên li dijî mirovahiyê pêk hatine û di asta toreya dab û nerîtan de be jî ew lihevkirina dijberiya nijadperestiyê ku bûye xwedî derbasdariyê, bi salên 1970'yî re, nemaze li Ewrûpayê bi siyaseta li dijî koçeberan re winda bûye û vediguhêzin ku partiyên siyasî yên di navê wan de li cihê "nijadperest" îbareya "neteweperest" heye texsîr nakin bi rabêjiyên faşist ray dixwazin; ew ên bi awayekî

---

147 Ann Laura Stoler. 2018. *Interior Frontiers. Diagnostic and Dispositif*. https://www.politicalconcepts.org/interior- frontiers-ann-laura-stoler/ [10.02.2021].

148 Etienne Balibar. 1991a: 21.

149 H. b.: 22.

150 H. b.: 23.

151 Pierre-André Taguieff. 2001. *The Force of Prejudice: On Racism and Its Doubles*. University of Minnesota Press: 208- 212.

aşkera serî li rabêjiyên faşist nadin jî, wekî di nimûneya Brîtanyayê de, xwe li arezûya pêkvejiyana bi ya bi kesên ji çanda xwe û “siruşta mirov” dipenihînin û nijadperestiyê diparêzin.[152] Gava bê bîra me di bingeha vê parêziyê de, eynî mîna ya di nijadperestiya biyolojîk de bertekiyên psîkolojîk û fîzyolojîk ên ku dikare mîna bêhn, deng, tehma dev, awayê reftarî, “pejnkeriyên xeyalî” yên ji cureyên şekilê jiyanê û “arezûyên ku naînin ser zimên”,[153] heta kerixînên/îkrahên zêhnî û bedenî bên wesifandine hene, zehmet dibe ku mirov bikare bibêje nijadperestiya nû ji ya kevn bêhtir nazikane dixebite yaxud tesbîtkirina wesifê çandî ya nijadperest a ku wê ji ya berê cihê dike, zor dibe.[154] Dîsan jî bi armanca ku mirov têkoşîna dijberî nijadperestiyê di hiş de zindî bihêle, li gel tezahurên nû yên nijadperestiyê, dê hewce pê hebe ku mirov stratejiyên înkarê yên nû li pêş çav bigire.

### *Zindîtiya li Dijî Nijadperestiyê*

Bonilla-Silva dibêje li Amerîkayê bi dawîbûna nijadperestiya fermî re ew ramana ku xwe dispêre nijadperestiyê li demên berê maye îcar bi awayê lênêrîneke spiyan a “nijadperest-korî”, nijadperestiyeke sembolîk” bi pêş dikeve û vê nijadperestiya ku ji wan îdîayan xwe bi xwe xwedî dike ku reşik ne ji ber mayîna duçariya nijadperestiya cudahîker, lê ji ber xwedîbûna wan a taybetiyên siruştî û nirxên çandî yan jî ji ber ku têra xwe nakevin nav hewldanan loma nikarin bigihîjîn pozîsyonên spiyan ên siyasî û aborî, wek “nijadperestiya bênijad” pênase dike.[155] Spiyên ku bidawîhatina sepanên nijadperest ên fermî meyl dibin wê wekî bidawîbûna nijadperestiyê şirove bikin, sedema nedîtina wan a nijadperestiya sîstematîk, binyadî û sazûmanî ya berdewam an jî tercîhkirina wan a înkarkirina vê yekê, ji endîşeya wan a mihafezekirina îmtiyazên wan ên hestî û darayî diqewime ku eger li dijî nijadperestiyê helwest bigirin dê wan ji dest bidin.[156]

---

152 Robert Miles û Malcolm Brown. 2003. *Racism*. Routledge: 15, 61. Ji bo nimûneya Brîtanyayê ku nivîskaran ew daye û teza “siruşta mirov” binêrin Martin Barker. 1981. *The New Racism*. Junction Books: 21-22.

153 Binêrin Ann Laura Stoler. 2016: 243-245.

154 Ji bo nîqaşeke li ser vê mijarê binêrin Hatice Çoban Keneş. 2014: 19-68.

155 Eduardo Bonilla-Silva. 2013: 6-8. Mahmood Mamdani dibêje ku nîqaşa nijadperestiya tenê wek referans li ser reşikên afro-amerîkayiyan tê kirin, derfet nade nîqaşkirina cihwarbûna spiyan a ewil û kuştina xwecihiyan/binkiyan ku wê nijadperestiyê îlham daye Almanyaya Nazî û Dewleta Îsraîlê û rexne li nîqaşa der barê nijadperestiyê de dike ku çima bi awayekî eleqedarî “mêtingehkariya “Amerîkan” li ser nehatiye sekinandin û bi bîr dixe ew xwecihên ku li araziyên ji bo wan terxankirî hatine hepskirin -tevî ku ne xwedî temînateke makeqanûnî bûn- tenê karîne sala 1968’an bigihîjin mafên xwe yên medenî. Mahmood Mamdani. 2015. Settler Colonialism: Then and Now. *Critical Inquiry*. 41(3): 596-614.

156 Binêrin Paula Ioanide. 2018. “Why Did the White Woman Cross the Street?”: Cultural Countermeasures against Affective Forms of Racism. *Souls*. 20(2): 198-221.

Flynn Jr., rewşa spiyan a ku ew naxwazin wek nijadperest bên binavkirin û derdibin nijadperestî meseleyeke ferdî û kêşeyeke exlaqî ye û xwedûrdana wan a ji fikireke rexneyî ya ku dibe bibe sedema qebûl û îdrakkirina wan a xebitîna nijadperestiya binyadî û sîstematîk û behskirina ji nijadperestiyê jî, "êdî" wek tiştekî ne li cih û westandox dibînin, mîna "westabûna spiyan" terîf dike û balê dikişîne ser wê yekê ku ev westabûna hanê ya xwe dispêre "berxwedana spiyan"a redkirina bi tevahî ya nijadperestiyê yan jî ji "sûcdariya spiyan" a bi qebûla temamî re rê ji etaletê re vedike, cuda ye.[157] Li aliyê din, em dikarin bibêjin ev hemû rewşên aktîf û pasîv ên spîtiyê, dikin ku îmtiyaz bi xwediyên xwe yên heyî re bimînin.

DiAngelo jî rewşa spiyan wek "şikestokiya spiyan" pênase dike ku ew li dijî her cure rexneyên der barê nijadperestiyê de dibêjin ew ne nijadperest in, wan berdêla nijadperestbûnê daye û heta bi sedema ku ew bi qasî hewce dike ji ber nebûna nijadperestiya xwe nehatine teqdîrkirin loma "bertekiyên zêde yên hestî" didin û derpêş dike ku ev şikestokiya hanê têkoşîna rarûbûna bi nijadperestiyê re li gorî berxwedana nijadperestan hîn bêhtir zor li wan dike.[158] Ji vî aliyî ve, em dikarin bibêjin ku nijadperestiya nû, bi taybetî ji înkarkirina nijadperestiyê çêdibe ku ev yek nijadperestiyê ji berê bêhtir şemitok û têper dike, loma jî têkoşîna dijberî nijadperestiyê, ya rast divê li hemberî vê rewşa ku nayê zeftê, stratejiyan bi pêş bixe.

Îroj dikare bê gotin ku çendî bi aşkerahî mirov bibêje ez nijadperest im an jî helwesteke nijadperest derpêş bike ew bi awayekî exlaqî tiştekî kêşedar be jî, lê ji ber saya tevgerên dijberên nijadperestiyê ew tiştekî bimaliyet e loma îfadeyên ferdî yên nijadperest û tezahurên wê kêm bûne; lê divê mirov bi bîr bixe ku nijadperestî bi dawî nebûye, ji lew re bi mîrasa rejîmên ku xwe dispêrên hîmê nijadê yên mîna koletî, mêtingehkarî û faşîzmê, bi cureyên cudahîkeriyê yên mîna neteweperwerî û zayendparêziyê û bi her cure rewtekên dînî re, têkiliyeke wan a pihêt heye.[159] Loma jî bi sedema ku mirov nijadperestiyê bêparêzî bihêle îfade û kiryarên tekane yên xwedî wesifê nijadperest bi nijadperestiyê tewandar bike hewce bi kişandina balê ya li ser wê yekê heye ku ya rast nijadperestî meseleyeke bêedaletiya civakî ye, yanî eleqe bi têkiliya meseleyên bikaranîna azadiyên sereke, dabeşiya çavkaniyên siruştî, perwerdehî, tenduristî, hewîn û gihana derfetên kar û hiqûqê heye.[160]

---

[157] Joseph E. Flynn Jr. 2015. White Fatigue: Naming the Challenge in Moving from an Individual to a Systemic Understanding of Racism. *Multicultural Perspectives*. 7(3): 115-124.

[158] Robin DiAngelo. 2018. *White Fragility: Why It's So Hard for White People to Talk About Racism*. Beacon Press: 1-6.

[159] Binêrin Tommie Shelby. 2003. Ideology, Racism, and Critical Social Theory. *The Philosophical Forum*. XXXIV:2. 153-188.

[160] Tommie Shelby. 2003.

Nijadperestnebûna kesekî, îfadeyekê yan jî ya kiryarekê, ji ber ku tecrubeyên wî/wê yên tekane ji razberbûna nijadperestiya dîrokî, sîstematîk û binyadî wêdetir neçûye, loma heta ku nijadperestnebûn nebe xwedî rewşa hemtayê dijberê nijadperestiyê, dê ji nijadperestbûnê zêde bi dûr nekeve. Wekî em di nimûneya "Tirkiyeya ji nijadperestiyê azade ye" yan jî ya di gelek welatan de ku wan "nijadperestî li paş hiştine"dibînîn,[161] di rewşeke wisan de ku nijadperestiyên bênijad, bênijadperest û bênijadperestî lê hikum diajon û mirov nijadperest xuya nebe, ji nijadperestbûnê hîn bêhtir rihet e, pêwîst e bi qasî nijadperestiyê dijberiya nijadperestiyê jî bê xuyakirin ku ev yek dê watedartir be. Wekî Bonilla-Silva jî diyar dike, îroj mesele ne nijadperestbûn e, lê dijberê nijadperestbûnê ye, yanî di nav binyada civakî ya xwedî bingeha nijadê de ku hemû aktor ji vê binyadê bandordar dibin, hewce pê heye ku têkoşîneke li dijî nijadperestiyê bê sêwirandin û aşkerakirin bê ka kara kê û windahiya kê ji vê yekê çêdibe.[162]

Dewlet ku têgiha nijadê li peysaja dîrokî bi cih dike, wê ji ferhenga civakî û têgihî dimalêşe û nijadperestiyê ji pawana xwe û sifatên xwe derdixe, tevî kirina nijadperestiya bênijad an jî teşwîqkirina nijadperestiya bênijadperest, ji nijadperestên bênijadperestiyan re jî qad we dike, ku me li jorê ji awayê wê yê şemitok û teper û xwedî xuyanga minferît behs kiribû.[163] Şêweyên nijadperestiya "nû", ku me di beşa pêşî de ew nîqaş kiribû û em dikarin wê mîna cureyekî aîdî serdema neheqîqetiyê jî bibinin, ku ew xwedî kapasîteyeke wisan e dikare amrazên nû li repertuwara înkarê zêde bike, loma em dikarin bibêjin ew ji binî ve bi wesîteya tebîrên xweş, ji nijadperestiyê re parêzbendiyê çêdike. Tezahurên minferît ên van nijadperestiyan ku bi awayekî nû tên wesifandin, eger mirov wan bi "rehenda hestgermiyê" hilde dest û wan wek pêşdaraziyên xwemalîkirî vekole, dê alîkariyên giring li têkoşîna dijberî nijadperestiyê bike.[164] Li aliyê din, ez difikirim divê mirov îhmal neke li ser têkiliyên desthilatê yên ku ji tundiya nijadperestiyê û pratîkên wê re zemîn amde dike, li ser endîşeyên nijadperestiyê yên dîrokî, binyadî û sîstematîk û li ser îdeolojiyên ku mêvandariyê ji nijadperestiyê re dikin, têra xwe hûr bibe.

Nijadperestî tenê dikare tevî doktrînên tehekumkar ên wekî neteweperwerî, mêtingehkarî, cureparêzî û zayendparêzî yên din bişixule, ji lew re em dikarin bibêjin ku yek ji hêmanên nijadperestiyê sîstematîk dike jî ev têkiliya sîmbiyotîk e.[165] Mêrek

[63] Binêrin Dylan Rodríguez. 2014. Goldwater's left hand: Post-raciality and the roots of the post-racial racist state. *Cultural Dynamics*. 26(1): 29-51; Megan E. Morrissey ve Christy-Dale L. Sims. 2015. Playing the Race Card: Antiracial Bordering and Rhetorical Practices of New Racism. *Review of Communication*. 15(2): 81-101.

[162] Eduardo Bonilla-Silva. 2013: 15-16.

[163] Binêrin David Theo Goldberg. 2008.

[164] Ji bo alîkariyeke wiha binêrin Hatice Çoban Keneş. 2015.

[165] Binêrin Pierre-André Taguieff. 2001: 226.

ku tenê ji ber mêr e nayê kuştin, lê jinek ji ber ku jin e, ew wek cureyeke ku dikare were kuştin tê dîtin û her kuştina jinan jî, bi awayê ku were meşrûkirin li têkiliyeke zayendparêz tê dagerandin. Zayendparêzî, eynî mîna nijadperestiyê, ji îmtiyaza bêyî çêbûna hesta sûcdariyê kirina sûc, meşrûkirina sûcê kirî û xweşkirinê pêk tê. Çendî ne mimkin e em li vir cih bidin lîteratura femînst ku derdixe rastê şertê pêşî yê nijadperestiyê zayendparêzî ye û li gel ku her du doktrîn berî kapîtalîzmê hebûne jî, lê bi kapîtalîzmê re wesifa sîstematîk û sazûmanî bi dest xistine, lê belê bêyî ez ji bell hooks behs bikim naxwazim di ser vê meseleye re derbas bibim, ku dibêje wesifandina rewşa duçarbûna jinên reşik ên li nijadperestiyê, zayendperestiyê û cudahîkeriya çînîtiyê wek "talûkeya sêmendî" hisnûtebîrek e, rewşa ku lê duçar bûne apaşkera îstîsmar, tehde û derketina ji mirovahiyê ye û ew rewşa ku jinên reşik tûşî wê dibin, ji bo ferdên reşik ên LGBTI+'yê hîn zêdetir derbasdar e.[166]

Di serê wan meseleyan de, ku ji aliyê edalet û daxwazên aştiya mayînde ve jî nimûneyên herî baş ên pêvajoyên rarûbûna bi raboriyê re qîmnekir dike, dîsan têkiliya nijadperestiyê ya bi doktrînên tehekumkar ên din re û wesifê wê yê sîstemîtîk û binyadî tê ku têra xwe xebat li serê nehatiye kirin. Ez dê vê meseleye di beşa piştre û di mînaka Afrîkaya Başûr de bi kitekit nîqaş bikim, lê li vir dixwazim bi kurtasî behsa nimûneya Guatemalayê jî bikim. Şerê 36 salî yê di navbera Dewleta Guatemala û rêxistinên gerîla yên xwedî desteka gelên maya de, ku Guatemala ji aliyê karkirina bi hêzên paramîlîter re, windakirina kesan a bi darê zorê, kirina ji cihûwaran û serîlêdana li taktîkên kontrgerîlayan dişibe dewleta Tirkiyeyê, piştî di sala 1996'an de bi peymana aştiyê dawî bû bi şûn de, li navbera salên 1998 û 1999'an du komîsyonê heqîqetê hatibûn avakirin ku wan raporên xwe yên nîhayî weşandibûn, mekanîzmayên edaletê yên cezayî hatibûn xebitandin û heta di sala 2013'an de serokê dewletê yê berê Ríos Montt -çendî ceza nexwaribe jî- bi sûcê jenosîdê li Guatemalayê hatibe darizandin jî, qeneeta serdest ew e ku li Guatemalayê rarûbûna bi raboriyê re pêk nehatiye.[167]

Oglesby û Nelson dibêjin ew nijadperestiya li dijî xwecihî û gelên maya, ku ew parçeyekî neveqetînbar ê dîroka mêtinkehkirina Guatemalayê ya ji aliyê Spanyayê ve ye, nemaze li navbera salên 1981 û 1983'yan ên di bin rêvebirina Montt de, ji bo pêkanîna kiryarên kontrgerîla yên jenosîdî bûye bingeh û vediguhêzin ku piştî di belgeyên leşkerî yên wê dewrê de gelê maya-ixil hildane kategoriya "dijminekî navxweyî" yê "îsyankar", jenosîda artêşê ya nijadperest wek kiryareke serkutkirina îsyanê hatiye

[166] bell hooks. 2010. *Teaching critical thinking: practical wisdom*. Routledge: 171.

[167] Ji bo nijadperestiya li Guatemalayê ku rarûbûn pê re çênebûye binêrin Elizabeth Oglesby û Diane M. Nelson. 2016. Guatemala's genocide trial and the nexus of racism and counterinsurgency. *Journal of Genocide Research*. 18(2-3): 133-142. Ji bo lêkolîneke li ser pêvajoya aştiyê ya Guatemalayê, binêrin Kudret Çobanlı. 2020. *Zor Olsa da Barış: Guatemala Deneyimi*. Disa Yayınları.

meşrûkirin.[168] Îcar piştî ku di doza Montt de dadgeh hikumê “sûcê jenosîdê” dide, di serî de derdorên kar û xwediyên erdan ên ku bi artêşa wê dewrê re kar kirine, dibe sedema nîşandana bertekiya hêzên serwer û îtirazên wekî Guatemala ne Rwanda ye, lihevxistin ne tiştekî etnîkî lê siyasî ye, ne ji ber ku ew maya ne, lê ji ber ku wan serî hildaye duçarî şideta dewletê bûne, hatine kirin.[169]

Eger maya ne ji ber mayabûna wan lê ji ber ku serî hildane hatine kuştin, diviya me nikariya serhildêr wek maya tesbît bikirina, îcar ji bo ev kuştin li nav beşa din a civakê bê meşrûkirin, em dizanin ku dewletê îhmal nekiriye îşaret bi taybetmendiyên “nijadî” yên mayayan jî kiriye. Der barê nimûneyên xebitîna şideta dewletê ya redkirina nijadperestiyê de, ku hewl didin nijadperestiyê bi siyaseteke ku ji mekanîzmayên hiqûqî û sazûmanî pêk tê binixêmin an jî li meseleyên siyasî û aborî qilifên nijadperest bitefsilînin û vê “siyasî”yê îptal dikin, mimkin e ku bikarin di rabêjiyên dewleta tirkî ya eleqedarî meseleya kurdî de jî rast lê werin. Bi siyasetê veşartina nijadperestiyê yan jî ev xebitîna ku derfet dide berterafkirina siyasiyê bi nijadperestiyê, bi gotineke din, em dikarin bi nimûneyeke farazî ya ji Tirkiyeyê îşaretî bikaranîna li şûna hev a ya siyasî û “nijadî” yan jî ya di nava hev û din de bikin: Em bibêjin ku eger îspartayî bi daxwazeke aborî yan jî siyasî serî hildabûna û piştre serî li tundiyê dabûna, dewlet jî ji bo ku vê daxwaz û serhildanê serkut bike serî li tundiyê bida û ji bo ku vê tundiya hanê li bal beşên din ên Tirkiyeyê rewa bikira, dikarîbû serî li îdîayên ku ev îspartayiyên serhildêr û “xayîn” bi esilên xwe rûm in bidaya û dikarîbû sedemên siyasî “bi mezeretên” nijadperest jî destek bikira. Ji ber ku îspartayî ne xwedî tenekî reş in, bi awayekî mihtemel dikarin wek delîleke din derpêş bikirina ku ev ne şideteke nijadperest e.[170] Lê hal we ye, me berê jî nîqaş kiribû ku rengê çerm, ji bo tehekumê, zengînbûnê, berdestkirinê û zeftkirinê meşrû bike, ew wesifên fîzyolojîk û çandî yên gelekî ji derfeta pêvedanîna helwesteke siyasî pê ve ne xwedî taybetmendiyekê ye û derfetên din ên fîzyolojîk û çandî jî, ji aliyê dewletê bi xwe ve bi rêya xebatên zanistî tên afirandin.

Bi kurtasî, wekî Stoler jî cext lê dike, palpiştiya tekane ya nijadperestiyê tu car ne taybetmendiyên fîzyolojîk ên mîna rengê çerm e; gava em bînin bîra xwe ku ji aliyê

---

168 Elizabeth Oglesby û Diane M. Nelson. 2016.

169 H. b.; Nivîskar lê zêde dikin ku doza Montt îdîaya sereke ya dîroka kolonyal berevajî kiriye: Bi rêya mêtingehkariyê ew tiştê ku ji navendê li dorhêlê, li “herêmên ku şideta barbaran li wan hikum diajo” tê birin, ne hiqûq, mafên mirovan û şaristanî ye; berevajî vê yekê, wekî ku gelên maya-ixil jî nîşan didin, şideta barbaran e ku ji derdorê li herêma wan a navend tê kirin û bûye çavkaniya daxwazên wan ên heq û hiqûq ku ji vê navendê çêdibin.

170 Ez wek keseke ku li taxên Îspartayê yên bi dêr û xaniyên ku ji rûman mayî mezin bûme, der barê dayîna vê mînaka farazî lê ne bêyî mesnet de, bi awayekî nispî hest bi xwe dikim ku ez di ewlehiyê de me.

rejîmên heqîqetê yên nijadî ve bi sedemek ji sedeman, bi nasnameyekê têkildarkirina beşeke nifûsê dikare wek hedef bê hildan, loma ez difikirim ku lêzêdekirina sifateke çandî ya li nijadperestiyê ne hewce ye, heta dibe ku tiştekî xelitîner be jî.[171] Jixwe Hannah Arendt jî bi bîr dixe ku arîstokratên li dijî Şoreşa Fransiz radibûn, bi mebesta berjewendiya xwe ya çînî biparêzin, li hemberî "neteweya" welatiyan, "nijada arîstokrasiyê" derdixistin pêş.[172] Eger em di hişê xwe de bigirin ku nijadperestî ne ji wesifên sabit û bidawî lê ji taybetmendiyên elastîkî û yên îkamebarên ku di menzîleke bêsînor de cih digirin tên hilberandin, heta rejîmên heqîqetê yên nijadî li ser lingan bimînin dê nijadperestî li raboriyê nemînin û divê mirov bipê ku ji bo ku ev rejîm xwe li ser pêyan bihêlin jî, ji bo bikaranîna çeka nijadê ya ku dikare ew wek kategoriyeke siyasî û civakî bê seferberkirin, dê serî li bipêşxistina amrazên nû bidin. Heta ku nijadperestî maliyeta şer bixe û heta rejîmên heqîqetê yên xwedan bingeha şerî xwedî bike, dê li tedawilê bîmîne, dê berdewamî bi xwe bide da ku teşe û navên nû wergire. Ji vî aliyî ve, têkoşîna dijberî nijadperestiyê divê ji daxwazên ji nav sîstemê wêdetir meşandina têkoşînekê be ku bala sîstemî bikişîne ser xwe û bi ya me ev xala destpêkê ya rasttir e. Divê têkoşîna dijberî nijadperestiyê, li ser têkiliya nijadperestiyê ya bi berjewendiyên civakî û aborî, li ser şixulîna wê ya bi doktrînên din re hûr bibe û ev hişyarîtiya lêhûrbûyî divê lê bê xebitandin da ku bi rehenda siyasî û hiqûqî ya rarûbûna bi raboriyê re bê destekkirin, bi lênêrîneke hîn giştgir, xwedan çendahî/kantîte û dagerînek jî divê ne nijadperestîbûnê lê dijberbûna nijadperestiyê bi rêxistin bike. Karê dijraberên nijadperestiyê, tu car ji karên nijadperestan hêsantir nebû, jixwe ku berevajiyê vê yekê bê gotin, dê ev yek ji bo nijadperestan bibûya dayîna payeyeke heqnekirî.

## 3. Bermayiya Nijadperest: Li Afrîkaya Başûr Rarûbûna bi Raboriyê re

Serweriya spiyan, ku di bin birêvebirinên mêtingehî yên Holanda û Brîtanyayê de dest pê kiriye û di dewra piştî serxwebûna sala 1931'ê de domiyaye, bi taybetî di pey Şerê Cîhanê yê Duyem re, bi rejîma *apartheid*ê ya Partiya Neteweyî re hîn bêhtir hat xurtkirin û perçinandin, bi desthilata Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê (*African National Congress* – ANC) ya sala 1994'an re bi awayekî fermî bi dawî bû û ew bi mekanîzmayên edaletê yên dewra derbasîbûnê ya li welêt re hat girêdan; li gel vê yekê, berdewambûna serweriya spiyan a îroj jî nîşan dide ku hesabpirsîna ji nijadperestî û mêtingehkariyê ne encameke siruştî ya rarûbûna bi raboriyê re ye. Ez dixwazim bi alîkariya hin rexneyên ku li Komîsyona Heqîqet û Lihevkirinê ya Afrîkaya Başûr (*Truth and Reconciliation Commission* – TRC) tên kirin, ku wê di dîroka têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re roleke giring pêk aniye û lê piştî alîkariyên TRC'yê yên xweser

---

[171] Ann Laura Stoler. 2016: 170.

[172] Hannah Arendt. 1976. *The Origins of Totalitarianism*. A Harvest Book: 161-165.

û giring, li ser vê tecrubeya hanê ya rêberiyê li têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re dike, rawestim û wê hildim dest.

Lenta ku derpêş dike berêtiyên bi navê TRC'yê yên wek bûyîna heqîqet û lihevkirinê, ku nemaze bersiv dide wan rexneyan ku daxwazên reşikan ên ji bo edalet û rarûbûnê nehatine tetmînnekirin, dibêje tercîhnekirina edaleta cezaker nayê wateya ku edalet nehatiye dabînkirin û bi taybetî wergirtina vegotinên heqîqetê yên mexdûran kiriye ku bêedaletiya “rejîma heqîqetê” ya *apartheid*ê bê naskirin û cext li wê yekê dike ku li hemberî feraseta edaleta modernîst û pozîtîvîst a ku di bingeha mêtingehkariyê de jî heye, îcar feraseta pirheqîqetî ya ku bi vegêranên mexdûr û failan pêk hatiye bi temamî amaje bi pêvajoyeke azadbûn, dagerîn û bi demokratîkbûnê dike.[173]

Komîsyonê bi etifkirina hîkayeyên mexdûr û failan ku wan “heqîqetên diyardeyî/edlî” derxistibûn holê, li “heqîqetên şexsî/vegêranî” guhdarî kiribû, rapora[174] xwe ya nîhayî jî bi mebesta ku bi rêya hevbandorî, nîqaş û diyalogê dê bikarin bigihîjin “heqîqeta civakî” û pê jî bigihîjin dagerîna “heqîqeta başker/tamîrker” a ku dikare xizmetê li rarûbûna bi raboriyê re û li avakirina dahatûyê bike, ji ber ku hem ji hêla kargêriya *apartheid*ê hem jî ji hêla ANC'yê ve rexne lê hatibûn girtin, ew wek delîleke serkeftîbûna Komîsyonê tê dîtin.[175] Rexneya ANC'yê ya li ser wê ew bû, ku raporê aktorên *apartheid*ê û şerkarên azadiyê yên li dijî *apartheid*ê tê koşîbûn, ji aliyê kirina îhlalên mafên mirovan ve wek xwedî heman dereceyî sûcdar û bi awayê exlaqî jî ew hevtayî hev dîtibûn.[176]

Encamên raporê, ku serokê wê demê Thabo Mbeki ew wekî “teşebusên ji bo hewldana krîmînalîzekirina têkoşîna qehremane ya gelê Afrîkaya Başûr kirêt û xelitandî” didît, xwe li nedîtina du îdîayên sereke yên ANC'yê datanî: A yekem, çendî têkoşîna çekdar parçeyekî kevneşopiya şerê mafdar e, lê ev heman tişt ji bo rejîma *apartheid*ê ne derbasdar e. Ya duyem, aktorên *apartheid*ê di çarçoveya rêzik û sepanên pêgiriya emir de, ku ew parçeyên sîstema ewlehiyê ya dewletê ne, sûcên li dijî mirovahiyên kiribûn, lê nimûneyên îşkence û miemeleyên xerab ên ku li kampên ANC'yê pêk hatine, ne bi talîmata pêşewayan, di encama hin “zêdegaviyên minferît” de qewimîbûn.[177] Ev rexne,

173 Patrick Lenta. 2000. Transitional Justice and the Truth and Reconciliation Commission. *Theora: A Journal of Social and Political Theory*. 96: 52-73.

174 https://www.justice.gov.za/trc/report/finalreport/Volume%201.pdf [18.02.2021]: 110-117;

175 Binêrin Paul van Zyl. 1999. Dilemmas of Transitional Justice: The Case of South Africa's Truth and Reconciliation Commission. *Journal of International Affairs*. 52(2): 647-667.

176 Binêrin N. Barney Pityana. 2018. The truth and reconciliation commission in South Africa: perspectives and prospects. *Journal of Global Ethics*. 14(2): 194-207.

177 N. Barney Pityana. 2018.

wekî ku me berê jî nîqaş kir, çendî ez difikirim ku dibe ev ji aliyê rewakirina şidetê ve dikarî were nîqaşkirin jî, lê ez wisan bawer dikim ku divê ev wek îtirazeke heqdar a li rarûnebûna bi şideta dewletê, bi bêcezatiyê, bi mêtingehkarî û nijadperestiyê re were dîtin. Ji ber ku em dê li jêrê careke din li van cure îtirazên li TRC'yê vegerin, ez dixwazim berdewamî bi nirxandinên li ser fonksiyona Komîsyonê bidim.

Çendî ANC rexne lê bigire jî misyona edaleta tamîrker a komîsyonê qebûl dike û van Zyl, vê yekê bi awayê wek hêzeke tek a di destê desthilateke siyasî de ku ji derfeta darizandina failan mehrûm e, şirove dike.[178] Helwesta ANC'yê ya ji ber garantî daye hilbijartinên demokratîk bên kirin ku qazanckirina wan aşkera ye û ji bo bidawîhatina rejîma *apartheid*ê jî dê fail neyên darizandin û bi saya vê tawîzê armanc kiriye desteka civakî û rewatiya siyasî bi dest bixe û bi berginda heqîqetê jî techîzkirina mekanîzmaya efûyê ya TRC'yê, wek hemleyeke hewce û bivênevê dibîne. Bi ser de, bikaranîna rayeya efûkirinê ya ku bi hin krîter û şertên objektîf ve hatiye girêdan a ji aliyê hikûmeteke ku temsîlkara reşikan e, di encama darazekê de ku dibe bi îflasa sîstema edaleta cezayî ya welêt ku halê hazir bêfonksiyon e bi encam bibe, tercîhkirina wê ya windakirina dem, pere û îtîbarê aqilane dibîne.

van Zyl diangêje ku birêvebirina nû ya nikare failên ji asta bilind ceza bike, ew ên ku di warê veşartina delîlan û bêdengkirina şahidan de û nemaze di çarçoveya qanûnên wekî rewşa neasayî de qanûnîkirina sûcên xwe yên kirî de têra xwe hunerwer in, ji ber sûcên bi dehan salan berê kirine dê di maweya hêvîkirî û bi qasî hatiye xwastin neyên cezakirin, bi şekilê israra li ser edaleta cezayî jî dê li ser pirsgirêkên heyî û yên akut ên civakî raneweste û doza ku qazanc kiribû jî dê winda bike.[179] Her wiha, TRC ku ji bo pêvajoya efûyê bi awayekî exlaqî biterazîne hatiye damezirandin, difikire ku bi wesîteya şahidiyên mexdûr û qurbaniyan dê ne tenê failên ku sûcên cezayî kirine, her wiha grûpên meslekî yên wekî akademî, medya, tib û hiqûqê, sazî û şirketên mezin jî hildin bin îfadeyan û heqîqetên eleqedarî avaniya nijadperestiyê ya sîstematîk jî derxe holê, rejîma *apartheid*ê jî wek sûcekî li dijî mirovahiyê pênase bike ku wisan bike rejîm nikaribe bê parastin û careke din neyê avakirin.[180] Vediguhêze ku TRC ji bo mexdûr û qurbaniyan, ku mecbûr nake ew bêedaletiyên hatine serê wan îsbat bikin, tesîreke psîkolojîk a sarêjbûn û xurtbûnê çêkiriye, bi wesîteya tedbîrên tezmînatê ku

---

178 Paul van Zyl. 1999.

179 H.b.

180 Ji bo xebateke ku balê dikişîne ser nijadperestiya li medyayê hem ya piştî *Apartheid*ê ew vnijadperestiya di medyaya Afrîka Başûr de hem jî ya li dijî encameke lêkolîna ku li ser rojnameyên rewteka sereke hatiye tesbîtkirin dîsan bi lêkolîna rexneyên ku ji medyayên hatine û ya stratejiyên înkarkirina nijadperestiyê, binêrin Kevin Durrheim, Michael Quayle, Kevin Whitehead û Anita Kriel. 2005. Denying racism: Discursive strategies used by the South African media. *Critical Arts*. 19(1-2): 167-186.

ragihandine hikûmetê, ji bo gelek mexdûr û qurbaniyan çendî sînorkirî be jî, mafê tezmînatê bi dest xistiye. Bi puxteyî, ew destkeftiyên ji ber nedarizandina failan û teserûfên hatine kirin, eger çavkaniyên aborî yên ku dê bên îsrafkirin li pêş çav bên girtin, wek nimûne, ew pereyê ku dê ji bo dahatûya mexdûran bê xerckirin, li şûna vê gava li fikirîna îhtimala ji bo îsbatkirina sûcên ku failan kirine ew bê xerckirin, divê bi bîr bê xistin ku ev xwedî giringiyeke heyatî ye û dibêje ku divê fikira edaleta cezayî mîna hêmana herî giring a pêvajoya rarûbûna bi raboriyê re bê dîtin.

Mamdani jî dibêje rayeya efûyê ya ku beranberî heqîqetê ji bo TRC'yê hatiye dayîn, ji rayeyekê zêdetir erkek e, heta mijara sereke ya bazarê ye ku TRC'yê mimkin û wê bi sînor dike û îşaret bi kêmasiyên TRC'yê yên der barê rarûbûna bi raboriyê re dike.[181] Rapor, ku di serî de qîma xwe pê tîne *apartheid*ê wek sûcekî mirovahiyê "bi nav dike", bi awayê tesbîtkirina xesarên rejîmê û ya li ser bingeha ferdan jî tezmînata xesaran û bi daxistina mexdûrên *apartheid*ê ya li aktîvîteyên siyasî, balê dikişîne ser lihevkirina civakî ya ku tê hêvîkirin di navbera dewlet û civatan de pêk bê, kiriye ku di navbera aktorên girêdayî dewletê û yên li dijî dewletê de, li bazarkirineke siyasî dagere. Her wisan, bi berginda heqîqetê tenzîmkirina efûya ferdî, îdîa dike ku gava lê bê bifikirandin gelek failên *apartheid*ê neanîne pêşberî TRC'yê, loma ew bi awayê bêcezatiyeke kolektîf şixuliye.

Mamdani balê dikişîne ser wê yekê ku gava Komîsyonê binpêkirinên di navbera salên 1960-1994'an lê kolaye tespît kiriye ku piştî hildana qedexeyên li ser partiyên siyasî û bidawîhatina rejîma *apartheid*ê dewra herî zêde binpêkirinên ku lê qewimîne ew pêvajoya hanê bûye û organîzasyonên serekî yên failan bi dorê Partiya Azadiyê ya Inkhatayê (*Inkhata Freedom Party* – IFP), Polîsê Afrîkaya Başûr (*South African Police* – SAP) û ANC bûne û organîzasyonê serekî yên mexdûr ANC, IFP û di rêza heftan de jî SAP bûye û bi vî awayî ew îhlalên girseyî û binyadî yên ku di dema rejîma *apartheid*ê de qewimîne ku rejîm di wexta gopîtka xwe de bûye hatine nexuyanekirin û îdîa dike ku hema bibêje resimekî wisan ê *apartheid*ê hatiye resimandin ku reşikan reşik kuştine, loma jî *apartheid* ji wesifên xwe yên dîrokî û kontekstî hatiye şofandin/pakdêran û bi bîr dixe ku mexdûrên şideta dewletê ya nijadperest a ku ji îdareya mêtingehkariyê hatiye dewrgirtin, ne ferdên siyasî û mixalif lê ew civatên qurbanî yên vê şideta sîstematîk in.[182]

---

181 Mahmood Mamdani. 2002. Amnesty or Impunity? A Preliminary Critique of the Report of the Truth and Reconciliation Commission of South Africa (TRC). *Diacritics*. 32(3-4): 32-59.

182 Mahmood Mamdani. 2002.

Tevî ku Mamdani krîterên dewra dîrokî, motivasyona siyasî û miemeleyên xerab ên giran ên girêdayî binpêkirinên diketin nav rayeya Komîsyonê rexne dike, ew sûcên li dijî mirovahiyê yên pirtebeqeyî yên ku rejîma *apartheid*ê li hemberî reşikan kiribûn, em fehm dikin ku hewl hatiye dayîn da ku bi rêzesedemên pragmatîk û polîtîk li lîsteya kesên ku mafê efûyê û tezmînatê bi dest xistin, hatine bicihkirin. Nedana tezmînatan a bi awayê pêşbînkirî li aliyekî, Komîsyona ku cext li îhlalên wekî jicihkirina reşikan a bi zorê, li qanûnên derbasîbûnê yên ku ji ber şopandina reşik û mixalifên rejîmê dihat sepandin, li xebitandina reşikan a bi darê zorê ku ketibûn ber van qanûnan, li tewqîfkirinên reşikan ên nehiqûqî û miemeleyên xerab ên li girtîgehan dikir, mimkin nedibû ku rarûbûna bi rejîma *apartheid*ê re û bi raboriya wê ya nijadperest û mêtingehkar re ku ew di bingeha wê rejîmê de hene, temîn bike. Bi kurtasî, Mamdani dibêje ku ew du ranêzikiyên sereke yên li TRC'yê serwer bûne; rabêjiya dînî ya ku bi modela îtiraf, poşmanî û bexşandinê re lihevhatinê ferz dike û feraseta mafên mirovan a ku pozîsyonên fail/qurban/mexdûran a bi hev û din re sînordar dike, îmkana rarûbûna bi dîroka mêtingehkariyê re û bi ya rejîma *apartheid*ê re berhewa kiriye.[183]

Leebaw dibêje mekanîzmayên edaletê yên tamîrker tenê dikare ji pêvajoyên rarûbûna bi raboriyê re ya civatên biçûk, kevneşopî û bi awayekî rêjeyî homojen xizmetê bike, lê rarûbûna bi rejîma *apartheid*ê re, ku ew ji du civatan pêk tê, bi avaniyên siyasî û hiqûqî yên modern ji hev cihê bûne û li ser îstismarkirina yek ji van civatan a ji aliyê dewlet û civatên din ve û duçarbûna wan a bi sûcên li dijî mirovahiyê ava bûye loma hewce bi bi mekanîzmayên cezaker heye û li gorî wê mebesta TRC'yê ne sarêj û tamîrkirina civakîtiyeke welê ye ku ew qet nehebûye, lê divê mebest ew bûya ku wê bêcezatiya dîrokî û binyadî bi xwe biqedanda ku ji çêbûna vê civakîtiyê re bûye asteng.[184]

Leebaw ku TRC'yê wek dirêjeya mekanîzmayên "edaleta şef" an jî "dadgehên gel" tên zanîn dibîne û ew di nav sîstema darazê ya nerîtî de hene, diparêze ku ji bo avakirina sîstema edaletê ya modern û fermî ku hewcehiya Afrîkaya Başûr pê heye, divê aktorên rejîma *apartheid*ê bên cezakirin. Dibêje ku ji ber pêşewayên ANC'yê bi xwe ne Dadgehên Nurnbergê yên li Almanyayê lê Komîsyona Heqîqetê ya li Şîliyê wek nimûne tercîh kiriye loma raborî ne bi rarûbûneke siyasî lê ew bi rewşa trawmeyeke civakî û mijara terapiyê bi encam bûye. Ji ber ku TRC'yê wehşeta organîze, sîstematîk û ya xwedî mebesta siyasî ji kiryarên elelade yên şidetê veqetandiye û ew wek sûcê li dijî mirovahiyê pênase kiriye û ji ber ku kirdeyên vî sûcî bêceza hiştiye loma tawîza

183 H.b.

184 Bronwyn Leebaw. 2003. Legitimation or Judgment? South Africa's Restorative Approach to Transitional Justice. *Polity*. 36(1): 23-51.

siyasî daye, lê bi ser ve zêde dike ku ji ber ew ji aliyê mîlîtanên ku li dijî rejîmê tê koşiyane û wan red kiriye ew mîna mexdûr/qurbaniyên TRC'yê bên binavkirin, ji aliyê aktîvîstên siyasî û nemaze mensûbên ANC'yê ve mixetab nehatiye wergirtin, di encama vê yekê de raborî bi awayekî kêm hatiye qeydkirin.

Rexneyên li wê yekê, ku li TRC'yê roleke sînorkirî ji bo mêrên lêzimên jinên "elelade" ên mexdûrên "rojane" yên sepanên nijadperest û zayendperest ên rejîma *Apartheid*ê ne hatiye dayîn da ku li mexdûriyetên xwedî wesifên "siyasî" yan jî li bûyerên wekî duçarbûna li tecawizê û êrîşa zayendî şahidiyê bikin, îşaret li wan kêmasiyên eleqedarî qeydkirina îhlalên sîstematîk û kolektîf dike ku ew berê qewimîne.[185] Qeydkirina raboriyê bi awayê şaş û kêm, encamên wisan li xwe digire ku nahêle tedbîrên siyasî û aborî bên hildan ku ev yek ji bo rarûbûna bi raboriyê re hewce ye.

Tevî ku TRC li ser şideta ferdî û fîzîkî hûr bûye, ji ber ku şideta kolektîf û aborî ya rejîma *apartheid*ê nexuya bûye loma bi kêrî wan spiyan tê ku ew dixwazin li dijî cudahitiya pozîtîf û çareseriyên malî yên binyadî yên ji bo reşikan rabin. Ji ber ku spiyan qebûl nedikir ew destekkarên çalak ên nijadperestiyê ne, di warê redkirina edaleta aborî û hilanîna ji holê ya newekheviya aborî ya berdewam a ku nijadperestiyê ew çêkiriye, zorahî nakişînîn. Ev rewş jî dike ku bifikirin ji bo hilanîna ji holê ya "kêmasiya edaletê" ya ku reşik halê hazir bi guman nêzikahî tê didin û sivikbûna meseleya aborî ya ku piştî dewra *apartheid*ê hîn berdewam e li wan hatiye teklîfkirin û loma jî qîmeta tezmînatên ku diviya bi awayê heqkirî bidana wan û her wisan meşrûtiya hemû pêvajoya TRC'yê qels dike.[186] ANC, ku bi garantiya dê bi temamî îmtiyazên xwe yên bi berdewamiya *Apartheid*ê winda nekin û dê ji wan tol neyê standin desteka spiyan wergirtibû û bawerî bi sedeqeta reşikan dianî ku wê azadbûna wan pêk anîbû, li şûna ku TRC'yê pêşbînî kiribû tezmînatên ferdî bide lê giranî dabû ser "projeyên geşepêdanê" yên xwedî xuyanga tezmînata kolektîf jî, wek tawîzên aborî yên ku tawîzên siyasî temam dikin, dihatin dîtin.[187]

Kesselring, rewşa ku Koma Destekê ya Khulumaniyê ya ew yek ji teşebusên herî giring a mexdûrên *apartheid*ê ye ku ji pêvajoya TRC'yê tetmîn nebûne û dixwaze sepanên efûyê yên ku mexdûran mehrûm dihêle da ew li dijî failan doza ceza venekin

[185] Binêrin LaKeasha G. Sullivan û Garth Stevens. 2010. Through her eyes: relational references in black women's narratives of *Apartheid* racism. *South African Journal of Psychology*. 40(4): 414-431.

[186] Nevin T. Aiken. 2016. The distributive dimension in transitional justice: reassessing the South African Truth and Reconciliation Commission's ability to advance interracial reconciliation in South Africa. *Journal of Contemporary African Studies*. 34(2): 190-202.

[187] Aurélien Pradier, Maxine Rubin û Hugo van der Merwe. 2018. Between transitional justice and politics: Reparations in South Africa. *South African Journal of International Affairs*. 25(3): 301-321.

bibe Dadgeha Makeqanûna Afrîkaya Başûr, şikayetên li şirketan ku wan kartela nan pêk aniye bibe Dadgeha Bilind a Kapê ya Rojava û deynên xwe yên li wan şirketên ku navenda wan li DYA'yê ne û ew şirtket destek didin rejîma *apartheid*ê jî bibin dadgehên DYA'yê, wek derfeta mixalefeteke civakî dibîne ku TRC'yê pêvajoya rarûbûna bi raboriyê re kêm hiştiye û diyar dike ku ev pêvajoyên ferdî û kolektîf ên hiqûqî yên dihêlin mexdûrên *apartheid*ê pozîsyona kirdeya siyasî wergirin û neheqiyên ku piştî dewra *apartheid*ê wek mîras mane li rojevê bihêlin da ku ji "bîreweriyên rûxînê yên tesîr li bedena wan kiriye aza bibin" hêz dide wan û îdîa dike ku derfet dide wan ji bo bikarin hesabpirsîna hiqûqî ya ku lihevhatina siyasî ew kêm hiştiye bidomînin.[188] Ev îdîa ji aliyê bibîrxistina rarûbûna bi raboriyê re, nîşandana wê yekê ye ku ew bi mekanîzmayên ku nijadperestiyê bêceza dihêle temam nabe, tewqên (tebeqeyên) nijadperestiyê yên ku mekanîzmayên edaletê yên cezayî jî nikarin bigihîjin wan -encam çi dibe bila bibe- dê bi rêya têkoşîna hiqûqî bi xwe berçav bibin û rehenda sîstematîk a nijadperestiyê jî dê derbasî qeydê bibe, giring xuya dikin.

***Tewqên Nijadperestiyê***

Adam Sitze, ku di navbera feraseta hesabpirsîna hiqûqî û edaleta cezayî ya Dadgehên Nurnbergê û feraseta ji bo lihevhatina civakî efûya giştî û edaleta tamîrker a komîsyonên edaletê yên li welatên Amerîkaya Latîn de, feraseta TRC'yê ya ku xwe dispêre efûya ferdî ya binyad-mexdûrî, xwedî şertê heqîqetê û tezmînatê wekî rêya sêyem tê dîtin, ew mîna "makîneya nemimkin" a pêknehatina mucîzeyan pênase dike û diangêje ku sedema vê nemimkiniyê jî, di bingeha wan saîqên mindemîçê avakirina TRC'yê de hene.[189] Sitze, ji ber ku di serî de Dadgehên Nunbergê tenê qîma xwe bi darizandina çend efserên nazî yên astbilind aniye loma îtiraz li wê yekê dike ku çima ew wek sepaneke efûya giştî ya fiîlî û bêcezatiyê nayê dîtin û TRC'yê ji komîsyonên heqîqetê yên li Amerîkaya Latîn venaqetîne û wê wekî dirêjeyeke komîsyonên lêkolînê yên ji saziyên sereke yên birêvirinên mêtingehkaran dibîne. Siztze dibêje ku Qanûna Geşepêdana Yekîtiya Neteweyî û Lihevhatinê (*Promotion of National Unity and Reconciliation Act 34* – Qanûna PNR'yê) ya bi mêjûya 1995'an, ku pê damezirandina TRC'yê hatiye çêkirin, piştî temînata bêcezatiyê ya ji bo mensûbên Hêzên Parastina Afrîkaya Başûr kariye bê pejirandin û bi vî awayî hewce pê nemaye ku TRC efûyeke giştî ragihîne û parlamentoyên *apartheid*ê bi bîr dixe ku wan bi qanûnên bêcezatiyê hêzên ewlehiyê û rayedarên dewletê yên ku di Qetliama Sharpevilleyê ya sala 1960'î û

---

188 Rita Kesselring. 2017. *Bodies of Truth Law, Memory, and Emancipation in Post-Apartheid South Africa*. Stanford University Press: 23-48, 198-199.

189 Adam Sitze. 2013. *The Impossible Machine A Genealogy of South Africa's Truth and Reconciliation Commission*. The University of Michigan Press: 1-20.

Serhildana Sowetoyê ya 1976'an de rol wergirtinbûn, hêvişandine.[190]

Ew, xuyabûna bêeleqetiya îçtihatên bêcezatiyê ya bi metoda "bexşandinê" ya xweserî TRC'yê re, efûya ku Qanûna PNR'yê bexşandiye, bi wê yekê aşkera dike ku ew xwedî wesif û pîvaneke wisan e ku nahêle ev efû wekî bêcezatiyekê bê dîtin û îdîa dike ku ya hildana nav çarçoveya bêcezatiyê ya dewleta *apartheid*ê bi xwe ye.[191] Li hêla din, bi bîr dixe jî, ku ew mizakereyên di navbera hikûmeta *apartheid*ê ya dawî û ANC›yê de hatiye meşandin û di sala 1990›î de li parlamentoyê hatiye pejirandin, ji bo sûcên ku ji aliyê mensûbên ANC û tevgerên azadiyê ve hatine kirin, bi qanûneke bêcezatiyê bi encam bûye.[192]

Sitze, îdîa dike ku TRC ji komîsyonên heqîqetê yên li welatên mêtingeh hatine avakirin cuda nexebitiye, bi tenê ne xwedî fonksiyona civandina zanyariyê bûye; amrazekî ji bo hildana bin ewlehiyê ya zebta kolonyal û xwedî mebesta normalîzekirinê, teknîkeke aîdî serweriya modern û zêhniyeta birêvebirinê bûye. Dibêje ku ev cure komîsyonên Împaratoriya Brîtanyayê ava kirine da ku li Afrîkaya Başûr "berberîtiyên nijadî lê bikolin" û der barê xwecihên ku di hikûmetên kolonyal de nayên temsîlkirin biryaran bigirin û sûcên mirovahiyê yên "ji ber aloziya ku wan xwecihên di nav xwe de li hev nakin, derxistine" bi metodên manend ên bêcezatiyê û bi rabêjiyên "trajediyên qewimî" hildidin dest û derpêş dike ku wekî me li jorê ji Foucault behs kir, di bingeha xwe de ji avakirina biyo-desthilatê re xizmeta temînkirina madeya xam dike.[193]

Sitze, bêcezatiya ku komîsyonên heqîqetê bi rêya katarsîsa neteweyî û mekanîzmayên efûyê pêk aniye, ku beyanên şahidan "nefehmbar" dibîne û antropolojiya kolonyal wan wek xwecihên îrrasyonel tebîr dike, şahidên ku lîteratura trawmayê ew wek qurban û mexdûr pênase dike lê îfadeyên wan li yên mîna bijan, bikeder, her wisan bi "ewlebariya wê nîqaşbar e" dadigerîne, bi awayekî besîd dîtina vê yekê wekî bedêleke aştî û lihevkirinê red dike û balê dikişîne ser nêzikîtêdaneke rexneyî ya ku lîteratura edaleta dewra derbasîbûnê wê nemimkin dike.[194] Li gorî wî, komîsyonên heqîqetê tercûmeyeke nû û ya qebûlbar a feraseta serweriya mêtingehkar û nijadperest û ya kargêriya wê dike û raboriya ku divê hesab jê bê pirsîn jî ji dîroka mêtingehkar û

---

[190] Adam Sitze. 2013: 25.

[191] H.b.: 126.

[192] H.b.: 26. Sitze, diyar dike ku bi derxistina qanûnên bêcezatiyê re yên di navbera salên 1990-1994'an de, bi qasî lêkolîneran ew peyitandiye, sûcdarên ku hejmara wan ji 13.000'an digihîje heta 21. 000'î, ji darizandinan miaf hatine hiştin û lê zêde dike hejmara wan sûcdarên ku di navbera salên 1957, 1961 û 1977'an de ji qanûnên hêvişandinê îstifade kiye, ne tê de ye.

[193] H.b.: 159-170.

[194] H.b.: 192.

nijadperest îzole dike, loma hewl dide divê yên bên cezakirin efû dike, yên pêwîst e wek siyaset bên xurtkirin jî şîfadar dike.

Ranêzikiyên radîkal ên ku li lîteratura edaletê ya dewra derbasîbûnê ya têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re û bi taybetî bi mesafeyî têgiha lihevhatinê hildidin dest, ji bo ku bikarin ji sûcên wekî nijadperestî û mêtingehkariyê yên dîrokî, binyadî û sîstematîk hesab bipirsin, îşaret ne bi sarêjkirina û tetmînkirina mexdûran, lê îşaret bi wê yekê dike ku divê bê armanckirin ew wekî kirdeyên siyasî beşdarî li guherîn û hesabpirsînê bikin. Neocosmos îdîa dike ku ANC'yê bi wesîteya TRC'yê mixalefeta civakî kemijandiye, însîyatîfên xweser ên siyasî yên gelan serkut kirine, kirdeyên siyasî kirine rewşa pêkhatiyên ji mexdûran û li şûna ku desthilatê bidin gel, ew di nav têkiliyên desthilatê yên ji rejîma *apartheid*ê dewrgirtî de heps kirine û fikira azadiyê jî li cihê melekeya mayîna li jiyanê ya ku dewletê ew bexşandiye îkame kiriye û bi berdewamî diangêje ku pêvajoya derbasîbûnê ne tenê bi rarûbûna bi raboriyê re ya sernekeftî maye, li neteweperestiyeke ku xwe ji dijminiya bi biyaniyan re xwedî dike û li binyadeke civakî ya apolîtîk veguheriye.[195] Binyada siyasî û civakî ya îroj ku ji ber têkoşîna ANC'yê ya li dijî *apartheid*ê meşandiye ya xwedî taybetmendiyên wekî xwebirêxistinkirina navendîparêz, veavabûna hiyerarşîk, kirina siyaseta binyad-dewletî û serîlêdana li "şideta şoreşger" a ji bo bidestxistina serweriyê û wekî encama bivênevêyî ya rarûbûna bi raboriyê re û desthilata piştî *apartheid*ê dibîne, loma rewşê wekî Afrîkayeke Başûr a ku bi serweriya rabêjiyên mafên mirovan û civaka sivîl şekil digire, şopên kargêriya mêtingehkar li xwe hildigire, berêtiyê dide geşepêdana aboriya neolîberal û ne desthilata gel, lê belê ya dewletê lê hikum diajo, diresimîne.

Neocosmos, bi bîr dixe ku gava ANC li mişextiyê bû, nemaze di salên 1980'yan de, têkoşîna ku Bereya Demokratîk a Yekbûyî (*United Democratic Front* – UDF) serê wê dikişand û temsîliya şêweyeke din a têkoşîna li dijî *apartheid*ê dikir, berêtiyê dida birêxistina xwedî bingeha gel ne ya partiyê û kirdeyîbûna siyasî; kultê pêşewatiyê, avakirina neteweya nijadî û têkoşîna azadiyê mihekeme dikirin û bi kiryarên bêşidet ên ku bi înîsiyatîfa gel pêk dihatin, şekil girtibû.[196] Ew dibêje ku bi salên 1990'î re, piştî rabûna qedexeyên siyasî ANC'yê pêşî di îdareya *apartheid*ê de cih girtiye û di sala 1994'an de jî dest pêkiriye feraseta "neteweya keskesorê" ya ku lênêrîna li cudahiyan ji xwe re mîna esasê misemeheyê dibîne derbasî pratîkê kiriye û modela xwebirêxistina pirnijadiyê (*multi-racial*) ya ku bi pesenda spiyan meşandiye û modela xwebirêxistinê ya ku cudahiyên nijadî (*non- racial*) red dike ya ku UDF'yê bi ramana "hişmendiya

---

[195] Michael Neocosmos. 2016. *Thinking Freedom in Africa: Toward A Theory of Emancipatory Politics*. Witts University Press: 163-169, 181.

[196] H.b.: 135-152.

reşikan" ew pejirandibû, ji dewreyê derdixe.[197] Her wiha îdîa dike ku bi desthilata ANC'yê re û nemaze bi wesîteya TRC'yê lihevhatineke ku rabêjiyên xirîstiyan-lîberal ew şêwandiye û feraseta mafên ferdî ya xwedî bingeha mexdûrên apolîtîk serwer bûye, pêvajoya kirdeyîbûna siyasî ya reşikan bi temamî bi dawî bûye û derbasîbûna li demokrasiya dewletê jî pêk hatiye.

Neocosmos dibêje dewra pêşî ya desthilata ANC'yê ya di bin birêvebirina Nelson Mandela de li dora rabêjiyên neteweperweriya dewletê, neolîberalîzma ekonomîk, civaka sivîl, mafên mirovan û pirçandîtiyê hatiye avakirin û derpêş dike ku resimê Afrîkaya Başûr a nû ya bi çîroka derbasîbûna li demokrasiyeke micîwî hatiye xemilandin û bi şekilê raser ê ji welatên din ên Afrîkayê cuda hatiye xêzkirin, hewl nedaye da ku cudahiyên nijadî yên ji zêhniyeta mêtingehkariyê dewr hatine wergirtin, ji holê rake.[198] Dewra di navbera 1996-2008'an de ya Thabo Mbeki, wekî dewreke wisan terîf dike ku feraseta dewra berî wê û pirsgirêkên wê bi siyaseta teknokratîk hatiye perçinandin; dewlet ji bo ku li cem Rojava rewatiyê bi dest bixe û pêdiviyên teşebusên taybetî dabîn bike û ji bo êşên gelê ku destek didinê û daxwazên wan (nemaze yên wekî pêdiviyên kar, hewîn û erd) bi cih bîne, di navbera duyîleyê (dîlemeyê) de asê maye.[199] Dewra Jacob Zuma ya di navbera 2008-2013'yan de jî wekî dewra dijminiya biyaniyan a fermî, şideta sîstematîk û lînça civakî vediguhêze ku di qetliama sala 2012'an de bi kuştina 34 madenkaran a ji aliyê polîsan ve bi encam bûbû û bi xirikandina li paş wesaîta polîsan a Mido Maciayê mozambîkî yê ajokarê taksiyê jî gihîştibû lûtkeyê.[200] Bi metodên şidetê yên ku ji mêtingehkariyê hatine wergirtin, meşandina siyaseta "xwecihîtiyê" ya ku armanc dikir derfetên micîzeya Afrîkaya Başûr ên aborî û siyasî li dijî afrîkayiyên "biyanî" bihêvişîne, wek encama nekarîna azadbûna ji rejîma *apartheid*ê ya desthilata nijadî û şedît a dewletê û nekarîna avakirina desthilateke gel a ku xwe dispêre kirdeyên polîtîk, dibîne.

Cejas jî dibêje, bi taybetî bi salên 1990'î re ew dijminiya li dijî biyaniyan ku bi îfadeyên wekî "Afrîka raweşiya ser sînorên me" vebeyiyabû medyaya Afrîkaya Başûr dihat meşandin û wekî nimûne di sala 2007'an de bûbû sedema agirberdana berî porê jinikeke etiyopyayî û şewitandina mêrikekî maliyî, tevî reşikên "sûcdar, qirêjî û cahil" ku ji Afrîkaya "mayî" hatibûn, reşikên ji Afrîkaya Başûr jî dabû ber xwe û vediguhêze ku ji ber encama mexdûriyetên ji aboriya *apartheid*ê mîras mane, polîtîkaya koçberan

---

197 H.b.: 159-161.

198 H.b.: 168-169.

199 H.b.: 171.

200 H.b.: 176-181. Erka serokatiyê ya Zuma heta 2018'an ajot. Ji bo dîmenên pevçûna Macia ya bi polîsan re û xirikandina wî ya bi paşiya erebeya polîsan ve binêrin: https://www.theguardian.com/world/video/2013/mar/01/south-african-police-drags-man-fresh-video-footage [20.02.2021].

a ku heta sala 2003'yan nehatiye guhartin û tevî qeyranên nû yên ekonomîk zêde bûne nijadperestî hîn jî li Afrîkaya Başûr zindî ye.[201] Kersting jî, ku dijminiya li dijî biyaniyan a li Parzemîna Afrîkayê vedikole, dibêje ew neteweperweriya berê ya xwedî îdîaya ku ber bi têkoşîna serxwebûnê dide, hêzên mêtingehkar ji xwe re dijmin dibîne, komên cuda yên civakî û etnîk li xwe digire û rê li ber qebîletiyê digire, îroj cihê xwe ji neteweperweriyeke xwedî terzê remekî ya ala û marşa neteweyî re hiştiye û slogana "Afrîkaya her kesî" ya Afrîkaya Başûr jî wekî "Afrîkaya afrîkayiyên xwecihî" rojane kiriye.[202]

Ez beşdarî Spiegel dibim ku dibêje bi sayeya mîrasa sermayeya madî û civakî ya ji dewra *apartheid*ê maye, spiyên ku hîn jî dameziraweyên sereke yên aborî û akademîk di destê xwe de digirin bertek nîşanî wan qanûnan didin ku ew ji bo guhartina vê rewşê hatine derxistin û divê mirov nijadperestiya reşikan jî ku piştî desthilata xwe ji dest didin wan dişibînin mîna babûnên nêr ên ku depresîf û pevçûnokî dibin, bi îhtiyad bişopîne.[203] Li aliyê din, divê ev îhtiyad tim li ser nijadperestiya sîstematîk hûr bibe û divê li pênasekirina nijadperestiyê ya ji aliyê nijadperestan bi xwe, îtiraz bike. Jê girîngtir, ne ez difikirim ku di şiroveyên felsefî de yên vê îtraza ku çavkaniya wê ya teorîk û siyasî wekî "hişmendiya reşikan" xwedî puxteya nijadperest e heye ne jî dikirim ku di cureyên Ubuntuyê de yên xwedî nêrîna romantîk de hebe.

Felsefeya Steve Biko ya ku ew wê wek "nijadperestiya dijberî nijadperestiyê" pênase kiriye û wek hişmendiya reşikan bi nav kiriye, ku diangêje bi mebesta piştgiriya di navbera reşikan de xurt bike û nasnameya mêtingehkariyê ya ku li reşikan tê ferzkirin mihekeme bike, hewce ye ew xwe ji spiyan cuda bi rêxistin bikin, li gel Lamola ku ew balê dikişîne ser xelitîna ku dibe ew di pêvajoya biadawîanîna nijadperestiyê de wek rawestgehek bê bikaranîn, ez jî difikirim ku di encamê de ev felsefe ramana nijadperest ji xwe re nake armanc.[204] Bi balkişandina ser wê yekê ku mêtingehkariya spiyan a li Afrîkaya Başûr li dawiya dawî "*epistemicide*" yanî qirkirina metodên pêzanîna xweser û hilberandina zanyariyê ya reşikan e, loma ez wisan difikirim ku di wê îdîayê de jî sawîreke orîjînalîtiyê ya manend peyda dibe ku dibêje bi tenê bibîranîna felsefeya Ubuntuyê ya nerîtî ya xwedî wesifê koloktîvîst û aştiyane mimkin dibe da ku

---

201 Mónica Inés Cejas. 2007. Racial Discrimination in Post-*Apartheid* South Africa: A New Irreducible "Other"?. *Safundi: The Journal of South African and American Studies*. 8(4): 473-487.

202 Norbert Kersting. 2009. New Nationalism and Xenophobia in Africa: A New Inclination? *Africa Spectrum*. 44(1): 7- 18.

203 Andrew Spiegel. 2008. Racism as epithet in the context of post*apartheid*'s demographic parity goals. *Anthropology Southern Africa*. 31(3-4): 103-113.

204 Binêrin M. John Lamola. 2016. Biko, Hegel and the End of Black Consciousness: A Historico-Philosophical Discourse on South African Racism. *Journal of Southern African Studies*. 42(2): 183-194.

rizgarbûna tam a ji mêtingehkariyê pêk were.[205] Ji lew re, bi texeyulkirina dengvedana sawîrên manend ên li Tirkiyeyê dixwazim bibêjim ku ji ber pratîkên nijadperest û rabêjî li her derê dinyayê bi doktrînên wekî hev hevkariyê dikin, avanî û encamên sîstematîk ên manend diafirînin, loma têkoşîna bi nijadperestiyê re jî, divê bi têkoşînên din ên li dinyayê re, bi gelan û felsefeyan re di nav piştevaniyê de bê meşandin û ne tenê berê xwe bide nijadperestiya fermî, divê ew berê xwe bide tebeqeyên nijadperest ên cuda jî.

### *Sînorên Edaletê yên Dewra Derbasîbûnê: Nijadperestî*

Ez dixwazim binê xalekê xêz bikim ku sernav û vê xebatê ew kêm hiştiye û wisan dest pê bikim. Helbet sînorê tek ê dewra edaleta derbasîbûnê ne nijadperestî ye; sînorekî din û dibe ku yekî hîn krîtîk hebe: mêtingehkarî. Di vê xebatê de, gava ez hewl didim nijadperestiyê hildim dest ku ew mêtingehkariyê û sîstemên tehekumê yên manend wek rêbêjiyek û pratîk rewa dike, divê ez wî heqî teslîm bikim ku ji behskirina navê mêtingehkariyê yan jî bi wesifandina amrazên birêvebirin û şidetê yên dewletê ya bi sifatê mêtingehkariyê wêde neçûme û dixwazim wisan pê de biçim. Di vê beşê de jî dixwazim bi taybetî cext li ser têkiliya nijadperestiyê ya bi bêcezatiyê re û ya li ser derfetên der barê xebatên edaleta dewra derbasîbûnê de bikim ku dikare bike nijadperestî xuyabar bibe û hesab jê bê pirsîn.

Çendî ew îdîayên ku dibêje mekanîzmayên edaleta dewra derbasîbûnê xwe dispêrin sedemên pratîk û pragmatîk ên bi serdemeke dîrokî ya diyar re sînorkirî ya meseleya rarûbûna bi raboriyê re û şideta nijadperest a ji raboriyê dewrî îroj bûye nexuyane dike, neyeksaniya zayendî û binpêkirinên kolektîf paşguh dike, midaxeleyên siyasî û leşkerî ya dewletên serwer neberbiçav dike û xwe dispêre feraseta hiqûqa navneteweyî ya navend-dewletî, cografyaya heyî ya bêcezatiyê dihêvişîne û berfireh dike ne nû bin jî, lê hîn aktueliya xwe diparêzin.[206] Ew îdîayên dijber ên ku dibêjin xerckirina çavkaniyên darayî ya ji bo mekanîzmayên darazê ya bi ûcba bidawîanîna bêcezatiyê, divê ji bo bidawîanîna şideta çandî û binyadî bê bikaranîn ku wan li raboriyê fonksiyona meşrûkirina şideta fîzîkî û îroj jî ya newekheviya sosyoekonomîk û siyasî tîne cih, lê tenê bi rêlibergirtina newekhevî û îhlalên heyî, xebitandina mekanîzmayên darazê û hildana bin garantiyê ya dewra derbasîbûnê mimkin e, tiştekî

[205] Binêrin C. W. Maris. 2020. Philosophical racism and ubuntu: In dialogue with Mogobe Ramose. *South African Journal of Philosophy*. 39(3): 308-326.

[206] Binêrin Rosemary Nagy. 2008. Transitional Justice as Global Project: Critical reflections. *Third World Quarterly*. 29(2): 275-289.

ji bîr dikin ku heta bêcezatî bidome dê nijadperestî, şidet û newekhevî jî dewam bike.[207]

Çendî edaleta cezayî ne çareserkirina newekheviyên sosyoekonomîk be jî, ew newekheviyên ku bi qasî tê xwastin dê bi mezaxtina çavkaniyên darayî yên ji bo edaleta cezayî ji holê ranebin jî, lê bi taybetî dikare ew bi kêrî birîna çavkaniyên siyasî yên nijadperestiyê bên. Jixwe ew komîsyonên heqîqetê yên ku di dewra derbasîbûnê û piştî wê de, bi mebesta aramkirina elîtên leşkerî, hiqûqî, aborî û siyasî yên ku naxwazin desthilatê ji dest berdin an jî bi sedema sîstemên darazê yên bêkêr û bêberhem yaxud ên biha serî li hatiye xistin, pirî caran bi ûcba telafîkirina bêcezatiyê hatine bikaranîn û em dibînin ku "mitebaqeteke aşopî" ya ku li şûna dad û aştiyê di navbera heqîqet û lihevkirinê de têkiliyeke bereyî çêdike bi pêş dikeve.[208] Li hêla din, ew mekanîzmayên telefiyê yên "serkeftî" ku hevaltî bi dagerîna siyasî û hiqûqî re nakin, nikarin rojeva edaletê xelas bikin an jî qîma xwe bi derxistina holê ya diyardeyên heqîqetê yên eleqedarî binpêkirina tîne digihîjin lihevkirineke civakî ya şikestokî, tevî nixamtina heqîqetên rojane û dîrokî yên wekî nijadperestî û mêtingehkariyê, em dizanin ku ji lihevhatineke siyasî ya mayînde jî bi dûr dikeve.[209] Her wiha ew îdîaya ku di komîsyonên heqîqetê de, bi wesîteya heqîqetên ku mexdûr şahidiyê li wan dikin katarsîseke civakî diqewime û digihîjin lihevhatinê, bi awayekî giştî ji îdîayên ku ew bi kêrî qisimên xwedan îmtiyaz tê bi wê de naçe, tenê bi temînnekirina pêdiviyên mexdûran ên aborî, endîşeyên wan ên hestî û derûnî, bendewariyên wan ên edalet û wekheviyê dimîne. Di komîsyonan de şahidîkirina mexdûran a bi awayê dîtina beşdariya siyasî yan jî wek feraseteke edaletê ya xwedî bingeha mexdûran şirovekirina rewşê, dîsan dibe sedema perçinandina îdraka ku beşa xwedan îmtiyaz bi raboriyê re rarû bûye yan jî nijadperestî bi dawî bûye.[210]

Divê em bi bîr bixin ku qalibên diyar ên desthilat û bêcezatiyê, piştî dewra lihevxistin û pêvajoya derbasîbûnê jî berdewam kirine û divê em wisan li ser wekî çavkaniyên nijadperest û mêtingehkariyê û her wiha li ser berdewamiya wan a şideta binyadî ya ku di cirmên bingeh-dewlet an jî damezireweyî de domiyaye hûr bibin û hewce ye ku mirov berê edaleta pêvajoya derbasîbûnê bide mekanîzmayên ku sûc afirandine û

---

207 Binêrin Matthew Mullen. 2015. Reassessing the focus of transitional justice: the need to move structural and cultural violence to the centre. *Cambridge Review of International Affairs*. 28(3): 462-479.

208 Anne K. Krüger. 2012. From Truth to Reconciliation: The Global Diffusion of Truth Commissions. Birgit Schwelling (Ber.). *Reconciliation, Civil Society, and the Politics of Memory Transnational Initiatives in the 20th and 21st Century* içinde. Transcript Verlag: 339-367.

209 Binêrin Pablo de Grieff. 2012. Theorizing Transitional Justice. *Nomos*. 51: 31-77.

210 Brandon Hamber û Patricia Lundy. 2020. Lessons from Transitional Justice? Toward a New Framing of a Victim- Centered Approach in the Case of Historical Institutional Abuse. *Victims & Offenders*. 15(6): 744-770.

dewra piştî lihevxistinê jî divê wekî “cihê sûc” bibîne.[211] Mekanîzmayên ku di bingeha sûc de hene, hêmanên sîstematîk û têkilî, pirî caran girêdayî hev in, ji ber ku bi awayê ahengdarî cihkî, girift û şemitokî dixebitin, loma hewce pê heye ku ji bo tesbîtkirina xebitîna şêweyên taybetî yên van cure çavkaniyan, lêkolînên bi aliyê paş de bên kirin û ji bo midaxelekirina li van şêweyên xebitînê jî divê ku ji bo dahatûyê, standina tedbîran bên temînkirin. Ji vî aliyî ve, wek nimûne tê pêşniyazkirin ku tezmînat ne tenê bi awayê dayîna neqdî, bi derfetên perwerdehî, tenduristî û kar bê plankirin ku mexdûr û nemaze jin bikarin têkiliyên xwe yên bi desthilata heyî re biguhêrin û divê hiqûqa cezayî jî ji nû ve bê vesazkirin da ku bikare van cure tezmînatan sererast bike.[212]

Yek ji qadên xebatê jî, ku rehendeke nû dide edaleta dewra derbasîbûnê û balê dikişîne ser lênêrîna cuda ya aliyê sîstematîk a nijadperestiyê, teserûfa li ser çavkaniyên jiyanî ya rejîmên nijadperest e. Ruiters ku aliyê nijadperest a polîtîkayên jîngehê yên ku ji dewra *apartheid*a Afrîkaya Başûr heta roja me ya îroj tê vedikole û balê dikişîne ser bêedaletiyên ku nayên pîvan; wek nimûne spî qadên jiyanê yên li herêmên ku herî kêm ji gilêşên pîşesaziyê tesîrdar dibin îşxal dikin lê reşik pêdiviyên xwe yên sereke yên mîna ava paqij, cihên lêhewîna bisihet û qîmkirî dabîn nakin; ji ber nexebitîna rojên bi sedema nexweşînan û xerckirina pereyê ji bo veguhastinê bi wan re windahiyên malî çêdibin; ji ber xwegermkirina erzan û ya ronahiyê bikaranîna don û komirê duçarî talûkeyan dibin, mehkûmî pirsgirêkên tenduristiyê yên mawedirêj û maweya kurt a jiyanê dibin, paşê jî lê zêde dike ku “av, ji dahatê hîn bêhtir bi awayekî neyeksan tê belavkirin.”[213] Ruiters, bi bîr dixe ku vê pergala mekanî ya ekonomîk ku cudahiyên nijadî siruştî dike û dijberên *apartheid*ê jî wê wek “tezahurên cografî yên kolonyalîzmê” bi nav dikin, bi rabûna ji holê ya jorxaneya nijadperest re bi dawî nebûye, neqil dike ku ev pergala hanê bi serweriya mekanî ya kapîtal kedê hepsî vebijêrkên sînorkirî dike û cihêtiya di navbera “çand”a ku reşikên kedkar xwediyê wê ne û ya “civak”a ku çînên navîn ên spî xwediyê wê ne jî, kûrtir dike.[214]

Divê bê gotin ku rexneyên li mekanîzmayên edaletê yên dewra derbasîbûnê tên girtin, bi giştî li dewletan tên arastekirin û pêşniyazên ku ji bo qadên xebatê yên aktorên sîvîl tên kirin da ku nijadperestiya sîstematîk bê aşkerakirin jî, dibe sedem ku lîteratureke hêja pêk were. Li aliyê din, divê ew hişyarî jî li pêş çav bên girtin ku dibe aktorên

---

211 Binêrin Jennifer Balint, Kristian Lasslett û Kate Macdonald. 2017. “Post-Conflict” Reconstruction, the Crimes of the Powerful and Transitional Justice. *State Crime Journal*. 6(1): 4-12.

212 Binêrin Eric T. Hoddy û Paul Gready. 2020. From agency to root causes: addressing structural barriers to transformative justice in transitional and post-conflict settings. *Contemporary Social Science [Online]*.

213 Greg Ruiters. 2001. Environmental racism and justice in South Africa’s transition. *Politikon: South African Journal of Political Studies*. 28:1. 95-103.

214 H.b.

sîvîl jî ji erezên civakî mizdarib bin û loma ji bilezxistina dagerînên radîkal zêdetir, divê ew wek kanên aktîvîzma baqî bên dîtin ku îşaret bi wan nelihevkirinan dike dê ebed bi temamî çareser nebin û bi wan daxwazên edalet û wekheviyê dike ku dê tim berdewam bibin.[215] Ji vî aliyî ve, ez dixwazim bi awayekî kurt behs ji hin nîqaşên fikirder ên li ser rêbazên nû yên zanyarî û lêkolînê, xebatên arşîv û hafizayê, derfetên hunerî û hilberîna ekonomîk û perwerdehiya alternatîf bikim.[216]

Ji ber ku têkoşîna ji bo rarûbûna bi raboriyê re dê bi berdewamiya nifşan bidome, loma ez difikirim ku xebatên saziyên perwerdehiyê û metodên wan, perwerdekar û mifredatên wan tînin rojê xwedî giringiyeke cuda ne. Ew ji raporên komisyona heqîqetê yên bîst welatan bi rê dikeve û xebata ku hem balê dikişîne ser berpirsiya binpêkirinên raboriyê ya di warê perwerdehiyê de hem jî ya potansiyela di warê rarûbûna bi raboriyê re, vediguhêze ku ew li ser komîsyonên heqîqetê bi giştî jî mifredat û şertên perwerdehiyê çawan bê ji lihevxistinan re dibin bingeh û perwerdehî bê çawan ji lihevxistinan tesîrdar dibe hûr dibe û tenê li ser naveroka perwerdehiyê qîma xwe bi kirinan tewsiyeyan tîne.[217] Xebateke din jî, ku bi bîr dixe xebata nûkirina mifredatê ya tenê behs ji encamên giştî û razber dike û di rapora TRC'yê de heye, bala xwe nedaye rejîma *apartheid*ê, berdewamiya avahiyên nijadperest û kolonyal der barê vê mijarê de ji ber ku techîzaeteke taybetî bi perwerdekaran nedaye qazanckirin, wek nimûne, rexne li wê yekê dike ku wezîfeya veguhastina versiyoneke maqûl a heqîqetên ku di komîsyonan de hatine vegotin, ji însafa nivîskarên pirtûkên dersan re û ji wan kesan re hatiye hiştin ku perwerdehiyê didin perwerdekaran.[218] Ji vî aliyî ve, ji ber ku Komîsyona Heqîqetê ya Syerra Leoneyê, bi maytêkirina UNICEF'yê jî, ji bo zarok û ciwanan xebatên taybetî kirine û ji ber ku versiyoneke "dosta zarokan" a rapora nîhayî weşandiye, wek nimûneyeke erênî tê nîşandan.[219]

Li şûna ku li ser perwerdehiyê tewsiye li dewletê bên kirin û ev tewsiye jî ji kêfa dibistanan re bê hiştin, hewce ye li dameziraweyên perwerdehiyê yên fermî û nefermî û xebitîna bi wan perwerdekaran re yên ku di her cure perwerdehiya navxweyî ya pîşeyî de erk werdigirin, ne tenê pêşniyazkirina perwerdeya ku zarok û ciwanan, lê temenmezinan jî li xwe digire bê kirin û

[215] Birgit Bräuchler. 2019. From transitional to performative justice: Peace activism in the aftermath of communal violence. *Global Change, Peace & Security*. 31(2): 201-220.

[216] Binêrin Paul Gready û Simon Robins. 2017. Rethinking civil society and transitional justice: Lessons from social movements and 'new' civil society. *The International Journal of Human Rights*. 21(7): 956-975.

[217] Julia Paulson û Michelle J. Bellino. 2017. Truth commissions, education, and positive peace: an analysis of truth commission final reports (1980-2015). *Comparative Education*. 53(3): 351-378.

[218] Felisa L. Tibbitts û Gail Weldon. 2017. History curriculum and teacher training: shaping a democratic future in post-*apartheid* South Africa?. *Comparative Education*. 53(3): 442-461.

[219] Julia Paulson û Michelle J. Bellino. 2017.

divê ceribandina sepana rêyên mitewazî yên ji bo ku lihevxistina dema berê bi îhlalên îroj re û bi rarûbûneke raboriyê re yên wekî avaniyên sîstematîk ên nijadperestiyê eleqedar dike, bê kirin. Bi vî awayî, ne tenê failên ku sûcên li dijî mirovahiyê kirine û mexdûrên van sûcan, divê wan ên ku emelekî mirovî kiriye û mexdûr “rizgar kirine” û mexdûrên ku “hatine rizgarkirn” jî li mifredateke aştiyê bên zêdekirin, divê têkiliya sûcên li dijî mirovahiyê yên “bi fermana zincîreyî ya qanûnî” yan jî “bi wesifê nijadî ya siruştî” bên birîn, hem ji bo bibîrxistina ku fail tercîheke siyasî û ya kiryarî kiriye hem jî daxuyaniyên “maqûl” ên eleqedarî bedêngbûna li hemberî sûcên ku li dijî mirovahiyê dihatin kirin dê di ber çavan re bên derbaskirin; her wiha dê ev yek bibe wesîleya siyasîbûna înkar, behane, etalet û bêberpirsîtiyê.[220]

Qadeke din a ku ne xwedî bingeha fokusê ya desthilat an jî dewletê ye û komîsyonên heqîqetê ew kêm an jî nîvçe hiştiye, dikare bê gotin ku ya rarûbûnê didomîne hunera rexneyî ye. Bi awayekî giştî em dikarin bibêjin ku bi berhemên hunerî yên rexneyî yên ku binyada sîstematîk a *apartheid*ê wek paşxaneyê vedibeyîne, êrîşên zayendparêz û nijadperest ên ku jin lê duçar mane wek şêweyên tecrubeyên ferdî vediguhêze, şopên ku van êrîşan di bedenen jinan de hiştine wek hêmana tesîra delîl û dîtbariyê bi kar tîne û li dawiyê “qeyda raboriyê” ya ku berhemên[221] hunerî yên rewteka sereke ew kêm hiştiye da ku şîna reşikan bi hesta sûcdariya spiyan re biterizîne, hatiye temamkirin. Hunerên performansê ku dikin heqîqetên di komîsyonan de hatine vegotin û yên nehatine vegotin bên veguhastin an jî berhemên hunerî yên nûjen ên ku ji jiyana rojane ya mexdûran, ji pirsgirêkên wan û ji pêdiviyên wan hatiye hereketkirin û wisan hatine hilberandin, divê bi taybetî ji aliyê hafizakirin û xuyanekirina heqîqetên mixalif ve giringiya vê yekê bê teslîmkirin.[222]

Gava em têgiha estetîkê, ne tenê bi têkiliya têgihê ya “bi xweşikiyê re” lê ji aliyê tecrubeya ku bi hestan tê bidestxistin, tê jiyandin û hest pê tê kirin hildin dest, mimkin e ku mirov bifikire vegêrana estetîka heqîqetan ne tenê hilberîna hunerî ye lê belê bi taybetî kiryareke siyasî ye ku bi melekeya mihekemeyê ve gêrdayî ye. Clarkson, bi têgiha “kiryara estetîk” a ku Rancière bi ûcba şêweyên kirdetiyên siyasî yên resen û

---

220 Ron Dudai. 2012. “Rescues for Humanity”: Rescuers, Mass Atrocities, and Transitional Justice. *Human Rights Quarterly*. 34(1): 1-38.

221 Binêrin Shakti Jaising. 2014. Reconstructing *Apartheid*, Redefining Racism. *Interventions*. 16(1): 117-134.

222 Binêrin Geoffrey V. Davis. 1999. Addressing the Silences of the Past: Truth and Reconciliation in Post-*Apartheid* Theatre. *South African Theatre Journal*. 13(1): 59-72; Paul Gready. 2008. Culture, Testimony, and the Toolbox of Transitional Justice. *Peace Review*. 20(1): 41-48; Rosemarie Buikema. 2012. Performing dialogical truth and transitional justice: The role of art in the becoming post-*apartheid* of South Africa. *Memory Studies*. 5(3): 282-292; Tine Destrooper. 2018. Performative justice? The role of theatre and performance in facilitating transitional justice. *South African Theatre Journal [Online]*; Khalid Amine. 2018. Decolonizing Theatre History in the Arab World - The case of the Maghreb. *Horizons/Théâtre [Online]*. 12. 10-25.

tecrûbeyên ku raweyên pêhisînê yên nû çêdike bi nav bike bi kar anîbû, bi rê dikeve û li hin berhemên hunerî yên ku piştî dewra *apartheid*ê hatine hilberandin, li roman û helbestên ku hatine nivîsîn, li nivîsarên qanûnî, li spartekên dibistanan, li metnên felsefî, li axaftina aktorên gelemperî û li pergîhevhatina jiyana rojane ya mirovên jirêzê dinêre û kiryarên estetîk ên kesekî ku xwedî wesifê potansiyela nûkirina têkiliya wî/wê ya bi yekî re, bi fikirekê re, bi bûyekê re heye, wek kiryarên siyasî nîqaş dike ku ew dibin wesîleya berfirehkirina sînorên edaleta dewra derbasîbûnê.[223] Em dikarin van cure kiryarên siyasî yên estetîk wekî wan derfetan bifikirin ku ew dikarin xebatên ji bo rarûbûna bi raboriyê re û têkoşîna dijberî nijadperestiyê bikin rewşeke sîstematîk.

Hewla arşîvkirina materyalên ku xwe dispêrin "kiryara arşîvîkirinê", hem ji bo peydakirina kêmaniyên arşîvên klasîk û fermî hem jî ji bo yên ku wisan tê fikirandin ew ne xwedî hêjahiya arşîvê ne lê "nijadperestiyê qeyd dikin" an jî ew ên ku welê dixuyên nayên arşîvkirin, dikarin ji pêkanîna heqîqeta edlî heta bi ya çêkirina hafizeya kolektîf, bibe xwedî gelek fonksiyonan.[224] Ez wisan difikirim ku ji van fonksiyonan a herî giring e ew e ku reperuwara înkarê ya nijadperestiyê teng dike, ronî dide ser hêla wê ya sîstematîk û digihîje tebeqeyên wê yên bêqeydiyê yên kiryarên siyasî ku wesifên estetîk bi wan dide qazanckirin. Loma ji vî aliyî ve dibe ku şopandina rêçikên van kiryarên hanê yên li Tirkiyeyê yên di çarçoveya têkoşîna dijberî nijadperestiyê de pêvajoya rarûbûna bi raboriyê re ya li Tirkiyeyê bibe mijara şêwirandina xebateke sûdwer. Ev xebat jî, bi gerandina şopa tezahurên nijadperest ên ku berê bend li pêşiya teşebusên çareseriyê kişandibû û bi îstifadekirina ji nimûneya Afrîkaya Başûr ku dibe li Tirkiyeyê pêvajoya rarûbûna bi raboriyê re were îhmalkirin û cext li ser hin nuqteyan dike ku dibe îmkan bide berdewamkirina nijadperestiyê û wisan bi dawî dibe.

---

[223] Carrol Clarkson. 2014. *Drawing the Line: Toward an Aesthetics of Transitional Justice*. Fordham University Press; Jacques Rancière. 2004. *The Politics of Aesthetics*. Continuum.

[224] Julia Viebach. 2020. Transitional archives: towards a conceptualisation of archives in transitional justice. *The International Journal of Human Rights [Online].* Viebach, bi bîra me dixe ku Ketelaar îdîa dike arşîv her du rûyên desthilatê yên ku wekî zidên hev dixuyên, ên hem dirûvê mabedekê hem jî dirûvê hepisxaneyekî pê dike nîşanî me dide, loma hêza arşîvê dibe ku teqabilî hêza gel bibe û Derrida tîne bîra me ku dibêje nabe mirov desthilateke siyasî ya ku ne xwedî kontrola arşîvan e texeyul bike, cext li ser kiryara siyasî ya mindemîcî kiryara arşîvkirinê ye, dike. Binêre Eric Ketelaar. 2002. Archival Temples, Archival Prisons: Modes of Power and Protection. *Archival Science*. 2: 221–38; Jacques Derrida. 1996. *Archive Fever: A Freudian Impression*. Chicago University Press.

## 4. Li Dijî Teşebusên Çareseriyê yên li Tirkiyeyê Berhilistiya Nijadperest

Partiyên siyasî yên kurdan ên xwedî îdîaya temsîlkirina îradeya siyasî ya beşeke giring a gelê kurd û birina wê ya li parlementoyê ku bi sedema kirina “kurdîtî” û siyaseta nasnameyê” tên rexnekirin, lê partiyên siyasî yên tirkî ku meseleya kurdan dadixin dereceya terorê û tercîh dikin wê hewaleyî artêşê bikin, bi dilekî rihet “tirkîtî” û “siyaseta nasnameyê” kirine; ji bilî ku xebitîna rejîma heqîqetê ya ku her cure arezûyên nijadperest ên dewleta tirkî li xwe digire hilde bin temînatê, wan çalakiyeke siyasî ya din nekiriye. Rejîma heqîqetê ya Tirkiyeyê, çendî cara pêşî di wexta Pêvajoya Çareseriyê de, bi wesîteya mizakereyên ku di navbera Tevgera Kurdî û desthilata AKP'yê de domiyane û xwedî wê potansiyelê bû ku dikarîbû bi guherîna binyada dewletê û heta navê dewletê bi encam bibûya, ketibe rewşeke pirsyarîkirinê jî,[225] lê ji ber ku desthilat ji bo pêwîstiyên vê mihekemekirinê yên veguherînên binyadî û bi raweyên têkiliyê re ne amade bû, di dewra şer de ya ku Pêvajoya Çareseriyê taqîb dikir, ji nû ve ji aliyê aktorên siyasî yên din û civakê ve bi tundî lê xwedî hatiye derketin. Wekî ku min berê jî hewl da nîqaş bikim, em dikarin bibêjin ku rewşeke wekî vê ji bo PKK û partiyên siyasî yên kurdî û ji bo aktorên sîvîl ên ku destek didan aştiyê jî derbasdar e. Li hêla din, mijara vê beşê, ji tezahurên berhilistiyê yên nijadperestiya tirkî ya li dijî pêvajoyên çareseriyê, pêk tê.

Hevdîtinên Osloyê yên ku di sala 2008'an de bi beşdariya aliyên sêyem ve di navbera dewlet û PKK'yê de dest pê kiribûn, ji hêla desthilatê ve biryardana avêtina gavê ji bo çareseriya meseleya kurdî ya ku wekî tiştekî jênerevîn dihat dîtin, bi mebesta ku civaka tirkî hîn ji vê gavavêtinê re ne amade ye, bi awayekî veşarî hatibû meşandin.[226] Neamadebûna civaka tirkî, ya rast wekî ku me li jorê jê behs kiribû, teqabilî berhilistiya spiyan, yanî ya wekî tune hesibandina meseleya kurdî yan jî teqabilî qebûlkirina wê ya wekî meseleya terorê dikir. Berhilistiya tirkî ya CHP/neteweperwer û MHP/miliyetperest, bertekeke wisan nîşanî “Vebûna Demokratîk” dabû ku Serokwezîr Erdogan di sala 2009'an de îlan kiribû û bi ya wan wan ew “Vebûna Kurdan” bû, loma ev xwevekirin ji aliyê AKP'yê ve li “Projeya Yekîtiya Neteweyî û Biratiyê” hat dagerandin. Eger mirov bibêje di bingeha vê bertekiyê de neteweperestiyeke welê heye ku rabêjiya kurdan a aştiyê, eynî bi awayekî rast, wek daxwazeke yeksanbûna bi tirkan re fehm dike û ji ber vê wekhevîtiyê jî razî nabe ku dev ji îmtiyazên xwe berde, dê ne tiştekî şaş be.

---

[225] Barış Ünlü. 2018: 302.

[226] Galip Dalay. 2015. Çözümü Kolaylaştırıcı Toplumsal Faktörler. Necmiye Alpay ve Hakan Tahmaz. Amd. Ji nav *Barış Açısını Savunmak. Çözüm Süreci'nde Ne Oldu?*. Metis Yayınları: 277.

MHP ku xwevekirina demokratîk wek îhaneta li welêt û neteweyê, teslîmbûna li PKK'yê û li dijî îtîbar û yekkeriya dewleta tirkî jî gef didît û CHP'yê jî ji ber ku meseleya kurdî wek pirsgirêka xizanî û bêperwerdehî didît û ji ber ku digazinî ev yek ne şefaf e daxilê wê nedibû û li dij radibû ku bi talîmatên hin hêzan ev li ser bingeha etnîkî û bi wesifê jihevcudaker çareseriyek li xwe digire, loma îdîaya ku hem tek aktor AKP ye ku dikare meseleya kurdî çareser bike hem jî tercîha ku divê PKK û DTP'yê wek mixatab wernegire, zehmet dikir.[227] Li dijî rexneyên ku der barê Xwevekirin û Pêvajoya Çareseriyê ya piştî wê de, ji Bahçelî û Baykal dihatin bi şûn de, çûna AKP'yê ya ber bi nijadperestiyê ve çendî bi awayê exlaqî ne rewa be jî, ji aliyê siyasetê ve ne tiştekî wisan bû ku neyê fehmkirin: "Xwevekirina xwedêgiravî" ku "naverok veşarî" û "niyeta wê kifş" bû, bi dawetkirina desthilatê ya digot "ji çiyê dakevin, dev ji çekan berdin, werin ser maseyê, siyaset^ê bikin", "hêviya siyasîbûna dabeşkeriya etnîkî" peyda dikir; ew xwevekirina ku diviya "ne li PKK'yê, li welatiyên me yên ku li herêmê dijîn bihata kirin", lê belê ji ber Erdogan ji bilî DYA û YE'yê "Bi pêşmerge, Îmralî û Qendîlê re, bi hevkariyeke tam bi PKK'yê re xwevekirinê dimeşîne" xwedî wê mebestê bû ku "berdewamiya hebûna neteweyî diavêt talûkeyê, rê li ber texrîba nasnameya neteweyî vedikir, lihevxistin û parçebûnê dawet dikirin, dibû sedema cihêbûna ji hev a dewlet û neteweyê"; yanî bi gotina "binêrin zimanê we cuda ye, çanda we cihê ye", "em ji we re kanalên din vekin", perwerdehî û hiqûqa li Tirkiyeyê li ser bingeha etnîkî ji hev cuda dikir û Tirkiye dikir nav rewşeke geremol.[228] Li ser van rexneyan jî AKP wek bersiv daxwazên kurdan bi daxwazên mafên ferdî re hevta digirt û kurdbûn ji nû ve li beşeke jorzanava/nasnameya raser a tirkbûn û mislimantiyê vediguherand û bi helwesteke paternalîst serî li rêya hembêzkirinê dida û şûna pozîsyona dewletê rûdinişt ku nijadperestiyê ji kesî re nahêle.[229] Berxwedana nijadperest a li Tirkiyeyê, destûr dida AKP'yê da ku di teşebusên çareseriyê de PKK'yê ya ku temsîla îradeya beşeke giring a gelê kurd dikir û li ser maseya aştiyê mixatabê wê bû ji dewreyê derxe, bi awayê ku meseleyê ji konteksta etno-polîtîk veqetîne wisan hilde dest û gavên çareseriyê jî li dijî partiyên siyasî yên kurdî li manewrayên şer dagerîne. Her wisan di navbera salên 2009-211'an de dozên ku bi bihaneya alîkarî û altaxiya PKK'yê kirine li endamên BDP'yê û destekkarên wê hatine vekirin, bersiv dida bertekên nijadperest ên li nav civakê, lê îcar endîşeyên eleqedarî xwevekirinê yên kurdan jî xurt û perçinandibûn. Kongreya Civaka Demokratîk ku platformeke alîgirên PKK'yê bû, di mêjûya 14 Tîrmeh 2011'an de ji bo ku îdîayên serweriyê yên li bajarên kurdan bi bîr bixe "xweseriya demokratîk" îlan

---

[227] ji bo îstîdlalên vê mijara hanê yên analîzên ku xwe dispêrin axaftinên li civînên grûpên CHP û MHP'yê hatine kirin binêrin İsmet Parlak û Armağan Öztürk. 2015. 2009-2015 Aralığında "Açılım" Süreçlerine Yönelik Siyasi Parti Söylemleri Üzerine Karşılaştırmalı Bir Analiz. *EUL Journal of Social Sciences.* VI(II): 87-114.

[228] İsmet Parlak û Armağan Öztürk. 2015.

[229] Binêrin h. b.

kiribû, ev endîşe li îtirazên berbiçav veguherandibûn û ji bo bidawîhatina hevdîtinên Osloyê yên ku jixwe şikestokî bûn û xwevekirina demokratîk, bihane amade kiribû.[230]

Li gel îtirazên xwedî bingeha nijadperestiyê yên MHP û CHP'yê yên bi tonên cuda, AKP'yê niyet kir ku daxwaza çareseriyê pêşwazî bike ku ew hem ji alîgirên wê yên kurd, hem ji aliyê kurdên ku dixwast wan qazanc bike hem jî ji beşên demokrat ên civaka tirkî dihat, îtiraza hevpar a li dijî Hevdîtinên Osloyê û Xwevekirina Demokratîk, yanî îdîaya ku ev pêvajo bi rêbazên ne şefaf, ne beşdar û ne demokratîk tên meşandin, bi awayê qismî hilda ber çav û berê xwe da teşebuseke hîn radîkal. Di sala 2013'an de biryar da ku rasterast bi Ocalanre hevdîtinan bike û ji bo ku di bin kontrola xwe de, di navbera Ocalan û PKK'yê de têkiliyekê pêk bîne û bi mebesta ku desteka civakî ya ji bo van hevdîtinan bi dest bixe, dest bi hin teşebusan kirin.[231] Mekanîzmayên ku bi mebesta meşandina van hevdîtinan û dabînkirina destekê ya ji bo pêvajoyê hatibûn avakirin û bi awayekî giştî li şûna ku ez Pêvajoya Çareseriyê nîqaş bikim, wekî min berê jî gotibû, ez dixwazim balê bikişînin ser hin berhilistiyên nijadperest ên ku pêvajo şepikandin.[232]

Partiyên din ên li meclisê, ji ber ku bi îradeya ji bertekên nijadperest bi xwedî dibûn wan red kir beşdar bibin, loma Komîsyona Çareseriyê ya Meclisê ku di sala 2013'an de hatibû damezirandin, neçar mabû ku bi 10 parlamenterên AKP'yê û bi 1'î BDP'yê bê pêkanîn. Parlamenterê Îzmîrê Vural Oktay ku bi gotinên "Êdî hevalê we yê rê PKK, dijminê we jî bû MHP, dabeşker hevalên we, neteweperwer jî bûn dijminên we" rexne li desthilatê girt û got "Em we û PKK'yê bi tenê dihêlin" û tevî parlamenterên MHP'yê Salon Civata Giştî terikand. Piştre CHP jî tevî MHP'yê bû.[233] Li gel guherîna vê

---

230 Güneş Murat Tezcür. 2014. Türkiye'de Silahlı Çatışmanın Med-Cezirleri ve Zor Bir Barış. Murat Aktaş (ber.) Ji nav Çatışma Çözümleri ve Barış. İletişim: 166.

231 Ji bo analîzeke têkildarî mekanîzmayên ku bi mexseda hevdîtinan bimeşîne û desteka civakî ya ji bo hevdîtinan bi dest bixe, hatine avakirin, binêrin Yasin Sunca. 2016. *Infrastructures for Peace in Turkey. A Mapping Study*. Berghof Foundation. Misteşariya Pergala Gelemperî û Ewlehiya Wê, ku ji bo hevdîtinan bi Ocalan re û bi Heyeta Îmraliyê ya HDP'yê re li ser navê dewletê bidomîne û xebatên Heyeta Aqilmendan û Komîsyona Çareseriyê ya Meclisê koordîne bike di pozîsyoneke kilîdî de bû, lê belê tenê rola wê bi ragihandina tercîh û biryarên hikûmetê û sepandinê sînorkirî bû, ji mekanîzmayên gelemperî ya herî giring bû ku li dawiyê ew bi temsîlkirina berjewendiyên dewletê erkdarkirî bû. Heyeta Îmraliyê ya HDP'yê ku wek fermî mixetabî Misteşariya Pergala Gelemperî û Ewlehiya Wê bû û ji ber pozîsyona kilîdî ve hevtayê wê bû, ji ber berpirsiya ku bikare hem bendewariyên dewletê hem yên PKK'yê pêşwazî bike hem jî bikare îtibara xwe li nik raya giştî ya tirkî bihêvişîne, erkeke wisan hildabû ser xwe ku ji rayeya wê der bû. Heyet ku dikarîbû bi wan kesên dewletê hevdîtina bi wan re pesend kiriye û bi qasî destûra ku dewletê daye dikarî bi Ocalan re dîdaran pêk bîne, tenê dikarî li gorî destûra ku PKK'yê daye înîsiyatîf wergire û heta raya giştî ya tirkî pê îtibar dikir, ew wekî mixetab dihat hildan.

232 Ji bo xebateke bikitekit a têkildarî Pêvajoya Çareseriyê, binêrin Cuma Çiçek. 2018. "*Süreç" Kürt Çatışması ve Çözüm Arayışları*. İletişim: 181-208.

233 https://www.ntv.com.tr/turkiye/cozum-sureci-komisyonu-kuruldu,XTr1FxcPx0GuTHl-8Z4mlg [24.04.2021].

tabloyê ya ji ber neçûna serî ya Pêvajoya Çareseriyê û dîtina ku "neteweperest" ji nû ve bûn heval û "dabeşker" jî cardin bûn dijmin, divê cext lê bê kirin ku di Komîsyonê de akademîsyen û aktîvîstên ku fikir û nêrînên wan hatine wergirtin, daxwazên gelê kurd ên ji bo dad û aştiyê anîne ser zimên, di rapora weşandî ya Komîsyonê de jî hatiye behskirin ku ya "li ser bingeha tirkbûnê nijadperestî kiriye belaya serê welêt" Cemiyeta Îtihad û Teraqiyê ye û cih ji wê nêrînê re hatiye dan ku "divê di Makeqanûnê de bi taybetî cextên li ser nijadperestiyê bên derxistin."[234] Li hêla din, Niwînerê BDP'yê Parlamenterê Bedlîsê Husamettîn Zenderlîoglu rexne li raporê girtibû ku "Çi ji aliyê zimên û naverokê ve çi jî bi awayê pêşkêşkirina li Serokatiya Meclisê ve, ne qebûlbar e" û gotibû ku "refleksa dewletê û nêrîna wê ya fermî vedibeyîne, bi mantiq û uslûbeke milîtarîst li qelemê hatiye xistin" û divê lê bê zêdekirin jî ku raporê aliyê kurdî tetmîn nekiribû.[235]

Pêvajoya ku li gel hebûna îtirazên kurdan ên li hikûmetê ku wê pêvajo bi helwesteke yek alî, kêfî û necidî meşandiye û bertekên raya giştî ya nijadperest hatiye domandin, bi refeqeta temsîlkarên hikûmetê nirxandin û pêşniyazên Ocalan bi Mitabeqeta Dolmabaxçeyê re, ku di mêjûya 28 Sebat 2015'an de li ser ekranên televîzyonan hat ragihandin, gihîşt lûtkeyê û dereceya xwe ya herî şikestokî. Ev mitabeqet, ji aliyê "Tevgera Neteweperest a ku ji bo hêvişandina Tirkiyeyê xwedan ezim e", wek "mexseda bêtirkkirina Anadoliyê" ya desthilata ku bûye dîlê "qatilê bebekan" hat dîtin û mîna hevtayê Rêkeftina Sevrê hat nirxandin, tevî ku ji hêla CHP'yê ve neyînî nehat dîtin jî, lê bi pirsa "Baş e, li pişt vê metna bişîfre çi heye, ew ê ku wê dizane gelo heye?" pêşwazî lê hatibû kirin û dîsan pirs ji hêla CHP'yê ve wiha hatibû bersivandin: "Di navbera AKP û HDP'yê de hevkariyeke hilbijartinê heye [...] Tirkiya vî karî ev e."[236] Em dikarin sedemên daxilnebûna CHP'yê ya Komîsyona Çareseriya Meclisê jî bi bîr bixin û bibêjin ku îtiraza CHP'yê ya li vê "metna bişîfre", ji berberiya siyasî ya desthilatê ya besîd naqewime.

Li dawiyê, ji ber îhtiraza PKK'yê ya der barê bêçekkirinê de, sondxwarina HDP'yê ku wê nehêlin Erdogan bibe serok û helbet a herî giring, ji ber bi temamî înkarkirina Erdogan a Mitabeqetê û pêvajoyê, beşa hevdîtinên pêvajoyê yên ku bi Ocalan re

---

[234] Rapora ku ez jê behs dikim, ew îfade di rûpelên bi numreya 200 û 272'yan de, wek tesbîtên aîdî Prof. Dr. Ahmet Özer tê de cih digirin. Ji bo "Toplumsal Barış Yollarının Araştırılması ve Çözüm Sürecinin Değerlendirilmesi Amacıyla Kurulan Meclis Araştırma Komisyonu Raporu" binêrin: https://www.tbmm.gov.tr/komisyon/cozum_sureci/docs/cozum_kom_raporu.pdf [24.04.2021]. Ji bo analîzeke raporê binêrin Cengiz Aktar. 2014. Barışı Kurmak. Murat Aktaş (ber.), ji nav Çatışma Çözümleri ve Barış. İletişim 205-207.

[235] https://www.amerikaninsesi.com/a/tbmm-cozum-komisyonundan-catisma-cikti/1800296.html [24.04.2021].

[236] İsmet Parlak û Armağan Öztürk. 2015.

dihatin kirin, di 5 Nîsan 2015'an de bi dawî hat anîn.[237] Di heyna hilbijartinan û piştî wan de, bertekên nijadperest ku hikûmet ji nû ve li wan bû xwedî û pişta xwe spart wan, di 11 Tîrmeh 2015'an de bû behane ku PKK agirbestê bi dawî bike, li bajarên ku li wan xweserî hatiye îlankirin bang li gel bike ku tevî şerê şoreşgerî bibin û çêkirina barîkat û xendeqan a bi desteka YDGH'yê bilezîne, vê teşebusa PKK'yê behane da destê dewletê da ku li wan bajarên xweserî hatiye îlankirin rewşa neasayî ragihîne û derketina derve qedexe bike, leşker bi ser Kurdistanê de raweşîne û dest bi "opreasyonên xenqedeqan bike." Ew aktorên sîvîl jî yên ku hewl didan li ber pêvajoya ku ji aliyê du partiyên siyasî yên reqîbê hev ve dihat meşandin, rageşiya ku her du hilbijartinên giştî çêkiribû û coşî û qilqala ku serweriya PKK'yê li Sûriyeyê afirandibûn li ber xwe bidin, ne xwedî wê serbixwebûn û hêzê bûn ku bikarin bi van hemû hêzên binyadî û hegemonîk re û bi berhilistiyên nijadperest re serederiyê bikin.[238]

Heyetên Aqilmandan ên ku ji akademîsyen, aktîvîst, hunermend, entelektuel û rojnamegaran pêk dihatin û li gorî heft herêmên cografîk ên Tirkiyeyê li heft koman hatibûn veqetandin, bi mebesta ku desteka raya giştî ji bo piştvaniya pêvajoyê çêkin, di mehên bihara 2913'an de, da ku li herêmên eleqedar ziyaret û hevdîtin çêkin û raporê ji bo Serokwezîr amade bikin hatibûn erkdarkirin.[239] Ew heyetên hanê, ji bo ku endîşeyên civaka tirkî li civaka kurdî, bendewariyên civaka kurdî li civaka tirkî veguhêzin û ji aliyê ku li qada gelemperî bibin wesîleya nîqaşên eleqedarî sedem û encamên meseleya kurdî, têra xwe xwedî fonksiyoneke giring bûn, diviya teşebusên bêîtibarkirinê yên li dijî erk û kesatiya wan a ku ji her du aliyan ve tên jî, pêşwazî bikirina.[240] Divê em not hildin ku ev teşebus, di dema pêkhatina ziyareta van heyetan de, "çendî ne berbelav be, li bertekiyên rêxistî, êrîşok û bişidet" jî dagerîbûn.[241] Her wiha, Baskin Oran ku di nav Heyeta Hêrêma Egeyê de cih girtibû, nimûneyên wisan didan ku hin hevpîşeyên wî yên di nav Heyetê de li şûna endîşeyên gel ê ku ji "neteweperestiyê" mizdarib bûn

---

237 Ji bo dengvedanên Mitabeqetê binêrin Ali Bayramoğlu. 2015. *The Process of Resolution: From Politics to Arms*. Democratic Progress Institute: 7-12.

238 Abdullah Kıran. 2014. Suriye, Kürtler ve Barış. Murat Aktaş (ber.), Ji nav Çatışma Çözümleri ve Barış. İletişim: 122.

239 Nirxandineke adil û bikêr a eleqedarî Heyetên Aqilmendan, ji aliyê Akademîsyenên Ji bo Aştiyê hatibû kirin: https://t24.com.tr/haber/iste-305-akademisyen-akil-insanlar-heyeti-raporu,230998 [28.02.2021]. Her wiha binêrin Ayşe Betül Çelik, Murat Çelikkan, Evren Balta, Nil Mutluer û Levent Korkut. 2015. Ji nav Çözüme Doğru: Olasılıklar, İmkânlar ve Sorunlar Üzerine Değerlendirme. Türkiye Barış Meclisi: 21-30. Mirov ji vê adresê dikare xwe bigihîne temamiya raporan: https://barisicinakademisyenler.net/node/4 [28.02.2021].

240 Binêrin Baskın Oran. 2014. *Kürt Barışında Batı Cephesi "Ben Ege'de Akilken..."* İletişim; Fuat Keyman. 2014. Çözüm Süreci, Müzakere, Güven ve Demokrasi, Murat Aktaş (ber.) Ji nav Çatışma Çözümleri ve Barış. İletişim: 22-23.

241 https://t24.com.tr/haber/iste-305-akademisyen-akil-insanlar-heyeti-raporu,230998 [28.02.2021].

li leha aştiyê zeîf bikin, wan serî li xurtkirina van endîşeyan ên li dijî aştiyê dabûn.[242] Akademîsyenên Ji bo Aştiyê jî, ku heyetan diyar kiribû ji bo aştiyê îqnakirina kesên biguman nêzî pêvajoyê dibin û ji bo ku aştî ji hêla civakê ve bê xwemalîkirin, meseleya herî krîtîk "ew ziman e ku tê bikaranîn", bi heman nimûneyan hereket kiribû ku desteka pêvajoya aştiyê zêde bikin, wek mînak, peyva "terorîst" ji ber ku "hem hin derdoran diêşîne, hem tersî pêvajoya aştbûn û çareseriya kêşeya kurdî ye, hem jî zimanê kesên ku bi neyînî nêzikahî tê didin bi awayekî neyînî diperçinîne", wan tewsiye dikir ku divê neyê bikaranîn.[243]

Heyet li aliyekî, di serî de AKP, bi tevkariya gelek derdorên ku tersî vê tewsiyeyê tev digeriyan, rarûbûna bi raboriyê re û temînkirina aştiyê, naskirina heqîqetan û helbet wekî dîtina hesab a ji nijadperestiyê, em bûn şahid ku Pêvajoya Çareseriyê, ji aliyê aştiyê ve bêyî bigihîje armancên herî jiyanî yên civakî û siyasî, bi dawî bû. AKP, ku bi berdewamiya Pêvajoya Çareseriyê re partiyên mixalefetê û PKK bi wesifê "temsîlkarên îdeolojiyên arkaîk"yafte dikirin[244] û ji ber bi arezûya ku dixwast bibe aktora tek a çareseriyê tenê mabû û hewl dida îtirazên maqûl ên li pêvajoyê jî bi senaryoyên şer ên mihtemel biqewitîne, şopên xwe yên demokratîkbûnê yên ku bi berdewamiya pêvajoyê xuya bûbûn, wek nimûne, krîzên siyasî û civakî yên mîna Berxwedana Geziyê jî bi zêhniyeta provokasyon, dek û komplo bi nav kirin û ji holê hildan. Li aliyê din, Vahap Çoşkun gava Pêvajoya Çareseriyê dinirxîne dibêje ku li gel daxwaza demokratîkbûn û bêçekbûna PKK'yê ya dewletê, PKK bi amrazên xweparastin û xwebirêvebirinê xwast ku li Kurdisanê serweriya xwe bide pêş û îdîaya wî ya ku ji ber dewletê înat kiriye gavekê bi pêş de biavêje û PKK jî gavekê bi paş de neavêtiye, pêvajo bi pêş de neçûye, xwedî wesifeke wisan e ku destekê dide rexneyên Ocalan ên dualî yên li ser "aştiya AKP'yê, şerê PKK'yê."[245]

Em dizanin ku ew serweriya PKK lê dixebitî wê bihêvişîne, tam jî ew serwerî ye ku dewlet dixwaze wê birûxîne; loma pêvajoya çareseriyê li parçeyekî vî şerê serweriyê dageriya, heta wekî me di beşa pêşî de nîqaş kir, ew dirêjeyeke şerê serweriyê yê li ser heqîqetê ye. Ji vî aliyî ve, gava mirov li gel "operasyonên xendeqan", berdewamî bi rexnegirtina li dewleta AKP'yê bike ku wê bi girtîxane û qeyûman serî li rêyên şikandina îradeya siyasî ya beşeke

242 Baskın Oran. 2014: 47, 217, 231, 250, 251, 316.

243 https://t24.com.tr/haber/iste-305-akademisyen-akil-insanlar-heyeti-raporu,230998 [28.02.2021]. Akademîsyenên Ji bo Aştiyê, di heman demê de "tevî ku rasterast kesekî din tehl nake jî, wek mînak, ji ber ku îfadeyên wekî 'Birêz Ocalan' an jî 'serokatî' li hin herêman dibe sedema bertekî û çêkirina dubendîtiyê" îşaret bi bikarneanîna wan dikir.

244 İsmet Parlak û Armağan Öztürk. 2015.

245 Hevdîtina bi mêjûya 14 Sebat 2016'an a ku nivîskar bi Vahap Coşkun re kiriye. Heta ku berevajiyê vê neyê diyarkirin, hemû etifên ku li Coşkun tên kirin, ji vê hevdîtinê hatine wergirtin. Her wiha binêrin Abdullah Öcalan. 2015. *Demokratik Kurtuluş ve Özgür Yaşamı İnşa İmralı Notları*. Weşanen Mezopotamya: 198.

giring a gelê kurd daye û rola wê ya di nezindîbûna hêviya çareserî û aştiyê de îroj jî bi hemû ezameta xwe ve hîn aşkera ye û ji aliyê berpirsiyên şixulandina pêvajoyê ve jî rexne li PKK'yê jî bigire, divê mirov aktorên sivîl jî, yên ku xebitîna rejîmên heqîqetê û proplematîknekirina wan a vê xebitînê paş guh neke, loma tevkariya wan a di pêvajoyeke din de giring dixuyê ku wê teqez ew pêvajo rojekê ji nû ve dest pê bike. Divê ez bi bîr bixim ku nîqaşa di qisimê pêşî yê xebatê de bi vê niyete hatiye kirin û ez difikirim ku tevkariyên wek wê jî, bi hînbûna ji pêvajoyên rarûbûna bi raboriyê re yên li dinyayê mimkin e; ji lew re ez dixwazim bi hildana dersên ku mirov dikare ji pêvajoya Afrîkaya Başûr derxe, berdewam bikim.

***Rarûbûna bi Raboriya li Dijî Nijadperestiyê û Bilîbûna bi Aştiyê***

Heta hem bertekiyên nijadperest ên li dijî Pêvajoya Çareseriyê hem jî li ber roniya nimûneya Afrîkaya Başûr, ku li jorê me ew nîqaş kir, nijadperestiya di bingeha meseleya kurdî de heye dernekeve holê û hesab ji şideta nijadperest neyê pirsîn, mirov dikare bibêje ku ne mimkin e meseleya kurdî bê çareserkirin. Dikare bê îdîakirin ku nabe rejîma *apartheid*ê ya nijadperest û mêtingehkar a li dijî reşikên Afrîkaya Başûr, bi şideta nijadperest û mêtingehkar û bi pratîkên siyasetê yên li Tirkiyeyê bê qiyaskirin, loma jî ji ber vê yekê pêvajoya rarûbûna bi raboriyê re ya Afrîkaya Başûr nikare ronî bixe ser pêvajoya rarûbûna bi raboriyê re ya li Tirkiyeyê. Tevî ku dikare bê gotin para mafdariya vê angaştê heye jî, lê mebesta vê xebatê ne kirina analîzeke berawirdî ya têkildarî her du nimûneyan e; ji bo ku der barê rarûbûna bi raboriyê re analîzeke berawirdî bê kirin, berdewamî bi xebatê hat kirin ku nimûneyeke herî nêzî Tirkiyeyê bê peydakirin, loma dikare bê gotin ji bo mirov ji her cure tecrubeyên ku li dahatûyê ji pêvajoya rarûbûna bi raboriyê re ya Tirkiyeyê bibe mîsal û ji wan îstifade bike, xebata li ser wan hewce û giring e.

Ji sûcên ku hêzên çekdar kirine, cihêkirin an jî dana pêş a sûcên ku parêzvanên kurd kirine, yaxud ji wan sûcan re yên ku PKK'yê kirine, îhtimala wekî sedem bikaranîna sûcên ku hêzên çekdar kirine, mesela em dikarin ji tecrubeya Afrîkaya Başûr derxin ku ev yek dê bike ku pêvajoya rarûbûna bi raboriyê re neçe serî. Eger bi tenê koma qurbanî û mexdûrên ku ji sîvîlên kurd ên mixalif pêk tê wek mixatab were hildan, ji ber îhtimala ku dê nijadperestiya sîstematîk û şideta mêtingehkar a li dijî gelê kurd û daxwaza wekhevî û edaletê ya gelê kurd nexuyane bike, loma talûkeyeke wiha li xwe vedihewîne.

Lêgerîna li mafê ferdî û tezmînatê ya li ser bingeha mafên mirovan, mehzûrên li dijî pêkanîna aştiyeke temendirêj û biheysiyet li xwe digirin ku ev yek dikare bibe sedema îhtimala îhmalkirina çarçoveya kolektîf a ji ber dana ser şopa binpêkirinên minferît an

jî ya windahiyan. Bi heman awayî, em dikarin bibêjin ew mekanîzmayên edaletê yên tamîrker ên ku serî li rêbazên dînî û kevneşopî didin, divê ku ne ji bo ji mekanîzmayên edaletê yên cezayî re alternatîf çêkin, lê ji bo ku van mekanîzmayan destek û temam bikin, divê di çarçoveya bûyer, herêm û sûcên diyar de wan bi kar bînin. Her wiha, divê mekanîzmayên tamîrker ên nerîtî li dijî bikaranîna paşguhkirina hîyerarşiyên civakî yên ku şer xwedî dikin, yanî li dijî wan teşebusên ku cudahiyên wekî zayend, çîn, temen, ol û ziman li ber çav nagirin, bi awayekî xwedan basîret tev bigerin.

Em dikarin bibêjin ku ji ber qeydkirina kêm û şaş a raboriyê dê li cem mexdûran, kiroxan û civatan pêvajoya rarûbûna bi raboriyê re îtibara xwe winda bike, dibe ku tedbîrên îlawe bikevin metirsiyê, loma jî li dijî îhtimalên ku dibe pêvajo ji hesabpirsîneke heqîqî û parkirina berpirsiyê mehrûm bimîne, divê lênêrîneke xwedan dîrayet bê bipêşxistin ku me ev îhtimal di Pêvajoya Çareseriyê de dîtin. Tevî fikirîna ku divê mirov li dijî "makîneyên nemimkin"ên ku pêkhatina micîzeyên ne gengaz weed dikin bihendaze be jî, ew wisan bawer dikim ku divê mirov xwe ji bendewariyên micîzewî yên ku van cure mekanîzmayan ne mimkin dikin û rexneyên rûxîner dûr bisekine û ez wisan bawer dikim ku divê her gavên rarûbûna bi raboriyê re jî, ji desteka telebkar mehrûm neyê hiştin

Tevî ku divê tercîhên civakî û darayî yên wekî efûya giştî û bexşandinê bi temamî neyên paşçavkirin jî, lê hewce ye ji bo ev tercîh bi awayê ku çanda bêcezatiyê xwedî bikin li temayulên siyasî û hiqûqî danegerin, mirov li dijî wan baldar be û wan tim di hişê xwe de bigire.[246] Loma ji vî aliyî ve, ji bo ku her merhale giştgir û xwedî wesifê pluralîst be, divê ji yekeyên hiqûqî heta bi komîsyonên heqîqetê, ji lêgerîna heqîqetê

[246] Di beşeke xebata xwe de ya ku min ew di 2014'an de kiribû, ji bo ez fikira edaletê û lêgerînên mexdûrên terora dewletê ya salên 90'î hîn bibim, ez ji nimûneya Afrîkaya Başûr û ji têgiha "hevhelalkirinê", ya ku Ocalan ew di nivîsara xwe ya Newroza sala 2013'an de behs jê kiribû bi rê ketibûm û min hewl dabû ku ez fehm bikim bê ka mexdûr der heqê bexşandina kirox/fail û berpirsan de çi difikirin. Di dewra berdewamkirina pêvajoya Çareseriyê de, wekî berginda destkeftiyên aştî û wekheviya siyasî, Ocalan bi îmakirinê berginda bexşandinê ya îslamî hilbijartibû ku dibe sûcdar qet neyên cezakirin û bexşandin kiribû mijara bazarkirina civakî û siyasî ku barê psîkolojîk û exlaqî yê mexdûran sivik kiribû. Ji vî aliyî ve, gelek kesên ku min bi wan re hevdîtin kiribûn, wan pir bi awayekî rast bexşandin bi şêweyeke siyasî şirove û pesend dikir. Li aliyê din, min bi wan derxistibû ku hema bibêje temamiya van kesan, dilê wan tune bû şexsen van sûcdaran bibexşînin û heta behsa bexşandinê bi xwe wan aciz dikir. Loma ew wisan hizirîbûm ku min pirs bi awayekî rast û di demeke rast de ji wan nepirsiye yan jî divê ku ev pirs tu car ji mexdûran neyê kirin. A duyem rast bû û Arendt mafdar bû: Mirov kesên ku dê nikaribin wan ceza bikin nikarin bibexşînin û yên ku dê nikaribin wan bibexşînin jî nikarin ceza bikin. Li hêla din, Derrida jî mafdar bû ku digot yê nayê bexşandin dikare bê bexşandin, lê belê tezahurên bexşandinê yên li TRC'yê jî rexne dikirin: Bexşandin aîdî qada taybetî ye, kêliya ku derkeve qada gelemperî winda dibe. Loma têgiha bexşandina siyasî ku di lîteratura edaleta dewra derbasîbûnê de heye û ez bi xwe jî wê bi kar tînim, a rast ji bilî îfadekirina licemhevbûna nemimkin a zidiyetan bi wê de naçe. Banga Ocalan a hevhelalkirinê jî, ez xwedî wê qeneetê me ku ji bo lihevkirina siyasî dê wezîfeya jesta siyasî ya ku bêcezatiyê dinixême bibîne, lê belê dê têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re, ya lêgerîna heqîqetê, ya aştiya civakî û edaletê tetmîn neke. Ji bo xebata ku ez jê behs dikim binêrin Nesrin Uçarlar. 2015.

heta bi vegotina heqîqetê têkoşîn bê kirin, divê vederkirin nebe bihaneya rexneyîtiya rûxîner û hewce ye ku lêxebitîna daxilbûnê bi xwe jî, li gel tevkariyeke rexneyî, li kiryariyeke siyasî bê dagerandin.

Li dawiyê, nîqaşa rejîma heqîqetê ya ku ez di destpêka vê xebatê de dimeşînim, ji nû ve hildana dest a di çarçoveya rarûbûna bi raboriyê re û hesabdîtina bi nijadperestiyê re, difikirim ku di konteksta nimûneya Afrîkaya Başûr de jî mimkin e. Dayîna têkoşîna li hemberî rejîmên heqîqetê yên fermî ku şerekî nijadî bi rêya siyasetê didomînin, talûkeya avakirina rejîmên heqîqetê yên mixalif li xwe digire, ya herî giring jî ew zanyariya ku dibe li dijî tezahurên cuda yên nijadperestiyê di nav xefletê de be, bi kêrî bipêşxistina nêrîna xwedî feraseta têkildarî rarûbûna bi raboriyê re were. Têkoşîna li dijberî nijadperestiyê ya xwedî pirnijadî ya ku ANC tevî spiyan dimeşîne, giringiya wê ya etîk-siyasî û destkeftiyên wê çendî difikirim ku divê di bin sîbera rexneyên li dijî tawîzên pragmatîk û siyasî de yên ku ew ji ber berginda lihevkirin û desthilatê hatine dayîn, neminin jî, ew têkoşîna ku li dijî serweriya spiyan daye, ez xwedî wê qeneeetê me ku sedema têrnekirina hêz û şiyana têkoşîna li dijî tundiya nijadperest û cudahiya li hemberî “afrîkayiyan”, texeyula guncîna li qalibê heqîqet-desthilata serwer jî heye

Mijarên wekî binyadî û nijadperestiya sîstematîk ên ku nikarin bibin rojeva sereke ya pêvajoyên rarûbûna bi raboriyê re û derbasîbûna li aştî û demokrasiyê, ku jixwe dewlet naxwaze behs jê bike, parêzkarên aştiyê jî xwe ji cextkirina wê bi dûr didin an jî berêtiyê pê nadin û rejîma aştiyê ya mihtemel ziyaret û tehdîd dikin ku ew wek xeyaleteke heqîqetê ya ku rejîma berê ya şer zindî dike li nav rastê digere. Ez welê dihizirim ku tek sedema bê çima parêzkarên aştiyê xwe ji cextkirina li meseleya nijadperestiyê dûr digirin, ne ew yek e ku dewlet naxwaze nêzî vekirina nîqaşa vê mijarê bibe.

Wekî me di têkiliya nijadperestiyê ya bi rejîma heqîqetê re dît, rejîma heqîqetê, rabêjiya wan hemû beşên ku peyrewên rejîmê ne, diyar dike; ji ber rejîma şer a nijadperest ku di bingeha rejîmê de heye civakê cemserî dike û vebijêrka tewandina heqîqetan a li gorî berjewendiyên siyasî li aliyan disepîne. Loma, ji bo ku mirov îtiraz li heqîqeta nijadperest û rejîma şer bike, nijadperestnebûn qîm nake, divê mirov dijberê nijadperestiyê be û dijberîtiya nijadpererstiyê bi awayekî besîd bi nîqaşkirina nijadperestiya rejîma heqîqetê sînorkirî namîne; pêwîstî pê heye ku rêbaz û şêwazekê peyda bike da rejîmên şer li rejîmên aştiyê dagerîne. Uslûb, ferheng û metodên ku şer û tundiyê ew cemserî kirine, hestewer kirine û kanc kirine, divê mirov wan bi şêwazek, bi ferhengek û bi metodên nazikane, bipêşketî û taybetmendbûyî pêşwazî bike.

Hewldana derxistina Tirkiyeyê ya ji “cografyaya bêcezatiyê ya heyî” ne tenê rêya

rarûbûna bi raboriyê re, her wiha rêya proplematîkkirina tundiya nijadperest a ku îroj diqewime û dibe ku li dahatûyê biqewime û ya bêedaletiyên niha ne jî. Ji vî aliyî ve, divê qîm bi rarûbûna siyasî neyê anîn ku dibe ew bi kêrî bijareyên serwer ên her du aliyan jî bê, ne eşkale sûcdar lê belê berfirehkirina “cihê sûc” giring e ku bi nexistina ji rojevê ya bêedaletiya aborî ya ku mexdûr duçarî wê bûne, bi vî awayî mimkin dibe. Li Tirkiyeyê tesbîtkirina rewşên ku “av ji dahatê bêhtir bi awayekî bêedalet tê belavkirin”, dibe ku derfet bide rarûbûna bi raboriyê re bikeve rojava beşên hîn berfirehtir.

Bi taybetî ji bo xebatên lêgerîna heqîqetê yên ku li ser diyardeyên heqîqetê hûr dibin û ew têkildarî îhlalên mafên mirovan in bên xurtkirin, dibe ku rêya danîna holê ya pirrehendiya binpêkirinan, aliyê sîstematîk a binpêkirineke minferît û her wisan wesifê wê yê nijadperest jî veke da ku bike ew hîn kêmtir bê nîqaşkirin. Ez wisan difikirim ku Tirkiye ji van cure teşebusan, nemaze ji xebateke arşîv û hafizayê ya hêja û ji toreke têkoşîna siyasî û hiqûqî ya ku bi hunerê re di nav hev de ne, ne bêpar e û hilberandina van xebatên giranbiha jî, wekî min li jorê behs kir, têr dike ku wan endîşeyan ji holê rake. Ji bo ku ev cure teşebus bên berfirehkirin, zêdekirin û xurtkirin, hewce bi kirina hîn bêhtir “çalakiyên estetîk” heye û ez destkeftiyên mihtemel ên hewlên ceribandina derxistina derveyî qadên siyasî yên heyî û yên rejîmên heqîqetê ya lêgerîna heqîqetê ya aştiyane, texeyul dikim.

# Gotina Dawî

Gava ji min re pêşniyaza kirina xebatekê hat ku ka dê têgiha dewra piştî heqîqetê û têkoşîna dijberî nijadperestiyê çawan bikare sîrayet li xebatên rarûbûna bi raboriyê re bike, ez nefikirîbûm ku ev tewere dê bi awayekî birêkûpêk bikarin hev bibirin. Gava min têgiha dewra piştî heqîqetê vedikola, ew fikir bi min re çêbû ku eger ez bidim ser şopa Arendt ve Foucault û xeta ramaneke diyar bişopînim dê gengaz be ku ez dê bikarim bigihîjim têkiliya di navbera heqîqet û siyasetê de, ji wê jî bigihim têgiha rejîma heqîqetê û xwe bigihînim têkiliya di navbera rejîmên heqîqetê û nijadperestiyê de. Îcar ji bo ez têkiliya vê xetê bi xebatên rarûbûna bi raboriyê re daînim rastê, wek rêyeke ku ez dê tenê ji nû ve tê de bimeşim xuya bûbû.

Lêgerîna heqîqetê ku qada çalakiya siyasî ya herî sereke ya qada rarûbûna bi raboriyê re ye û min pêwendiya wê bi rejîma heqîqetê û têkoşîna dijberî nijadperestiyê re danî, îcar eleqedarkirina wê ya bi hewla aştiyê re jî ji min re bû meseleyeke wisan ku ez herî zêde tê fikirîm. Tevî ez difikirim hewla rarûbûna bi raboriyê re û lêgerîna heqîqetê li dawiya dawî xizmetê ji armanca aştiyê re dike jî, lê min bawer dikir ku bi rêbazeke hîn giştgir û tewqdar têfikirîna li ser rêyên ku mirov bikare bi wan hem bêqeydiyên eleqedarî bêedaletiyên li raboriyê qels bike hem jî daxwazeke aştiyê ya li dahatûyê ya temendirêj û bihesiyet belave bike, ji bo min mimkin û pêwîst bû. Li hêla din, ev têfikirîn û dana aqilan, ji bilî nirxandineke ku tedbîrên şênber û tewsiye li xwe digirtin, min hêvî dikir ew li nîqaşeke wisan dagere ku rexneyên biheqaniyet li xwe vehewîne. Niha jî, bi xulaseyeke ku xwe dûrî dubarekirina vê nîqaşê digire û bi xwasteka ku ev xebat ji nîqaşên nû re bibe wesîle, ez dixwazim vê xebatê biqedînim.

Çendî difikirim ku di serî de bi nimûneya Afrîkaya Başûr ne mimkin e ku mirov pêşniyaza rarûbûna bi raboriyê re li desthilateke wisan bike ku wê bi heq û bi layiq bike û guherîna sîstemê pêşniyaz bike û heta divê mirov tim wê rastiyê di hişê xwe de bigire ku birêvebirineke xwedî niyeta rarûbûna bi raboriyê re jî dê vî karî bi hemû aliyan ve hilnede dest; loma jî ez dikirim ku her gavê der barê rarûbûna bi raboriyê re çendî biçûk dibe bila bibe, ji kê tê bila bê divê mirov wan li têkoşîneke demdirêj zêde bike û xebata ji bo ku wan li şiyana edaleteke heqîqî û aştiyê dagerîne jî dê hewleke li cih be.

Ez difikirim ku lêgerîna edalet û heqîqetê, ne têkoşîneke wisan e ku divê bi memnûnbûna mitleq û serkeftinê bi encam bibe, lê gengaz e ku ji bo çêkirina daxwazeke aştiyê ya ku hemû mexdûrên şer lê bibin xwedî, ew wek hewl û bilîbûneke timî bê dîtin. Baweriya min ew e ku ev bilîbûn dê bi temenê kesekî ve sînorkirî nemîne, bi gotineke din, divê di hiş de bê girtin ku ev yek dê tim ji nifşekê li nifşeke din bê veguhastin, dê tekabulî çêkirina civariyeke siyasî, hiqûqî û çandî bike û loma hewce pê

heye ku mirov berêtiyê bide zêdekirina vê civariyê û bikaranîna wê ya hevparane, bi vî awayî jî dê hêz bide lêgerîneke heqîqetê ya aştiyane û dê qadeke hîn berfireh a siyasî ji têkoşîna dad û rarûbûna bi raboriyê re veke. Çendî bi şer û lihevxistinan navber lê bikeve jî, ez dîsan dihizirim ku çêkirina civariyeke aştiyê ya ku tim tê veguhastin mimkin e. Gava ez ji bilîbûna çêkirina civariya aştiyê û veguhastina wê behs dikim, di çarçoveya anîna bîra xwe ya rê û dirban de, ez dixwazim bi kurtî cih bidim rêzanên jibîrkirinê.

Bilîbûneke aştiyane, wisan dixuyê ku divê jibîrkirineke rêzaniyê li xwe bigire ku bibîranînê ji hêrs û tundiyê pak bidêre. Hildana barê bibîranînê ya li ser mexdûran, a rast ji bo parkirina giraniya siyasî û civakî ya barê bibîranînê ya mexdûran, em dikarin bibêjin ku eger ji mexdûran re kêlî û mekanên çûna raboriyê û "vegera li paş" li gel şahidan bên çêkirin û derfeta jibîrkirin û berdewamkirina li jiyanê bê temînkirin, dê rêzaneke jibîrkirinê ya ku ji aştiyê re xizmetê bike çêke û ez difikirim ku xebatên hafizedarkirinê jî -li gel hewla nedana jibîrkirinê û xuyabarkirin û hesabpirsînê-mimkin e ku wek parçayekî vê rêzan û adabê bê dîtin.

Em dikarin ji tezahurên "vegera li paş" bi rê bikevin ku Marc Augé ew wek şekilekî jibîrkirinê hildide dest û nehiştina miseletbûna raboriyê ya li mexdûran an jî vegera mexdûran a li raboriyê, hewladana sînordarkirina bi demek, çarçoveyek û bi emniyeteke gelemperî, siyasî û civakî re ku raborî mexdûran bi tenê û timî, bi awayê ku jibîrkirinê li xwe nagire bi dest bixe, yanî têfikirîna li ser rê û dirbên ku mexdûr raboriyê tevî yên din bi bîr bînin û îmkan bide wan da ku şideta raboriyê "ji bîr bikin", mirov dikare vê wek adabeke jibîrkirinê teswîr bike.[247]

Em dikarin bibêjin ku bibîranîn û jibîrkirin dawiya dawî kudandina demê ye; gava ev rêwîtiya livok a di navbera van rêgehan de ku hev çêdikin/heyî dikin bi dawî bibe, bibîranîn li jibîrkirinê, jibîrkirin jî li bibîranînê hevtayî dibin. Jixwe erka anîna bîra xwe ya ku bibîranînên fermî disepînin, jibîrkirinekê dinixêmin an jî mimkin e mirov îşaret bi wan rewşan bike ku ezma jibîrkirinê ya rizgariya şexsî xwedî dike, li zilma bibîranînê dadigere. Ji vî aliyî ve divê ku mesele bi awayekî hêsan ne bibîranîn an jî jibîrkirin e. Augé dibêje ku ji bo mirov bikare di dema niha de be, nemire û sadiq bimîne, hewce bi jibîrkirinê heye û wekî ew amaje pê dike "çawan ku pesinandina jibîrkirinê nayê wateya biçûkdîtina hafizeyê, hîç nayê mehneya paşçavkirina bîreweriyê/bîranînê", yanî yên ku nayên jibîrkirin wekî tune nahesibîne; "ew qebûlkirin e ku jibîrkirin di çarçoveya bibîranînê de dişixule û îşaretpêkirina cihgirtina bîranînê ya di çarçoveyê de ye."[248]

247 Binêrin Marc Augé. 2019. *Unutma Biçimleri*. Wer. Mehmet Sert. Yapı Kredi Yayınları: 47-65.

248 H.b: 15.

Li Kurdistanê wekî li salên 90'î, şideteke ku mirov nikare li berê tehemûl bike, lê bixebite da wê "di çarçoveya bîreweriyê de" bigire, dikare wan encaman bide ku şidetê bicivîne û arezûya rewatiya şidetê zindî bihêle. Tiştê ku divê di çarçoveya jibîrkirina adabê de bê bibîranîn, ew siyaseta rewakirina şidetê, dana jibîrkirin û ya negotinê ye ku palpiştiyê ji stratejiya înkarê ya vê şideta Dewleta Tirkî re dike. Her şideta dewletê, tenê ne ji aliyê şertên wê, "behaneyên wê" û amûrên wê ve, ji aliyê qurbaniyên wê yên ku divê bên bibîranîn ve jî tekane ye; lê belê taktîkên failan ên ku heqîqetên diyardeyî bi awayekî qestî bincil dikin, berevajî dikin, tune dikin û şideta dewletê înkar dikin, bi qasî ku ji van tekanetiyan re wesifê kolektîf û siyasî çêke, xwedî giştiyekê ne.[249]

Ez wisan bawer dikim ku divê kêliyên vegera li paş a mexdûran li bîranîna şidetê neyê terkandin, ev kêlî divê bi rêzanên bibîranîna kolektîf û siyasî bên dorpêçkirin û şidet bi xwe hewce ye li duçariya adabê ya jibîrkirinê re bê hiştin. Qeneeta min ew e ku têkoşîneke rarûbûna bi raboriyê re, ya ku li ser çavkaniyên siyasî yên şideta dewletê û encamên wê hûr dibe, ne bi tenê ji bîreweriyên mexdûran, lê ji adabeke jibîrkirinê ya civakî jî bi rê dikeve, dê li gorî armanca kudirandina siyaseteke aştiyê be ku dixwaze pêçokeyiya tundî û şer bişikêne.

Têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re ku adaba jibîrkirinê li xwe vedihewîne, helbet nabe ku ji daxwazkirina edaleta cezayî û çendî kêm û bêencam dimîne bila bimîne jî, ji israrkirina têkoşîna hiqûqî û ji xebata ji bo hildana nav çarçoveya fiêlên cezayî ya rabêjî û kiryarên nijadperest cuda bê fikirandin. Tevî vê yekê, ez wisan difikirim mirov dikare vê hewldan û bilîbûnê wisan bisêwirîne ku divê ew wekî îtirazkirina li rejîmên heqîqetê, dijberiya nijadperestiyê, lêgerîneke heqîqetê ya aştiyane, xebata ji bo xwegihandina tewqên heqîqetê yên têkildarî mexdûriyetên cuda, xwegihandina tebeqeyên bêeleqetiyê yên têkildarî heqîqetên mixalifan û yên bermayiyên nijadperestiyê be û biceribîne ku xwe bigihîne bernameyên siyasî yên ku ji aliyê beşeke hîn zêde ya gel ve bê rexbetkirin.

Ne tenê fikirîna li ser tezahurên nijadperestiyê yên rabêjî û kariyariyên wê yên li qada fermî ya siyasetê, giring e mirov li ser wan rêyan bifikire ku ew bikin rûçikên wan ên sîrayetî qadên nefermî yên siyasî, têkiliyên civakî û aborî, heta berhemên çand û hunerê û hêvişandin û bikaranîna çavkaniyên siruştî kirine, bên xuyakirin. Îstifadekirina ji awayên fikirînê yên ku nîqaşên felsefeya siyasetÊ, hilberînên hunerî û derfetên teknolojîk wan dixin tevgerê û ji tecrubeyên nimûneyên welatên din, dikin ku karê têkoşîna bi nijadperestiyê re bibe wekî bilîbûneke siyasî ya nazikî û îlhambexş. Li gel çêkirina hayjêtiya der barê nijadperestiyê de, di heqê helwestgirtina aktîf a li dijî

---

[249] Binêrin René Lemarchand (ber.). 2011. *Forgotten Genocides Oblivion, Denial, and Memory*. University of Pennsylvania Press.

nijadperestiyê de, aktorên gelemperiyê yên ku potansiyel û berpirsiya wan heye îlham û cesarete bidin kes û dameziraweyan, wisan dixuye ku sûdwerbûna wan a bi qasî ji felsefeyê, ji hunerê û teknolojiyê, îstifadekirina wan a ji nimûneyên têkoşîna dijberiya nijadperestiyê jî tiştekî hêja û bivênevê ye.

Gava xebat bê kirin da ku heqîqetên diyardeyî yên têkildarî mexdûriyetên ji dewletê diqewimin ên qurbaniyên nijadperestiyê xuyabar bike û hewl bide hesabê vê yekê bê pirsîn, divê xwe li heqîqetên diyardeyî yên têkildarî zilma derî dewletê jî bike xwedî; divê îtibara failên sîvîl a heyî yên xwedî rabêjî û kiryarên nijadperest û pozîsyona wan a raserî siyasetê û ya ku wekî "aşina/hînbûyî" dixuye ji nîqaşkirinê re bê vekirin; li gel mexdûriyeta qurbaniyan divê heqîqetên der barê hilberînên wan ên siyasî, çandî û aborî, yên der heqê destkeftiyên têkoşîna ku didin û yên hêza wan a veguherîner de jî derxin holê, ku ev yek hemû dibe bibin lingên lêgerîneke heqîqetê ya aştiyane ya têkoşîna dijberiya nijadperestiyê.

Welhasil, ev xebat xwe dispêre wê ramanê ku diyardeya ji avakirin, şixulîn, berhingarî û elastîkiya rejîma heqîqetê ya Tirkiyeyê re dibe bingeh, mimkin e wekî nijadperestiyê bê wesifandin ku ev yek pêwîst û sûdwer e; loma ji wan ramanan hereket dike ku ew hem eleqedarî têkiliya heqîqet û siyasetê ya ku nîqaşa dewra piştî heqîqetê jê re bûye wesîle hem jî têkildarî rarûbûneke bi raboriyê ya dijberî nijadperestiyê û ya têkoşîna lêgerîna heqîqetê ye. Niyeta vê xebatê ew e ku ji nû ve li ser têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re, lêgerîna heqîqet û aştiyê bê fikirandin, ku gelê kurd ê yek ji hedefên nijadperestiya li Tirkiyeyê ye wê dimeşîne da ku bêedaletî û şideta dewletê ya ku berê û îroj jî duçarî wan bûye xuyabar bike, bike ku hesabê van yekan bê pirsîn û îtirazkirina xwe ya li rejîma heqîqetê ya fermî bîne ser zimên. Li ser wê yekê tê fikirîn ku bêyî hêza vê têkoşînê, tekûziya wê û destkeftiyên wê paşçav bike, bêedaletiya ku gelên din, civat û beşên ku wek serwer dixuyên duçarî wê bûne û bi awayê ku şideta dewlet û ya rêxistinê li xwe vehewîne û hêz bide lêgerîna heqîqetê ya heyî, yanî ji xwe re dike mebest ka gelo bi beşeke civakî ya hîn zêde re meşandin vê têkoşînê û kirina şahidiya ku rejîmên heqîqetê rejîmeke şer çêdike, minkin e yan na.

Tevî ez pê emîn im ku ez bi wan mebestên hanê bi rê ketime jî, lê ez tam pê ne bawer im ka min ew mebest bi awayekî layiq aniye cih an neanîne. Ji lew re, li xelasekê ez dixwazim dubare bikim: Ez difikirim ku bi gerandina şopa têkiliya rejîmên heqîqetê ya bi nijadperestiyê re, hewla rarûbûna bi raboriyê re û lêgerîna li heqîqetê tekabulî parçeyekî têkoşîna dijberî nijadperestiyê dike; têkoşîna dijberî nijadperestiyê, ne tenê bi îtiraza li rejîma heqîqetê ya fermî û îtibarkirina bi rejîma heqîqetê ya mixalif re, lê belê bi daxwaza rarûbûna bi raboriyê re û ya lêgerîneke heqîqetê ya aştiyane ya ku li dijî rejîma şer e, ku ew ji rejîmên heqîqetê xwe xwedî dike, gengaz e û ji bo ku bikare aştiyeke temendirêj û biheysiyet çêke divê ji tewqên bêqeydiyê bibihure û mimkin e

ku xwe bigihîne tebeqeyên mexdûriyetên cuda jî ku ev yek hewce û tiştekî sûdwer e. Çendî ez pê dizanim ku mehsûr û bertengiyên fikirîna bi raweya divêtiyê û nivîsîna bi wê hene jî, lê ji ber min hîn jî rêya azadbûna ji vê raweyê peyda nekiriye, loma ez hêvî dikim ku vê xebatê wesifê xwe yê vexwendina fikirê winda nekiribe.

# Çavkanî

A. Tarık Çelenk. 2017. *Türk Sağının Düşünce Atlası: "İnsanı Yaşat ki Devlet Yaşasın"*. Mahfil.

Abdullah Kıran. 2014. Suriye, Kürtler ve Barış. Murat Aktaş (ber.) Ji nav Çatışma Çözümleri ve Barış. İletişim.

Abdullah Öcalan. 2013. *Demokratik Uygarlık Manifestosu. I. Kitap. Uygarlık. Maskeli Tanrılar ve Örtük Krallar Çağı*. Abdullah Öcalan Sosyal Bilimler Akademisi Yayınları.

Abdullah Öcalan. 2015. *Demokratik Kurtuluş ve Özgür Yaşamı İnşa İmralı Notları*. Weşanên Mezopotamya.

Adam Sitze. 2013. *The Impossible Machine A Genealogy of South Africa's Truth and Reconciliation Commission*. The University of Michigan Press.

Âdem Terzi. 2020. "Post-Truth" Kavramı ve Türkçe Karşılıkları Üzerine. *Türk Dili*. Nisan, 69: 82; 80-86.

Ahmet İnsel. 2001. Ber. *Modern Türkiye'de Siyasi Düşünce Cilt 2 / Kemalizm*. İletişim.

Albert Memmi. 2000. *Racism*. University of Minnesota Press.

Ali Bayramoğlu. 2015. *The Process of Resolution: From Politics to Arms*. Democratic Progress Institute.

Andrew Spiegel. 2008. Racism as epithet in the context of post*apartheid*'s demographic parity goals. *Anthropology Southern Africa*. 31(3-4): 103-113.

Ann Laura Stoler. 2016. *Duress. Imperial Durabilities in Our Times*. Duke University Press.

Ann Laura Stoler. 2018. *Interior Frontiers. Diagnostic and Dispositif*. https://www.politicalconcepts.org/interior-frontiers-ann-laura-stoler/ [10.02.2021].

Anna Durnová. 2019. Unpacking emotional contexts of post-truth. *Critical Policy Studies*. 13(4): 447-450.

Anne K. Krüger. 2012. From Truth to Reconciliation: The Global Diffusion of Truth Commissions. Birgit Schwelling (ber.). Ji nav *Reconciliation, Civil Society, and the Politics of Memory Transnational Initiatives in the 20th and 21st Century*. Transcript Verlag: 339-367.

Aurélien Pradier, Maxine Rubin û Hugo van der Merwe. 2018. Between transitional justice and politics: Reparations in South Africa. *South African Journal of International Affairs*. 25(3): 301- 321.

Ayşe Betül Çelik û Nil Mutluer. 2015. Toplumsal Barış ve Barış Sürecinin Toplumsallaşması. Ayşe Betül Çelik, Murat Çelikkan, Evren Balta, Nil Mutluer û Levent Korkut. 2015. Ji nav Çözüme Doğru: Olasılıklar, İmkânlar ve Sorunlar Üzerine

Değerlendirme. Türkiye Barış Meclisi: 21-30. Ji vê adrese mirov dikare xwe bigihîne temamî raporan: https://barisicinakademisyenler.net/node/4 [28.02.2021].

Ayşegül Kayagil. 2021. Yok Ama Var: Türkiye'de Irk, Irkçılık, Köleciliğin Hayaletleri. *Cogito*. 101: 81-92.

Bahar Şahin Fırat. 2014. Türkiye'de 'Doksanlar': Devlet Şiddetinin Özgünlüğü ve Sürekliliği Üzerine Bir Deneme. *Türkiye'de Siyasal Şiddetin Boyutları*. Ber. Güney Çeğin û İbrahim Şirin. İletişim: 382-389.

Barış Özkul. 2015. Kürt Meselesinde Yeni Durum. *Birikim*. https://birikimdergisi.com/haftalik/7384/kurt-meselesinde-yeni-durum [05.01.2021].

Barış Ünlü. 2018. *Türklük Sözleşmesi: Oluşumu, İşleyişi ve Krizi*. Dipnot.

Baskın Oran. 2014. *Kürt Barışında Batı Cephesi "Ben Ege'de Akilken..."* İletişim.

Basque Permanent Social Forum. 2017. *ETA's disarmament in light of international DDR guidelines: Lessons learnt from an innovative Basque scenario*. Berghof Transitions Series No. 12. Berghof Foundation.

bell hooks. 2010. *Teaching critical thinking: practical wisdom*. Routledge.

Biray Kolluoğlu Kırlı. 2005. Forgetting the Smyrna Fire. *History Workshop Journal*. 60: 25-44.

Birgit Bräuchler. 2019. From transitional to performative justice: Peace activism in the aftermath of communal violence. *Global Change, Peace & Security*. 31(2): 201-220.

Brandon Hamber û Patricia Lundy. 2020. Lessons from Transitional Justice? Toward a New Framing of a Victim-Centered Approach in the Case of Historical Institutional Abuse. *Victims & Offenders*. 15(6): 744-770.

Bronwyn Leebaw. 2003. Legitimation or Judgment? South Africa's Restorative Approach to Transitional Justice. *Polity*. 36(1): 23-51.

Bulent Gokay û Darrell Whitman. 2017. No Racism Here: Modern Turkey and the question of race and national identity. *Links: International Journal of Socialist Renewal*: http://links.org.au/no-racism-here-modern-turkey-race-national-identity [06.04.2021].

Büşra Ersanlı. 2006. İktidar ve Tarih. Türkiye'de "Resmî Tarih" Tezinin Oluşumu (1929- 1937). İletişim.

C. W. Maris. 2020. Philosophical racism and ubuntu: In dialogue with Mogobe Ramose. *South African Journal of Philosophy*. 39(3): 308-326.

Carrol Clarkson. 2014. *Drawing the Line: Toward an Aesthetics of Transitional Justice*. Fordham University Press.

Cengiz Aktar. 2014. Barışı Kurmak. Murat Aktaş (ber.) Ji nav Çatışma Çözümleri ve Barış. İletişim.

Cenk Saraçoğlu. 2012. Türkiye Sağı, AKP ve Kürt Meselesi. *Türk Sağı:* Ji nav *Mitler, Fetişler, Düşman İmgeleri*. Ber. İnci Özkan Kerestecioğlu û Güven Gürkan Öztan. İletişim: 243-279.

Çiğdem Akgül. 2011. *Militarizmin Cinsiyetçi Suretleri: Devlet, Ordu ve Toplumsal Cinsiyet*. Dipnot.

Colin Wright. 2018. Post-Truth, Postmodernism and Alternative Facts. *New Perspectives.* 26(3): 17-29.

Cuma Çiçek. 2017. *2013-2015 Çözüm Süreci'nde Sivil Toplum Kuruluşları*. Barış Vakfı Yayınları.

Cuma Çiçek. 2018. *"Süreç" Kürt Çatışması ve Çözüm Arayışları*. İletişim.

David Theo Goldberg. 2008. Racisms without Racism. PMLA. 123(5): 1712-1716.

David W. Wilson, Xiaolin Lin, Phil Longstreet û Saonee Sarker. 2011. Web 2.0: A Definition, Literature Review, and Directions for Future Research. *AMCIS 2011 Proceedings* Paper 368: http://aisel.aisnet.org/amcis2011_submissions/368 [01.12.2020].

Devrimci Eğitim-Broşür. 2020. Rojava Jineolojî Andrea Wolf Enstitüsü İlk Eğitim Devresinden Notlar: https://jineoloji.org/tr/wp-content/uploads/2020/09/Revolutionary-education- turkish-1.pdf [12.03.2021].

Dylan Rodríguez. 2014. Goldwater's left hand: Post-raciality and the roots of the post-racial racist state. *Cultural Dynamics*. 26(1): 29-51.

Eduardo Bonilla-Silva. 2013. *Racism without Racist: Color-Blind Racism and the Persistence of Racial Inequality in the United States*. Rowman & Littlefield Publishers.

Ekin Kadir Selçuk. 2018. *"Mücadeleciler" Mücadele Birliği (1964-1980)*. İletişim.

Elizabeth Oglesby û Diane M. Nelson. 2016. Guatemala's genocide trial and the nexus of racism and counterinsurgency. *Journal of Genocide Research*. 18(2-3): 133-142.

Eric Ketelaar. 2002. Archival Temples, Archival Prisons: Modes of Power and Protection. *Archival Science*. 2: 221–38.

Eric T. Hoddy û Paul Gready. 2020. From agency to root causes: addressing structural barriers to transformative justice in transitional and post-conflict settings. *Contemporary Social Science [Online].*

Ertuğrul Zengin. 2021. *Akıncılar Hareketi. 1970'lerde İslâmcı Gençliğin Oluşumu ve Eylemi*. İletişim.

Etienne Balibar. 1991a. Is There a 'Neo-Racism'? Etienne Balibar û Immanuel Wallerstein. *Race, Nation, Class. Ambiguous Identities* içinde. Verso.

Etienne Balibar. 1991b. Racism and Nationalism. Etienne Balibar û Immanuel Wallerstein. Ji nav *Race, Nation, Class. Ambiguous Identities*. Verso.

Evren Balta. 2015. Ölü Bedenlerin Siyasal Yaşamları. *Birikim*: https://birikimdergisi.com/haftalik/7240/olu-bedenlerin-siyasal-yasamlari [05.03.2021].

Fatma Esra Öztürk. 2019. Göçmen Kadınlara Yönelik Üretilen "Yeni Irkçılık" Kavramının Medya Çerçevesinde İncelenmesi. *Global Media Journal TR Edition*. 9(18): 255-273.

Felisa L. Tibbitts û Gail Weldon. 2017. History curriculum and teacher training: shaping a democratic future in post-*apartheid* South Africa?. *Comparative Education*. 53(3): 442-461.

Ferhat Kentel, Meltem Ahıska û Fırat Genç. 2009. *"Milletin Bölünmez Bütünlüğü" Demokratikleşme Sürecinde Parçalayan Milliyetçilik(ler)*. TESEV Yayınları.

Ferhat Taylan. 2013. Strateji, Norm, Yönetim: Foucault'nun 1978 Collège de France Dersleri. *e-skop*: https://www.e-skop.com/skopbulten/strateji-norm-yonetim-foucaultnun-1978- coll%C3%A8ge-de-france-dersleri/1701 [01.12.2020].

Franca d'Agostini. 2019. Misunderstandings about truth. *Church, Communication and Culture*, 4(3): 266-286.

Fuat Dündar. 2019. *Modern Türkiye'nin Şifresi. İttihat ve Terakki'nin Etnisite Mühendisliği (1913-1918)*. İletişim.

Fuat Keyman. 2014. Çözüm Süreci, Müzakere, Güven ve Demokrasi, Murat Aktaş (ber.) Ji nav Çatışma Çözümleri ve Barış. İletişim.

Füsun Üstel. 2004. İmparatorluktan Ulus-Devlete Türk Milliyetçiliği: Türk Ocakları 1912- 1931. İletişim.

Galip Dalay. 2015. Çözümü Kolaylaştırıcı Toplumsal Faktörler. Necmiye Alpay û Hakan Tahmaz. Ber. Ji nav *Barış Açısını Savunmak. Çözüm Süreci'nde Ne Oldu?* Metis.

Geoffrey V. Davis. 1999. Addressing the Silences of the Past: Truth and Reconciliation in Post-*Apartheid* Theatre. *South African Theatre Journal*. 13(1): 59-72.

Giovanni Gobber. 2019. The scarlet letter of 'post-truth': the sunset boulevard of communication. *Church, Communication and Culture*. 4(3): 287-304.

Greg Ruiters. 2001. Environmental racism and justice in South Africa's transition. *Politikon: South African Journal of Political Studies*. 28(1): 95-103.

Günay Göksu Özdoğan. 2002. *Turan'dan Bozkurt'a. Tek Parti Döneminde Türkçülük (1931- 1946)*. İletişim.

Güneş Murat Tezcür. 2014. Türkiye'de Silahlı Çatışmanın Med-Cezirleri ve Zor Bir Barış. Murat Aktaş (ber.) Ji nav Çatışma Çözümleri ve Barış. İletişim.

Hannah Arendt. 1972. *Crises of the Republic*. A Harvest Book.

Hannah Arendt. 1976. *The Origins of Totalitarianism*. A Harvest Book.

Hannah Arendt. 2012. *Geçmişle Gelecek Arasında*. Wer. Bahadır Sina Şener. İletişim.

Hatice Çoban Keneş. 2014. *Yeni Irkçılığın "Kirli" Ötekileri. Kürtler, Aleviler, Ermeniler*. Dipnot.

Ilia Xypolia. 2016. Racist Aspects of Modern Turkish Nationalism. *Journal of Balkan and Near Eastern Studies*. 18(2): 111-124.

Ilker Aytürk. 2011. The Racist Critics of Atatürk and Kemalism, from the 1930s to the 1960s. *Journal of Contemporary History*. 46(2): 308-335.

İnan Özdemir Taştan. 2018. Ayrımcılıkla Mücadele için Radikal Medya. Ülkü Doğanay (Ber.) Ji nav *Ayrımcılığın Yüzleri*. Kapasite Geliştirme Derneği: 217-232.İsmet Parlak û Armağan Öztürk. 2015. 2009-2015 Aralığında "Açılım" Süreçlerine Yönelik Siyasi Parti Söylemleri Üzerine Karşılaştırmalı Bir Analiz. *EUL Journal of Social Sciences*. VI(II): 87-114.

Jacques Derrida. 1996. *Archive Fever: A Freudian Impression*. Chicago University Press.

Jacques Rancière. 2004. *The Politics of Aesthetics*. Continuum.

Jeff Goodwin. 2007. "The Struggle Made Me A Nonracialist": Why There Was So Little Terrorism in the Anti*apartheid* Struggle. *Mobilization*. 12(2): 193-203.

Jennifer Balint, Kristian Lasslett û Kate Macdonald. 2017. "Post-Conflict" Reconstruction, the Crimes of the Powerful and Transitional Justice. *State Crime Journal*. 6(1): 4-12.

Joseph E. Flynn Jr. 2015. White Fatigue: Naming the Challenge in Moving from an Individual to a Systemic Understanding of Racism. *Multicultural Perspectives*. 7(3): 115-124.

Joshua Miller û Susan Donner. 2000. More Than Just Talk: The Use of Racial Dialogues to Combat Racism. *Social Work with Groups*. 23(1): 31-53.

Julia Paulson û Michelle J. Bellino. 2017. Truth commissions, education, and positive peace: an analysis of truth commission final reports (1980-2015). *Comparative Education*. 53(3): 351-378.

Julia Viebach. 2020. Transitional archives: towards a conceptualisation of archives in transitional justice. *The International Journal of Human Rights [Online].*

Katharina Bodirsky. 2016. From the 'state-idea' to 'politically organized subjection.' Revisiting Abrams in times of crisis in Turkey and EU-Europe. *Journal of Global and Historical Anthropology*. 75: 121-129.

Katherine Verdery. 1999. *The Political Lives of Dead Bodies: Reburial and Postsocialist Change*. Columbia University Press.

Kathrin Braun. 2019. Unpacking post-truth. *Critical Policy Studies*. 13(4): 432-436

Kemal Can û Tanıl Bora. 2000. MHP'nin Güç Kaynağı Olarak Kürt Meselesi. *Birikim*. 134- 135: 56-72.

Kevin Durrheim, Michael Quayle, Kevin Whitehead û Anita Kriel. 2005. Denying racism: Discursive strategies used by the South African media. *Critical Arts*. 19(1-2): 167-186.

Khalid Amine. 2018. Decolonizing Theatre History in the Arab World - The case of the Maghreb. *Horizons/Théâtre [Online]*. 12: 10-25.

Kudret Çobanlı. 2020. *Zor Olsa da Barış: Guatemala Deneyimi*. Disa Yayınları.

LaKeasha G. Sullivan û Garth Stevens. 2010. Through her eyes: relational references in black women's narratives of *Apartheid* racism. *South African Journal of Psychology*. 40(4): 414-431.

Limor Shifman. 2018. Testimonial rallies and the construction of memetic authenticity. *European Journal of Communication*. 33(2): 172-184.

M. John Lamola. 2016. Biko, Hegel and the End of Black Consciousness: A Historico-Philosophical Discourse on South African Racism. *Journal of Southern African Studies*. 42(2): 183- 194.

Mac Maharaj. 2008. *The ANC and South Africa's Negotiated Transition to Democracy and Peace*. Berghof Transitions Series No. 2. Berghof Foundation.

Mahmood Mamdani. 2002. Amnesty or Impunity? A Preliminary Critique of the Report of the Truth and Reconciliation Commission of South Africa (TRC). *Diacritics*. 32(3-4): 32-59.

Mahmood Mamdani. 2015. Settler Colonialism: Then and Now. *Critical Inquiry*. 41(3): 596-
614.

Marc Augé. 2019. *Unutma Biçimleri*. Wer. Mehmet Sert. Yapı Kredi Yayınları.

Martin Barker. 1981. *The New Racism*. Junction Books.

Matthew Mullen. 2015. Reassessing the focus of transitional justice: the need to move structural and cultural violence to the centre. *Cambridge Review of International Affairs*. 28(3): 462- 479.

Md. Ali Siddiquee. 2020. The portrayal of the Rohingya genocide and refugee crisis in the age of post-truth politics. *Asian Journal of Comparative Politics*. 5(2): 89-103.

Megan E. Morrissey û Christy-Dale L. Sims. 2015. Playing the Race Card: Antiracial Bordering and Rhetorical Practices of New Racism. *Review of Communication*. 15(2): 81-101.

Mehmet Kurt. 2019. 'My Muslim Kurdish brother': Colonial rule and Islamist governmentality in the Kurdish region of Turkey. *Journal of Balkan And Near Eastern Studies*. 21(3): 350–365.

Mete Kaan Kaynar. 2020. Türkiye'nin Ellili Yılları Üzerine Bazı Notlar. Mete Kaan Kaynar (ber.) *Türkiye'nin 1950'li Yılları*. İletişim.

Michael Billig. 1995. *Banal Nationalism*. Sage.

Michael Neocosmos. 2016. *Thinking Freedom in Africa: Toward A Theory of Emancipatory Politics*. Witts University Press.

Michael Welch. 2003. Trampling Human Rights in the War on Terror: Implications to the Sociology of Denial. *Critical Criminology*. 12: 1-20.

Michel Foucault. 2002. *Toplumu Savunmak Gerekir*. Wer. Şehsuvar Aktaş. YKY.

Michel Foucault. 2003. *"Society Must Be Defended" Lectures at the Collège de France.1975-76*. Picador.

Michel Foucault. 2011. *Entelektüelin Siyasi İşlevi*. Wer. Işık Ergüden, Osman Akınhay, Ferda Keskin. Ayrıntı. Michel Foucault. 1980. *Power/Knowledge. Selected Interviews and Other Writings 1972-1977*. Ed. Colin Gordon. Pantheon Books.

Mónica Inés Cejas. 2007. Racial Discrimination in Post-*Apartheid* South Africa: A New Irreducible "Other"?. *Safundi: The Journal of South African and American Studies*. 8(4): 473-487.

Murat Ergin. 2008. 'Is the Turk a White Man?' Towards a Theoretical Framework for Race in the Making of Turkishness. *Middle Eastern Studies*. 44(6): 827-850.

Murat Kılıç. 2016. *"Allah, Vatan, Soy, Milli Mukaddesat" Türk Milliyetçiler Derneği (1951- 1953)*. İletişim.

N. Barney Pityana. 2018. The truth and reconciliation commission in South Africa: perspectives and prospects. *Journal of Global Ethics*. 14(2): 194-207.

Nancy L. Green. 1999. Le Melting-Pot: Made in America, Produced in France. *The Journal of American History*. 86(3): 1188-1208.

Nazan Maksudyan. 2016. *Türklüğü Ölçmek. Bilimkurgusal Antropoloji ve Türk Milliyetçiliğinin Irkçı Çehresi 1925-1939*. Metis.

Nesrin Uçarlar. 2015. *Hiçbir Şey Yerinde Değil. Çatışma Sonrası Süreçte Adalet ve Geçmişle Yüzleşme Talepleri*. İletişim.

Nevin T. Aiken. 2016. The distributive dimension in transitional justice: reassessing the South African Truth and Reconciliation Commission's ability to advance interracial reconciliation in South Africa. *Journal of Contemporary African Studies*. 34(2): 190-202.

Norbert Kersting. 2009. New Nationalism and Xenophobia in Africa: A New Inclination? *Africa Spectrum*. 44(1): 7-18.

Onur Atalay. 2018. *Türk'e Tapmak. Seküler Din ve İki Savaş Arası Kemalizm*. İletişim.

Özgür Sevgi Göral Birinci. 2017. *Enforced Disappearance and Forced Migration in the Context of Kurdish Conflict: Loss, Mourning and Politics at the Margin*. École des Hautes Études en Sciences Sociales Histoire et Civilizations [Teza doktorayê ya neweşandî].

Özgür Sevgi Göral, Ayhan Işık û Özlem Kaya. 2013. *Konuşulmayan Gerçek: Zorla Kaybetmeler*. Hakikat, Adalet ve Hafıza Çalışmaları Derneği Yayınları.

Pablo de Grieff. 2012. Theorizing Transitional Justice. *Nomos*. 51: 31-77.

Patrick Lenta. 2000. Transitional Justice and the Truth and Reconciliation Commission. *Theora: A Journal of Social and Political Theory*. 96: 52-73.

Paul Bijl. 2015. *Emerging Memory: Photographs of Colonial Atrocity in Dutch Cultural Remembrance*. Amsterdam University Press.

Paul Gready. 2008. Culture, Testimony, and the Toolbox of Transitional Justice. *Peace Review*. 20(1): 41-48.

Paul Gready û Simon Robins. 2017. Rethinking civil society and transitional justice:

lessons from social movements and 'new' civil society. *The International Journal of Human Rights*. 21(7): 956-975.

Paul van Zyl. 1999. Dilemmas of Transitional Justice: The Case of South Africa's Truth and Reconciliation Commission. *Journal of International Affairs*. 52(2): 647-667.

Paula Ioanide. 2018. "Why Did the White Woman Cross the Street?": Cultural Countermeasures against Affective Forms of Racism. *Souls*. 20(2): 198-221.

Pierre-André Taguieff. 2001. *The Force of Prejudice: On Racism and Its Doubles*. University of Minnesota Press.

Ran Halévi. 2017. The new truth regime. *Le Débat*. 197(5): 28-41.

René Lemarchand (ed.). 2011. Forgotten Genocides Oblivion, Denial, and Memory. University of Pennsylvania Press.

Rita Kesselring. 2017. *Bodies of Truth Law, Memory, and Emancipation in Post-Apartheid South Africa*. Stanford University Press.

Robert Mejia, Kay Beckermann û Curtis Sullivan. 2018. White lies: a racial history of the (post)truth. *Communication and Critical/Cultural Studies*. 15(2): 109-126.

Robert Miles û Malcolm Brown. 2003. *Racism*. Routledge.

Robert Stock. 2012. Apologising for Colonial Violence: The Documentary Film Regresso a Wiriyamu, Transitional Justice, and Portuguese-Mozambican Decolonisation. Birgit Schwelling (ber.). Ji nav *Reconciliation, Civil Society, and the Politics of Memory. Transnational Initiatives in the 20th and 21st Century*. Transcript Verlag: 239-276.

Robin DiAngelo. 2018. *White Fragility: Why It's So Hard for White People to Talk About Racism*. Beacon Press.

Ron Dudai. 2012. "Rescues for Humanity": Rescuers, Mass Atrocities, and Transitional Justice. *Human Rights Quarterly*. 34(1): 1-38.

Rosemarie Buikema. 2012. Performing dialogical truth and transitional justice: The role of art in the becoming post-*apartheid* of South Africa. *Memory Studies*. 5(3): 282-292.

Rosemary Nagy. 2008. Transitional Justice as Global Project: Critical reflections. *Third World Quarterly*. 29(2): 275-289.

Serpil Sancar. 2017. *Türk Modernleşmesinin Cinsiyeti. Erkekler Devlet, Kadınlar Aile Kurar*. İletişim.

Shakti Jaising. 2014. Reconstructing *Apartheid*, Redefining Racism. *Interventions*. 16(1): 117-134.

Stanley Cohen. 1972. *Folk Devils and Moral Panics*. Macgibbon and Kee.

Stanley Cohen. 2001. *States of Denial: Knowing about Atrocities and Suffering*. Polity.

Talin Suciyan. 2015. Dört nesil: Kurtarılamayan son. *Toplum ve Bilim*. 132: 132-149.

Tanıl Bora. 1998. Millî Tarih ve Devlet Mitosu. *Birikim*. 105-106: 83-93.

Tanıl Bora. 2017. *Cereyanlar: Türkiye'de Siyasi İdeolojiler*. İletişim.

Tine Destrooper. 2018. Performative justice? The role of theatre and performance in facilitating transitional justice. *South African Theatre Journal [Online]*.

Tommie Shelby. 2003. Ideology, Racism, and Critical Social Theory. *The Philosophical Forum*. XXXIV:2. 153-188.

Toplum ve Kuram. 2014. "Geçmişin İşlenmesi Ne Demektir?" *Toplum ve Kuram*. 9.

Volkan Şimşek. 2018. Post-Truth ve Yeni Medya: Sosyal Medya Grupları Üzerinden Bir İnceleme. *Global Media Journal TR Edition*. Bahar/Spring. 8(16).

Yasin Sunca. 2016. *Infrastructures for Peace in Turkey. A Mapping Study*. Berghof Foundation.

Yeşim Yaprak Yıldız û Patrick Baert. 2020. Confessions without guilt: public confessions of state violence in Turkey. *Theory and Society*. https://doi.org/10.1007/s11186-020-09398-x [03.12.2020].

## Nesrîn Uçarlar

Nesrîn Uçarlar di sala 2009an de ji Zanîngeha Lundê ji beşa zanistên siyasî doktoraya xwe girt. Li hin zanîngehan li ser felsefeya siyasetê, teoriyên netewperweriyê û edaleta pêvajoya derbasbûyînê dersan da. Li ser kêşeya Kurdî ya Tirkiyeyê,di warên wek desthilatdarî û berxwedan, mafên ziman, rûbirûbûna paşerojê, aşitî û lêgerîna heqîqetê de xebatan kir.

© Truth Justice Memory Center, 2022

Vê raporê hewl dide ku ji analîza “rejîma heqîqetê” ya Foucault û ji nirxandinên Arendt ên eleqedarî têkiliya di navbera heqîqet û siyasetê de hereket bike û li ser nîqaşa dewra piştî heqîqetê (post-truth era) ya roja me raweste. Ji seyra dewra piştî heqîqetê ya li Tirkiyeyê, ku mirov dikare wek serdema neheqîqetiyê jî wê biwesfîne, bi rê dikeve da ku çêbûna rejîma heqîqetê ya li Tirkiyeyê, awayê xebitîna wê, miqaweta wê û krîza wê vekole û hewl dide li bernameyên televîzyonan ên salên 1990'î û yên 2010’an, nemaze li tezahurên “têkoşîna li dijî terorê” yên ku vebeyîne kanalên dewletê û li şopên hafiza û heqîqetê yên cuda yên ji van tezahuran qewimîne binêre. Ev rapor, têkiliya di navbera rejîma heqîqetê ya resmî ya Tirkiyeyê û rejîma heqîqetê ya mixalîf, ku ev li dijî ya resmî hatiye avakirin, wek rejîmeke şer nîqaş dike, ku nemaze ew di wexta “operasyonên xendeqan” de berbiçav bû. Mebesta vê raporê ew e ku ramanên nivîskar yên eleqedarî têkoşîna rarûbûna bi raboriyê re û nemaze ya têkildarî metoda lêgerîna li heqîqetê ya aştiyane, ku ji îtiraza rejîmên heqîqetê çêbûne, di çarçoveyeke qirêna/pevçûna heqîqetê de hilde dest û binirxîne.